

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Vildan PERTAV**

**HİLVAN YÖRESİNE AİT OLAĞANÜSTÜ MASALLARIN VLADİMİR  
PROPP YÖNTEMİNE GÖRE ANALİZİ**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2022**



**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Vildan PERTAV**

**HİLVAN YÖRESİNE AİT OLAĞANÜSTÜ MASALLARIN VLADİMİR  
PROPP YÖNTEMİNE GÖRE ANALİZİ**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**

**Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK**

**MUŞ-2022**

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**  
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Vildan PERTAV**

**ANALÎZA ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA CURNÊ REŞ LI**  
**GORÎ RÊBAZA VLADÎMÎR PROPP**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK**

**MÛŞ-2022**

## NAVEROK

NAVEROK .....	I
ABSTRACT .....	II
ÖZET.....	III
KURTE .....	IV
KURTEBÊJE .....	V
PÊŞGOTIN .....	VI
DESTPÊK .....	1

## BEŞA YEKEM

### ÇÎROKÊN DERASAYÎ Û RÊBAZA VLADİMİR PROPP

1.1. ÇÎROKÊN DERASAYÎ Û MORFOLOJİYA VLADİMİR PROPP .....	5
1.1.1. Çîrok .....	5
1.1.2. Taybetmendiyên Çîrokan.....	8
1.1.3. Teoriya Binyadger (Structuralism) .....	12
1.1.4. Vladimir Propp Rêbaza Morfolojîk .....	13
1.1.5. Erk û Fonksiyonên Çîrokên Derasayî yên Vladimir Propp .....	20

## BEŞA DUYEM

### ANALÎZA ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA CURNÊ REŞ LI GORÎ

### RÊBAZA VLADİMİR PROPP

2.1. ANALÎZA ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA CURNÊ REŞ LI GORÎ RÊBAZA VLADİMİR PROPP .....	21
2.1.1. Analîza Çîroka Bi Navê Sêwîyê Ap û Amojina .....	33
2.1.2. Analîza Çîroka Bi Navê Padîşêh û Lele .....	38
2.1.3. Analîza Çîroka Bi Navê Çîroka Fuqêre.....	41
2.1.4. Analîza Çîroka Bi Navê Dal Ahmet .....	46
2.1.5. Analîza Çîroka Bi Navê Dêwê Serzer .....	49

2.1.6. Analîza Çîroka Bi Navê Hirç.....	53
2.1.7. Analîza Çîroka Bi Navê Pîrewokê.....	56
2.1.8. Analîza Çîroka Bi Navê Mihemedşah .....	58
2.1.9. Analîza Çîroka Bi Navê Masîyê Kesk û Hişin .....	62
2.1.10. Analîza Çîroka Bi Navê Padîşahê Diz.....	66
2.1.11. Analîza Çîroka Bi Navê Mihemed û Keçika Padîşêh.....	71
2.1.12. Analîza Çîroka Bi Navê Meryem û Natalî .....	75
2.1.13. Analîza Çîroka Bi Navê Gurî .....	77
2.1.14. Analîza Çîroka Bi Navê Pîrê û Rovî.....	80
2.1.15. Analîza Çîroka Bi Navê Hebîbê Neçar.....	83
<b>2.2. FONKSIYONÊN KU DI ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN CURNÊ REŞ DE</b>	
<b>DERBAS DIBIN .....</b>	<b>85</b>
<b>ENCAM.....</b>	<b>91</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>98</b>
<b>PÊVEK .....</b>	<b>98</b>

## ÖZET

### YÜKSEK LİSANS TEZİ

## HİLVAN YÖRESİNE AİT OLAĞANÜSTÜ MASALLARIN VLADİMİR PROPP YÖNTEMİNE GÖRE ANALİZİ

**Vildan PERTAV**

**Tez Danışman: Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK**

**2022, 160 sayfa**

Masal, sözlü anlatı geleneğinin bir ürünüdür. Masallar insanların anlatımı sayesinde nesilden nesile aktarılmıştır. Halk masalları, kaybolma riski nedeniyle derlemeciler tarafından kaydedilmektedirler. Biz de bu çalışmaya öncelikle Hilvan masallarını derlemekle başladık. Bu çalışmada Hilvan’da tespit ettiğimiz on beş masal kullanıldı.

Folklorcular, masallar üzerine farklı çalışmalar yapmışlardır. Bu folklorculardan biri de Vladimir Propp’ dur. O daha çok olağanüstü masallara yönelmiş ve olağanüstü masallar üzerine otuz bir fonksiyon tespit etmiştir.

Bu çalışmada Hilvan’da derlenen on beş olağanüstü masal Vladimir Propp’un yöntemine göre analiz edildi. Bu çalışmanın amacı Hilvan yöresine ait olağanüstü masalların Vladimir Propp yöntemine uyar mı uymaz mı sorusunun cevabını vermektir. Propp’un belirlediği tüm fonksiyonlar bu masalarda tespit edilmiştir. Bu çalışmanın sonucunda Hilvan yöresine ait olağanüstü masalları bazı eksiklikler olsa da Vladimir Propp yöntemine uyduğu görülmüştür.

**Anahtar Kelimeler:** Hilvan, Masal, Vladimir Propp, Olağanüstü, Fonksiyon

**ABSTRACT**  
**MASTER'S THESIS**  
**ANALYSIS OF SEVERAL FAIRY TALES FROM HILVAN ACCORDING TO**  
**METHOD OF VLADIMIR PROPP**

**Vildan PERTAV**

**Advisor: Assisant Prof. Dr. Mehmet Emin PURÇAK**

**2022, Page: 160**

Story is a product of oral narritive tradition. Stories and tales have been passed down from generation to generation through the narration of people. In order to preserve this genre, the tales were recorded by the compilers. We started this study by compiling Hilvan tales. In this study, we have benefited from fifteen fairy tales that we have detected in Hilvan.

Folklorists have carried out various studies on fairy tales. Vladimir Propp is one of those folklorists. He mostly focused on fairy tales and identified thirty-one functions of fairy tales.

In this study, fifteen fairy tales compiled in Hilvan were analyzed according to Vladimir Propp's method. The aim of this study is to answer the question of whether Hilvan's fairy tales fit the Vladimir Propp's method or not. All functions determined by Propp have been detected in these tales. As a result of this study, it has been confirmed that Hilvan's fairy tales there are some deficiencies.

**Key Words:** Hilvan, Tale, Vladimir Propp, Fairy, Function

**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**ANALÎZA ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA CURNÊ REŞ LI GORÎ**  
**RÊBAZA VLADÎMÎR PROPP**

**PERTAV, Vildan**

**Şêwirmend: Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK**

**2022, 160 Rûpel**

Çîrok, cureyek ji edebiyata gelêrî ye. Çîrok bi saya vegotina mirovan ji nifşekê derbasî nifşeke din bûne. Ji bo ku ev cure winda nebe jî ji aliyê berhevkarên ve tên qeydkirin. Me jî herî pêşî bi berhevkirina çîrokên Curnê Reş dest bi vê xebatê kir. Di vê xebatê de panzdeh çîrokên ku me li herêma Curnê Reş tespît kirine hatin bikaranîn.

Folklornasan, xebatên curbicur di derheqê çîrokan de kirine. Yek ji wan folklornasan jî Vladimir Propp e. Wî bêhtir bala xwe daye li ser çîrokên derasa û li ser çîrokên derasa sîh û yek fonksiyon diyar kirine.

Di vê xebatê de panzdeh çîrokên derasa yê Curnê Reş, li gor rêbaza Vladimir Propp hatine analîzkirin. Armanca vê tezê ew e ku bersiva pîrsa çîrokên derasa yê herêma Curnê Reş li rêbaza Vladimir Propp tên yan nayê bê dayîn. Hemî fonksiyonên ku Propp diyar kirine di van çîrokan de hatin tespît kirin. Di encama vê xebatê de tê dîtin ku pirani çîrokên derasa yê Curnê Reş hin kêmasî hebin jî li rêbaza Vladimir Propp tên.

**Peyvên Sereke:** Curnê Reş, Çîrok, Vladimir Propp, Derasa, Fonksiyon

## **KURTEBÊJE**

bnr.	:	Binêre
B. Z.	:	Beriya zayinê
C.	:	Cild
enf.	:	Encama Neyînîya Fonksîyonê
hwd.	:	Her wekî dî
r.	:	Rûpel
vghz.	:	Vegûhezêr



## PÊŞGOTIN

Berhevkarî folklorê gel zindî dihêle. Çimkî dema ku mirov nenivîse wekî her tiştî dibe ku folklorê wî gelî jî bê jibîrkirin. Berhevkarî xebateke hêsan nîne. Ji bo ku xebatên behevkarîyê bîn kirin demek dirêj û sebreke mezin hewce dike. Ji bo mijara vê tezê ez zêde fikirîm. Di serî jî ber ku berhevkarî karek zehmet bû û mirov nedizanî ku çi dê bê pêş mirov em hinekî di dudilîyê de man. Lê dema ku em ketin nava xebatê zêdetir karê berhavkarîyê bala me kişand û me xebata xwe êdî bi dilek aram domand. Em li şopa çîrokan çûn û bi wan çîrokan jî bo me zarokatiya serdemekê çêbû. Çimkî wekî piranî kurdên di temenê me de di zarokatiya wan de jî wan re jî pir kêr hatibûn vegotin.

Ji pêşniyariya mijara tezê heta kêliya dawîn şewirmendê min her tim ligel min bû. Ji aliyê çavkanî, fikr û metodên tezê ve gelek alikariya min kir. Ji bo dilsozî û alîkariya şewirmedê min, birêz Mehmet Emin PURÇAK re spas dikim. Dîsa şewirmendê min ê duyemîn dema nivîsandina vê tezê de rexneyên xwe û pêşniyariyên xwe jî min re parve kir. Ji bo alikariyên wî birêz İlyas SUVAĞCI re spas dikim.

Mamoste Canser KARDAŞ jî bo çavkaniyan alikariya min kir û fikra vê mijarê jî wî derket. Ji bo alikariyên wî jî birêz Canser KARDAŞ re spas dikim.

Ji bo ku mirov bigihîje çîrokekê carinan bi dehan kesan re dikeve têkiliyê. Hemû çîrokbêjên ku jî min re çîrok vegotin û hemû kesên ku alikariya min kirin ku ez bigihîjim wan çîrokbêjan re spas dikim.

Ji aliyê berhevkirina çîrokan ve bavê min her tim bi min re bû. Bi saya wî ez gihîştim çîrokbêjan. Ji bo hevaltî û dilsoziyê wî jî bavê xwe re spas dikim. Ji bo ku di vê xebatê de her tim piştgirî dan min jî diya xwe û sê birayên xwe re spas dikim.

## DESTPÊK

Her civak an jî gel xwedî folklorekê ye. Folklor jiyan bi xwe ye. Em tiştên ku di jiyana xwe de dibînin, têkiliye pê tînin, bi kar tînin, hez dikin û hwd. di nav nav folklorê de dibînin. Axaftin, xwarin, zayîn, mirin, nifir, dua, cil û berg, edebiyat, huner û hwd. ev têgehên em wekî şaxên folklorê dikarin bibînin (Pertev, 2018: 29-31). Ev mînakên em dikarin dûr û dirêj bikin. Cihê ku mirov heye li wir folklor heye.

Pêwendiyêke xurt di navbera folklor û edebiyatê de heye. Lewra wek çîrok, efsane, destan, stran, xebatên folklorî yê pêşî bi piranî li ser berhemên edebiyata gelêrî ne (Pertev, 2018: 32). Di vê tezê de jî wek şaxêke girîng a folklorê em li ser çîrokan xebitîn. Di destpêkê de çîrok wekî berhemek yê ser zimanî bû, di nava civaka mirovatiyê de serî hildaye. Çîrok bi berhema aqil û hizrê civakê tê zanîn û roj bi roj, di jiyana de hatiye vegotin (Rahman, 2016: 12). Paşê ji bo ku çîrok nayên windakirin û ji bo ku bigihîjin nîfşên nû hatin berhevkerin. Em niha zêde rastî çîrokbêjan nayên. Çîrokbêjî bi teknolojiyê ve hêdî hêdî di jiyana me de derket. Dayikên ku zarokên xwe bi çîrokan dikirin xew êdî pir kêmane. Zarok li şûna çîrokan an bi televîzyon an jî bi telefonê ve mijûl dibin. Têkiliyên di navbera mirovan de êdî wekî berê xurt nînin. Her ku roj diçe axaftinên di navbera mirovan de di çarçoveya pêdiviyên de dimîne. Ev sedeman bi teknolojiyê ketine nav mirovan û rasthatina çîrokbêjan jî kêmtir bûye. Di aliyekî de jî kêmbûna çîrokbêjan xebatên berhevkeriyê qîmettir dike. Çimkî her ku çîrokbêj kêman dibin jibîrbûna çîrokan jî ewqas zêde dibe. Çîrokan berê bi piranî di bîra kal û pîran de dijîn. Her ku roj diçe ew kal û pîr jî mixabin kêman dibin. Di vî warî de her çiqas zû xebat bîna kirin ewqas baştir e. Ji bo berhevkeriyê her roj girîng e û her roj qîmetek e.

Her çiqas li gor me kêman bin jî di edebiyata kurdiya kurmancî de li ser çîrokan folklorî, di mijarên cûrbicûr de xebatên akademîk hatine kirin. İbrahim Tarduş (Tarduş, 2015) li ser mijara perwerdeya zarokan, Mehmet Bozkoyun (Bozkoyun, 2015) li ser analîza çîrokan, Mohammed Baiz Rahman (Rahman, 2016) li ser mijara perwerdeya zarokan, Bünyamin Demir (Demir, 2016) li ser motifên çîrokan, Mohammed Khidhîr (Khidhîr, 2017) û Reşîr Rojdar Yıldız (Yıldız, 2017) li ser edebiyata zarokan, Leyla Kaplan (Kaplan, 2018) li ser motifên çîrokan, Servan Başdaş (Başdaş, 2018) li ser mijara perwerdeya zarokan, Cihat Güney (Güney, 2019) li ser analîza çîrokan tez nivîsandine. Hatice Ücar (Ücar, 2019) di çîrok û stranên gelêrî yê Colemêrgê de li ser mijara

nasnameya jinê tezek nivîsandiye. Bi vî awayî em xebatên cuda dibînin. Li gor lêkolînên me heta niha ji aliyê mijarê ve xebatên (tez) herî nêzî xebata me yên Mazhar Çiftçi (Çiftçi, 2019) û Yasîn Duran (Duran, 2019) in. Mazhar Çiftçi li ser bîst û çar çîrokên derasa yên herêma Çaldiranê xebitiye. Yasîn Duran jî li ser deh çîrokên derasa yên Colemêrgê xebitiye. Ew her du xebat jî ji aliyê analîzê ve dişibin teza me. Çimkî ew herdu xebat jî ji bo analîzkirina çîrokan rêbaza Propp bi kar anîne. Cudahiya xebata me û ya wan ew e ku çîrokên ku di xebatan de hatine bikaranîn in. Me jî ji bo vê xebatê herêma Curnê Reş hîlbijart.

Curnê Reş navçeyeke girêdayî bajarê Rihayê ye. Curnê Reş di navbera bajarê Rihayê û navçeya Sêwregê de cîh digire. Li vê navçeyê ji bilî Kurmancan, Dimil û Erebi jî dijîn. Lê zêdetir xelqê wê kurmanc in.

Wekî ku me di jor de jî diyar kir heta niha xebatên nêzî vê xebata me hebin jî li herêma Curnê Reş ev lêkolîn nehate kirin. Me jî ji ber vê hewcedarî bi xebateke wiha dît. Ji bo ku edebiyata kurdî geştir û xurttir bibe hewcedariya me bi lêkolîn û xebatên bi vî awayî hene. Li her dere ku Kurd dijîn hewceye ku em folklorê wan zindî bihêlin û li gor taybetmendî û xalên girîng ên folklorê wan çêşnê folklorê vekolin û li gel û ger bibe jî li cihanê bidin nasîn. Armanca me di vê tezê de ew e ku em panzdeh çîrokên derasa yên herêma Curnê Reş li gorî rêbaza Propp analîz bikin.

Çîrok cûrbicûr in. Di nav van cureyan de çîrokên ajalan, çîrokên pêkenokî, çîrokên zincîreyî û hwd. hene. Propp li ser çîrokên derasa analîzên xwe kiriye û em jî ji bo vê xebatê li çîrokên derasa geriyan.

Lê di dema lêgerîna çîrokan de tenê ev cure çîrok derneketin pêş me. Em rastî gelek çîrokên cuda hatin. Em dikarin bibêjin ku piraniya wan çîrokên li ser ajalan bûn. Di nava çîrokên ku hatine berhevkirin de me panzdeh çîrokên derasa hîlbijartin.

Ev panzdeh çîrok ji aliyê heft kesan ve hatine vegotin û dengê wan hatiye qeydkirin. Ev çîrok li navenda Curnê Reş û li gundên Cemal (Ömerli) û Çimdeliyê hatine berhevkirin. Ev her du gund jî pir nêzî navendê ne.

Di serî de ji bo ku em xwe bigihîjînin çîrokan pirs bi pirs me xwe gîhand çîrokbêjan. Carinan kesên ku me pir hêvî dikir ku çîrokan dizanin û me xwe digîhand wan, digotin “Ez nizanim.” an “Min berê pir dizanibûn lê niha min jibîr kirine.” Pir caran li wir em dest vala vedigeriyan. Tişteke balkêş jî heye ku qasî ku me lêkolîn kir piraniyê mêran

wekî jinan çîrokên derasa nizanibûn. Ew bi gelemperî an meselok, an çîrokên derheqê ajalan de an jî pêkenok digotin. Ji çîrokbejên ku me di vê xebatê de cîh daye çîrokên wan pênc kes jin û du kes jî mên in. Em dikarin bibêjin ku ev xal li ser folklorê jinan jî hêjayî lêkolînê ye.

Berhevkar zêdetir di karê berhevkarîyê de metodên mînanî çavnêrî, hevpeyvîn û anketê bi kar tînin (Taş M., 2018: 6). Metoda çavnêriyê vediqete du forman; çavnêriya beşdarî û çavnêriya ne beşdarî. Di çavnêriya beşdarî de lêkolîner cihê ku berhevkarîyê dike pêş de dibîne û dikeve nav civakê lê kes nizane ku ew ji bo berhevkarîyê li wir e. Lêkolîner dema çavnêriyê ya bûyereke folklorîk dê biqewime çalak e. Ew jî daxilê wê bûyerê dibe. Lê di çavnêriya ne beşdarî de kes an civakê hembêrî berhevker dizane ku ew berhevkarîyê dike. Di vê çavnêriyê de berhevkar çalak nîne. Lêkolîner wekî temaşevanekî wê bûyerê ye. Ew nîşeyên xwe digire û dangan qeyd dike (Çobanoğlu, 2019: 81-83). Me di merheleya berhevkarîyê de ji metoda çavnêriya ne beşdarî îstîfade kir. Çimkî xebata me li ser çîrokan e û me jî bi saya çîrokbêjan xwe gîhand van çîrokan û wan dizanibû ku em berhevkarîyê dikin û dengê wan qeyd dikin.

Têkiliya me ya bi çîrokbêjan ve rû bi rû çêbû. Bi gelemperî em çûn mala wan. Carinan jî ji ber ku mala wan ji bo deng qeyitkirinê neguncav bû me wan li mala xwe mêvan kir. Dema ku me ev çîrok derbasî ser qaxizê kirin me rê û rêbazên berhevkarîyê bi kar anîn. Çîrok çawa hatibin gotin wisa hatin nivîsandin. Tu guherandin an jî sererastkirinên rêzimanî li ser çîrokan nehatiye zêdekirin. Agahiyên derheqê çîrokbêjan de jî wek çavkaniyên devkî me nîşan dan.

Ev xebata me ji du beşan pêk tê. Di beşa ewilîn de têgeha çîrokê hatiye nasandin. Piştî Vladimir Propp û rêbaza wî ya morfolojîk hatiye nasandin. Di beşa duyem de çîrokên ku hatine berhevkarîyê li gor rêbaza Propp hatine analîzkirin. Piştî analîzê çîrokan wek encam hemû fonksiyonên ku di çîrokan de hatine tespîtkirin hatin nîşandan. Di dawiya xebatê de çîrokên derasa yên ku li Curnê Reş hatine berhevkarîyê cîh digrin. Di dawiya xebatê de me cîh daye çîrokên ku ji bo vê xebatê hatine berhevkarîyê. Dîsa di dawiya xebatê de ji bo ku çîrok bi devoka Curnê Reş ve hatine nivîsîn û ji bo ku baştir bînin femkirin me ferhengokek jî amade kiriye.

Di nivîsîna vê tezê de hin pirsgerêk jî derketin pêş me. Ya rastî pirsgerêk dema berhevkarîyê de derdiket pêş me. Dema me çîrok berhev dikirin pir caran ji çîrokbêjên

cuda heman çîrok rastî me dihat. Carinan bi varyanteke cuda carinan jî bi heman awayî çîrok dihatin gotin. Hin kesên ku me lê hêvî dikir ku çîrokan dizane em li cem wî dest vala vedigeriyan. Û hin çîrokbêj dema me digot nav û paşnavê te dê di xebatê de bê nivîsîn ditirsiyan û nedixwestin çîrokê vebêjin. Lê di dawiyê de me wan aram dikir û ew bawerî bi me dikir paşê me dest bi berhevkirinê dikir. Wekî ku me di jor de jî diyar kir carinan ji ber mala çîrokbêjan ne guncav bû me wan li mala xwe kir mêvan. Ev rêbaz jî di nav xwe de talûkeyek dihewand. Çimkî ew ji cihê xwe yê xwezayê dûr diketin û dibe ku tiştên cuda bala wan bikişanda û nekaribûna her tiştê di bîra xwe de ragihînin. Ji bo vê jî me dema li mala xwe mêvan kirin me hinek dem da wan û em bi wan re mijûl bûn paşê me xwest ku turikê xwe yê çîrokan ji bo me vekin. Pirsgirêkên bi vî awayî derketibin pêş me jî me heta dawiyê xebata xwe domand.

## BEŞA YEKEM

### ÇÎROKÊN DERASAYÎ Û RÊBAZA VLADİMİR PROPP

#### 1.1. ÇÎROKÊN DERASAYÎ Û MORFOLOJIYA VLADİMİR PROPP

##### 1.1.1. Çîrok

Di zimanê Îngilizî de ji bo çîrok “tale”, Fransewî de “conte”, Tirkî de “masal”, Erebi de “mesel”, Elmanî de jî “machen” tê bi kar anîn. Di kurdiya kurmancî de derhaqa cureya vê vegotinê de gelek peyv hene. Çîrok, çîrçîronik, destan, xebiroşk, çêrçerok, çîronk, çîvanok, qewatî, be ser hat, meselok, xebiroşk, çîrvanok, çîrçîrok, serborî, metalok, kurteçîrok, xemisok, mesel, serpêhatî, hîkaye hwd. (Kızıl & Veysel, 2015: 70-85). Di vê xebatê de me ji nav van peyvyan peyva çîrokê hilbijart. Peyva çîrokê di nav xelkê kurd de zêdetir berbelav e û li herêma Curnê Reş jî wek ‘çîrok’ tê zanîn û bikaranîn. Me jî ev peyv ji bo vê xebatê lêhatî dît.

Dîroka bikaranîna peyva “çîrokê” bi teqezî nayê zanîn. Qasî ku tê zanîn ev bêjeya “çîrokê” di sala 1893yan de di ferhengê Kurdî-Erebî de hatiye bikaranîn. Navê ferhengê El-Hediyye el-Hemîdiyye fi’l-Lugat el-Kurdiyye ye û ji aliyê Yusuf Ziya Paşa el Xalidî el Meqdîsî ve hatiye nivîsîn û li Stenbolê hatiye çapkirin (Bozkoyun, 2015: 17).

Di derheqê vê cureya wêjeyî de ji bo binavkirina peyvê zêde peyv hene. Lê ev yeka jî gengeşiyekê ji bo binavkirina çîrokê derdixe holê. Di vî warî de gelek nîqaş têne kirin. Çend nîqaşên di vî warî de wiha ne:

Rohat Alakom vê nîqaşê wiha şîrove dike: “Carcar di weşanên perîdiyodîk de, peyva çîrok li şûna serpêhatiyan (kurteçîrok) jî tê bikaranîn. Lê belê ev yeka ne rast e. Ji ber ku nivîskarên serpêhatiyan kifş in. Serpêhatî berhemên nûjen in, bi tehr û naveroka xwe ve ji çîrokan gelekî cuda dibin. Ev yeka di warê navkirinê de tevliheviyeke mezin di zimanê kurdî de peyda dike. Carinan an herdu berhemên re jî çîrok tê gotin. Pêwîst e ev pîrsa termînoloji yê bê çareserkirin û divê her tişt di cihê xwe de rûne” (Alakom, 2013: 13).

Ayhan Geverî di Antolojiya Çîrokên Nûbiharê de wiha dibêje: “Edebiyata kevin a kurdî gelek dewlemend bû, lê edebiyata nûjen hema em bibêjin van salên dawî ligel nivîsê ve muşerref û nasyar bûye. Wêca ev ‘dewrê transê’ ku di navbera edebiyata devkî û ya nivîskî de ye û hêj jî tesîra wê devam dike, wekî gelek tevliheviyan meseleya ‘çîrokê’ jî

bo me kiriye çîrok û mesele. Jixwe li cem me kelîmeya ‘çîr’ ku koka çîrokê ye, bi maneya ‘meselê’ ye û hêj jî mîsalên dihête gotin “Çîra wî gelek dirêj e” (Geverî, 2008: 12).

Cewerî di Antolojiya Çîrokên Kurdî de di bin sernava çîrokê de wisa dibêje:

“Ev jî rastiyeke e ku gotina ‘çîrok’ ji aliyê gelek kesan mîna ‘masal’ a tirkî, an jî ‘saga’ ya swêdî tê fêhmkirin. Li gelek deverên Kurdistanê kurd ji ‘masal’ re jî dibêjin ‘çîrok’. Lê li hin deveran jî bêjeya ‘çîrçîrok’ heye ku ev gotin di kovara Hawarê de jî hatiye bikaranîn. Herçiqas ‘çîrok’ û ‘çîrçîrok’ li hin deveran were eynî maneyê, an jî mirov tu ferqê nexwe navbera van herdu terman, lê di jiyana rastî de ev bi awayekî zelal ji hev vediqetin. Di jiyana rojane de di danûstandinên civakî de gotina ‘çîrok’ di zimanê gel de pirr tê bikaranîn. Gava yek ji yekî re behsa jiyana xwe an jî behsa jiyana hinên din bike û yê ku jê re tê behs kirin hê jî bipirse, yê ku behs dike dibêje ‘çîroka wan dûr û dirêj e’, an jî ‘ev çîrok dirêj e’, an jî ‘ev çîrokeke dûrûdirêj e.’” (Cewerî, 2003: 35).

Çi li nav Kurdan çî jî li cîhanê pênasekirineke hevpar ji bo çîrokê çênebûye. Her nivîskar, her berhevkar û lekolîner li gorî xwe çîrok pênase kiriye (Kızıl & Veysel, 2015: 71). Em dê li vir li ser çend pênaseyên cuda yên di derbarê çîrokê de bisekinin.

Pertev Nailî Boratav ji bo çîrokê wisa dibêje: “Çîrok wisa tê pênasekirin ku bi pexşankî tê gotin, ji bilî baweriyên olî û efsûnî, tevahî berhemên xeyalî ye, bi rastiyeke re bê eleqe ye, îddaya wê tune ku kes jê bawer bike” (Boratov, 1969: 80).

Sakaoğlu derheqê çîrokê de wiha dibêje: “Hin lehengên çîrokê heywan û heyînên siruştî ne û bûyerên çîrokan li welatê çîrokê diherike. Çîrok, ew vegotinên devkî nin ku her çiqas berhemên xeyalî bin jî guhdarvanan ji xwe bawerkirin dide (Sakaoğlu, 2015: 134).

Rohat Alakom di derheqê çîrokê de wiha dibêje: “Çîrok beşeke folklorê ye, nivîskarên wan ne kişî in, gel bi xwe ev berhem afirandine” (Alakom, 2002: 11).

Necat Keskîn di derheqê çîrokan de wiha dibêje: “Di nav vegotinên gelêrî de wek cure ya ku herî zêde derdikeve pêş û ya ku di edebiyata gelêrî de herî zêde derbas dibe çîrok e. Wekî Thompson jî dibêje: “Li her derê vebêjerên çîrokan hene û her dem guhdarvanên dilxwaz dibînin.” Çîrok yek ji hunera mirovatiyê ye ku di nav hezaran sal de hatiye vegotin û nifş bi nifş hatiye veguhestin” (Keskin, 2019: 204).

Di van pênaseyan de xuya dike ku pênaseyên têgeha çîrokê ji aliyê taybetmendiye, cureyê û ji aliyê beşa edebiyatê ve hatiye pênasekirin. Pênaseyeke rûniştî ji bo çîrokê nîne. Lê taybetmendiye rûniştî me digihîjine vê têgehê.

Çîrok jî mîna “gotinên pêşyan, mîna biwêj/îdyom, dilok/manî, pêkenî û destanan...” berhemên zargotinê ne (Yıldız, 2017: 233). Ji demên berê ve hatine gotin û hinek ji wan derbasî nivîsê bûne ku wek mînakên sereke tên nirxandin (Keskîn, 2019: 22). Ji van hin mînakên girîng ev in:

*Panchatantra* (pênc rê/ pênc destur/ rêgez/prensip) mînaka herî navdar ya çîrokan e ku bi zimanê resen ê sanskrîtî ne û li Hindistanê hatine berhev kirin. (Keskîn, 2019: 22). Gava ku behsa edebiyata Rojhilatê tê kirin, serê pêşî, çîrokên bi navê “*Çîrokên Hezar û Şevkê*” bi navê û deng in. Di edebiyata Danîmarkayê, çîrokên bi navê “*Çîrokên Andersen*” jî bûne malê edebiyata cîhanê. Wekî din di edebiyata Frensî de jî, *Çîrokên Perrault*, gelek navdar in. Di edebiyata Tirkî de jî çîrokên ku Eflatun Cem Güney ew berhev kirine, wek bîngeha vî çeşnî tên qebûl kirin. Dîsa *Çîrokên Keloğlan* jî di edebiyata Tirkî de gelek navdar in (Yıldız, 2017: 232).

Li cîhanê pir kesan çîrokên devkî di nav gel de berhev kirine. Di vî warî de em dikarin çend mînakên bidin. Xebatên derbarê berhev kirinê û vekolînê bi awayekî zanistî li ser çîrokan bi Birayên Grimm tên destpêkirin (Keskîn, 2019: 229). Nivîskarê Alman Wilhelm Grimm (1786-1859) û Jacob Grimm (1785-1863) çîrokên gel ên ku nehatibûn nivîsandin berhev kirine paşê jî ev çîrok nivîsandinê. Ev xebat ji bo xebatên ku dişibin xwe bûye standardek (Çobanoğlu, 2019: 37). Di vî warî de xebata Homerosê yewnanî, xebata nivîskarê Scotlandî Walter Scott (1771-1832) û hwd. xebat jî hene. Herwiha li gelek welatên cîhanê piştî Birayên Grimm xebatên berhevkeriyê hatine kirin (ji bo agahiyên berfireh bnr. Çobanoğlu, 2019).

Çawa ku em di nava gelên din de xebatên pêşîn yê derheqê çîrokan de bi saya berhevkerinê dibînin ev tişt bi heman awayî di nava kurdan de jî ciyê xwe girtiye. Di nav kurdan de pêşengê vî karî wek Mele Mehmûdê Bazidî tê zanîn (Keskîn, 2019: 231). Mele Mehmûdê Bazidî tenê çîrok berhev nekiriye di berhemên xwe de cîh daye hêmanên folklorîk yê din jî.

Di derheqê Mele Mehmûdê Bazidî de Pertev van agahiyan bi me re parve dike:

“Ji aliyê berhevkarî û tomarkirinê xebata herî berfireh di salên 1850î de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) hatiye kirin. Wî di gelek beşên folklorê kurdî de berhem dane. Du pirtûkên wî yên bi navên Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye û Camiye Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî ji bo folklorê kurdî berhemên giranbuha ne. Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye, xebateke civaknasî, etnografî û folklorî ye. Ji rabûn rûniştinê heta awayên zewacê, ji baweriyên gelêrî heta navên jin û mêrên kurdan, ji taybetmendiyan cilûbergên kurdewarî heta xwarin û vexwarinan, der barê çand û civaka kurdan de agahî hatine dayîn. Camiye Rîsale û Hikayetê Ekradiyye li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Tê de 3 meqale û 40 çîrokên gelêrî hene” (Pertev, 2015: 250).

Piştî Mela Mûsayê Hekarî, Mela Mehmûdê Bazîdî çîrokên kurmancî derbasî nivîsê kiriye lê qesta me ji vê gotinê ne ew e ku hemû hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî nivîsine çîrok in. Ziya Avcî, pirtûka Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî ya Mela Mehmûdê Bazîdî transkribe kiriye û çap kiriye (Tarduş, 2015: 15). Bi vî awayî berhevkarîya çîrokên kurdî berbelav dibe û êdî lêkolînerên din û kovar û rojnameyên kurdan jî bala xwe didin berhevkarîyê û xebatên bi vî awayî zêdetir dibe.

Tarduş di vê mijarê de wiha dibêje:

“Em dema ku dîroka çîrokên kurdî yên ku hatine berhevkirin dinêrin xebatên bi vî rengî tenê ji aliyê Kurdan ve nabin. Em wek Albert Socin û Eugen Pyrm rastî kesên biyanî jî tên. Piştî Mela Mehmûdê Bazîdî, Albert Socin û Eugen Pyrm di sala 1890î de çîrokên herêma Turabdîn û Botanê bi navê Kurdische Sammlungen li Petersburgê çap kirine. Dîsa Rojhelatnasê elmanî F. Le coq di sala 1901î de li Mukriyan û hinek deverên Bakûr geriyaye hinek çîrok û gotinên peşyan civandine. Di sala 1903yan de jî bi navê Kurdische Texteê (Deqên Kurdî) li Berlînê çap kiriye” (Tarduş, 2015: 16).

Piştî van pirtûkan em çîrokan di rojname û kovarên û rojnameyên kurdiyên kurmancî de dibînin. Wekî kovarên Rojî Kurd, Jîn, Hawar, Ronahî û hwd. de û rojnameyên wek Rojnameya Roja Nû, Rojnameye Stêrê (ku pêveka Rojnameya Roja Nû bû) û hwd. de jî em rastî gelek çîrokên kurdî tên (Pertev, 2018: 284).

### 1.1.2. Taybetmendiyan Çîrokan

Hiyamên berê, dapîr û bapîran ji nêviyan xwe re çîrok vegotine. Yê neviyan jî ne xwendin bû ye ne jî nivîsandin. Awayekî xweser ê hêngaftin û fêrkirina navbera nifşan hebûye. Ev jî ‘vegotina devkî’ bûye (Yıldız, 2017: 228). Çîrok cureyeke pexşanî yên edebiyata devkî ye ku bi hezaran salan ve hatiye vegotin. Nifş bi nifş bi awayekî devkî heta îro jî çîrok hatine gotin û guhdarkirin.

“Di nav her civakê de û her wextî vebêjerên ku xeyalên xwe û hestên civakê wek çîrokan gotine. Bi gotinên ku ji devan derketine dîsa ji bo ku bikevin devan; bi pîranî di şevên dirêj û tarî de ku hinekî wê tarîbûnê ji ser wan rabike; di şevbûherkan

de, di civatan de bo ku civatê hinekî bibe dûr û wan kêfxweş bike; berî ku zarok têkevin xewekegiran û xweş çîrok hatine gotin” (Keskin, 2019: 204).

Em vir dixwazin li vegotina Keskin taybetiyekê zêde bikin ku ew jî dema ku me li navçeya Curnê Reş çîrok berhev dikirin piranî gotinên çîrokbêjan de vegotina çîrokê wek li ber argûna derbas dibû. Ango digotin ku çîrokên ku li ber argûnan jina bi hev du re digotin. Dema ku jin li ber êgir şiv çêdikirin an jî nan dipijandin di nav xwe de, bi hev dû re an jî ji zarokan re çîrok vedigotin.

Taybetmendiyeke mezin a çîrokan jî anonîmbûna wan e. Ango çîrok aîdê gelan in. Wekî ku me di jor de jî diyar kir bi awayekî devkî ghiştine îro û bi saya berhevkarên çîrok dikevin ser kaxizê. Çîrok cara ewil ji aliyê kî/ê ve hatine gotin nayên zanîn.

Çîrok ji hêla teknîka planî ve dabeşî sê beşan dibin: Beşa pêşî, ciyê raxistina cî, bûyer û lehangana e. Ji bo ku çîrokbêj, bala guhdaran bikşîne ser xwe, bi çîvanokeke mîna “Hebû tune bû, ji Xwedê mezintir kes tune bû, hebû paşayek û...” dest pê dike, pey re bi diyarkirina navê lehang û bûyera wî dike. Beşa eslî ku beşa duduyan e, ciyê vegotin û dirêjkirina bûyera eslî û bûyerên di ne ku li dora wê diqewimin. Navê beşa dawî jî, beşa daxwazan e. Di dawiya vê beşê de jî çîvanok heye (Yıldız, 2017: 231). Dawiya çîrokê bi gelemperî wek qalibên “Çîroka min çû diyaran, rihmet li bavê guhdaran” , “Çîroka min çû diyaran, rihmet li dê û bavê guhdaran.” “Çîroka min çû nav rişka, rihmet li bavê we gişka.”, “Çîroka min ji te re xweş, mîna dîlîmek zebeş”, “Çîroka min li garan, rehma li dê û bavê guhdaran, ji bilî fesadê li ber dîwaran.” hwd. diqede.

Taybetmendiyeke sereke ya çîrokê ew e ku; ew xwedî teknîkeke vegotinê ya pir kurt û serî ye. Di çîrokê de xaleke girîng jî ev e ku; her tim tê aşkerekirin ku bûyer di demeke borî de derbas dibe. Di çîrokê de hêmanên fantastîk gelek zêde ne û di cureyên din de bi vê miqdarê nayên dîtin. Di çîrokan de bûyer di cîhanê xeyalî de diqewimin, lehangên wan carina mirov, carinan heywan û carinan jî hin heyînan derasa ne, bi mebesta kêfanî an jî perwerdekirina guhdaran tên gotin û rastiyan bi hin remz û sembolen derasa û bi rêya hin qaliban tînin ziman (Duran , 2019:5).

Bi gelemperî naveroka çîroka kurdî gelekî dewlemend e. Motîfên curbicur û efsûnî derdikevin pêşberî me. Qesrên li ser ewran, bajarên heft tebeqan di binê erdê de, hûtên wekî çiyayan bilind, keçikên pêriyan, postên efsûnî, hewzên nemiriyê, beranên qemer yên dûtên wan wekî zinaran mezin, qehremanên birim, kevirên bi efsûn, ajalên rê û rêberiyê nîşanî mirovan didin û her wekî din tiştên ecêb di çîrokan de cihê xwe yên taybet digirin (Bozkoyun, 2015: 21).

Bûyerên ku di çîrokê de tèn vegotin, dibe ku bi temamî xeyalî bin û tu rastiyeke wan jidil tunebe. Bûyerên wusan in ku bi temamî, ji bin hiş û xeyalên gel derketine. Çawa ku bûyera çîrokê, xeyalî ye, kes û lehengên tê de jî xeyalî ne û di jiyana rastîn de, zû bi zû rastî meriv nayêtin. Lehengên çîrokê, kesên mîna padîşah, perî, pîrelek/pîrehebok, keçelok, bazirgan, dêw, hût, ziya (ejder) û cin in (Yıldız, 2017: 231).

Lehengên ku di nav bûyeran da derbas dibin tevger û xuyên wan di beşa ewilîn a çîrokê de çawa be heta dawîya çîrokê jî wisa berdewam dike. Lehengên baş, heta dawîya çîrokê baş in, yên xirab jî heta dawîya çîrokê xirab in.

Di çîrokan de çawa ku dem diyar nîne, cîh jî ne diyar in. Gava navê ciyekî bête diyarkirin jî, ew deverên xeyalî yên mîna “Pişt Çiyayê Qaf”, “Heft qat binê erdê” yan jî esman in. Digel vî awayî, teswîrê/şayesên berfireh ên sirûştê di wan de cî digrin (Yıldız, 2017: 231). Dema ku vebêjêr çîrokan, çîrokê vedibêjin bi gelemperî çîya, çem, an jî rêyên li welatên xwe dixin nava vegotinê lê ev yeka nayê wateya ku ew çîrok li wîr derbas bûye. Vebêjêr ji ber ku di vegotinê de dijwariyê nekişînin rêyek bi vî awayî didomînin.

Li gel ku çîrok çêkirî, xeyalî, xwedî leheng û mijarên derasayî bin jî di nav vê cureyê de çîrokên ji hev cuda hene û çîrokên ku dişibin hev jî hene (Keskin, 2019; 214). Ev jî bala lêkolîneran dikişîne û pir curebûna çîrokan ji bo wan bûne mijar.

Keskîn ji bo vê mijarê wiha dibêje:

“Ev cudabûn û manendîbûn bala lêkolînera dikişîne û ew ji bo famkirin û analîzên berfirehtir dikevin nav hewldanên polînkirina çîrokan. Li gorî mijar, karakter, naverok çîrok tèn kategorîzekirin ku wek tîp tê binavkirin. Di vê mijarê de sê navên sereke derdikevin pêş. Di nav wan de kesê yekem ku di vî warî de hewl daye û gihaştîye hinek encaman Antti Aarne ye (Aa). Stîth Thompson li ser bingeha xebatên Aarne (AaTh) û Hans- Jörg Uther jî li ser bingeha xebatên her duyan xebatên xwe didamezirîne (ATU). Hêjayî gotinê ye ku Pertev Naili Boratov û Prof. Dr. Wolfram Eberhard jî ji 2500 çîrokan Tîpên Çîrokên Tirkî (Typen Türkischer Volksmärchen- TTV) amade kirine. Wan di bin banê 23 mijaran de 378 cureyên çîrokan tesnîf kirine” (Keskin, 2019; 214).

Propp jî wekî ku em ê dema ravekirina Propp de jî cih bidinê li ser çîrokên derasayî xebitiye. Wî di nava kategorîzekirinan de çîrokên derasa hîlbijartiye û erk û fonksiyonên xwe li çîrokên derasa diyar kiriye.

Di dabeşkirina Aarne-Thompson de çîrokên derasa di nava tîprêzgeha 300- 749 de hatine tomarkirin. Aarne-Thompson cureyên van çîrokan li gor rewşa wan a derasayî wisa rêz dike: “Dijminên derasayî, mêrên/jinên derasayî, efsûnkirî; an xizmên din, efsûnkirî,

peywirên derasayî, alîgirên derasayî, hêmanên sêhrî, hêz û zanînen derasayî” (Çobanoğlu, 2019: 134). Li gor Linda Degh çîrokên bi sêhr wesîqeyên herî kevn ên dîroka mirovahiyê ne (Degh, 2005: 342-353).

Di nava cûreyên çîrokan de ya herî zêde tê zanîn ev cûre çîrok in. Naveroka van çîrokan neasayî ne. Bûyer carcaran heft tebeqe di binê erdê de, carcaran li ser çiyayekî di nava ewran de, carcaran li welatê pêriyan diqewimin. Lehengên van çîrokan cin, pêrî, dêw, hût, cinawir, pîrhevok, pîreke sêhrbaz li aliyê din lawikê padîşah, keybanûyek, nêçîrvanek, belengazek hwd. in (Bozkoyun, 2015:30). Lehengên van çîrokan li hember mehlûqatên ecêb dikevin têkoşînen hebûn û nebûnê. Ev cure çîrok bigelempêrî xeyalî ne û bi rastiyê re têkiliya wan tune ye. Ev cure çîrok ji aliyê formel an jî qalip gotinan ve dewlemend in. Di naveroka van çîrokan de ji yekê zêdetir bûyer hene. Li gor vegotinên gelêriyên din dirêjtir in (Sakaoğlu&Karadavut, 2011: 17). Em ê li gor Propp taybetmendiyên çîrokên derasa dema ravekirina rêbaza wî de jî rave bikin.

Lêkolîn û teoriyên ku li ser çîrokan hatine kirin jî gelek in. Herwiha di derbarê çavkaniyên çîrokê de hinek senifandin hene. Ev senifandina di bin navên ekolan de derdikeve pêşberî me. Ev ekol bi vî awayî derdikevin pêş me:

1. Ekola Mîtolojiyê (Nêrîna Berî Dîrokê): Nêrîna vê dibisitanê ew e ku çavkaniyên çîrokan mîtolojî ye. Yek ji nûnerên vê ekolê G. Huet e ku li gor wî çavkaniya çîrokan hewceye ku ji mîtolojiya Hînd-Ewropayê were lêgerîn. Li gor vê nêrînê bi borîna demê re mîtolojiyên Hînd-Ewropayê guherîne û bûne çîrok. Nûnerên vê ramanê Jacob Grîmm, Wilhelm Grîmm, G.V. Cox û Max Muller, Dasent û hwd. in (Sakaoğlu&Karadavut, 2011: 10).

2. Ekola Hîndolojiyê (Nêrîna Dîrokî): Li gorî vê ramanê çavkaniya çîrokê Hindistan e. Ew dibêjin ku çîrok nav û demên dîrokî de teşeya xwe standine û belav bûne (Keskîn, 2019:210). Nûnerên vê ramanê Sylvestre de Sacy, Theodar Benfey, Henry Gaidoz, Emanûel Cosqûm, Laiseleur Deslougheamps û hwd. in (Sakaoğlu&Karadavut, 2011: 10).

3. Ekola Antropolojiyê: Rexneyên li ekola mîtolojî û hîndolojiyê bingeha vê nêrînê pêk anîn (Keskîn, 2019:211). Li gor nûnerên ku vê ramanê diparêzin têkiliya çîrokê bi *Pançatanrayê* û bi *mîtolojiye* ve tune ye. Li gor wan bigeha çîrokê jiyana mirovatîyê ye. Çîrok çanda serdemê an jî ya çanda dîroka borî di nav xwe de dihewîne. Nûnerên vê

ramanê etnografên wek Edward Taylor, Andrew Lang, M. Lennan dikarin bên hesabandin (Sakaoğlu&Karadavut, 2011: 11).

Ev her sê ekolên ku me dan kesên mîna Sokolov, Dorson û Gennep bi awayekî berfireh li ser van her sê ekolan sekinîne (Keskîn, 2019:211). Bi vî awayî ekolên li ser çîrokan, ramanên li ser çavkaniyên wan û xebatên li ser çîrokan hatine sefinandin. Çawa ku li ser çavkaniyên çîrokan hatine xebitîn herwiha gelek folklornasan li ser çîrokan xebat kirine û xwestine bingeh û avahiya çîrokê jî bizanibin.

Folklornasan, di xebatên xwe da teorî û rêbazên lêkolînê, dabeşî du koman kirine: Koma Teorîyên Navendmetinî û Koma Teorîyên Navendmekanî (Yıldız, 2019: 16-17).

Folklornas, li gor teorîya Navendmetniyê, di lêkolînên xwe de metna vegotina gelêrî ji bo xwe dikin bingeh û şîrove û analîza xwe li ser wê ava dikin (Hikmet, 2016:26).

Teorîyên ku li ser rêbaza Navendmetinî dixebitin, her cure pirsgerêkên xwe, li gor teşeyê metin û taybetmendiyên binyad û naverokî yên metinan çareser dikin. Li gor teorî û rêbazên Navendmekanî folklornas, digel metnê berhemê, ew di heqê çibûn û çawaniya pêkhatina vegotina li ber dest de teoriyan pêş dixin. Ew pirsra “çima” an jî “ji kuderê” li vegotina gelêrî nakin lê belkî pirsra “çi” û “çawa” lê dikin (Hikmet, 2016:26).

Li gorî Dorson teoriyên îroyîn yên folklorê ev in:

Teoriya dîrokî-erdnîgarî, teoriya dîrokî- nûavakirînî, teoriya îdeolojîk, teoriya fonksiyonî, teoriya psîko-analîtîk, teoriya binyadî, teoriya devkî-formulayî, teoriya nav-çandî, teoriya gel-çandî, teoriya girse-çandî, teoriya nîvqadî û teoriya kontekstî (ji bo agahiyên berfireh bnr: Dorson, 2017).

Mijara vê tezê ku Rêbaza Vladimir Propp e, ji nav Teorîyên Navendmetnî, di bin binşaxê “Teorîyên Binyadger ên Folklorê” da cih digire (Dorson, 2017: 85-86). Ji ber vê yekê jî nav van teoriyan da em ê li ser teoriya binyadî bisekinin.

### **1.1.3. Teoriya Binyadger (Structuralism)**

Di bingeha rêbazên binyadgeriyê de xebatên zimanzaniyê hene. Ew bêtir li ser taybetiyên bingehîn ên binyada metnan disekinin. Binyadgerîparêz, pêşî li herêmeke diyar an li ser komekê vegotin û lêkolînan dikin. Piştî binyadek derdikeve holê. Ew vê binyadê dixin teşeya formulekê û di asta cihangîştî de bi kar tînin. Yanî bi gotineke din, ew “rêzimana afirandinên edebiyata gelêrî” çê dikin (Çalışıran, 2020: 56). Pêgirên vê

ekolê li şûna ku li dû varyanta orjînal a vegotinekê bigerin an jî li cihê ku derheqê sedemên derketin û belavbûna vegotinên gelêrî de şîroveyan bikin; bala xwe didin avahiya ku çîrok li ser wê pêk tê an jî xîmên bingehîn ku di proseseke vegotinî de xwedî rol in (Hikmet, 2016: 64).

Dorson destpêka vê teoriyê bi van hevokên jêrin ve rave dike:

“Parêzerên analîza binemayê (structural) pêşniyazên xwe berî salên 60î bi pêş ve xistin, wek mînak Andre Jolles di pirtûka xwe Einfache Formen- Formên Sade da (sala 1930) de, ji bo damezirandina teşeya pêşî ya derbirîna folklorê hewl daye; û Lord Raglan di pirtûka xwe ya bi navê The Hero- Leheng (1936) de nimûneya giştî ya tecrubeyên epîzodîk ji bo vegotinên lehengî ya klasîkû mîtolojîyê rave kir. Navûdengê van hewldanên di warê veqelaştina binemayê de ji vekolînên Vladimir Propp ê Rûsî bû ku yekem car sala 1928an bi navê Morphology of the folklate- Dariştina Çîrokên Gelerî li Rûsîyeyê hate weşandin. Û sala 1958an li îngilîzî hate wergerandin. Berçavbûna xebata Propp dewam kir û careke din di sala 1968an da Alan Dundes di pêşgotina pirtûka xwe the Morphology of North American Indian Folktales- Morfolojîya Çîrokên Bineciên Emerîkaya Bakur (1964) Propp wek pêşengê vê xebatê bi nav dike. Û ew teorî li ser çîrokên ku wê demê bêteşe dihatin dîtin ceriband û qada teoriya binyadî biawayekî ronak, berfirehtir kir” (Dorson, 2017: 83-84).

Armaca hemû rêbaz û teoriyên binyadger ew e ku lêkolîner, cureyên folklorê li gor model û formulên navneteweyî dêne ber xwe û wan analîz bike. Bi vî awayî ev rêbaz, bi demê re gramereke folklorê çê dike û ji bo ku meriv bi geşedana çand û zihnî ya merivahiye serwext bibe û wan rave bike, di asta navneteweyî de xebatên berawirdî dike (Çobanoğlu, 2019: 202).

Rêbazên binyadgeriyê yên ku jînenîgariya leheng tehlîl dikin ji aliyê kesên wek Johann Georg von Hahn, Otto Rank, Lord Raglan, Eric Hobsbawm hatine ceribandin. Di vê rêbazê de taybetiyên lehengan tên diyarkirin. Rêbaza “tehlîla binyadgeriyê ya çîrokan” a Vladimir Propp di vî warî de gelek navdar e. Ev rêbaz wek “Rêbaza Morfolojîk” jî tê binavkirin. Li gorî Propp, kok û dîroka çîrokê zêde ne girîng e. Propp li ser taybetiya fonksiyonî ya çîrokan sekiniye. Ji dêvla tehlîlên diyakronîk, wî vekolîneke binyadî ya senkronîk pêşniyaz kiriye (Yıldırım, Pertev, Arslan, 2013: 47-48). Em binêrin ka Propp kî ye û tehlîla wî ya binyadgeriyê ya li ser çîrokan çawa ye?

#### **1.1.4. Vladimir Propp û Rêbaza Morfolojîk**

Vladimir Yakovliyevîç Propp, 17ê Nîsana sala 1895an li Petersburgê hatiye dunyayê. Wî di navbera salên 1913 û 1918an da li Petersburgê Beşa Ziman û Edebiyata Slavî, filolojîya Rûsî û Almanî, digel Felsefeya Almanî û Felsefeya Rûsî xwendiyê. Sala

1918an perwerdeya xwe qedandiye û çendakî li dibistanên curbicur dersên mîna Almanî, Ziman û Edebiyata Rûsî dide xwendin. Piştî ku li kolejê wanebêjiya Almanî dike, di Zanîngeha Leningradê de dest bi xebatên perwerdeyê dike û li vir dursa folklorê dide. Piştî van xebatan, berhemên wî yên mîna Morphologiya Skazki (sala 1928an) ango “Morfolojiya Çîrokê” li Rûsyayê tê çapkirin, nav û dengê wî di warê Morfolojî û Folklorê da li dunyayê belav dibe. Propp, sala 1932yan wekî Endamê Hîndekariyê di Unîversîteya Lenîngradê/ St. Petersburgê de dest karî dike. Li vir ew bi xebat û lêkolînên xwe yên Linguistik/Zimannasîyê jî balê dikêşe ser folklorê û wekî serokê beşê, heta sala 1970 ku dimire, berdewamî dide kar û barên folklorê. Piştî berhemên xwe yên bi navê *Rayên/Binyadên Dîrokî yên Çîrokên Awarte* (sala 1946an) û *Helbesta Epîk a Rûs* (sala 1955an) dinivîse (Propp, 1998: 7).

Berhema wî ya ewilîn ya ku hatiye çapkirin, Morphology of Folktale (Morfolojiya Çîrokan), ji sala 1928an e. Dema ku xebata wî derket haya pir kesî jê çênebû. Ev berhem dê di pêşerojê de bi wergera Îngîlîzî re dê dengvedaneke bêhampa ji Propp re bibexşîne û niha jî berhema wî ya herî naskirî ye (Hîkmet, 2016: 72). Di serî de navê kitêbê ya ku em îro dizanin hinekî jê cuda ye. Propp li ser vê mijarê dibêje ku, “Min navê Morphology of Wondertale (Morfolojiya Çîrokên Derasayî) li kitêbê kiribû, lê ji ber ku bêtir balê bikişîne ser kitêbê, weşanger peyva wondertaleyê (çîroka derasayî) bi folktaleyê (çîroka gelî) ve guherand û bi vî awayî her kesî hew dizani bû ku kitab qanûnên giştî yên çîrokên gelî diduhurîne. Dema ku di sala 1928an de xebata wî ya bi navê *Dirûvsaziya Çîrokê* derket, ji ber ku dijî îdeolojiya siyasî bû hate jîbîrkin lê piştî ku di sala 1958an de ev xebat li zimanê ingilîzî hate wergerandin, li cîhanê de deng veda (Duran , 2019: 6).

Di sala 1958an de wergerandina berhemê bo îngîlîziyê û ji wê jî girîngtir, nivîsa danasînê/rexneyî ya bi sernavê “Binyat û Şikil, Ray û Ramanên Li Ser Berhemeke Vladimir Propp” ya di sala 1960an de nivîsandî ya Claude Levi-Straus ku danerê antopolojiya binyadger û zanyarê bi nav û deng ê Fransî ye. Wexta ku ev nivîs dengvedanekî bo kitêbê û helbet bo Propp di seranserê dunyayê de derdixîne, Propp êdî heftê salî ye. Ew tesîra ku Levi-Straus li Ewropayê û li Fransayê kiribû, di Dinyaya Teze [Emerîkayê] de jî duayenekî folklornasîyê yê Emerîkayê Alan Dundes bi gotara xwe ya ku di sala 1962an de bo kovara Journal of American Folklore hinartî û bi kitêba xwe ya bi navê Morfolojiya Çîrokên Çermsoran ên Bakûrê Emerîkayê’ ya ku di sala 1964an de çapbûyî dê ew cure bandorê bike; û di dawiyê de bi hostatiya analîzkirina binyadgeriyê

ya Propp ligel zanîna wî ya kûr ya folklorê rûsî dê bala herdu aliyên Atlantîkê bikişîne ser xwe, bi taybetî piştî sala 1970ê şûn de navê Proppî dê bibe klasîk (Çiftçi, 2019:12).

Propp, di seranserî heyata xwe de li dû tiştê nehugerbar a di folklorê de ketibû (Morfolojî, Kokên Tarîxî, Şahiyên Gund ên Rusî di vê lidûketinê de berhemên herî hêja ne) û di axiriyê de têgihîşt ku kifşkirina tiştê neguherbar her wext nayê maneya kifşkirina heqîqetê. Lewra li gorî Propp folklor dîsîplîneke îdeolojîk e û fikir-ramanên giştî yê heyamekî dide der, ku gava ew fikir-raman diguherin amajeyên bi naveroka folklorê tê kirin jî diguhurin (Çiftçi, 2019:12).

Vladimir Propp, nûnerekê teoriya avahîsazê ye. Nûnerên vê êkolê bala xwe didin avahiya ku çîrok li ser wê pêk tê an jî xîmên bingehîn ku di prosesê vegotinê de xwedî rol in (Duran, 2019: 7). Propp analîza xwe li gorî şert û lêkolînê wê demê û yê Rûsyayê dike. Wê demê çîrok ji aliyê tîp û motîvê ve tîpên polînkirin û ji bo vê yekê jî pêdivî bi daneyên bêhtir dibînin (Keskin, 2019:251). Propp li hemberî vê nêrînê wiha dibêje:

“Li vê derê em ê nekevin mijara lêkolîna dîrokî ya çîrokan em ê bêhtir li ser çawabûna çîrokan bisekinin. Lewra heya em fem nekin ku çîrok çawa ne, em derheqê peydabûna wan de jî nîkarin nikarin tiştê bibêjin. Berî ku em hîn bibin çîrok ji ku derê dertên, divê em fem bikin ku çîrok çi ne” (Propp, 2020:8).

Propp, çarçoveya rêbaza xwe bi çîrokên derasayî ve bi sînor dike û têgeha “fonksiyon” wekî têgeheke diyarker bi kar tîne. Lewma Propp, wekî gelekî folklorzanên beriya xwe nakeve li dû pirsên wek bingeha çîrokan ji ku tê, varyanta orjînal ya çîrokê kîjan e, tîkiliya di navbera dîrok û folklorê de çî ye û hwd. (Hikmet, 2016: 72). Li gorî Propp, fonksiyon çalakiya kesekî ye lê ev çalakî jî li gorî herikîna honandina bûyerê hatiye diyarkirin. Bi vegotîneke din, çalakiyên kesekî beşên herî girîng ên çîrokan in. (Çobanoğlu, 2019: 212).

Wê demê, bi bandora ekola finî ku nûnerê wê Antti Aarne yê xwendekarê Kaarle Krohn bû, bêhtir li ser tîpolojî, motîfan, koka çîrokan û polînkirina wan disekin (Keskin, 2019: 251-252). Propp van xebatan rexne dike; li gorî wî ji bo ku çavkaniyên zayîna an koka çîrokan bê kirin hewceye ku lêkolîner çawaniya çîrokê bizanibe û bikare danasîna çîrokê bike. Ew li dijî A. Aarne derketiye û wî hêmana herî biçûk a çîrokê wek motîf qebûl nekiriye. Popp nîşan daye ku motîf dabeş dibin û bi çeşn dibin (Günay, 2011: 20).

Keskîn vê nêrîna Propp wiha şîrove dike:

Propp ne li dijî polînkirinê ye; dîyarde û objeyên derdorê ji hêla terkip û binyada wan, ji hêla koka wan an jî ji hêla pêvajoyê û guherînên ku derbaskirine ve dikarin bîna vekolan û polînkirin. Lê rastiyêke din jî ew e ku diyardeyek berî her tiştî divê bê teswîrkirin. Loma berî teswîrkirina diyardeyê em nikarin behsa koka wê bikin.

Berî ku koka çîrokê bê ronîkirin, divê çibûna (çîrok çiyê?) çîrokê bê zanîn. Çîrok cûrbicûr in û di nav vî cûrbicûrbûna wan de em nikarin van vekolin, lê em dikarin tevahiyê (corpus) ji hev parçe bikin, teswîr bikin û ji vî yekê bigihîjin polînkirineke rast (Keskin, 2019: 252).

Propp, hewl dide ku hemû hêlên kokena/etîmolojîk a dîrokî ya çîrokan dîne ber xwe û li ser guherînên serdemî yê çîrokê bixebite. Li gor Propp pêvajoya derketina çîrokan a dîrokî, ya ku li ku û ji alî kê ve hatine gotin, ewqas ne girîng e. Li gor wî ya girîng teşe û karîgeriya van çîrokan e (Güney, 2019: 21). Ew bi vî rêbaza xwe, li ser guherînên ku çîrokek, di nav pêvajoya xwe ya serdemekê de rast lê hatîye hûr dibe. Bi raveyêke din li şûna tehlîla diyakronîk, ew wê tehlîla senkronîk ku hêmanên çîrokê, di nav beşeke serdemekê de digire destî pêşniyaz dike. Propp, ji parçeyên çîrokê dest pê dike û ber bi giştîya wê ve diçe û lê dikole, bê ka binyada wê çawa ye. Wî ev rêbaza xwe li dijberî Rêbaza dîrokî-Cografî derxistîye pêş. Çûnkî di Rêbaza Dîrokî-Cografî da teşeyê yek çîrokekê, bi gelek versiyonên din ra dihat berawirdkirin; lêbelê Propp, wan binyadên hevpar ên çîrokên çiyawaz derdixê holê û hewl dide rave bike, bê ka mantiqa binyadger a çîrokan bi çî awayî hatiye pevxistin (Yıldız, 2019: 22).

Propp bi xwe jî qebûl dike ku bi helwesta morfolojîk xebata xwe razber û tevlihev dike. Lê ew balê dikişîne ser vî yekê; dema ku bingeheên razber neyên vekolîn mirov nikare bigihîje tu diyardeyên şênber (Dündar, 2014: 116).

Nêrînên Propp di derheqê armanca xebata xwe ya morfolojîk de bi vî awayî nin. Em niha bîna ser teoriya wî ku em bibînin çîrok çawa analîz kirine.

Di Kataloga Çîrokên Navneteweyî, (Antti Aarne & Stith Thompson, The Types of the Folktale, Helsinki 1964, Aarne) de çîrok dabeşî van cûreyan hatine kirin: Çîrokên heywanan, çîrokên eslî: çîrokên derasayî/awarteyî û çîrokên rasteqînparêz, çîrokên zîncîreyî û hikayeyên pêkenî, fikreyên nuktedar û derewînderanîn (Yıldız, 2017: 20).

“Her çiqasî ev polînkirina ku Aarne kiriye rast û bi fêde be jî, li gorî Propp hinek kêmasiyên vî polînkirinê hene. Wek mînak, çîrokeke ku di nav de hirç derbas dibe, gava mekan diguherîne û wek mînak diçe Ewropayê li wir hirç dikare bibe şeytan. Di vî rewşê de ev çîrok dê çawa bê polînkirin. Propp her çiqas ev rexne li polînkirina Aarne kiribe jî çîrokên ku li ser dixebite jî ji vî polînkirina Aarne hildibijêre. Ango Propp analîz û xebata xwe li ser çîrokên derasayî dike ku di polînkirina Aarne Antti de ew di navbera hejmarên 300 û 749an de cîh digirin” (Keskin, 2019: 253).

Propp ji bo çîroka derasayî/fairytales wiha dibêje: “Çîroka ku bi xerabî an jî kêmahiyekê dest pê dike, di fonksiyonên navbeynkar de derbas û bi zewac an jî bi vekirina girêkê bi encam dibe. Çîrokên wiha ji aliyê dirûvên xwe ve çîrokên derasayî ne” (Propp, 2020: 93-94).

Ji aliyê din ve çîrokên derasayî li gorî Propp xwedî du taybetmendiyan sereke ne:

1- Pirrengî û pircûdatiya wan

2- Yekteşebûna wan a di bin vê pirrengitî û pircuretiya wan de (Keskin, 2019: 252).

“Fonksiyon” ji bo wî di çîrokên derasayî de têgeha herî watedar e ku mirov dikare avahiya çîrokê li ser wê bide rûniştandin. “Ji peyva fonksiyonê, çalakiya kesekî, çalakiya ku di nava rûdana honakê de ji ber wateya xwe hatiye pênasekirin, em fêm dikin” (Propp, 2020: 24). Propp gava ku behsa rêbaza xwe dike dibêje ku; pêşî beşên sazker ên çîrokê dê bîn jihev veqetîn û piştre çîrokê li gorî van beşên sazker dê bîn berawerdkirin. Di dawiya vê analîzê de jî dê binyadeke morfolojî derkeve ku hem li gorî beşên sazker û hem jî li gorî têkiliyên van beşan bi hevdu û bi tevahiyê re teswîreke van çîrokan pêkan be. (Propp, 2020: 22) Ji bo danasîna vê rêbaza rast a çîrokan Propp çar rewşên ji çîrokên derasayî yên ku di polînkirina Aarne de cih digirin berawird dike (Keskin, 2019: 253-254).

1- Qral, teyrekî dide leheng. Teyr leheng dibe qraliyeteke din.

2- Bapîr hespekî dide Suçenko. Hesp Suçenko ber bi qraliyeteke din ve dibe.

3- Efsûnkerek(sêhrker) qeyîqekê dide Ivan. Qayîk Ivan dibe qraliyeteke din.

4- Keybanû gustîlkekê dide Ivan. Kesên qirase ku ji gustîlkên derdikevin Ivan dibin qraliyeteke din.” (Propp, 2020: 23).

Wekî ku di çar rewşên jor de jî hatiye xuyakirin ku Propp li ser taybetiyên ku hatine guherandin û neguherandinên disekine. Yê ku diguherin obje û navên lehangan in û di van de yê ku naguherin jî çalakî ne. Propp ev çalakiyan wek fonksiyon bi nav dike (Ölmez, 2015: 535).

Li gor Propp karîgerî kiryarên kesan e; lê ev kiryar jî li gor wateya honandina herikîna bûyeran tên diyarkirin. Bi awayekê din kiryarên kesan bingeha beşên çîrokan e. Propp van kiryanan ji guherîna kesan her dem rizgar dike û cîyê her kiryarê li gor herikîna bûyerê diyar dike. Propp bi vî awayî 31 fonksiyonan tespît dike (Güney, 2019: 21-22). Û

van fonksiyonan wisa rêz dike: Dûrketin, qedexekirin, bînpêkirina qedexeyê, lêpîrsîn, komkirina agahiyan, xapandin, tevlibûna sûc, xirabî (kemasî), navbeynkarî, destpêkirina kiryara dijber, çûyîn, kiryara yekemîn a pexşker, berteka leheng, girtina heybera efsûndar, rêwîtiya di navbera du keyitiya de, lêkdan, îşareta taybet, serkeftin, hilanîn, bi şûn de vegeerîn, şopandin, alîkarî, xwe veşartin û vegeerîn, fikrên bêbingeh, karê zahmet, pêkanîna karê zahmet, nasandin, derxistina holê, guherîna teşe, cezakirin, zewicandin (Propp, 2011: 28-65).

Bêguman di hemû çîrokan de ev kiryar bi dorê peyda nabin lê car caran ji van karîgeriyan du-sê heb tune ne; yan di ser re hatine gavkirin. Dîgel viya jî dora qewimîna kiryan car din naguhere. Di çîrokên derasayî de her tişt bi xirabiyekê dest pê dike. Leheng ji bo ku xirabiyê ji holê rake dikeve nav liv û tevgeran. Ji ber vê jî hinek kes alîkariya leheng dikin; hinek jî li hember disekin. Bi vî awayî leheng heta ku bi ser dikeve, bi dorê di hemû qonaxan re derbas dibe. Propp di van xebatên xwe de li ser karîgeriyên çîrokan digihîje van encaman:

1. Kiryarên lehengan ji aliyê kê û çawa diqewimin bila biqewimin tu carî naguherin û her yek in û berdewam dikin.
2. Di çîrokên derasayî de karîgerî/kiryar bi sînor in.
3. Dora karîgeriyan her yek in.
4. Avaniya hemû çîrokên derasayî yek in naguherin (Propp, 2011: 24-26).

Metoda Propp li ser du lîngan ava bûye: Fonksiyon û rol (Temel, 2005: 85). Her wiha ji bilî fonksiyonên sabît di çîrokeke derasa de, karakter di heft rolên sabît de derdikevin pêş me. Ev rol ji “êrîşkar(kesê/a xirab), bexşgêr, alîkar, prenses (babê wê), şandyar (hinêryar), leheng, lehengê derewîn” pêk tên (Propp, 2020:80-81). Di çîrokan de dibe ku kesek di çend rola de derkeve pêş me. Mînak, di çîrokekê de dibe ku bexşgêr û prenses heman kes be. Dibe ku di çîrokekê de heft rol bi hev re nebin ji wan hin rol kêmbin. Li gor Propp, fonksiyon, di nav qada çalakiya heft kesan belav dibin. Qada çalakiya êrîşkar (xirabî, şer, şopandin); qada çalakiya bexşgêr (amadekirina veguhêzîna objeya sêhrî, objeya sêhrî dana lehengî); qada çalakiya alîkar (di pêkînanîna karê zehmet de harîkirina lehengî); qada çalakiya prensesê û babê wê (xwasteka pêkînanîna karê zehmet, derxistina holê ya lehengê sextekar, nasîna lehengê rast, cezakirina êrîşkarî, zewicîn); qada çalakiya şandyar (erkdarkirina lehengî); qada çalakiya lehengî (çûyîna bi armanca

lêgerînê, berteka xwastekên bexşgêrî, zewicîn); qada çalakiya lehengê sextekar (çûyîna bi armanca lêgerînê, berteka xwastekên bexşgêrî, îdiayên bêbinyat) (Propp, 2020: 80-82).

Ji bo ku çîrok bi şikleke objektîf bihêne sinifandin du cot element hene. Ev element têkoşina li gel xayîn-serkeftin (H-J) û erka zor-çareserî (M-N) ne. Li gorî hebûn û nebûna van cotan çîrok dibin çar cure:

1. Çîrokên ku di nav de cotê H-J heye.
2. Çîrokên ku di nav de cotê M-N heye.
3. Çîrokên ku di nav de hem cotê H-J hem jî M-N heye.
4. Çîrokên ku di nav de çî ji van cote elemanta nîn in (Propp, 2020: 104).

Çîrok, bi danasîna leheng dest pê dike. Ji bo vê rewşa ewil an jî destpêk dihête gotin. Ev ne fonksiyonek e lê elementeke morfolojîk e. Ev element, bi sîmgeya “α” yê tê nîşandan (Propp, 2020: 29).

Me di jor de qala rêbaza Propp kir. Ev rêbaza Propp ji hin aliyan ve hatiye rexnekirin.

Alan Dundes bixwe jî rêbaza Propp bi kar aniyê û rexneya wî li ser “bêwatebûna rêbaza analîza binyadî ya Propp” e. Li gorî rexneyên Dundes Propp di dawîya analîzê de li ser wateya şemaya ku derdikeve holê tiştêk negotiye. Dundes dibêje ku rêbazeke ku nayê şîrovekirin ji lîstikeke akademîk pir kêr cudatir e (vghz. Dundes. Çobanoğlu, 2019: 229). Ango Dundes li ser li ser şemaya ku di dawîya rêbazê de derdikeve holê disekine û ew Propp rexne dike ku piştî derketina şemayê ew girêdayî tiştêkî neaniye. Piştî analîzê mirov bi şemayê ve nikare çîrokê şîrove bike û bi tiştêkî ve jî girê bide. Keskin jî di vê xalê de wiha dibêje:

“Hinek rexne jî li nêrîn û analîza Propp hatine kirin. Ev rexne bi giştî wiha dikarin bîn rêzkirin:

Di serî de derasayîbûn ne diyar e. Li aliyê din, Propp her çiqasî rexne li polînkirinê bike jî, ew bixwe bi “derasayîbûn”ê polînkirinekê dike. Dîsa bi vê yekê ve têkildar, li gel ku rexneyan li polînkirina Antti Aarne dike û polînkirina li gorî tîpan wek şaşiyekê dibîne, dîsa jî çîrokên xwe yê derasayî ji vê polînkirinê hildibijêre.

Li gorî Propp polînkirina li gorî kategoriyan (şêwe: mînak fabl) bi pirsgirêk e; ya li ser mijaran tevlihev e. Lê ew bixwe pêşniyazekê nake” (Keskin, 2019: 259).

Li gorî İlhan Başgöz bi helwesta Propp zimanê çîrokê nikare bê vekolîn û li ser lehengên çîrokê şîrove nikarin bîn kirin û pêwendiya çîrok û civakê nayê berçevan. Mirov

bi helwesta Propp nikare fem bike ku çîrok henek e yan jî rexneyek civakî ye heta mirov ji bo ev metna di dest de nikare bibêje ku ev çîrokeke rast e yan bêbinî ye. Propp binyadeke razber xêz dike (Azadovskî, 1992: 37).

Ji bilî van jî rexne lê hatine kirin. Li gorî rêbaza Propp her fonksiyon cihek wê heye û li gor rêza ku wî diyar kiriye hev dişopînin. Lê piştî ku xebata wî bo Îngîlîzî hat wergerandin rêbaza Propp li ser çandên pir cuda hat tetbîqkirin. Ji ber ku rêbaza Propp ji aliyê folklornasek din li ser Çîrokên Rûsî nehatibû tetbîqkirin û yekî ku pir çîrokan bide ber hev dê bibîne ku carinan fonksiyoneke ku li gor Propp lazim e ku di nava çîrokê de cîh bigre di serî çîrokê de yan jî pişt fonksiyoneke din de cîh digre (Çobanoğlu, 2019: 229).

Bi vî awayî rexneyên curbicûr li rêbaza Propp hatine kirin. Her çiqas ev rexne li rêbaza Propp hatibin kirin jî metoda Propp li cihanê binav û deng bûye û li welatên cuda cuda li ser çîrokan hatiye tetbîqkirin.

#### 1.1.5. Erk û Fonksiyonên Çîrokên Derasayî yên Vladimir Propp

Ji ber ku formulîzekirina ku Bedran Hikmet kiriye karê me hêsantir kir me ev tabloya jor rastûrast bijart. Dîsa ji ber ku ev jêgirtin bingeha lêkolîna me ye û me hemû çîrokên ku berhev kirine girêdayî vê analîz kiriye me pêwîst dît ku di xebata xwe de em cîh bidin vê tabloyê. Tabloya 31 fonksiyonên ku Propp tesbît kiriye û hin sernavên li binê van fonksiyonan ev in:

<p><b>I.) Ji Malbatê yek dût dikeve</b>  <b>Pênase:</b> Dûrketin  <b>Hêma:</b> <math>\beta</math></p>	<p>1. Ji neslên pîr yek ji malê vediqete. (<math>\beta 1</math>)  2. Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî rengêkî teqez yê veqetîne tê dîtin. (<math>\beta 2</math>)  3. Ji neslên nû yek ji malê vediqete. (<math>\beta 3</math>)</p>
<p><b>II.) Leheng bi qedexeyekê re rûbirû dimîne</b></p>	

<p><b>Pênase:</b> Qedexekirin <b>Hêma:</b> γ</p>	<p>1. An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşan kirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn. (γ1) Bi fermaneke an jî pêşniyazeke, rewşeke berevajî qedexeyê tê destnîşankirin. (γ2)</p>
<p><b>III.)</b> Qedexe tê binpêkirin. <b>Pênase:</b> Binpêkirina Qedexeyê <b>Hêma:</b> δ</p>	<p>Rengê binpêkirina qedexeyê wekî rengê qedexeyê bixwe ye. Fonksiyonên II û III bi hev re cotik/Cotekê pêk tînin. Carina bêyî ku beşa yekem yanê fonksiyona II. hebe ya III. heye.</p>
<p><b>IV.)</b> Êrîşkar hewl dide ku agahîyan bi dest bixe. <b>Pênase:</b> Lêpirsîn <b>Hêma:</b> ε</p>	<p>1. Armanca lêpirsînê, zanîna cihê ku zarok lê dimînin an jî zanîna cihê eşyayê bi qîmet e. (ε1) 2. Berevajîya lêpirsînê, qurban ji êrîşkar hin pirsan dike. (ε2)  3. Di hin rewşan de lêpirsîn bi qasidiya hin kesên cuda tê kirin. (ε3)</p>
<p><b>V.)</b> Êrîşkar di heqê qurbanê xwe de agahîyan berhev dike. <b>Pênase:</b> Agahî Berhevkirin <b>Hêma:</b> ζ</p>	<p>1. Êrîşkar (Xayin), bersivekê ji pirsaxwe re digire. (ζ1) 2. Lêpirsîna ku bi rengêkî dî an jî berevajî tê kirin, bersiveke lêhatî dixwaze. ζ2 û ζ3</p>
<p><b>VI.)</b> Êrîşkar ji bo ku qurbanên xwe an jî serweta qurbanên xwe bi dest biêxe, hewl dide ku qurbanê xwe bixapîne. <b>Pênase:</b> Xapandin <b>Hêma:</b> η</p>	<p>1. Êrîşkar dixwaze qurbanî/ê qanîh bike. (η1) 2. Êrîşkar rasterast tiştên sêhrî bi kar tîne. (η2) 3. Êrîşkar hin rêyên dî yê xapînok an jî tirsêr bi kar tîne. (η3)</p>
	<p>1. Leheng ji êrîşkar bawer dike. (θ1)</p>

<p><b>VII.)</b> Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alîkariya dijminê xwe kiriye.</p> <p><b>Pênase:</b> Tevlî Tawanê Bûn</p> <p><b>Hêma:</b> 0</p>	<p>2-3. Leheng bi hin tiştên sêhrî an tê birîndarkirin an jî dikeve xewê. An jî, leheng digel ku tu kesî, ew li razanê mecbûr nekiribe jî ji nişkê ve radizê û karê dijmin rihetir dike. <b>(02)</b> û <b>(03)</b></p>
<p><b>VIII.)</b> Êrîşkar zîrarê dide yekî ji malbatê.</p> <p><b>Pênase:</b> Xirabî</p> <p><b>Hêma:</b> A</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Êrîşkar yekî/ê direvîne. <b>(A1)</b></li> <li>2. Êrîşkar objeyeke sêhrî didize an jî direvîne. <b>(A2)</b></li> <li>3. Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zîrarê dide zevîyan. <b>(A3)</b></li> <li>4. Êrîşkar ronahiya rojê direvîne. <b>(A4)</b></li> <li>5. Êrîşkar kiryarên xwe yên dizîye an jî revandinê bi şiklekî dî dike. <b>(A5)</b></li> <li>6. Êrîşkar zîrarê dide bedena kesan. <b>(A6)</b></li> <li>7. Êrîşkar, dibe sebeb ku yek ji nişkê ve berze bibe. <b>(A7)</b></li> <li>8. Êrîşkar quranê/a xwe mecbûr dike ku tiştêkî bike an jî bi zorê tiştêk jê digire. <b>(A8)</b></li> <li>9. Êrîşkar dirahêle yekî/ê. <b>(A9)</b></li> <li>10. Êrîşkar ferman dide ku yekî/ê biavêjine behrê. <b>(A10)</b></li> <li>11. Êrîşkar li yekî/ê an jî tiştêkî sêhrê dike. (wî/wê bi sêhrê vediguherîne tiştêkî dî) <b>(A11)</b></li> <li>12. Êrîşkar yekê/î diêxe şuna yekê/î dî. <b>(A12)</b></li> <li>13. Êrîşkar ferman dide ku yek bihête kuştin. <b>(A13)</b></li> <li>14. Êrîşkar yekê/î dikuje. <b>(A14)</b></li> <li>15. Êrîşkar yekê/î di cihekî de qîlf dike an jî diavêje zîndanê. <b>(A15)</b></li> <li>16. Êrîşkar yekê/î mecbûr dike ku pê re bizewice. <b>(A16)</b></li> </ol>

	<p>17. Êrîşkar, qurbanî bi mirovxuriyê ditirsîne. (A17)</p> <p>18. Êrîşkar her şev yekî/ê diêşîne. (A18)</p> <p>19. Êrîşkar şer îlan dike. (A19)</p>
<p><b>VIII-a.)</b> Ji Malbatê Yek Tişteki Berze Dike An Ji Dixwaze Tişteki Bi Dest Bixe.</p> <p><b>Pênase:</b> Kêmasî</p> <p><b>Hêma:</b> a</p>	<p>1. Kêmasiya keçikeke nişanî, kêmasiya dostekî. (a1)</p> <p>2. Pêdivîya bi objeyeke sêhrî wekî sêv, av, hesp, şûr û hwd. (a2)</p> <p>3. Pêdivîya objeyekê ne sêhrî lê ecêb. Teyrê agir, werdeka pûrt zêr û hwd. (a3)</p> <p>4. Ji bo kuştina dêwekî, tişteki wekî hêka bi sêhr kêma e. (a4)</p> <p>5. Ji bo jiyînê, kêmasiya wasiteyên pêdivî, tiştên maqûl. (a5)</p> <p>6. Hin formên cuda. (a6)</p>
<p><b>IX.)</b> Agahiya xirabiyê an jî kêmasiyê belav dibe, bi daxwaz an jî fermanekê serî li leheng tê dayîn, leheng tê şandin an jî diçe.</p> <p><b>Pênase:</b> Qasidî, Kêliya Derbasiyê</p> <p><b>Hêma:</b> B</p>	<p>1. Hawara alîkariyê tê kirin, dûre jî leheng tê şandin. (B1)</p> <p>2. Leheng pêre tê şandin. (B2)</p> <p>3. Leheng ji mala xwe derdikeve rê. (B3)</p> <p>4. Agahiya felaketê belav dibe. (B4)</p> <p>5. Lehengê ku hatiye qewirandin, ji mala wî bo derekî dîr dihête birin. (B5)</p> <p>6. Lehengê ku hatiye mehkûm kirinê mirinê, bi dizî serbest dihête berdan. (B6)</p> <p>7. Straneke dilêş ku wê êşê tîne ziman tê stîrîn. (B7)</p>

<p><b>X.)</b> Lehengê ku lê tê gerîn qebûl dike ku bikeve nava çalakiyê an jî biryara çalakiyê dide.</p> <p><b>Pênase:</b> Destpêkirina Çalakiya Dijber</p> <p><b>Hêma:</b> C</p>	<p>Pirî caran di çîrokê de behsa vê kêliyê nayê kirin lê berîya derketinê teqeze ku biryarek hatiye girtin. Ev kêlî an jî element di çîrokên ku leheng ji bo gerekê derdikeve rê de dertê pêş me.</p>
<p><b>XI.)</b> Leheng ji mala xwe derdikeve.</p> <p><b>Pênase:</b> Çûyîn,</p> <p><b>Hêma:</b> ↑</p>	<p>Ev çûyîn ji dûrketina berê ku bi Hêmaya β'yê de derdikeve pêş me cudatir e. Çûna lêger-leheng ji çûna qurban-leheng cudatir e. Armanca çûna leheng lêgerînek e lê qurban bêyî armanca lêgerînekê xwe di nava serboriyekê de dîtiye. Di çîrokan de du cure derketin hene. Yek, ya lehengî ye dî, ya qurbanî ye. Vegotin û honak bi piranî li ser lehengî teşekul dike. Lê carîna dibe ku keçikeke ciwan ji malê derkeve û kes lê negere. Hingê vegotin li ser serboriyên keçikê teşekul dike. Lewma lehengê lêger hebe an nebe jî ev îşaret heye.</p>
<p><b>XII.)</b> Leheng, di imtîhan, lêpirsîn an jî êrişek ku dê rê veke ku ew ê objeyeke sêhrî an jî alîkarek bi dest bixe de, derbas dibe.</p> <p><b>Pênase:</b> Fonksiyona Pêşin ya Bexşger</p> <p><b>Hêma:</b> D</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Bexşgêr, lehengî imtîhan dike. <b>(D1)</b></li> <li>2. Bexşgêr silav dide lehengî û pirsan jê dike. <b>(D2)</b></li> <li>3. Kesekî/ê ku li ber mirinê ye an jî yê mirî, ji leheng dixwaze ku ew alîkariya wî bike. <b>(D3)</b></li> <li>4. Girtiyek/Dîlek, ji leheng dixwaze ku wî xilas bike. <b>(D4)</b></li> <li>4a. Heman rewş li piştî hatina girtina bexşgêr derdikeve pêş me. <b>(D4)</b></li> <li>5. Serî li leheng tê dayîn û jê eman tê xwestin. <b>(D5)</b></li> </ol>

	<p>6. Du kesên ku gengeşe dikin ji leheng dixwazin ku ew xenîmetê li wan parve bike. <b>(D6)</b></p> <p>7. Daxwazên dî. <b>(D7)</b></p> <p>8. Mexlûqatekî/Aferîdeyekî dijmin, hewl dide ku leheng bikuje. <b>(D8)</b></p> <p>9. Mexlûqatekî/Aferîdeyekî dijmin, bi leheng re şer dike. <b>(D9)</b></p> <p>10. Objeyeke sêhrî, nîşanî leheng tê dayin û pêşniyaza taqasê/bihevguherînê tê kirin. <b>(D10)</b></p>
<p><b>XIII.)</b> Leheng, reaksiyonê dide çalakiyên mirovê ku dê di pêş de bexşê bibexşîne wî.</p> <p><b>Pênase:</b> Reaksiyona Lehengî</p> <p><b>Hêma:</b> E</p>	<p>1. Leheng, di imtîhanê de bi ser dikeve/bi ser nakeve. <b>(E1)</b></p> <p>2. Leheng, silava bexşgêr digire/nagire. <b>(E2)</b></p> <p>3. Leheng, daxwaza kesekê ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne/pêk naîne. <b>(E3)</b></p> <p>4. Leheng, girtî serbest berdide. <b>(E4)</b></p> <p>5. Leheng, heywanê ku jê alîkarî dixwaze xilas dike. <b>(E5)</b></p> <p>6. Leheng, parvekirina ku li ser gengeşe heye dike û yên ku gengeşê dikin dût dixê. <b>(E6)</b></p> <p>7. Leheng, hin xizmetên/alîkariyên dî dike. <b>(E7)</b></p> <p>8. Leheng, bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrîşa xilas dibe. <b>(E8)</b></p> <p>9. Leheng, aferîdeyê/a dijmin têk dibe/têk nabe. <b>(E9)</b></p> <p>10. Leheng, bihevguherînê qebûl dike lê li hember bexşgêr hêza sêhrî ya objeyê bi kar tîne. <b>(E10)</b></p>

<p><b>XIV.)</b> Objeya sêhrî ji leheng re tê dayîn.  <b>Pênase:</b> Girtina Objeya Sêhrî  <b>Hêma:</b> F</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Objê rasterast tê dayin. <b>(F1)</b></li> <li>2. Objê, li wî cihê ye, yê ku ji leheng re tê gotin. <b>(F2)</b></li> <li>3. Objê tê çêkirin. <b>(F3)</b></li> <li>4. Objê tê kirîn û firotin. <b>(F4)</b></li> <li>5. Objê bi rasthatinê dikeve destê leheng. (leheng wê dibîne) <b>(F5)</b></li> <li>6. Objê xwe bi xwe yekcar peyda dibe. <b>(F6)</b></li> <li>7. Objê tê vexwarin an jî xwarin. <b>(F7)</b></li> <li>8. Objê tê dizîn. <b>(F8)</b></li> <li>9. Curbecur kes bi dilê xwe dikevin xizmeta leheng. <b>(F9)</b></li> </ol>
<p><b>XV.)</b> Leheng bi cihê ku obje li wê derê ye ve tê birin, jî bo wî rêberî tê kirin an jî tê birin.  <b>Pênase:</b> Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti  <b>Hêma:</b> G</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng li ezman difire. <b>(G1)</b></li> <li>2. Leheng li ser erdê an jî li ser avê rêwîti dike. <b>(G2)</b></li> <li>3. Ji leheng re rêbertî tê kirin. <b>(G3)</b></li> <li>4. Ji leheng re rê tê nîşandan. <b>(G4)</b></li> <li>5. Leheng navgînên sabît yên veguhastinê bi kar tîne. <b>(G5)</b></li> <li>6. Rêçên îşaretkirî rê nîşan didin. (xwîn, şop, ta û hwd.) <b>(G6)</b></li> </ol>
<p><b>XVI.)</b> Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev.  <b>Pênase:</b> Pevçûn/Şer  <b>Hêma:</b> H</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng û êrîşkar li meydanekê şer dikin. <b>(H1)</b></li> <li>2. Leheng û êrîşkar dikevin pêşbaziye. <b>(H2)</b></li> <li>3. Leheng û êrîşkar bi lîstika kaxizan dilîzin. <b>(H3)</b></li> </ol>
<p><b>XVII.)</b> Nîşaneke taybet li leheng peyda dibe.</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Di bedena leheng de nîşanek peyda dibe. <b>(I1)</b></li> </ol>

<p><b>Pênase:</b> Nişana Taybet <b>Hêma:</b> I</p>	<p>2. Leheng gustîlk an jî destmalek dibîne/bi dest dixê. <b>(I2)</b> 3. Curbecur nişanên dî. <b>(I3)</b></p>
<p><b>XVIII.) Êrîşkar têk diçe.</b> <b>Pênase:</b> Serkeftin <b>Hêma:</b> J</p>	<p>1. Êrîşkar li meydana şer têk diçe. <b>(J1)</b> 2. Êrîşkar di pêşbaziye de têk diçe. <b>(J2)</b> 3. Êrîşkar di lîstika qumarê de têk diçe. <b>(J3)</b> 4. Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk diçe. <b>(J4)</b> 5. Êrîşkar bêy ku tu pevçûn biqewime tê kuştin. <b>(J5)</b> 6. Êrîşkar rasterast tê qewirandin. <b>(J6)</b></p>
<p><b>XIX.) Xerabiya di destpêkê de tê telafikirin an jî kêmasî tê pêşwazîkirin.</b> <b>Pênase:</b> Pêşwazîkirin <b>Hêma:</b> K</p>	<p>1. Objeya ku lê tê gerîn, bi zore an jî bi hileyê/qurnaziye tê revandin. <b>(K1)</b> 2. Objeya ku lê tê gerîn, bi xiz ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan. <b>(K2)</b> 3. Objeya ku lê tê gerîn, bi saya cazîbeyê tê bidestxistin. <b>(K3)</b> 4. Bi destxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast encameke çalakiyên berê ye. <b>(K4)</b> 5. Objeya ku lê tê gerîn, bi navgîniya objeyeke sêhrî hemen tê bidestxistin. <b>(K5)</b> 6. Bikaranîna objeya sêhrî, feqîriyê-hejariyê diqedîne/dawiya feqîriyê-hejariyê tîne. <b>(K6)</b> 7. Objeya ku lê tê gerîn, di dema nêçîrekê de tê bidestxistin. <b>(K7)</b> 8. Kesê ku sêhr lê hatiye kirin vedigere şexsiyeta/nasnameya xwe ya berê. <b>(K8)</b> 9. Mirî zindî dibe. <b>(K9)</b> 10. Êsîr/Dîl tê xilaskirin. <b>(K10)</b></p>

	<p>11. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn, bi heman rengê bidestxistina objeya sêhrî ye. <b>(K11)</b></p>
<p><b>XX.)</b> Leheng vedigere  <b>Pênase:</b> Veger  <b>Hêma:</b> ↓</p>	<p>Veger û gihastin bi piranî bi heman rengî ne. Digel vê jî, pêdivî bi dirûveke taybet ya vegeerê nîne. Di gihastinê de curbicur navgîn û serborî hene lê vegeer hemen pêk tê. Lê bi heman rengê gihastinê ye. ↓</p>
<p><b>XXI.)</b> Leheng Tê Şopandin.  <b>Pênase:</b> Şopandin  <b>Hêma:</b> Pr</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Şopîner, li pey leheng difire. <b>(Pr1)</b></li> <li>2. Şopîner, daxwaza sûçdar dike. <b>(Pr2)</b></li> <li>3. Şopîner dema ku dişopîne li dû hev dikeve rengê çend heywan an jî tiştekî dî. <b>(Pr3)</b></li> <li>4. Şopîner dikeve rengê objeyeke bi cezb û dertê rêya leheng. <b>(Pr4)</b></li> <li>5. Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe. <b>(Pr5)</b></li> <li>6. Şopîner hewl dide ku leheng bikuje. <b>(Pr6)</b></li> <li>7. Şopîner hewl dide, dara ku leheng xwe tê de veşartîye, bi diranên xwe perçe bike/jêbike. <b>(Pr7)</b></li> </ol>
<p><b>XXII.)</b> Bi hawara leheng de tê çûyîn  <b>Pênase:</b> Alîkarî  <b>Hêma:</b> Rs</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng, ber bi ezman ve tê birin. <b>(Rs1)</b></li> <li>2. Leheng, astengan dertîne ser rêya şopînerê xwe û direve. <b>(Rs2)</b></li> <li>3. Leheng dema ku direve xwe dixwe rengê hin objeyan ku wî vedişêrin. <b>(Rs3)</b></li> <li>4. Leheng dema ku direve xwe vedişêre. <b>(Rs4)</b></li> </ol>

	<p>5. Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre. <b>(Rs5)</b></p> <p>6. Leheng, dema ku direve dikeve rengê heywanekî, kevirekî û hwd. û xilas dibe. <b>(Rs6)</b></p> <p>7. Leheng li hember ejderhaya mê ku dikeve curbecur rengan û dixwaze wî bixapîne, li ber xwe dide. <b>(Rs7)</b></p> <p>8. Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin. <b>(Rs8)</b></p> <p>9. Di kêliya ku dê leheng bê kuştin de, bi hawara wî ve tê gihastin. <b>(Rs9)</b></p> <p>10. Leheng, heldipeke dareke dî: <b>(Rs10)</b></p>
<p><b>VIII</b> Tê Dubarekirin  <b>X-XI</b> Tê Dubarekirin  <b>XII</b> Tê Dubarekirin  <b>XIII</b> Tê Dubarekirin  <b>XIV</b> Tê Dubarekirin  <b>XV</b> Tê Dubarekirin</p>	<p>Xerabî tê dubarekirin.</p> <p>Leheng dîsa derdikeve rê, lêgerîneke nû dest pê dike.</p> <p>Rêzebûyerên ku di serencama bidestxistina objeya sêhrî de derdikevin dîsa tên jîyîn.</p> <p>Leheng helwest nîşanî kesê ku dê di pêş de tiştêkê lê bibexşîne wî, dide.</p> <p>Objeyeke nû ya sêhrî bo leheng tê dayîn. Leheng bo cihê ku objeya ku lê digere tê veguhastin/gihandin an jî tê birin.</p>
<p><b>XXIII.)</b> Leheng xwe vedişêre/kîbûna xwe vedişêre û vedigêre mala xwe an jî welatek dî.</p> <p><b>Pênase:</b> Vegarîna bi rengê veşartina kîbûna xwe</p> <p><b>Hêma: O</b></p>	<p>Li vê derê du kategorî derdikevin.</p> <ol style="list-style-type: none"> <li>1. Vegera leheng ya mala xwe. Leheng diçe cem zenatkarek û li cem wî dixebite.</li> <li>2. Leheng diçe cem qiral wekî seyis an jî aşpêj dixebite. Carina jî bi tenê vegera li welat heye.</li> </ol>

<p><b>XXIV.)</b> Lehengekî sextekar bi îdîayên bê bingeh derdikeve.  <b>Pênase:</b> Îdîayên Bêbingeh  <b>Hêma:</b> L</p>	<p>Leheng ku vegere welatê xwe ev îdîa ji alî birayên wî ve tîn pêşxistin. Leheng ku vegere welatek dî, ev îdîa ji alî wezîr, general û hwd. dî ve tîn pêşxistin. Birayên leheng îdîa dikin ku wan objeya sêhrî aniye û wezîr an jî generalê welatê biyan îdîa dike ku wî ejderha tîk biriye.</p>
<p><b>XXV.)</b> Karekî dijwar li leheng tî pêşniyazkirin.  <b>Pênase:</b> Karê Dijwar  <b>Hêma:</b> M</p>	<p>Yek ji girîngtirîn hêmana çîrokê di vir de ye. Ev karên dijwar ji yên ku di xaçerêyên berê de dertên dibe ku cudatir bin. Ev curbicur in. Wekî, îmtîhana xwarin û vexwarinê, îmtîhana agir, îmtîhana mamikan, îmtîhana hîlbijartinê, îmtîhana nehatina dîtinê, îmtîhanên hêzê, hostetî, sebir û cesaretê, maçkirina prensesê, anîna tiştê an jî çêkirina tiştê.</p>
<p><b>XXVI.)</b> Karê dijwar tî bicihanîn  <b>Pênase:</b> Bicihanîna Karê Dijwar  <b>Hêma:</b> N</p>	<p>Rengê bicihanîna van karên zor wekî îmtîhanê pêk tî. Ev kar bi piranî, beriya ku bî dayin ji alî leheng ve hatine kirin an jî dîtin. Mînak, leheng dizane ku kîjan nîşanên taybet li ser prensesê hene. Rewşên ku divêtiya bicihanîna wan ji pêş de hatine hînkirin bi îşareta <b>(0N)</b> tî nîşandan.</p>
<p><b>XXVII.)</b> Leheng tî naskirin  <b>Pênase:</b> Naskirin  <b>Hêma:</b> Q</p>	<p>Leheng bi rêya nîşaneke taybet, birîn an jî objeyeke ku jê re hatiye dayin tî naskirin. Leheng di heman demê de ji ber ku karekî zor bi ser xistiye jî tî naskirin. Li dû dîrketinek dirêj jî tî naskirin.</p>

<p><b>XXVIII.)</b> Kîbûna êrîşkar, lehengê sexte an jî yê xerab dertê meydanê.</p> <p><b>Pênase:</b> Derxistina Meydanê</p> <p><b>Hêma:</b> Ex</p>	<p>Derketina vê fonksiyonê bi piranî girêdayî ya berê ye. Carina li dû têkçûna di karê ku hatiye pêşniyazkirin de rewş derdikeve meydanê. Pîrî caran wekî vegotinek jî pêk tê ev fonksiyon. Yan rastîya bûyeran wekî çîrokek tê gotin ku êrîşkar/lehengê sextekar jî lê guhdar dike an jî carina bi rêya strîna stranekê kîbûna rast ya êrîşkar tê vegotin.</p>
<p><b>XXIX.)</b> Leheng dikeve renekê nû</p> <p><b>Pênase:</b> Veguherîna Dirûvî</p> <p><b>Hêma:</b> T</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng bi tevgereke sêhrî ya alîkarê xwe reng/dirûv diguhêre. <b>(T1)</b></li> <li>2. Leheng koşekeke pîr xweşik çêdike. <b>(T2)</b> Di vir de guherîna dirûvî nîne lê statuya wî diguhêre.</li> <li>3. Leheng kincên nû li xwe dike. <b>(T3)</b></li> <li>4. Hin dirûvên mantiqî û pêkenî. <b>(T4)</b></li> </ol>
<p><b>XXX.)</b> Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê cezakirin.</p> <p><b>Pênase:</b> Cezakirin</p> <p><b>Hêma:</b> U</p>	<p>Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê kuştin, tê dûrxistin, bi dûva hespê ve tê girêdan an jî ew bixwe xwe dikuje û hwd. Carina jî efûyek esîlane bo wî tê derxistin. Bi piranî êrîşkar û lehengê sextekar yê ku di beşa duyem de dertê tê cezakirin.</p>
<p><b>XXXI.)</b> Leheng dizewice û dertê ser text.</p> <p><b>Pênase:</b> Zewicîn</p> <p><b>Hêma:</b> W</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng, jinê û welat bi hev re bi dest dixê an jî pêşî nivê qiraletiyê bi dest dixê û piştî mirina dê û bav hemî qiraletiyê bi dest dixê. <b>(W<sup>0</sup>)</b></li> </ol>

	<p>2. Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîne, di vê rewşê de nabe qral. <b>(W<sup>0</sup>)</b></p> <p>3. Carina jî berevajî vê bi tenê dertê ser text. <b>(W<sub>0</sub>)</b></p> <p>4. Eger çîrok, di kêliya berî zewicînê de bi xerabiyêke nû bê birîn, bi nîşanîbûna beşa yekem û sozeke derbarê zewicînê de, bi dawî dibe. <b>(W<sub>1</sub>)</b></p> <p>5. Rewşa dijber, jina lehengê zewicandî hunda dibe, di encama lêgerînê de jin tê dîtîn û zewac tê nûkirin. <b>(W<sub>2</sub>)</b></p> <p>6. Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî renekî dî tê xelatkirin. <b>(W<sub>3</sub>)</b></p>
--	--

Me fonksiyonên ku Propp diyar kirine bi tabloya jor nîşan da. (Hikmet, 2016: 75-86)

Bin fonksiyonên ku Propp diyar kirine bi hejmaran ve ji hev hatine veqetîn. Heta niha xebatên ku me dîtine de, em rastî sê cure nîşandanan hatine. Ev bi mînakê fonksiyona ‘xirabiyê’ ve bi vî awayîne: A<sub>1</sub>, A<sub>2</sub>, A<sub>3</sub>, (Hikmet, 2016: 75-86) A<sup>1</sup>, A<sup>2</sup>, A<sup>3</sup> (Propp, 2020: 140-147) û A<sub>1</sub>, A<sub>2</sub>, A<sub>3</sub> (Keskin, 2019: 333-343). Me di vê xebata xwe de bikaranîna wek A<sup>1</sup>, A<sup>2</sup>, A<sup>3</sup> yê hilbijart.

Gava ku çîrok tene tehlîlîkirin pêşiyê rêzebûyerên ku çîrokan pêk tînin tene diyarkirin. Li gor Propp çîrokê de her xirabiyê nû, zirar, kêmasiya ku derdikeve pêş me dibe sebaba pêkhatina rêzebûyerên nû. Ji ber vê yekê çîrok ji rêzebûyeran pêk tê (Duran, 2019: 19). Ji ber vê em ê him rêzebûyeran diyar bikin him jî kîjan fonksiyon di kîjan rêzebûyerê de hatiye dîtîn em ê bidin nîşandan.

Piştî van agahiyên derbarê morfolojiya çîrokan ya Propp û danasîna fonksiyonên wî niha êdî em dikarin berê xwe bidin çîrokên ku me ji herêma Curnê Reş berhev kirine.

## BEŞA DUYEM

### ANALÎZA ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA CURNÊ REŞ LI GORÎ RÊBAZA VLADÎMÎR PROPP

#### 2.1. ANALÎZA ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA CURNÊ REŞ LI GORÎ RÊBAZA VLADÎMÎR PROPP

##### 2.1.1. Analîza Çîroka Bi Navê Sêwîyê Ap û Amojina

###### Rêzebûyer – I

1. Du sêwîyê ap û amojina hewûn. (**Pênase: rewşa destpêkê, Hêma:  $\alpha$** )
2. Bav û diya wan tunewû. (**Pênase: Dûrketin, Hêma:  $\beta^2$** )
3. Diya xwa tew li wana hez nedikir. Digo: “Van çine serê me bûne bela ne em ê van çito bikim.” (**Hêmana Peywendiyê-Ş**)
4. A rawû naxira dewêr girtin. Go: “Ez ê vana bişînime ber naxirê.” Go: “Ku dilê min li van hûnik bibe.” A rawû Fatmegul û Elî va şande ber naxirê, çolê. Ro bi ro pîvazeke serê bi wan re dikêye, a hinek nan manê kurs murs dikêye, nanê ku haşa merî didê heywên meywên. (**Pênase: Xirabî, Hêma:  $A^9$** )
5. Elî û Fatmê ve rokê çûn ber dewêr giriyan. (**Pênase: Çûyîn, Hêma:  $\uparrow$** )
6. Mangeka diya wan heye teva naxirê ye. Mangeka diya wan tenê heye. (**Hêmana peywendiyê-Ş**)
7. Mangê dî ku digrîne. Rebbilalemîn kir. Ziman kete devê mangê hat. Go: “Elî Fatme hûn bû çî digrîne.” (**Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma:  $D^2$** )
8. Go: “Em ê birçîne.” Go: “Helê şîva me pîvaz e nan e kursê kepegê ne.” Go: “Ap û amojinê me ne.” Go: “Li me tedê dikan.” Go: “Apê me bi amojina me nikane filan.” (**Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma:  $E^2$** )
9. Rawûn çûne hinda manga diya xwe, “Bisimîlla” gotin û qoçê rastê rakirin. Sêwine qey Rebbilalemîn yardim kiriye. “Bismilla” gotin, bavooo li pêş wan çî û çî bû. Her tişt hate pêş çavê wan. Her tişt wan re çewû. Têr kirin, xwarin. (**Pênase: Girtina Objeya Sêhrî Hêma:  $F^9$** )
10. Her tişt hate pêş çavê wan. Her tişt wan re çewû. Têr kirin, xwarin. (**Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma:  $K^6$** )

11. Navê keçika wê jî Eş e navê lêwik jî Hem e. Go: “Hemo, Eşê hele pê re herin yek.” Go: “Hele vana çi dikine çi dixune.” Go: “E tiştêkî nadime.” Go: “Vana ro bi ro rind diwune, çeleng diwune.” Rawû lawik pê re şand. **(Pênase: Şopandin, Hêma: Pr<sup>8</sup>)**
12. Go êvarê diya xwa bervê çû. Go: “Anê hal mal e. Go: “Qoçê diya Fatmê, manga diya Fatmê da, go hanî hanî go vana safî goşt dixuna ku çi tişt dinê da heye, go wa yê têdê go dixune.” **(Pênase: Agahî Berhevkirin, Hêma: Ç<sup>3</sup>)**
13. Êvar bû. Çûne mal. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓**

### **Rezebûyer - II**

14. Rawû mêrik ra got: “Tu zanî?” Go: “Dilê min pir goşt dixaziye” Go: Tu îllam vê mangê serjê kî.” **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)**
15. Rawû mêrik ra got: “Tu zanî?” Go: “Dilê min pir goşt dixaziye” Go: Tu îllam vê mangê serjê kî.” Mêrik go: “Em xwa bi wê mangê xwadî dikine filan.” Dehe riya nan nexwar xwa kire cîya. Rabû tişt mişt, teneke kirine bin ewa xwe. Bin doşega xwa. Êvarê xwe ser da avite erdê. Go: “Ay ay ay go parsuyê min gî şikiyan.” Go: “E dikê bimirim.” Dehe riya cîya ranewû. Mêrik go: “Niha tu dewa çi dikiye, tu bû çiyê nexweşî?” Go: “Va ew a te çiyê?” Go: “Ku tu manga diya Fatmê min ra serjê kî ez ê rihet bim.” Go: “Ku tu serjê nekî jî go ez kê wir hanî bim.” Mêrik rawû go: “Em ê mangê serjê kin.” **(Pênase: Tevlî Tawanê Bûn, Hêma: θ<sup>1</sup>)**
16. Mêrik rawû go: “Em ê mangê serjê kin.” Va keçika û lawik va bîst giriyan. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup>)**
17. Go: “Tu zanî bira min serjê kin.” Go: “Ez ê goştê xwe bi wan tehl bikim bi zihêr kim.” Go: Ez ê we jî şîrin bikim.” Go: “Hûn ê wan hestiyê min di ber axurê min da erdê kin.” Go: “Ku hûn kîçax royê li we teng hat go hûn ê herin bigrin.” Go: “Bê we jî kesî ra na.” Go: Ê gir bin ê çûk bin go kî li xwe ke kesî ra nawe go ê li we ra bibin. Gî zêr in. Gî kincê wan zêr in.” **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî Hêma: F<sup>2</sup>)**

### **Rêzebûyer – III**

18. Va niva telessiya xwe nakiye li wan tew hez nakiye. Ro bi ro diwê tu yê kîlok herî birisî Elî jî ê birise. Berê nedida Elî îja da Elî jî. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>8</sup>)**
19. Go vana çûne pêşiya dewêr. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**
20. Va keçika hiri çû talazê bir û keçik wir li şopê çû. Çû ku hiri ketiye devê şikeftêkê. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

21. Hiriyê derdixê ku dengê şikeftê da tê. Dere bavoo ku pîreke (caduyê) hêvir distirêye nêmin û xwun di pêsirê da tê ye, yeka serqot e merî lê dibizdiye. Go: “Were were Fatma min tu ku ra hatî, were serê mim tiji sipî bûye.” Go: “Were hewkî van sipîyana bikuje.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>1</sup>)**
22. Fatmê çû serê wê da ser xwe. Made xwa li hev neket. Sipîyê wê kuştin kuştin kuştin. **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>1</sup>)**
23. Go: “Here qîza min.” Go: “Tu jî Elî jî” (navê wan berê zaniye.) Go: “Here.” Go: “Avekê were pêşiya we. Go: “Dest û çavê xwa pak tê da bişon, kaniyakê were pêşiya we. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî Hêma: F<sup>2</sup>)**
24. Go: “Xwayingê go me dest û çavê xwa vê da şuştin. Go: “Serçavê me mina lokisa bûne.” Pir çeleng bûn, lewend bûn. Ber çavê meriya mina hîvekî bûn. **(Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>1</sup>)**
25. Vana êvarê derin. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**
26. Eşê tu jî siweda herî.” Eş jî pir ê pîs e. Go: “Tu jî herî go hela ka vana çi kiriye?” Eş siwe da pê re çû. **(Pênase: Karê Dijwar, Hêma: M)**
27. Go: “Eşê çi li te qewimî?” Go: “Pîrê çi wan ra go min ra jî go.” Ê go: “Çima tu ha bûy ew ha bûn?” Ê go: “Anê min sipiyên pîrê nekuştin lema.” **(Pênase: Bicihanina Karê Dijwar, Hêma: N)**

#### Rezebûyer IV

28. Lawê padîşêh kê bizewice. Bana mîna ku Cemalkoyê gund mindan, bana derdorê gî kir. Banê kirin îşte go lawê padîşêh kê bizewice, delal bang kirin dan, bira her kes were dawetê. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
29. Leganek danî wê derê go: “Heta çûme Elî, Fatme go hûn ê vê leganê tiji hêsir kin.” Go: “Hûn ê xênî da jî dernên.” **(Pênase: Karê Dijwar, Hêma: M)**
30. Dikek hewû. Dîk go: “Elî, Fatme hûn bû çi digrîne.” Diwê: “Hûn bû çi digrîne.” Diwê: “Welle... Diwê: “Îşte hal mal ap û amojinê me ha kirin.” Dê: “Herin hinek avê xwe têkine ew ê destek xweyê xwe têkin. Surafkê bîna ava çava bûwe.” Go: “Zû herin kincê xwa li xwe kin.” **(Pênase: Bicihanina Karê Dijwar, Hêma: N)**
31. Vana çûn ber axurê mangê kolan. Bavoo, ku her qatek kinc dibiriqîne gî zêr in. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî Hêma: F<sup>5</sup>)**
32. Ku hûn wana negihîştinê vana berî wan çûn û ketine govendê. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**

33. Heta ku wana di wirda doş bûn çûn wana jî rast hatine mal. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

34. Ku bi rêva hatin ecele hatin qondera Fatmê dikeve kaniyê. **(Pênase: Nîşaneyêke Taybet li Leheng Peyda dibe, Hêma: I<sup>2</sup>)**

#### **Rêzebûyer V**

35. Lawê padişêh jî dereser kaniyê ku hespa xwe avde. Dinire ku hesp li şewqekê avê venaxiye. Lê dinêre ku qundereka zêrînî ye. Tev e hev dalxe didiye. Dilê xwe dikeve wê konderê hîn ne xadiyê qonderê. Diwê ez ê vê qonderê bigerînim ku va nigê kê ra bibe. Dawet maweta xwa îptal kir. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

36. Ku çito Fatme dertê a dê va ya wê şevê ye. Kincê pîs jî ê lê ne. Ku çito qunderê dike nigê xwe bîna qapaxê tam nigara diwe. **(Pênase: Leheng Tê Naskirin, Hêma: Q)**

37. Lawê padişêh hîn daweteke nihû li hev dixê, şeş roya şeş şeva dawetê dike. **(Pênase: Leheng Dizewice û Dertê Ser Text, Hêma: W<sup>0</sup>)**

38. Kincê Fatmê li Eşê kirine. Wa gošta biriye. Şidikek daye ber e. A Fatme jî kiriye rojinê, perdek jî ser da berdaye, devê wê jî girê daye. Devê wê girê daye. Sorikê ser çava dê. **(Pênase: Leheng Dikeve Rengekî Nû, Hêma: T<sup>3</sup>)**

39. Dîk dê:

“Qîqîrîk qîqînde

Fatma rindik tendûr de

Eşika pîsik xemil de”

Derin sorikê ser çava radikin ku ûûûû Eşik e. Şidikek daye ber sêrî ye, e wa gošta gî biriye. Serçavê reş in. **(Pênase: Derxistina Meydanê, Hêma: Ex)**

40. A îşte Eşikê îptal dikin û lawê padişêh tê Fatmê li hespê dike û dere. **(Pênase: Leheng Dizewice û Dertê Ser Text, Hêma: W<sup>1</sup>)**

#### **Rêzebûyer V**

41. Wir rihetiyê nadê. Dere dê îşê xwe berê çêdike ber sêhirciya. Dere şehêkî li zihêrê çêdike. **(Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>3</sup>)**

42. Dê Fatme min hîn ku e hatime ez serê te bişom, piştta te mistim. Radibê serê Fatmê dişo wê şehê mera di paş istiyê Fatmê re dike. **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>2</sup>)**

43. Fatme li hêla di va diquliwe. **(Mirina Leheng)**

44. Lawê padîşêh amaaan hawaaar, ley va çi bû, çi newû. (Pênase: Qasidî, Kêlfya Derbasiyê, Hêma: B<sup>4</sup>)

45. Wa çentê xwa radike û tê malê. (Pênase: Veger, Hêma: ↓)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Sêwiyê Ap û Amojina’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, \beta^2, \xi, A^9, \uparrow, \xi, D^2, E^2, F^9, K^6, Pr^8, \zeta^3, \downarrow$

II.  $\eta^3, \theta^1, A^{14}, F^2$

III.  $A^8, \uparrow, \xi, D^1, E^1, F^2, I^1, \downarrow, M, N$

IV.  $\xi, M, N, F^5, \uparrow, \downarrow, I^2$

V.  $\xi, Q, W^0, T^3, Ex, W^1$

VI.  $F^3, \eta^2, B^4, \downarrow$

Di vê çîrokê de şeş rêzebûyer derdikevin pêş me. Di çîroka ‘Sêwiyê Ap û Amojina’de rêzebûyer li pey hev tèn. Her şeş bûyer jî di nav xwe de xirabiyekê nîşan dide. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav “çîrokên ku di nav de cotê M-N heye” yê.

Di çîrokê de *leheng* Fatme ye. Hemû bûyer li derdora Fatmê derbas dibin û xirabiyên piraî ji bo wê tèn kirin. Di her şeş rêzebûyaran de wek *êrişkar*, amojin derdikeve pêş me. Amojin jî sêwiyên hez nake û naxwaze ew cem wan bijîn. Lewma tiştêk xirab li herdu biraziyên mêrê xwe dike. Di vê çîrokê de di rêzebûyera yekem û duyem de *bexşgêr*, çêlek (mange) e. Rêzebûyera sêyem de *bexşger*, pîrejin e. Di çîroka me de *alîkar*, di rêzebûyera pêncemîn de wek dîk derdikeve pêş me. Dîk alîkariyê dide Fatmê û wê ji xirabiya amojina wê difilitîne. Di vê çîrokê de *lehengê derewîn* Eş e. Eş dikeve cihê Fatmê û dixwaze bi lawê padîşêh re bizewice. Dixwaze kesên derdora xwe bixapîne. Dîsa ji bo vê xirabiyê jî diya wê alî dide wê. Di vê çîrokê de *şandiyar* (*hinêryar*) û prenses cih nagire. Ji ber vê yekê ev çîrok di nav pênc kesan de belav dibe. Ev çîrok bi mirina *leheng* xilas dibe. Ev fonsiyona dawî li rêbaza Propp nayê.

Di fonksiyona XXIan de *leheng* tê şopandin. (Pr) bin fonksiyonên Pr<sup>1</sup>, Pr<sup>2</sup>, Pr<sup>3</sup>, Pr<sup>4</sup>, Pr<sup>5</sup>, Pr<sup>6</sup>, Pr<sup>7</sup> hene lê ev hemû jî li çîroka me nayên. Me li vê derê bin fonksiyona Pr<sup>8</sup> ‘ji aliyê kesekî ve şopandin’ lê zêde kirîye.

Fonksiyonên di çîrokê de li gor rêza diyarkirî ya sefinandina Propp nînin. Mînak fonksiyona (I) yê piştî fonksiyona (M) yê hatiye. Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: A, ↑, D, E, F, K, Pr, ↓, I, M, N, Q, W, T, Ex, B

## 2.1.2. Analîza Çîroka Bi Navê Padîşêh û Lele

### (Çîroka Yekem) Rêzebûyer – I

1. Go kalek hewû. Keçik li ber ferêt rûniştiye. (**Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α**)
2. Dî ku kalekî gencek pî kir û bir wê hêla ferêt. Dû re li wê hêla ferêt jî li pî kir û hanî vê hêlê. (**Hêmana Peywendiyê-Ş**)
3. Hat go: “Gênco.” Go: “Çiye?” Go: “Hele were hinda min.” Go: “Çi ye?” Go: “Çima tu li vî kalê siwar bû, çima kalê te pî kir bir wê hêla ferêt cardin jî hanî vê hêlê?” (**Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>3</sup>**)
4. Go: “Welle me şert da girt.” Go: “Mî go rawe çend derewan min ra bike e te pî kim, ku tu derewan nekî e bikim tu min pîke.” Go: “Welle me şert da girt.” (**Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>**)
5. Ê go bana kalê kir. Go: “Qe tişteke nate serê te tu çima werî vî gencî li pî kî werî salê şeşte hefte ye.” (**Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>1</sup>**)
6. Go: “Welle mi ne tişteke dî, min ne li dinê fem kir.” A go: “Siwe bû, êvar bû e dêm ka îro ye.” (**Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>**)
7. Keçikê got: “Were got e te re çîrokekê bêm.” (**mtv.**)

### (Çîroka Duyem) Rêzebûyer – I

8. Go: “Bavê min padîşah bû.” Go: “Yek padîşeh bû yek jî lele bû.” Go: “Ez yeka tenê bûm.” (**Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α**)
9. Go: “Xwanyîng, birê min tew tunewûn. Go: “Bav û diyê min gotiye zariyekî Lele bûye ê çûkîk em ê te re bînin. Lawik e, em ê te re bînin xwa ra pê bilîze em ê êvarê jî bûwin bi wan din.” (**Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>**)
10. Min zeweş lêwik ra parçê kir, e pê dilîzime. Go: “Tişteke nêye bîra min e. Kêra, kelem têraşî min orta zêweş da danî.” Go: “Ku lêwik çûye kêre listiye. Ez û lêwik derdê hevda ketine. Go: “Kêr çûye qiriqa lêwik e lawik fetisî.” (**Hêmana Peywendiyê-Ş**)
11. Go: “Min ew lawika kire çuvalêkî, go min bir dolawa xwa. Diya min jî nika here wê odê, bavê min jî nika.” Go: “Min bi şev destê wi jêkir çekire ser qonaxê.” Go: “Teyr û tûra xwar. Mala xwa qe ê ber feratekî ye.” Go: “Min royê tişteke lêwik jêkir çekîr, ku bixwe. Lawik wenda bû.” (**Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>7</sup>**)

12. Go: “Nigekî lêwik li hinda min ma.” Go: “Riya dawiyê, min çekire ser qonaxê ku çi heywan çuyêkê niva elimî wira. Go: “Di deve wî heywanî da kete xwarê. “Go: “Bekçiyê me pêgirt. Va niga li ku hat?” Go: “Delal bang kir. Go: “Qiyamet bû. Va niga li ku hat li ku nat em ê bân.” **Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>4</sup>**)

13. Go: “Min çû bekçiya ra got hûn niha çi dixwazine? E vê ew ê vedişêrime va olayîyek hatiye serê min e. **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>1</sup>)**

14. Hûn çi bân ez ê mîna we bikim.” Diwê: “Em çi diwêne.” Diwê: “Em çel bekçî bavê te ne, em yek jî bavê neyê razî ne. Ti li me giya ra bûyî yek em gî werine hinda te em vê olayê veşêrin.” **(Pênase: Qedexekirin, Hêma: γ<sup>2</sup>)**

15. Go: “Min hêrameka reş li xwa werda kalo. Kê siweda gî werin, çel bekçiyê bavê min e kê werin e kê gî ra ya rakevim. Go: “Min hêrameka reş li xwa werda, e daketime bajêr.” Go: “Min rawû satoreka xwa kirî ya ku pê goşt hûr dikin.” Go: “Min bire ser çerxa tûj kir û min îçkîna pir kirî, min sîrka pir kirî. Go: “E hatime mal. Kesek min nas nakiye.” **(Pênase: Veguherîna Dirûvî, Hêma: T<sup>3</sup>)**

16. Go: “Ku kîjan kete xêni go em te re bi yek bin, araî vexwarin, tem di min nedan, a min serê wan jêkir û çekire zîndanê. Min serê wan jêkir û çekir zîndanê.” Go: “Min çel meri teva lêwik çek û yek meri, mi gî çekirine zîndanê.” Go: “Min şeş miha jî ro bi ro jî qanadekî wan didime heywêne. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>18</sup>)**

#### **(Çîroka Duyem) Rêzebûyer – II**

17. Go: “Pir çû hindik çû, ez qert bûm. Salê min bûne bîst û heft bîst heyşt. **(mtv.)**

18. Yekî ra raketiye. Go: “Kalo, va zemanê jî îşte ê hanî ye, ez yekî ra bûme yek. **(Hêmana Peywendîyê-Ş)**

19. Go: “Salê min bûne bîst û heft bîst heyşt go padîshahekî dûr hat ez lawê xwa ra xwastim.” Go: “Ez yekî ra bûme yek.” Go: “Salê mi pir çû hindik çû.” Go: “Kî têye mi dixwazîye...” Go: Ez dêm e nakim. Kê pasikê min derê. Ez ne keçik im. E nakim. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**

20. Ez kesî ra jî nawême. Diya min û bavê min zanine.” Go: “Bavê min go qîza min çima tu nakiye?” **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>2</sup>)**

21. Go: “Bavo hal mal e ku min vana gî kirine min va jî kiriye. **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>2</sup>)**

22. “Bigere li çar mey dinê yeka eyînî mîna salê min da bira neynokê wê dîsa mina neynokê min bin. Bigere bîne hinda min ku tu min bûk kî.” (Pênase: **Karê Dijwar, Hêma: M**)

23. Derekê bernadin, radiwe yeka bîna wê diwûnin. (Pênase: **Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N**)

24. Navê wê Gul e navê wê jî Gulçîn e. Eynî ha bidin kêleka hev tu nizanî kîjan kîjan e. Şerik merikê didiye ber xizmetçiyê kes serçavê xizmetçiyê nawûniye. (Pênase: **Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>**)

25. Çûn daketine bajêr ku çi qumaşê rind heye hanî kire nivînan ku çi malê rind heye, qiza padîşahane bûka padîşahane go kê min ra were. (Pênase: **Zewicîn, Hêma: W<sup>0</sup>**)

26. Rawûn siyar kirin birin çûn. (Pênase: **Çûyîn, Hêma: ↑**)

27. Min go: “Were hinda min hîn ku zava natiye xêniye.” Go: “Min kincê xwa li wê kirin, kincê wê mi li xwa kirin.” Go: “E çûm şûna wê ser pûş dirêj bûm.” Go: “Zava jî êvarê, lawê padîşêh jî hate hinda wê.” (Pênase: **Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>**)

28. Min go: “De kincê min bide ê xwa li xwa ke.” Go: “Wêdaaaa.” Go: “E mêrik ra raketim. Ez bûme jinika wî. E pê ra bûme yek. E ne şûna xwa didim, ne kincê xwa didim.” (Pênase: **Îdfayên Bêbingeh, Hêma: L**)

29. Go: “Ez çûm ku Gulçîn raketiye. Xwudan ser da zîpik zîpik bûye.” Go: “Kalo. Go: “Min belgi da ser dêv û min çongê xwa dan qirikê go dest min da go bix bix bix bix...” Go: “Min fetisand.” (Pênase: **Cezakirin, Hêma: U**)

30. Go: “Min kincê xwa li xwa kirin ê wê ye berê jî li wê kirin.” (Pênase: **Veguhêrîna Dirûvî, Hêma: T<sup>3</sup>**)

31. Go: “Hatim ser doşega xwa raketim.” (Pênase: **Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>1</sup>**)

#### (Çiroka Yekem) Berdewamiya Rezebûyera Yekem

32. “Kalo” go: “He binire e qîzek im aa, min çi û çi kir.” Go: “Te nikanû du derew bikira.” Go: “Çel û du meri bi vê qîzitiya xwa go min bi veşartî kuştin.” Go: “Ez niha xwadiyê çel û du qetla mê.” (Hêmana Peywendiyê-Ş)

33. Go kal kuta ferêt kir û go: “Here mada ku tu tiştêkî re nawuye zeman li te çûye.” (Pênase: **Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup>**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çiroka ‘Padîşah û Lele’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

(Çiroka Yekem)

I.  $\alpha, \xi, \varepsilon^3, \zeta^1, \varepsilon^1, \zeta^1, (\text{mtv.}), \xi, A^{14}$

(Çîroka duyem)

I.  $\alpha, a^1, \xi, \varepsilon^2, \zeta^2, A^7, B^4, \varepsilon^1, \gamma^2, T^3, A^{18}$

II.  $(\text{mtv.}), \xi, a^1, M, N, \eta^3, W^0, \uparrow, \eta^3, L, U, K^1$

Di vê çîrokê de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Di vê çîrokê de rêzebûyer li pey hev nayên. Em dikarin bibêjin ku di nav vê vegotinê de du çîrokên sereke derdikevin pêş me. Bûyerên ku di navbera kalepîr û Gulê de derbas dibe çîroka sereke ya ewilîn e. Çîroka sereke ya duyemîn jî ew e ku Gulê jiyana xwe ji kalepîr re vedibêje.

Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikevin nav “çîrokên ku di nav de cotê M-N heye” yê.

Di çîroka yekem de *leheng* Gulê ye. Dîsa ew ji ber ku kalepîr dikuje xwedî rola *êrîşkar* e jî. Ji bilî van taybetiyên şexsiyetan di çîroka yekem de dernakeve pêş me.

Di çîroka duyem de *leheng*: Gulê ye. Hemû bûyer li derdora Gulê derbas dibin û di vê çîroka derasayî de him *leheng* Gulê ye him jî Gulê wek *lehengê êrîşkar* derdikeve pêş me. Gulê di serî de bi xeletî be jî dibe sedema mirina zarokê. Li pey wê jî ew xwe di nav kirinên kirêt de dibîne. Ji bo ku kes nebihîse her şev ji laşê zarokê mirî parçekê jê dike û diavêje li ber heywanekî. Ango aliyê wê yê *êrîşkar* piştî mirina zarok derdikeve. Paşê ji bo ku kes nebihîse ku ew zarok miriye çil nobedarên bavê xwe dikuje. Herî dawî jî wî kalepîrî dikuje ku sedema wî jî wekî ku nikare derewekî jî bike dihesibîne. Di vê çîrokê dîsa *prens* jî wek Gulê derdikeve pêş me. Çimkî Gulê qîza padîşahekî ye û heman demê de dîsa bi kurê padîşahekî re dizewice. Di çîroka me de *alîkar*, di rêzebûyera sêyemîn de derdikeve pêş me. *Alîkar* padîşah (bavê Gulê) e. *Lehengê derewîn* di vê çîrokê de Gulçîn e. Gulê wê dixê cihê xwe tenê ji bo şevê lê Gulçîn êdî dev ji wî cihê bernade û naxwaze bibe xizmetdara Gulê. Di vê çîrokê de *şandyar (hinêryar)* û *bexşger* cih nagire. Ji ber vê yekê ev çîrok di nav pênc kesan de belav dibe.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: A, a, B, T, M, N, L, U, W, K.

### 2.1.3. Analîza Çîroka Bi Navê Çîroka Fuqêre

#### Rêzebûyer – I

1. Go pîrek û lawikekî xwa hewûn. Go pir ê feqîr bûn. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α)**
2. Go li xwe re bar kirin çûne bajarekî. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**
3. Sal bi sal ew bû lawik gir bû, xort bû. Go: “Anê em çi karê bikin?” Go: “Lawikê min here xwa ra here şivaniya, gavaniya gund bike.” **(mtv.)**
4. Lawik çû xwara dewarê xwa doş kir, viz kir. Viz bû, doş bû. Dî ku şiveka dirêêjj, ê mîna gewriya mêr e, hîn tîr jî li bêr ê xwar e. Şiva xwa radike. Dê va çito şiv e, şiv e hema çito şiv e. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>5</sup>)**
5. Pîr dî ku rokê tevna xwa dardê. Bi şev radiwe ku tevna xwa çûye li ber sekiniye. Tevn çêwûye. Riya din tê ku xaliya wê çekirine, xaniyê wê av kirine, damîştine. Pîrê diwê qey cîranê wê hatiye pê ra kiriye. Riya din dîsa dinire ku karê wê kirine. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>9</sup>)**
6. Cîrana xwa ra dê: “Eferim welle te duhu hatiye karê min kiribû. Xwadê li te razî we.” Dê: “Na xaltiyê, min nekiriye.” Cîrana xwa ya din ra diwê. Cîrana wê ya din jî dê welle min jî nekiriye. Dê: “Le va kê karê min kiriye?” Dê: “Hele bise ku e gudariyê lê bikim ku kê kiriye?” Pîr, bi şev diwe, xwa dike kuncikekî vedişêre. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
7. Dî ku nîvinê xwa tep û rep hilweşiyar. Xwadeyoo, keçiçek di wê şivêda derket, dengê quranê lê hat. Dest û çavê xwa şuştin, porê xwa şeh kir. Çû ser tevnê rûnişt. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>1</sup>)**
8. Go: “Tu kî yî tu min ra bê.” **(Pênase: Lêpirsîn, Hêma: ε<sup>3</sup>)**
9. Go: “Anapîr.” Go: “Ez dergîsta lawikê te me.” Go: “Ez xwastekiya lawikê te me.” **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>3</sup>)**
10. Lêwik jî hay jê tine ha wa dilê wê ketiye lêwik. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**
11. Pêrî go: “Mi ber de.” Pîrê digê çotîka xwa, çotîkê xwa dişkîne û lawik êvarê tê ku ê xêni ye. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>1</sup>)**

## Rezebûyer – II

12. Rokê, duduya, sisîya... yeka mîna cîraneka wan ku go: “Mala pîrê bûkeka xwa diye. Dertêye derva.” Go: “Derva gî ronik diwuye. Çiku pêri ye, pêri ye Xwadê pê ra şandiye.” Ya dini go, ya dini go...Lawê padişêh pê hesiya. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
13. Go: “E bimirim, ez ê vê jinika Fuqêre lê bistînim.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>8</sup>)**
14. Bana Fuqêre kirin. Go: “Were şerten min te re hene.” Ê Fuqêre go: “Şertê te çîye?” Hat ber sikinî. Go: “Şertê min go tî herî cilekî wîni.” Go: “Ez ê li vê meclisa xwa raxim.”

Go: “Li vê hêlê wê hêlê metrokê kom bimîne.” Gîya go: “Tişteki hanî, cilê hanî tunene ma, kê meclîsê seriyak heye yek tunê.” (Pênase: **Karê Dijwar, Hêma: M**)

15. Jinika xwa go: “Çima Fuqêre tu digirîye?” (Pênase: **Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>2</sup>**)

16. Fuqêre go: “Îşte lawê padîşêh min re şert daxistiye. Diwê tu şertê min nînê şunê ez kê jinika te bigrim.” Gotiye here min re cilekî bîne ez ê meclîsa xwa raxim, gotiye ê li vê hêlê wê hêlê kom be. A va şertek e.” (Pênase: **Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>2</sup>**)

17. Dê: “Wî eyb e elemek te ra.” Diwê: “Va çiyê?” Diwê: “Here va şûna ku te lê hanîm, ku te erdê dîm. Bê selameleykum xenzûr êlan.” Dê: “Wana jî ê bîn aleykumesam ênişte. Diwê emrê te çiyê? Bê keçika we tişteki tune ku ciyê xwa li ser bike, ka wî cilê we yî ber kun.” (Pênase: **Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>2</sup>**)

18. Ê dê: “Temam.” Kêf kir û çû. (Pênase: **Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, Hêma: G<sup>5</sup>**)

19. Tişt mişteki tinê ha. Erdî iiişk ezmanî iiişk. Go: “Selameleykum xenzûrêlan.” Wana jî go: “Eleykumselam ênişte.” Qapî lê vewû. Go: “Emrê te çiyê?” Go: “Welle keçika we gotiye here min re cilekî bîne kê ser ciyê xwa bikim.” Go: “Here lêy here way ber kun bide ênişte.” Go: “Bira biwe here.” (Pênase: **Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>5</sup>**)

20. Kêf kir û çû. (Pênase: **Veger, Hêma: ↓**)

21. Gîya pê qerf kir. Lawê padîşêh pê keniya. Go: “Hehheee!” Go: “Te hanî, têra meclîsê dike?” (Pênase: **Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>1</sup>**)

22. Go: “Erê.” Go: “Mi hanî.” (Pênase: **Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>**)

23. Nîva piştê wî metîn bû ku wa dera dereka ew e, çiku erdî işk e qapî lê vediwuye. A bir û çû bana çar peya kir. Meclîs jî gî tirşikçiyê axa nin. Raxistin û ew kirin. Haaoooooww, ku her gulekê tê da ye, her ewekê tê da ye. Raxistin ku li vê hêlê jî metrok bû li wê hêlê jî metrok bû. Tew her ku radixine pir diwûye. (Pênase: **Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N**)

24. Fuqêre kêf kir û reviya çû mal. (Pênase: **Veger, Hêma: ↓**)

### **Rêzebûyer – III**

25. Riya din banê kirin. Go: “Were. Go: “Du şertê te mane.” Go: “Çiyê şertê min?” Go: “Tu yê herî guşiyak tiri wînî. Ez ê li vê meclîsa xwa li vê ortê darxim ku çiqê gelan gîdanê min hewe ê bixwe, wa guşiyê ê neqede.” (Pênase: **Karê Dijwar, Hêma: M “VIII Tê Dubarekirin”**)

26. Jinikê go: “Xêr e Fuqare? Tu digiriye dîsa. Megrî e heme, li paş te me, megrî.”  
**(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>2</sup>)**

27. Go: “Welle padîşêh mi ra ha gotiye. E ditirsim ku te li mi bistîne.” **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>2</sup>)**

28. Go: “Kes nika min li te bistîne.” Go: “Here şûna ku te lê hanî me.” Go: “Bê selameleykum.” Go: “Ê bên Eleykumeselam. Bav û diya min in. Xwang û birê min in.” Go: “Ê bê tu hatiye çiyê?” Go: “Bê e hatime keçika we gotiye here mi ra guşiyak tiri wîne e dikê bixwum.” A go: “Ê bi te din tu yê wînî werî. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>2</sup>)**

29. Go: “Tu hereeee.” Go: “Serê xwa mêşîne, tu here.” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>2</sup>)**

30. Çû wira. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, Hêma: G<sup>5</sup>)**

31. Fuqêre go: “Selamaleykum.” Go: “Eleykumeselam.” Qapi lê vewû. Go: “Emrê te ênişte.” Ber emrî wî ne. Go: “Emrê min keçika we gotiye welle cîgera min dişewitiye. Here min re guşiyek tiri bîne ku ez bixwim.” Go here filan derê filan rezî. Qapi vewiye. Guşiyak tiri jêkir, mîna kundaxa zariya ne. Guşiyak tiri jêkir. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>5</sup>)**

32. Lawê padîşêh go: “Te hanî?” **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>3</sup>)**

33. “Wîne wîne wîne, em bixwin.” Ê xwa ra dên hef hef hef... Mexsûs ha ê fêsat pir in. Bi dar xistin. Guşiyê tey turi bîna qundaxê şûna xwa da neliviya. **(Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N)**

#### **Rezebûyer IV**

34. Fuqêre go: “Temam bû? Go: “Ew ê te mi ra man? **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>2</sup>)**

35. Go: “Erê şertekî mi man. Şertekî min ê çetin maye. Biwe biwe, newe tu kê jinika xwa siwe da mi ra wînî mal.” **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>2</sup>)**

36. Go: “Tu yê herî, tu yê çaxakî sê rokî wînî.” Go: “Ê meclîsa min ê şora bike.” **(Pênase: Karê Dijwar, Hêma: M “VIII Tê Dubarekirin”)**

37. A rawû, çû. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

38. A rawû, çû. Giriya jinikê go: “Tu dîsa bû çi digriye Fuqare?” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>2</sup>)**

39. Fuqêre go: “Îja jî tişteki din gotiye. Gotiye tu yê herî çaxakî sê rokî wînî ê li meclîsa min şora bike. Ma çaxayî sê rokî zanin şora bikin?” **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>2</sup>)**

40. Go: “Here şuna ku tu duhu çûyî.” Go: “Bê selameleykum, qapiye li te vewe.” Go: “Bê keçika te gotiye heduriya min nêye bira wî çaxa yê me bişîne, lawikê birê min e. E kê xwa ra pê heduriya xwa bînim.” **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>2</sup>)**

41. Ê vî lotik li xwa xistin û çû. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, Hêma: G<sup>5</sup>)**

42. Çû, go: “Selamaleykum.” Go: “Eylekumeselam.” Gî lê kom bûn. Keçika xwa hezdikine. Bi xwa keçika xwa pê ra şandine ma. A go: “Keçika we gotiye wî çaxayî bişînin. Heduriya min nêye e kê xwa ra pê heduriya xwa bînim.” Go: “Biwe.” **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>9</sup>)**

43. Lawê padîşêh go: “Çaxa şora bike.” Gî hatin ser ra sekinin. Go: “E çi şora bikim.” Cardin go: “Çaxa şora bike, bikêlime.” Go çavê xwa doş kiiirinn, go: “Nuç nuç.” Gî lê ditirsine jî. Go: “E çi şora bikim.” Go: “Çaxa şora bike.” Go: “E çi şora bikim.” Go:

“Min bîstaneke xwa çand li Horhor

Go zeweş tê da gî bûne qiyayê qor

Go e dinime dê û jina lawê padîşêh ku

Kê jina Fuqêre lê bistîne bi zor” **(Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N)**

44. Ê xelkê gî tûka ser çava kir û meclîs terikandin û çûn. **(Pênase: Cezakirin, Hêma: U)**

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Fuqere’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, \uparrow, \S, F^5, F^9, \S, F^1, \varepsilon^3, \zeta^3, a^1, K^1$

II.  $\S, A^8, M, D^2, E^2, F^2, G^5, F^5, \downarrow, \varepsilon^1, \zeta^1, N, \downarrow$

III.  $M, D^2, E^2, F^2, B^2, G^5, F^5, \varepsilon^3, N$

IV.  $\varepsilon^2, \zeta^2, M, \downarrow, D^2, E^2, F^2, G^5, F^9, N, U$

Di çîroka ‘Fuqere’ de çar rêzebûyer derdikevin pêş me. Di çîrokê de rêzebûyer li pey hev tên. Her çar bûyer jî xirabiyekê nîşan didin. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav “çîrokên ku di nav de cotê M-N heye” yê.

Di çîrokê de *leheng*: Fuqere ye. Hemû bûyer li derdora Fuqere derbas dibin û xirabîyên piranî ji bo wî tîn kirin. Di her sê rêzebûyerên dawî de wek *êrîşkar*, lawê padîşêh derdikeve pêş me. Dilê lawê padîşêh dikeve jina Fuqereyî dixwaze wê ji Fuqereyî bistîne. Lewma çend şertan ji Fuqere re dibêje û ger ew wan şertan de serkeftî dernekeve dê jina wî jê bistîne. Û dest bi vegotin û daxwazên karên dijwar dike.

Di vê çîrokê de *bexşgêr*, jina Fuqere ye. Çimkî jina wî wek perîyekê ye û ji bo ku Fuqere ew şertên ku lawê padîşêh bîne cîh rê û rêbaza gihiştina wan tiştan dike û dixwaze ew biserkeve. Jina Fuqere di heman demê de rola *prencesê* jî dilîze çimkî ew hin rolên *prencesê* jî girtiye. Mesela ji bo wê şertên dijwar ji Fuqere re tîn dayîn. Daxwaza bicîhanîna karên dijwar dîsa roleke *prencesê* ye û ew jî di vê lehenga me de cîh digire. Ango jina Fuqere him di rola *bexşgêr* de ye him jî di rola *prencesê* de ye. Di çîrokê de *alîkar*, di rêzebûyera yekem de diya Fuqere ye, di vê bûyerê de bi saya diya Fuqere jina wî dikeve nav çîrokê û dîsa bi saya diya wî jineke wî çêdibe. Di vê çîrokê de *lehengê derewîn* û *şandyar (hinêryar)* tune ye.

Ev çîrok di nav pênc kesan de belav dibe. Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: ↑, F, A, M, D, G, F, N, ↓, U

#### 2.1.4. Analîza Çîroka Bi Navê Dal Ahmet

##### Rêzebûyer – I

1. Xwa ra sê, çar keçik hewûn. Xwa ra çûwûn ku bin dara bilîzin. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α)**
2. Keçika gotû: “Keçê ma dilê ketiye Dal Ahmet.” Gotû: “Erêêê, va pênc şeş sal in e li dû ketime ez nizame ku î li kîjan gundî ye.” **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**
3. Gotû: “Hûn ê mi ra sandiqekê çêkin û a hûn ê zexêriya mi ê heft sala têkin û ez ê wir di dengiz da herim.” **(Pênase: Dûrketin, Hêma: β<sup>3</sup>)**
4. Keçikê rawû bav û diyê xwa ra gotû: “Mî ra sandiqekê çêkin. Zexêriya min ê heft sala dêkinê, min dengiz da berdî e dikê herim ber gundê wana bisekinim.” Gotû: “Dilê min ketêye.” **(Pênase: Destpêkirina Çalakiya Dijber, Hêma: C)**

##### Rezebûyer – II

5. A rawûn pê ra sandiq ser necêr çêkirûn, a zexêriya wê ya heft salan kiriwûnê, di dêniz da berdî wir xwa ra çû. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>10</sup>)**

6. Çûwû, çûwû. Ber mala xwanga Dal Ahmet sikinîwû. **(Pênase: Vegerîna bi rengê veşartina kîbûna xwe, Hêma: O<sup>2</sup>)**

7. A xwanga Dal Ahmet hema piyê wê digre. Diwê: “Keça min.” Diwê: “Tu hatiye.” Diwê: “Xwa eşkere ke.” Diwê: “Welle ez hatime xaltiyê.” Diwê: “Ez hatime bûna birê te hatime.” Dê: “Heft sal in e dêngiz da tême dê bûna birangê te hatime.” **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

8. Diwê: “Welle keçika min, birê ney li mal e.” Dê: “Ku birê min were roya bazarê...” Diwê: “Tu û şansê xwa.” Keçik jî kêf dike. Dê: “Welle ez hatime şallê e rezîl newîm.” **(mtv.)**

9. A vana tev derine pîknîgê. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**

10. Dal Ahmet dere ser darê, ku meywe jê ke. Keçik jêr da kufikê dide dest e. Jor da keçikê mêze dike. Keçik dê: “Xwedêyo, Xwedêyo dê şallê li mi hez bike.” A Dal Ahmet peya jêr diwe. Dê: “Xwanga min welle min va keçika begenmîş kiriye.” **(mtv.)**

#### **Berdewamiya Rêzebûyera Yekem**

11. A keçikê hez dike, radiwûn rihela wê dikin, tişt miştê wê dikin. Xwanga Dal Ahmet birê xwa dizewicîniye. **(Pênase: Zewicîn, Hêma: W<sup>4</sup>)**

#### **Rêzebûyer – III**

12. Siwariyek li wê da tê. Tê diwê: “Axa, axa Xwadê umrekî te de.” Diwê: “Li gundê mala bavê te wana def lê diketiyê.” Dê: “Te dizewicînine.” **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

13. A radiwe li bergîra xwa lê siwar diwe û dere. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwitî an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwitî, Hêma: G<sup>2</sup>)**

14. Dê: “Amaan, hawaar va çi def e, va çi sîtil in, va çi tişt e.” Dê: “Welle oxil, em te dizewicînine.” Dê: “Em kê te ra sûprîzê bikin ku tu werî mal.” Dê: “Min niva jinik hanîye.” Diwê: “Jinik ê hanê di paş perdê da ye.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>16</sup>)**

15. Keçik dinire bû wexta nîvro nehet bû îkundu nehat. Keçik radiwe gelinligê xwa dike ziwûnê xwa û katek kincê qereçiyê li xwa dike. **(Pênase: Veguherîna Dirûvî, Hêma: T<sup>3</sup>)**

16. Keçik pirs a pirs pis a dere mala bavê Dal Ahmet. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwitî an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwitî, Hêma: G<sup>5</sup>)**

17. A dere, jinik li wa meriya pirs dike. Diwê: “Oda Dal Ahmet li ku derê ye?” Diwê: “Îro bûk hanîne.” Diwê: “Bûk ê li ku derê ye?” **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>3</sup>)**

18. A dere oda Dal Ahmet ku bûkê li wê derê ye. Nare oda bûkê dere hêla dini. (Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)

19. Dere kincê qereçiya li xwa datîne û gelinlixê xwa li xwa dike û a Dal Ahmet li wir va tê. A dê: “Te dî” Dê: “Bûne dudu.” (Pênase: Zewicîn, Hêma: W<sup>0</sup>)

Dema ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Dal Ahmet’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

I.  $\alpha, a^1, \beta^3, (\text{mtv.}), \uparrow, C, W^4$

II.  $A^{10}, O^2, \xi, (\text{mtv.})$

III.  $\xi, G^2, A^{16}, T^3, G^5, \varepsilon^3, \uparrow, W^0$

Di vê çîrokê de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Di vê çîrokê de bûyer li pey hev tên. Ev çîrok dikeve nav gruba “çîrokên ku di nav de cote elemantên H-J û M-N nîne” yê. Rêzebûyera yekem de mijara daxwaza zewacê derbas dibe û ji bo wê keçik di nav sindoqekê de bi behrê ve diçe ba Dal Ahmet. Di rêzebûyera duyem de jî Dal Ahmet jî evîndar dibe û daweta keçikê û ya Dal Ahmet tê kirin. Dîsa malbata Dal Ahmet gazî wî dike û ew keçikê diterikîne û diçe. Di rêzebûyera sêyem de keçik dide şopa Dal Ahmet, kincên xwe diguherîne û bi şikleki dîsa dibe jina Dal Ahmet.

Di vê çîrokê de *leheng* keçik (keçika ku dilê wê ketiye Dal Ahmet) e. Ji bo fonksiyonên vê lehengê ev tevgerên keçikê di nav çîrokê de xuya dikin: Lêgerîna Dal Ahmet, çûyîna keçikê û zewaca wê ye. Wekî lehengê *alîkar* jî xwenga Dal Ahmet derdikeve pêş me. Ew ji bo ku têkiliyekê di navbera Dal Ahmet û keçikê çê bike rêbazê nîşanî leheng dide. Di vê çîrokê de *êrîşkar* bav û diya Dal Ahmet in. Çimkî ew xwediyê fonksiyonên xirabiyê ne. Ew dixwazin Dal Ahmet bi keçikeke din re bizewicînin. Û Dal Ahmet mecbûr dihêlin ku bi wê keçikê re bizewice.

Di çîroka Dal Ahmet da em rastî *prences, bexşgêr, lehengê derewîn û şandiyar (hinêryar)* nayên. Ango ev çîrok bi sê keseyatan ve hatiye honandin.

Di fonksiyona “XXXIian de leheng dizewice û dertê ser text. (W) Bin fonksiyonên W<sup>0</sup>, W<sup>0</sup>, W<sub>0</sub>, W<sup>1</sup>, W<sup>2</sup>, W<sup>3</sup> hene lê ev her şeş jî li çîroka me nayên. Me li vê derê bin fonksiyona W<sup>4</sup> (Zewac nivî de dimîne, zava mecbûr dimîne ku biçe cihekî din) lê zêde kirîye.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: a, ↑, C, A, O, T, G, W

### 2.1.5. Analîza Çîroka Bi Navê Dêwê Serzer

#### Rêzebûyer – I

1. Go heft lawik û keçikeka malikekê hewû. (**Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α**)
2. Go va birê xwayingê çûne çolê, nehatine mal. (**Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑**)
3. Gotiye: “Te kiriye. Çima birê te heft in tu bi serê golikê beş sond dixwuye.” (**B<sup>4</sup>**)
4. A diwê: “Anê diwê hittilbatil ez ê herime wê derê. Diwê: “Sehirciyakî mi ra kerekî li xwaliyê çêke, ez ê bi wê kerê herim.” (**Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>3</sup>**)
5. Diwê: “Tim bê ço, ço ku tu bê hoş kerika te yê hilweşe.” (**Pênase: Qedexekirin, Hêma: γ<sup>1</sup>**)
6. Dere çolê bi rê va bîr dîke dê: “Çoş, hoş.” Ku çolê de here çi bike. Kerika xwa hildiweşe. Xwali ye lê siwar bûye. Kerik li celbê çêkirine. Hildiweşe. (**Pênase: Binpêkirina Qedexeyê, Hêma: δ<sup>1</sup>**)
7. Dinire ku jinîkek rastê hat. (**Hêmana Peywendiyê-Ş**)
8. Diwê: “Ez ê te biwûn.” Diwê: “Birê te yê jî were mi bixaze.” Diwê: “Em jî heft keçik in.” Diwê: “Dêwê heftseri zemaninde diya me revandiye. Heft birê me hene dêw in. Em heft jî keçik bûne, em însan in.” (**Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>4</sup>**)
9. Çû kete şikeftê îşte. (**Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑**)
10. Go: “Va şikefta birê te ne. Em heft bira ne, î mezîn ev e.” Go: “Va kî wû rasta te hat.” (**Pênase: Naskirin, Hêma: Q**)
11. Go: “Ammaan û amman go vê pisikê meqêherîne. Ku goşt e ku çiyê bidê.” Go: “Va pisika me ya heft salan e.” Go: “Ê here êr mêr da bimîze.” Go: “Ar tune ha!” (**Pênase: Qedexekirin, Hêma: γ<sup>1</sup>**)
12. Pisikê xwa ha tê da, tê da wê jî pisik kut kir. Go: “Dûra mi here.” Go: “Dûra mi here.” Pisik qeherî. Keçik rawû ku şîva birê xwa bike çû ku pisikê bi êrda mîstîye. (**Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>5</sup>**)
13. Go: “Êvar e birê mi werin ez ê çokim?” Keçik derkete ser şikeftê pê ra dên Şikefta Kulik. Dî ku arek li dûr mîna ku li Cemalkoyê li hinda Sêregê arek dûmanek radiwûye. (**Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: KF<sup>2</sup>**)
14. Wa keçika û şeş xwayingê xwa jî li wê derê ne. A diwê: “Em newêrin. Diwê ha te ra hinek ar dikine a paçekî dê ahanî bi vê derê bigre û here.” Diwê: “Birê te jî îllam werin me bixwazin.” (**Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>4</sup>**)

15. Hah keçik diwê: “Hah te ra, bavê me wexta ku li xew rawe. Bîna xerîwa tê, zane.” Diwê: “Ku hat vî şeyî çeke.” Diwê: “Cardi kê bi te gê, vê sawûnê çeke.” Diwê: “Ku cardin kê bi te gê va terziya çeke.” Diwê: “A wê çaxê ku tu ketî şûna xwa niva nika tiştêkî bike. Wê şikeftê nas dike.” Ku birê xwa derine seyd meyd e jî tiştêkî pir mezin, kevirekî tînine didine ser şikeftê ye. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>1</sup>)**

## **Rezebûyer – II**

16. Nigê keçikê wê çaxê ber qêpi dikeve çilkek xûn lê dirijê. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

17. Dew wê xwînê dialêse. Dê: “Va xûna însanan e. Dê: “Mi ra bê kî hatiye vira.” Keçik dê: “Welle bîlle bavo.” Diwê: “Ya Şikefta Kulik e, hatiye.” Diwê: “Hatiye êr e.” Bi şopa keçikê dikeve. **(Pênase: Di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, Hêma: G<sup>6</sup>)**

18. Keçik dinire ku toz û dûmanek rawûye bîna ku erebak di nav wê toz û dûmanê da were. **(Pênase: Şopandin, Hêma: Pr<sup>5</sup>)**

19. Keçik sawûnê çedike, dê li pêş wî dêwî diwe celb, diwe çilbok, diwe batax. Heta dêw xwa li wira xilas dike, dikê hema bi keçikê gîne. Îja şêh çedike. Diwe dehl û dirişk pêşiya wî. Heta ku xwa dehl û diruşka xilas dike. Îja derziyê çedike. Derziyê çedike. Heta dêw xwa lê diqedîne xwa digîhîne şikefta xwa û dêw dere paş şikeftê rûdine. **(Pênase: Alîkarî, Hêma: Rs<sup>2</sup>)**

20. Dêwê Serzer dere paş şikeftê disekine. Diwê: “Mîjmîjo, tiliyê derxe bimîjo ku her heft birê te nekujo.” Dê: “Ez ê her heft birê te bikujim.” Keçik tiliya xwa derdixe. Va dê wa tiliya wê dimije. Keçik rep û hêla din dikeve. Xûn tê da namîne. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>17</sup>)**

21. Birê xwa dê: “Xwayingê çî hatiye serê te” Diwê: “Dêw ro bi ro tê tiliya min derdixin, bavê wana tiliya min dimije xûna min dimije ku her heft birê te li nêçîrê nekujim.” A dê: “Xwîn di mi da nemaye.” **(Pênase: Qasidî, Kêlîya Derbasiyê, Hêma: B<sup>4</sup>)**

22. Birê lê dibê, diwê: “Ku çito go tiliya xwa derxe go bê ez dernaxim.” Go: “Ku cardi go tiliya xwa derxe, ez tiliya te bimijim bê e dernaxim.” Dîsa dêw tê. Vana xwa li dêw veşartiyê. A dêw tê dê: “Mîjmîjo, tiliyê derxe bimîjo ku her heft birê te nekujo.” A keçik dê: “Ez dernaxim.” Ku hîn hiiraa keçikê dike ku here şikeftê da keçikê bixwe a vana lê dixin. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>1</sup>)**

23. Serê dêw jê dikin û va dêw lox diwe û dere jêr. **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>5</sup>)**

### Rêzebûyer – III

24. Keçik tèn qewûl nakin. Dên: “Vana çito bavê me kuştiye. Dêw e ku çiyê jî bavê me ye.” Dên: “Em çi bikin qene em li vê keçikê xilas bin.” Diwê ku têlek wa pûrtek wî dêwî here zikê kê di zik da diwûye ejdî ye. Vana radiwûn keçik dera qirşa ku tê dere kom dike tê. Dere ku misîn bi ser xwa va ke avê vexwe vana pûrta bavê xwa kiriye misîn e. Kiriye misîn e. Ku keçik avê vedûxwe dê ûûyy dê mû çû qirika mi. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>6</sup>)**
25. Dê rooo bi ro keçika gir diwe qalind diwûye. Dê: “Niha çi li te qewumiye? Te çi kiriye? Kî te re bûye yek e? Va zikê te...” Dê: “Welle birawnoo, rûyê min ê li we yê reş be kes nîzika min newûye. Ez ê vê çolê me dê kesek nîzika min newûye.” Dê: “Na na na...” A wana lê îfterê dikan. Diwê: “Ê hamîle ye.” Diwê: “Dere qirşa, nê.” Diwê: “Ê hamîle ye.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>9</sup>)**
26. Dê: “Em çito bikin çito nekin?” Dê: “Em ê biwûn li çolekê bikujin.” Du birê xwa dên: “Xwanyingê, hadê em kê herine qirşa, êzika.” Çol e, xwalî ye, dûr e. Dê: “Hadê em kê herin êzika.” **(Pênase: Qedexekirin, Hêma: γ<sup>1</sup>)**
27. Xwaying dê: “Hadê.” **(Pênase: Binpêkirina Qedexeyê, Hêma: δ<sup>2</sup>)**
28. A xwanga xwa li kerê dikan û pir derin, hindik derin. Derine kerbelakê dûr û dûr, hew siwe ev jî êvar. **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>5</sup>)**

### Rezebûyer IV

29. Diwê: “Birawooo dê ku e li vê kerbelê terikandim.” Dê: “Tu herî diyarî mala, nigê tekeve kelemekî dara, heta destê min pê new ne zer biwe ne der biwe.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>11</sup>)**
30. Lawê padîşêh xwa ra viz diwe. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
31. Dinire ku keçikeka çiqayî çeleng e. Li bin darekê dirêj bûye. Êjdiyak ha dêv ra dikişiyê. Pêşi heye dawî tune. Radiwe wî ejdiyayî tim jê dike, jê dike, jê dike. Ê dike dismala xwa ku tamam dertê. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: KF<sup>1</sup>)**
32. Diwe mala xwa. Rihet diwe, keçikeka bîna vê tinê. Çava berê didê. Dê: “Ez ê li xwa mer kim.” Dê: “Ez ê mer kim.” Dê: “Kesekî xwa tinê li vê çol û polê mi xwa ra dîye.” **(Pênase: Zewicîn, Hêma: W<sup>0</sup>)**
33. A rokê dîn ku erebek hate gund şeş heft sal çûne. Erebak hat gund û ber mehelle ber siqaqê xistine pê ew a kom dikine ku pê diwine der meran e. Dinire ku Xwadeyoo yekî nig lê meziiin bûye. Kal bûye, çavê xwa lê dikeve digirî. Dê: “Qey yanê va birê min e.”

Gî dên: “Ti çima ha bûye?” Dê: “Welle xwangeka me hewû. Min xayineta pê ra kir” Dê: “Mi bir çolê hîşt me gura jinê xwa kir.” Dê: “Ku nifir li mi kir ku çi bû e negîhîştîme malê e ha bûm.” Destê xwa pê dixê. Dê: “Keko nigê te yê rihet bûye.” A diwe mala xwa. Qey birê xwa ye. Mêrik dinire ku çito ku ava zer çû çû... Jinik dinire ku dirnaxa wê ejdîjayî ye. Ku çito tê da derdixê lawik rihet diwe. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>8</sup>)**

34. Dê: “Tu kî yi?” Dê: “Ez xwayinga te me.” Dê: “We li mi hanî hanî kir jinê we. Te di binire e hatime ku hûn ê li ku ne.” **(Pênase: Derxistina Meydanê, Hêma: Ex)**

Dema ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Dêwê Serzer’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

- I.  $\alpha, \uparrow, B^4, F^3, \gamma^1, \delta^1, \xi, D^4, \uparrow, Q, \gamma^1, A^5, KF^2, D^4, F^1$
- II.  $\xi, G^6, Pr^5, Rs^2, A^{17}, B^4, H^1, J^5$
- III.  $A^6, \gamma^1, \delta^2, B^5, KF^1, W^0, Ex$
- IV.  $A^{11}, K^8$

Di vê çîrokê de çar rêzebûyer derdikevin pêş me. Ev çîrok dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J heye” yê. Ev çîrok ji aliyê bûyeran ve di rêzê de nîne. Lewra di navbera rêzebûyera sêyem de xirabiyeke din derdikeve holê.(A<sup>11</sup>) Rêzebûyera sêyem xilas nabe û em di nav de rêzebûyera çarem dibînin.

Rêzebûyera yekem de xwaying dixwaze bigihîje cem birayê xwe. Birayên xwe dibîne û bi birayê xwe re dest bi jiyîna şikeftê dike. Lê birayê wê jê re dibêjin pîsîka me neqehêrîne ger tu wê biqehêrîni dê agirê me vemirîne. Rojekê pîsîk êgir vedimirîne. Keçîk jî li pey dû diçe û diçe Şikefta Kulik ku egir bîne. Diçe digihîje êgir. Piştî wê bûyera duyem dest pê dike. Xwaying diçe ji keçîkên Dêwê Serzer egîr digre û dema ku vedigere, lingê wê xwîn dibe û Dêwê Serzer dide pey wê. Dixwaze wê bixwe. Lê bi saya tiştên ku keçîkên Dewê Serzer dane wê xwe digihîjîne şikefta xwe. Dêwê serzer her roj xwîna wê dimije. Birayê wê dema ku hîn dibin ku dêw xwîna xwanga wan dimije wî dikujin. Bi kuştina dêw jî rêzebûyera duyem bi dawî dibe. Piştî mirina bavên xwe jinên birayan mûyekî dêw dixin nav avê û bi xwayingê vexwarindin didin. Ew mû dibe ejdîyak û di zik de mezin dibe. Jin mêrên xwe re dibêjin xwanga we bi du canî ye. Bira jî wê dibin çiyekî dûr dihêlin. Piştî vir rêzebûyera çarem dest pê dike. Xwaying nifirê ji birayê xwe re dike. Di vir de em dibînin ku rêzebûyera sêyem û çarem dikeve nav hev û du. Di nav rêzebûyera sêyem de destpêka ya çarem wekî ku me jor da nîşan da, xuya dibe û dîsa rêzebûyera çarem berdewam dike. Bira dema ku xwangê ber dide şunde padîşahek wê dibîne û wê ji

wî ejdîyê ku zikê wê de derdikeve xilas dike. Wê dibe cihê ku hatiye û bi wê re dizewice. Di vir de jî rêzebûyera sêyem diqede û ya çarem berdewam dike. Di ser wê bûyerê de demek dirêj derbas dibe û rojekê birayê wê bi lingekî birîndar tê pêşiya wê. Xwaying fem dike ku nifira wê qewimiye. Lingê birayê xwe sax dike û rastiye jê re dibêje. Çîrok bi vî awayî dawî dibe.

Dem a ku em kesayetên vê çîrokê dinêrin wek *leheng* xwaying derdikeve pêş me. Di vê çîrokê de *leheng* bi kiryarên xwe yên wekî lêgerîn, çûyîn, zewac, li ber daxwazên bexşger bersiv dayîn û hwd. ve xuya dibe. *Êrîşkar* di vê çîrokê de Dêwê Serzer e. Dêwê Serzer bi xirabîyên ku li xwaniyê dike ve di vê çîrokê de rola êrîşkar digre. Dîsa wek *êrîşkar* keçikên Dêwê Serzer jî piştî mirina wî di çîrokê de *êrîşkar* in. Ew jî heman awayî xirabiyan li xwaniyê dikin. Lê di serî çîrokê de keçikên Dêwê Serzer wek kesayetên *bexşger* jî rola wan heye. Çimkî ew, ji bo ku dêw xwayinga heft bira nexweşe, sabûn û derziyeke bi sêhr didin wê. Ev tevger em dibînin ku tevgerên *Bexşger* in. Lê ew di dawiyê de rola êrîşkar dilîzin. Em di vir da dibînin ku ev keçikên Dêwê Serzer di çîrokê de xwedîye du rolan in. Çîrokê de *şandyar* diya xwaying û heft birayan e. Dê dihêle ku keçik biçê ba birayan. Ev destûra ku dê dide wê wek tevgerê *şandyar* derdikeve pêş me. Padîşah jî di dawiya çîrokê de xuya dike û ew jî xwaniyê ji ejdî xilas dike. Ji ber vê tevgerê ew jî di çîrokê de wek *alîkar* e.

Di vê çîrokê de em tevgerên pênc kesayetên dibînin. *Lehengê derewîn* û *prences* di vê çîrokê de cîh nagrin. Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: ↑, B, F, D, ↑, Q, A, K, D, F, G, Pr, Rs, H, J, W, Ex

### 2.1.6. Analîza Çîroka Bi Navê Hirç

#### Rêzebûyer – I

1. Go sê keçik derine qirşa. (**Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α**)
2. Derine qirşa. (**Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑**)
3. Her yek bi newalekî dikeve, qirşê xwa kom dikin ê yekê jî birê xwa pê ra çûye. (**Hêmana peywendiyê-§**)

4. Her hinek koşakî lê dikine va hinda hevalî xwa piştî yê wê lê dikine, hil dide pîyê wê hil dide pîyê wê ku tê ê xwa jî ku çito dike ê xwa rake nika rake. Destiyakî ser datîne. Birê xwa ra dê hilde min. Ku çito dike dîsa nika rake. **(mtv.)**
5. Dinire ku hirçekî bîna meşka xwa kirê kiye û tê da dirêj bûye. Keçikê pî dike û direvîne hirç. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>1</sup>)**
6. Lawik: “Ammaan, hawaar, la filanino hirçê Fîdan bir, hirçê Fîdan bir...” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasîyê, Hêma: B<sup>4</sup>)**
7. Vana deereekê bernadin. Teselliya xwa niva dikevin. Pir digerin. Diwên ku çi bû niva bû. **(Hêmana peywendiyê-Ş)**
8. Va hirça jî vê keçikê diwe dike şikeftêkî. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>15</sup>)**
9. Raduwe keçikê ra diwe. Keçikê ra mêriklixîyê dike. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>16</sup>)**
10. Heft sal ne dêmek. E çito bikim. Neynok dirêj bûne, por dirêj bûye, eyne mîna hirça bûye wa jî heft çêlik kirine. **(Pênase: Veguherîna Dirûvî, Hêma: T<sup>1</sup>)**
11. Heft zariyê keçikê diwin, heft sala da. Nîvî hirç e, nivî jî merî ye. **(mtv.)**

## **Rezebûyer – II**

12. Jinik ha çavê xwa digerrîne, dîye ku şivanekî pezî li pêş e li wa dera digerrîne. **(Hêmana peywendiyê-Ş)**
13. Diwê: “Laaw şivanoo, şivanoo...” Şivan guhu dide ser, deng narêkê, dinire ku da tê ye şivan viz diwe, doş diwe, nawûne. Radiwe, dinire ku deng li vê şikeftê da tê ye. Dê: “Welle va dengê vê şikeftê ye. Dere, diwê: “Tu kî yî? Rû çi yî? Tu çi isn î? Tu çi cîsn î?” Dê: “Welle ez Fîdan im. Wê salê hirçê e revandim, e qîza mala filan kesî me.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>1</sup>)**
14. Dinire ku hirç wê da hat ku hîn va pê ra şora dikiye. Hirç tekmaqê mêrik dixê. Mêrik wê derê cansiz dikeve, loxa jêr dike hirç. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup>)**
15. Vana pir lê digerin, dên: “Va şivana çito bûye, va bû çi miriye? Va dîsa hirç e?” **(Hêmana peywendiyê-Ş)**
16. Pir dere hindik dere, salek, dudu dikevîne arê. Dîsa hirç qey qulikekê tê da dêle. Şêni hatiye îja çoyê desta ye hatin ewa ne. Ban dikiye, hirç tim terka şikeftê jî nakiye qey jinika xwa yê tê da ye. A doş diwîn çûne kumîyana çîye. **(mtv.)**
17. Diwê ban dike ban dike. Diwê: “Law mîlleet, law hûn kî ne, hûn mala kê ne? Diwê hirçê e revandime heft heyşt salin e kirime vir e mi bernadiye ez filan kes im here pê ra bê.” A vana derin li mal diwên. **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasîyê, Hêma: B<sup>1</sup>)**

18. Gund gî çoyê xwa dike dest xwa û tèn, dest xwe û tèn. A ku tê nêzika şikeftê hirç wan dide ber kevira û ber ewa. Bixe bix bi hirçê dikeve. Lêdixin. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>1</sup>)**

19. Keçikê lê distînin. **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>1</sup>)**

### **Rêzebûyer – III**

20. Diya keçikê diwe keçikê, dike teyştê sêri dişo, neynoka dike. Eyn wa jî mîna hirça bûye. Şilf, tazi ye, mîna cinawira bûye. **Pênase: Veguherîna Dirûvî, Hêma: T<sup>1</sup>)**

21. Diwe vîze vîza wa çêlikê hirça di şikeftê da. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup> -Kêmasiya Dayikê-)**

22. Hirç bi şev tê ser xaniyê wan tê tep rep, tep rep... Keçik dêre derva dê: “E herim anê, ecew e nerim? Çêlikê mi niha digirîne.” Diwê: “Fîdaaaan, keçik lawik alululuuu keçik lawik aluuluulu...” Yanê ban dike dê werin. **(Pênase: Qasidî, Kêlîya Derbasiyê, Hêma: B<sup>1</sup>)**

23. Diya xwa dê: “Were hirç e, pîs e.” Dê: “Lê anê ku hirç e, ku pirç e kezewê qirç e qirç e.” Yane digirîne. Keçik dîsa dere diya xwa dinirem ku wir li ser xênî rûdine. Diya xwa dere, dê: “Qîza min hirç e, çêlikê hirça nin. Tu kê vana çokî.” Diwê: “Anê ku hirç e ku pirç e kezewê qirç e qirç e.” **(mtv.)**

24. A dere hinda çêlikê xwe û a wana jî keçikê bîr dîkin. **(Pênase: Qasidî, Kêlîya Derbasiyê, Hêma: B<sup>3</sup>)**

Dema ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Hirç’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I. α, ↑, §, (mtv.), A<sup>1</sup>, B<sup>4</sup>, §, A<sup>15</sup><sub>16</sub>, T<sup>1</sup>,

II. §, D<sup>1</sup>, A<sup>14</sup>, §, (mtv.), B<sup>1</sup>, H<sup>1</sup>, J<sup>1</sup>,

III. T<sup>1</sup>, a<sup>1</sup>, B<sup>1</sup>, (mtv.), B<sup>3</sup>

Di vê çîrokê de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Ev çîrok dikeve nav “sinifa çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J heye” yê. Di vê çîrokê de bûyer li pey hev hatine. Bûyerên ku dikevin nav hevûdin nînin.

Rêzebûyera yekem de hirç Fîdanê direvîne. Dibe şikeftê û wê dîl digire. Di rêzebûyera duyem de jî şivanek dixwaze Fîdanê ji hirç xilas bike lê hirç şivên dikuje. Gundî piştî mirina şivên li şivên digerin lê wî nabînin. Du salan şunda gundî Fîdanê ji hirç xilas dîkin. Di rêzebûyera sêyem de jî Fîdan bê zarokên xwe nabe. Bi hawarên

zarokên xwe dilê wê dişewite û dîsa diçe ba zarokên xwe yê nîvî hirç nîvî mirov. Bi vî awayî bûyer diqewimin.

Dema ku em kesayetên vê çîrokê dinêrin *lehengê* çîrokê Fîdan e. Hemû bûyer li derdora wê diçin. Ya ku tê revandin ew e. *Êrîşkar* di vê çîrokê de hirç e. Ew *leheng* direvîne û şivên dikuje. Wek *alîkar* şivan derdikeve pêş me. Ew dixwaze Fîdanê ji hirç xilas bike lê nikare. Dîsa gundî jî wek kesayetên *alîkar* di çîrokê de cîh digrin. Ew Fîdanê ji hirç xilas dikin. Diya Fîdanê dawîya çîrokê de rola *şandiyar* dilîze. Ew pêşiyê naxwaze ku keçîka xwe biçê ba zarokên xwe lê di dawiyê de Fîdanê dihêle ku biçê. Di vê çîrokê de em tevgerên çar kesayetan dibînin. *Bexşger*, *lehengê derewîn* û *prences* vê çîrokê de cîh nagrin.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine. Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: ↑, A, B, T, D, H, J, a, B

### 2.1.7. Analîza Çîroka Bi Navê Pîrewokê

#### Rêzebûyer – I

1. Go gundikek hewû. (**Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α**)
2. Go diçûne ber çemekî êş. Go diçûne êş. Go yek rokê çû êş hat. (**Pênase: çûyîn, Hêma: ↑**)
3. Gotiye: “Law.” Gotiye: “Va jinê me hene gî çî yê pintî yê pîs in.” Gotiye: “Hinek jinê li ber çê in, digerinê ê şîlfê tazi ne.” Tu nawê wana jî pîrewok in, însanê ferêt in. Gotiye: “Law çiqayî çeleng in, law çiqayî lewend in. Va jinê mê yê pîs î pintî.” (**mtv.**)
4. Çûyîna cem mirovan di nav pîrewokan de qedexe ye. (**Pênase: Qedexekin, Hêma: γ<sup>1</sup>**)
5. Rawûye, çûye korteka xwa vedaye ser jî ha noylon û qirş û qal kiriye. Mewûj mewûj kiriye. Vana ber çê digerin. Yeka qasî neh deh salî dikeve kortikê. Dikeve kortikê. A va hema xwa çê dike ser û şûşinekê kurkekê ra dike û pîrewok li hêsî pir ditirsin. A lê dikin û tîne, tê mal. (**Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>1</sup>**)
6. Kesî ra nawê. Dê bira gir bûweee. Dê mi ra nawe, ez ê bi lawikê xwa mer kim. Ê çîqa jî xwaşik in pîrewok. Pîrewok gir diwe, şûna wê tim bin kulîne ye. Nê mên dixwîye û hema deriye bin kulîne ye. Serçavê kesî nawûniye. Bi lawikê xwa ra mer dike. (**Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>16</sup>**)

7. Rokê îja birê wê mêrikê dere, dere êş, tê mala wan. Dê: “La, e îro ber çêm ra hatim.”  
Go yek diwê: “Fatikê mi, Fatikê min, Etikê mi keçikê mi.” Dê: “Wir ber ferêt ra dere tê.”  
**(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>7</sup>)**

## Rezebûyer – II

8. Pir dere hindik dere. Gir diwe. Heft, heyst sal derin A Xwadê zariyakî jî dide wê.  
**(Hêmana peywendiyê-Ş)**

9. Tim û tim tişteki lê dikine, hesinekî jî di bera dikine. Hêsin ditirsine newêre destê xwa  
bi şûjinê bike ne jî wêre here teva toplima xwa. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>15</sup>)**

10. A wa bebikê xwa gir diwe. Yekî herimî ye. Gir diwe. Niva mezin diwe. **(Hêmana  
peywendiyê-Ş)**

11. Qey hîn sonxi xwediyê xwa ne. Ku kê tê dê dora ferêt hîn li wê digerine. Xwa riya  
giya didine. Wa na jî, pîrewok jî xwa riya kesî nadin zû zû. **(Pênase: Destpêkirina  
Çalakiya Dijber, Hêma: C)**

12. A wa lawikê xwa ra dê. “Vî hesinê vê dera mi da kaş ke.” Lawik kaş dike. **(Pênase:  
Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>10</sup>)**

13. A dinire ku hema qîjînek hat û di qêpi ra derket. Reviya. **(Pênase: Alîkarî, Hêma:  
Rs<sup>1</sup>)**

14. A vana şopê direvin ku xwa çito çe dike nav avê dinire ku xwûna soor bi ser avê  
ket. Cesedê wê bi ser ket. Hema dikujin. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup>)**

15. Niva hatiye hinda mîllet a. **(Pênase: Binpêkirina Qedexyê, Hêma: δ<sup>1</sup>)**

Dema ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Pîrewokê’ dinêrîn şemayeke wiha  
derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, \uparrow, (mtv.), \gamma^1, A^{16}, B^7$

II.  $\S, A^{15}, \S, C, K^{10}, Rs^1, A^{14}, \delta^1$

Di vê çîrokê de du rêzebûyer hene. Ev çîrok dikeve nav gruba “çîrokên ku di nav  
de cote elemantên H-J û M-N nîne” yê. Di vê çîrokê de bûyer li pey hev hatine. Bûyerên  
ku dikevin nav hevûdin nînin.

Rêzebûyera yekem bi ecibandina pîrewokê dest pê dike. Mêrikek pîrewokeke  
(Fatik) deh salî direvîne û şûjînekî kincên wê ve derbas dike da ku ji dest wî neçe. Û dema  
ku pîrewok mezin dibe jî bi lawikê xwe re mehr dike. Rêzebûyera duyem de jî Fatik zariyê

wê dibe heft salî û Fatik ji lawê xwe re dibêje: “Vî hesinê vê dera mi da kaş ke.” Lawik jî wekî wê dike û Fatik direve. Diçe nava behrê. Lê ew êdî ji aliyê Pîrewokên din ve nayê qebûlkirin çimkî ew di nav mirovan da jiyaye û qedexe bi zordariyê be jî hatiye binpêkirin. Fatikê dikujin.

Di vê çîrokê de em rastî ev her sê kesayetên tî: *Leheng* Fatik e. Xirabî li wê tê kirin. Ya ku tê revandin ew e. Daxwaza filitînê di wê de heye. Ya ku direve û dimire ew e. *Êrîşkar* di vê çîrokê de mirovê ku Fatikê direvîne ye. Ew Fatikê bi zordarî direvîne û dixê nav mirovan. Dîsa bi lawê xwe re bi zordarî mehr dike. Pîrewokên bin behrê jî di dawiya çîrokê de wek *êrîşkar* derdikevin pêş. Çimkî ew jî Fatikê dikujin. Wek *alîkar* jî lawikê Fatikê derdikeve pêş me. Ew diya xwe ji şûjinê xilas dike û dibe sedema filitîna diya xwe. Di vê çîrokê de em tevgerên çar kesayetên dibînin. *Bexşger, şandyar, lehengê derewîn û prenses* di vê çîrokê de cîh nagrin.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: ↑, A, B, C, K, Rs, A,

### **2.1.8. Analîza Çîroka Bi Navê Mihemedşah**

#### **Rêzebûyer – I**

1. Go gundek hewû. Go ê li ber çemekî da wû. Go ê ip î issiz bû. Go lawikekî malikekê hewû û go şeş keçikê xwa hewûn. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α)**
2. Go lêwik li keçikekê hez dikir. Go çito kir, gotin: “Tu yê feqîr î em nadine we, tu gavan î em nadine te keçikê.” Lawik heft sala li hêviyê ma. Wir keçik nedanê. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>)**
3. Wê derê jî salê carê gemîyak tê. Pê ra diwên gemiya salê. Salê carê gemî hatiye, salekê çûye, salekê jî vegeyriyaye. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
4. Rawû lêwik têra şeş miha xwarin marin xwarina xwa ya gî hazir kir û gemiya salê mezin e, li gemiya salê siwar bûn û çû... **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti Hêma: G<sup>2</sup>)**
5. Firtinak rawû, ser raketin, gemi hêl diwûye. Ê ku ketin avê, aman aman, aman... Niva hindik maye ku herin bi şûna xwa gê. A vana raketin rawûn ku sê çar textê gemiyê tenê mane û vana li ser çel meri maye li hezarî. Rawû gîya kincê xwa danîn. Korika xwa şidandin û ajnê kiriiin kiriiin, çel lê maye. Çûne wê hêlê her hinik bi çiyakî ketin, bana

hev kirin û yekî go: “Bajarek têye xanê ye.” Go: “Çira têne xanê.”: Bi ro ye. Go bajarekî şên e. Bana hev kirin, ditirsine jî. Gî çiya ne banî ne. Dereka xerîw e. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

### **Rezebûyer – II**

6. Nav bajêr viz diwîne ku go halla halla, go nee îsanek lê heye, dukanê vekirîne, maxazê vekirîne, xaniyê vekirîne, mal gî heye. Her tişt heye û îsanek lê tine. Qûlek lê tune. Go va tişteke vî bajarî da bûye. Go: “Em ê çito bikin?” Her tişt pir e, bajarek e û kesek nemaye. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>6</sup>)**

7. Yekî go: “Ez ê îşev, ez ê bipê.” Yanê ez ê nowetê bipê. A rawû li ber qêpi sikinî, ê di jî gî yê xêni da tirsira ra gî di xaniyakî da raketin. Xof digrine. Dên va çito bajarî şên e, her tişt pir e dê çima îsanek lê tune ye. A vana radikevin û radiwin ku şûr ê li wê ortê yê hevalê wan tune ye. Vir da digerin wê da digerin, derekê nawûnin. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup>)**

8. Riya din yekî din. Gî tev rûniştin. Heta dudu, sisiyaan. Giya go xewa me têye îşev tişteke tune ye. Siwe da dîsa rawûn ku şûr î li wir e lawik tune ye. Riya din dîsa rawûn ku şûr ê li wir e û lawik tune. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup> -Xerabî tê dubarekirin-)**

9. Çar man. Çar man. Go: “Em ê çito bikin?” Go: “Wîne em ê îja dudu bipên.” Rawû duduya pa. Devê qêpi pa. Xwadêyooo! Dî ku di şefaqê ra mîna du lokiza hat hîve hîvek lê têye. Ku dêwê heft serî ye. Çavê xwa mîna lokisa vêketine. Ê mîna qaymonekê ye. A rawû hat. Ku bîna însên li ku tê ye wira nas dikiye. A hat ku çito hema ku wana daqultandin û vana bi şopê ketin û ma kê dêw çokin? Dudu man. Mihemedşah û hevalekî man. Vana çûne ser xêni. **(Pênase: Destpêkirina Çalakiya Dijber, Hêma: C)**

10. Go: “Wîne.” Go: “Em sê çar şûra ku hat em dîr va bavinê şalê li çav mava kete ku em dîra isti misti jêkin.” Î mezin e, pir î mezin e. Rawûn çûn ser xêni, tew neketine cîya. Xani ye ku î bilind e çî ye nizanime. Jêr mara gî dar û ber e. Go em ê herin ser xêni go wê da hat ku hînî li ku ye? Van şûr mûr avitnêkê, şûr çû bi çava ketin. Çava da çit bûn. Çit bûn. A vana çûn, bi şûra bi ser ketin. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>1</sup>)**

11. Kuştin, heta siwê hîve hîvek li wî dêwî haaat. Go xirç xirç quliwî ser wî dar û ber î. Gî dar in di bin da dişkêne wiqa ku î mezin e. Bajarek gî wî xwariye. A rawû çûn. Siwê zikê wî dêwî qeşartin, qelaştin ku hevalê wan gî tûmî yî tê da ne. **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>1</sup>)**

### **Rêzebûyer – III**

12. Xwa re îja çûn serekî bajêrê dini. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**
13. Ê go: “Bira qe tişt gî hewe.” Go: Em kê çokin?” Go: “Taliya xwa em bêkes in, vê derê ne. Em ditirsine, xofê zikê me dê.” Bi hev ra gotin. Navê yekî Ahmedşah e navê yekê jî Mihemedşah e. Go: “Xovê di zikê me dê.” Go: “Em kê çokin bira qe malê dinê gî e me we.” **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**
14. Dîn ku pîrewok li dora çê m hene. Yanê wan jî însan in, keçik in, jin in, hîn ê çûçik in, ê gir in. Xwa ra şembîloka kom dikine. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
15. Go şalê me her yekî yek li vana xwa ra bigirta, baniyana li xwe mer kirana. Rawûn çûn nîzika ferêt dî ku wana li wê derê hene. Riya dini îšta çûn ewek girtin û şûjin tê ra kirin. Hinik mewûj birin. Li wa dera li mewûja pir hez dikin. Dê: “Mowûj mowûj mowûj.” A li wa dera mewûj reşandin û kortek hanî kolan a darik marikê zirav, gîha mîha dane ser çilo milo. Wext çû. Deng bi wan ket. Bi pîrewokan. Go: “Mowûj mowûj mowûj...” Ê çîplax in a eynî jin in wana jî jinê ferêt in. Pîrewok, pê ra dên pîrewok. A rawûn ketine çelê û ketine çelê. Pîrewoka mewûj kom kirin û xurp û sê çarek ketine çelê. A ketine çelê vana her yekî yeka xwa metîn pê girt. Vana zanine ku pîrewok li şûjinê ditirsin. Her yekî ewaka xwa li maxazê rakir û şûjineka xwa rakirin, tê rakirin. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>1</sup>)**
16. A pir çû hindik çû. Her du jî hamîle bûn. Yekê keçikeka xwa yekê lawikekî xwa bû. A rokê, dudu, sisê; salek dudu çûn. Cardî ya Mihemedşêh zari hewû. Zariyekî xwa hewû, bû du zariya. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
17. Ê dinê go: “E, kê jinika xwa rakim herim.” Wî go: “E nê m.” Niva e wê hêlê nawûnim. Va qîherî hat. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**
18. Jinikê îllam elimî zimanê wê şorê wê. Go: “Tu yê îllam vê dera min ra vê kaş kî.” Şûjino tê ra kaş kir. Çend riya gudarî kiiir. Dî ku nariye. Li zariyê xwa hez dikiye. Keçik û lawikeka xwa heye. **(Pênase: Destpêkirina Çalakiya Dijber, Hêma: C)**
19. Go: “Îllam haydê em herine ber çê m kinca û seriyê xwa bişon.” Go: “Em kinca fînine gemarî dikine çê dikine. Xwarin pir e, sawûn pir e em kê herine ber çê m çi?” Lawik tim ditirsiye. Diwê: “Na welle.” Diwê em ê îllam herin em kê xwa ra herin ber çê m kêyfê.” Lawik çito dike çarê lê nawûne. Hinek tişt miştê xwa digrin û her du zariyê xwa yî çûçik digrin û cardin jî ê hamîle ye ro miha ne. A derine ber ferêt. **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)**

20. Derine ber ferêt, xwa ra li ber ferêt kirriin, xwariin. Dî ku bi zimanekî şora dikiye, ê bin ferêt ra şora dikiye. Meri meriyê xwa re şora dikiye. Lawik çû metîn pê girt û li hindê rûnişt. Go: “Tu çi bi mi digiriye?” Go: “E li te ditirsime.” Go: “Metirse.” Go: “Yek, dudu, sisê.” Go: “Sê zariyê mi hene.” Go: “Tu çima ditirsîye?” A lawik, wa berda bi derdê tişta da ket bi zariyê xwa list. **(Pênase: Xapandin, Hêma:  $\eta^3$ )**

21. Lê nîrî ban kir, go: “Mihemedşaaahh!” Go: “He li mi binêre.” Dî ku ê li orta ferêt e. Zariyakî xwa li piyê xwa kiriye, a ê hamîle ye, zariyak jî li hinda lêwik maye. **(Pênase: Alîkarî, Hêma:  $Rs^1$ )**

22. Carê xwa li bin avê va kir rawû. Cinazê lêwik bi ser avê ket. Wê ku li kola xwa kiriye. Cardin xwa bin va kir dî ku şîrîta por bi ser ket. Seri serjê bûye bi laşê xwa va. Seri bi ser ket. Go: “Mi kir tu meke, ley!” Go: “Tu çima li mi ha dikîye.” Ê bin ferêt wa kuştin. A wa kuştin û lêwik jî serê xwa girt û çû. **(Pênase: Cezakirin, Hêma: U)**

Dema ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Mihemedşah’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

- I.  $\alpha, a^5, \S, G^2, \S$
- II.  $a^6, (A^{14})^2, C, H^1, J^1$
- III.  $\uparrow, a^1, \S, A^1, \S, \downarrow, C, (\eta^3)^2, C, Rs^1, U$

Di çîroka bi navê Mihemedşah de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Ev çîrok dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J heye” yê. Di vê çîrokê de bûyer li pey hev hatine.

Di rêzebûyera yekem de Mihemedşah diçe welatekî din. Bi keştiyekî ve rêwîtiyê dike. Bahozek radibe û keştî dikeve bin avê. Lê bi tevî wî çil kes li ser textên keştiyê dimînin. Ew avjêniyê dikin û digihîjin bajarekî. Di rêzebûyera duyem de dêwek her şev tê nobedarên wan dixwe. Herî dawî Mihemedşah û Ahmedşah dimînin. Ew jî wî dêwî dikuvin. Di rêzebûyera sêyem de her du diçin aliyê din ê bajêr. Li wir du pîrewokan digrin û li xwe mehr dikin. Piştî wextek dirêj zarokên wan jî dibin. Ahmedşah vedigere mala xwe. Mihemedşah li wir dimîne û dawîya dawî Pîrewok ji dest wî xwe xilas dike. Lê diçe nav behrê him zarokê xwe dikuje him jî pîrewokên bin avê wê dikuvin. Ev jî ji bo Mihemedşah wek cezayek e.

Di vê çîrokê de *Leheng* Mihemedşah e. Ew dikeve rêwîtiyê û bi êrişkar re şer dike. Lê di rêzebûyera sêyem de ew wek *êrişkar* di çîrokê de rol digire. Çimkî ew bi zordariyê

ve pîrewokê digre û bi zordarî bi wê re dizewice. Ango Mihemedşah di vê çîrokê de xwedî du rolan e. Dîsa wek *êrişkar* dêw jî di rêzebûyera duyem de cîh digire. Dêw mirovan dixwe û hevalên Mihemedşah dixwe. Ahmedşah jî wekî Mihemedşah pîrewokan digre û ew jî di rêzebûyera sêyem de wek *êrişkar* cîh digire. Ew ji ber ku bi Mihemedşah re li hemberî dêw şer dike wek *alîkar* jî rol digire. *Bexşger, şandyar, lehengê derewîn* û *prences* di vê çîrokê de cîh nagrin.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: a, G, A, C, H, J, ↑, ↓, Rs, U

### 2.1.9. Analîza Çîroka Bi Navê Masîyê Kesk û Hişin

#### Rêzebûyer – I

1. Dê zemanekî padîşahê hewûye. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α)**
2. Dê padîşah nexweş bûye. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>)**
3. Dê tixtora gotiye: “Masîyê kesk û hişin heye di dêniz da.” Dê: “Ku tu wî bixwî, xwûna wî bixwî.” Dê: “Tî rihet bûwî.” **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
4. Diwê radiwûn derin. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**
5. Ê law tora davinê. Digrin. Diwê lawika xwa diwê wa bala xwa didê ku masiyekî xwaşik e. Dê: “Law, welle va gune ye law.” **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>4</sup>)**
6. Welle masîci tê diwê: “Padîşah, Xwadê imrekî te de.” Diwê. Dê: “Me hat, me girt lawê te jî girt, avit nav ewê. Nehîşt ku em te ra bînin, werin. Gotiye welle, heyf e wa yî xwaşik e, masî bira ew newe.” Diwê masî digre, berdide cardî nav ewê. **(Pênase: Qasidî, Kêlîya Derbasîyê, Hêma: B<sup>6</sup>)**
7. Ku wir diwê şunda va dê: “Lawikê min, mi ra î xaîn e, ê heze ke bimirim ê şûna min padîşah be.” Dê lawê xwa ewladlixiyê da dixîne, dê: “Hadê tu ku da deriye here.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>9</sup>)**

#### Rezebûyer – II

8. Mihemed dere dere mîna ku here here dê balê çatereyekê ye. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti Hêma: G<sup>2</sup>)**
9. Dê balê xwa yekî hat. Go: “Silameleykum, aleykumeselam.” Merheba, xoş bêş. Go: “Navî te çiye?” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>2</sup>)**

10. Go: “Navî mi Ahmed e.” Lawê padîşêh jî navê xwa Mihemed e. Dê: “Tu kê ku da herî?” Dê: “Welle hal meda durumeka mi yê hanî ye.” **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>2</sup>)**
11. Gotiye: “Hadê em bi xwe ra heval bin. Em birê hevûdin e.” **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>9</sup>)**
12. A Mihemed radikeve, a va jî bala xwa didê di dûr da çirak xanê dikiye. Xanek e. Va xwa li wî aliyî da digre û dere. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: †)**
13. Dere bala xwa didêkê ku dêwekî du keçik girtine. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>1</sup>)**
14. Go hema radiwe wî dêwî dikuje. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>1</sup>)**
15. Dêw dikuje. Wa keçika ra diwê çî? Diwê: “Welle vî em revandine hanîne vê derê.” Dê bala xwa didê ku dawîya ew ê da tiji zêr e. Dê: “Hûn li vir bin.” Dê: “Ku em vegeê hatin, em ê we jî bi xwa ra wînin, werin.” **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>1</sup>)**

### Rêzebûyer – III

16. Diwê derine bajarekî berê otêl motêl tunewûn xan hewûn. Hespa xwa diwin xanekî. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: †)**
17. Ew mewê xwa li wir datînin. Diwê Mihemed bala xwa didêkê keçikek, keçika padîşêh diwûn e. Dilê xwa dikevê. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**
18. Va radiwe hevalê xwa ra diwê. Ahmed dê: “Mada wirge dora ew ê ra viz be viz be viz be.” Diwê: “Li wir bimîne ku te ra çî avit tu bigre were.” Dere viz diwe doş diwe dor qonaxa padîşêh ra. Diwê keçik ha teqê ra mêze dike. Diwê peleke xasa berdide. **(Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>2</sup>)**
19. Ahmed gotiye: “Temam.” Dê: “Va yê gotiye ku êvarê were xas baxçesiyê. Em bi wê de re hevdu gên.” “Wirge?” “Erê.” Diwê: “Temam.” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>2</sup>)**
20. Diwê Mihemed derî ranekeve haa. **(Pênase: Karê Dijwar, Hêma: M)**
21. Mihemed dere xas baxçesiyê, bala xwa didê ku bavo, law avek deriye, baxçekî xwaş. Yataxekî li wê derê ye. Dere ser yataxê, qirt û ranakete. Radikeve, va keçik tê vir da viz dike, wê da viz dike bi xwa nahese. Dê: “Va çito bûye? Va natiye?” Dê: “Tu raketî ni?” Diwê: “Erê.” “Bimbarek.” Diwê: “Merî radikevî? **(Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N – encama neyênî ya fonksiyonê)**
22. Dê dere. Ahmed ra diwê: “Va gula daye ber serê min.” **(Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>2</sup>)**

23. Ahmed dibêje: “Tu çi ye li wê derê raketiye, keçik hatiye tu ranewûye, gotiye bira were baxçê gulan.” (Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>2</sup>)
24. Va îjar dere baxçê gulan. Dere wira, dimîne dîsa dere radikeve. (Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N – enf.)
25. Keçik îjar çotek kaw dike berî. A va ku tê dê bala xwa didê cotek kawî di beriyê dê. (Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>2</sup>)
26. Dere Ahmed ra dê: “Va dane mi.” Ê diwê: “Tu çûye raketî keçikê gotiye tu mi ra niva nawû. Here xwa ra kaw bilîze. Tu çi şopa min ketiye?” (Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N – enf.)
27. Dê: “Here viz be.” Cardi dişîne. Dere viz diwe viz diwe, viz diwe viz diwe keçik bala xwa didê ku dîsa du pelê rihana ber dide. (Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>2</sup>)
28. A va tê diwê: “Ez ê herim.” Dere Ahmed diwê: “Tiliya xwa birîn bike û xwêy bike ku tu ranekevî.” A va tiliya xwa birîn dike xwey dike û dere. (Hêmana Peywendiyê-Ş)
29. Bala xwa dayê ku keçik hat. (Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)
30. Hatine hinda hevu dini. (Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N)
31. Go: “Em çito bikin çito nekin?” Go: “Îşte tu here ez ê şûr li vê dera texim.” A tu niva here malê. Şûr li keçikê dixê. (Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>1</sup>)
32. Keçik dere malê. (Pênase: Veger, Hêma: ↓)
33. A vana tèn diwên: “Haho haho...” dên. Diza hatiye ew ê me li hinda xanê, barê meyê zêran, çi tiştê me gî birine û dikine qîreqîr. A va gî tèn korime morimê padîşêh gî tèn diwên welle me yek birîn kiriye, diwên: “Em dizê xwa nas dikin.” (Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)
34. Ê dên: “Madam hûn dizê xwa nas dikine werin viz bin, werin viz bin.” Viz diwin doş diwin, mal bi maaal. Diwê mala padîşêh dimîne. Dên welle mala padîşêh nawe. Padîşêh diwê werin mala mi jî mêze kin. (Pênase: Tevlî Tawanê Bûn, Hêma: θ<sup>1</sup>)
35. Derin mala padîşêh mêze dikin ku diwê: “Mi şûr li niga xistiye.” Bala xwa didinê ku keçik birînkirî ye, nigê wê birînkiriye, şûr lê xistiye. A gotiye: “Welle dizî mi vaya ye. Dizî me ye.” (Pênase: Naskirin, Hêma: Q)
36. Dê: “Mada wirge wîne em ê veşêrin. Diwê em ê darxin.” Ahmed gotiye: “Na, birakî mi heye hûn ê bidine birê mi.” (Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup> -enf.-)
- Tîne tê a didine Mihemed. (Pênase: Zewicîn, Hêma: W<sup>0</sup>)

### Berdewamiya Rêzebûyera Yekem

37. Dê: “Welle padîşah.” Dê: “Ku tu emrê me bikî.” Dê: “Em ê herin, em ê herine memleketî xwa.” Ahmed û bi wî va tîn. Tîn a derin wa her du keçikê ku li dest dêw filitandûn jî tînin. Diwûne sisê. Li wê derê ku çiqasa zêr jî hene gî bar dikin û tîniin.

**(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

38. A tîn tîên, a wî, cî ku Ahmed hatiye digên wê derê. A dê: “Birawoo, em li vê derê em dikê niva li hev veqetin.” **(Ji hev veqetîn: <)**

39. Dê: “Le va keçika?” Ahmed dê: “Bira ê te wîn.” Diwê: “Ez wa masîya me.” Diwê: “Te heyata mi xilas kir. Mi jî te ra va însanetiya kir.” diwê. Diwê: “Mada wirge.” Diwê hinek xwîna xwa didê diwê: “Biwe, bide bavê xwa.” Dê: “Bavê te yê î rihet bûwe î te jî ef bike.” **(vegûhestina objeyekî diyarker: s)**

40. A Ahmed dere. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

41. Dê “Padîşah mi te ra îlaca te haniye. A dê: “Vê xwînê hewkî vexwe.” Diwê: “Tu yê rihet bûwî.” Çito dixwe rihet diwe. Ku rihet diwe dê: “Oxil mada ku te dermanê mi hanî mi rihet kir, mi jî tu ef kirî.” **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>4</sup>)**

42. Radiwe wa her sê keçikana jî lê mer dike. **(Pênase: Zewicîn, Hêma: W<sup>0</sup>)**

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Masîyê Kesk û Hişin’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, a^5, \S, \uparrow, E^4, B^6, A^9, \downarrow, <, s, \downarrow, K^4, A^{13}, W^0$

II.  $G^2, D^2, E^2, F^9, \uparrow, A^1, H^1, J^1$

III.  $\uparrow, a^1, I^2, B^2, M, N, I^2, B^2, N, I^2, N, B^2, \S, \uparrow, N, I^1, \downarrow, \eta^3, \theta^1, (mtv.), Q, W^0$

Di çîroka Mihemed û Masî de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Di çîrokê de bûyer li pey hev nehatine. Piştî rêzebûyera sêyem êdî ji bo rêzebûyera yekem encamek tê vegotin. Di serî de çîroka rêzebûyera yekem xilas nabe.

Di rêzebûyera yekem de padîşah nexweş dibe û ji wî re masiyek hewce dike ji bo ku ji nexweşiyê xilas bibe. Lê lawê wî masî diavêje avê û padîşah wî diqewitîne. Di rêzebûyera duyem de jî hevaltiya Ahmed û Mihemed tê vegotin û ew du keçikan ji dêw xilas dikin. Di rêzebûyera sêyem de dilê Mihemed dikeve keçika prensesê û Ahmed jî alî wî dike ku bi wê re bizewice. Heta vir hemû bûyer li pey hev tîn. Piştî Ahmed ji Mihemed re dibêje ez masî me. Xwîna min bigre û biçe. Ahmed diçe û xwînê dide bavê xwe û bavê wî wî efû dike. Ev jî dibe encama rêzebûyera yekem. Çimkî bavê Mihemed hê nexweş e û hewcedariya wî bi xwînê heye.

Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de hem cotê H-J hem jî M-N heye.” yê.

Di çîrokê de *leheng* Mihemed e. Hemû bûyer li derdora Mihemed de derbas dibin. Wek *êrîşkar*, di rêzebûyera yekem de Padîşah rol dilîze. Ew Mihemed diqewitîne. Di rêzebûyera duyem de jî dêw wek *êrîşkar* xuya dike. Dêw jî du keçikan digre û bi Mihemed re dikeve lecê. Di vê çîrokê de *bexşgêr* di rêzebûyera yekem de Mihemed e. Mihemed di çîrokê de xwedî du rola ye. Di dawîya çîrokê de ango di berdewamiya rêzebûyera yekem de *bexşgêr* Ahmed e. Ji ber ku Mihemed masî (Ahmed) ji mirinê xilas dike ew dikeve dirûvê mirov û him alîkariya wî dike him jî xwîn a xwe dide wî ku bavê wî, wî efû bike. Ahmed di rêzebûyera duyem û sêyem de wek *alîkar* jî rol dilîze. Ew bi Mihemed re rêwîtiyê dike û çî xirabî tîn pêş wî alîkariya wî dike ku jê xilas bibe. Dîsa bi saya wî Mihemed bi keçika padîşêh re dizewice Di vê çîrokê de *şandyar (hinêryar)* di rêzebûyera sêyem de derdike pêş me û ew jî Ahmed e. Çimki dema ku Prensê ji Ahmed re nîşanên taybet dide (wek gul, kaw û hwd.) Ahmed dibêje ew tîn çî watêyê û wî dişîne cihên ku keçik nîşan daye. Em dibînin ku di vê çîrokê de Ahmed xwedî sê rola ye. *Prensê* jî keçika padîşêh e û Mihemed di dawîya çîrokê de bi wê re dizewice. Di vê çîrokê de *lehengê derewîn* tune ye. Ev çîrok di nav şeş kesan de belav dibe.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: E, B, A, G, D, E, F, ↑, H, J, I, B, M, N, ↓, Q, K, W

### 2.1.10. Analîza Çîroka Bi Navê Padîşahê Diz

#### (Çîroka Yekem) Rêzebûyer – I

1. Diwê rokê padîşahê hewûye. (Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α)
2. Diwê bi şev gotiye ez jî herime diziyê. Kincê xwa, li xwa dike û dere. (Pênase: Veguherîna Dirûvî, Hêma: T<sup>3</sup>)
3. Diwê derin fitikê lê dixin, wir lê dixin, wir lê dixin. Dê sê meri tîn Diwên teva wî diwine çar. (Pênase: Nîşana Taybet , Hêma: I<sup>3</sup>)
4. Nizanine ku padîşah e. (Hêmana Peywendiyê-Ş)

5. Diwê derine, dên: “Em çi bidizin.” Dê derin pezekê diwûnin. Diwê kar bûye. Diwê tînin, dên: “Bavo tu ê nihû yî.” Dê: Tu yê nihi yî.” “Erê.” Dê: “Bira va ê te we, tu biwe here xwa ra va yî bixwa.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>5</sup>)**

6. Ê dê: “Wîne em hunerê hev û din bên.” Yek dê: “Welle.” Diwê: “Ku ez herime malekê ku ez Tiştêkî wan bidizim ke ser vê malê tiştêkî bixwim e nêlim ku wa tişta here. E tiştêkî wan nawim.” Go î di jî diwê: “Ku ke carê meriyekî bûwunim, bi şev ke çavekî va biwunim ku ew xwa bipêçe jî ez wî nas dikim.” Dê ê di jî dê: “Welle ku ez zimanê heywên zanim.” Dê ku: heywan ku çi bê ez zanim.” Padîşah jî diwê: “Ez jî meriya li îdamê xilas dikim.” **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>6</sup>)**

7. Dên ku: “Hadê kem herin xezîna padîşêh wekin.” Diwê: “Hadê kem herin.” Diwê derin. Tiştêkî lê dixin derin. Diwê derin. Diwê ku siwê xezîna padîşêh vewûye. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>5</sup>)**

#### **(Çîroka Yekem) Rezebûyer – II**

8. Diwê temsîlen sax wezîr dere, beriya xwa tiji dike dertê, sol wezîr dere beriya xwa tiji dike dertê. Vî hesawî general derin. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

9. Dê dizî belli ye. Çû girtin hanî hatin. Birin çûn ku darda kin. Dê we vekiriye. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup>)**

10. Aman vir da wê da. Diwê padîşah ewêki li xwa dike dere. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**

11. Dê lê mêze dike. Dê te dî çavê xwa yî mîna ew a ne. Dê: “Te go e kanim we xilas kim.” Ew ê ku meriya nas dike. Dê wê çaxê ku çûn dê kûçikek dê ban dike, dê: “Padîşah çi yê bênamûs e, deriyê diziyê malê xwa.” La va diwê: “Hilla hilla va padîşah diwe?” **(Pênase: Naskirin, Hêma: Q)**

12. Dê radiwe ku dere. Diwê: “Bavo ez şehîd im vana ne dizê min in.” **(Pênase: Îdîayên Bêbingeh, Hêma: L)**

13. Padîşah Dê: “Kê pêşiyê çûye diye?” **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>2</sup>)**

14. Dê: “Sax wezîr.” Dê: “Sax wezîr were.” Dûra dê: “Sol wezîr.” Dûra tê, dê: “Beriya van tev din.” Bala xwa didin ku zêrê di beriyan wan dê. A diwê: “Dizê min vana ne.” **(Pênase: Îdîayên Bêbingeh, Hêma: L)**

15. Dê raduwin, sax wezîr û sol wezîr dar da dikin. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: KF<sup>1</sup>)**  
**(Çîroka Yekem) Rêzebûyer – III**

16. A dê padîşah bana wan dike dê va merinê wir ê ciddî ne tîne xwa ra dike qorimê xwa. (mtv.)

17. Dê rokê birê wan î çûk te yî noweta wan dipêya. (Hêmana Peywendiyê-Ş)

18. Diwê bala xwa didê ejdiyak rawû ku padîşêh bigre. (Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>4</sup>)

19. Dê vî rawû lêxist ku ejdiha ye. Go xist go kete bin qarolî wî. (Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>1</sup>)

20. Padîşah bala xwa didê dê şûrek ser ra sikiniye. Aman aman, bana ew a dike. Dê: “Werin vî e kê bikuştama.” Dê: “Vî biwe herin.” Dê: “Vî dar da kin.” (Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup> -enf.-)

#### (Çîroka Yekem) Rezebûyer IV

21. Yaw birê xwa yî mezin diwê: “Padîşah Xwadê umrekî mezin bide te.” Dê: “Îfada wî bigre.” (Pênase: Fonksiyona Pêsin ya Bexşger, Hêma: D<sup>7</sup>)

43. Padîşah dê: “Ma îfada çi bigrim? Niva îfade îcaw nake.” Dê: “Mi dî kê bi şûr mi li mi xista. Niva îcawa îfadê nakê.” (Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>5</sup> -enf.-)

22. Ê çito ber digere, qewûl nake. Dê: “Padîşah?” Dê: “Çiye?” Dê: “E kê te ra meselekê biwêm a dûra dîsa bi dar da ke.” (Hêmana Peywendiyê-Ş)

#### (Çîroka Duyem) Rêzebûyer – I

1. Dê: “Padîşahek hewûye.” Dê: “Papaxanekî xwa hewû ye.” (Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: a)

2. Dê: “Rokê bala xwa didê papaxanê xwa wenda bûye. (Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>6</sup>)

3. Wenda bû. Çend riya wenda bû. Go hat bala xwa didê ku mawûna pençê xwa da du dendik hanîne.” (Hêmana Peywendiyê-Ş)

4. Dê: “Padîşah tîne tê wa dendika diçîne mezin diwe ku her yek sêveka pir mezin. (Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>6</sup>)

5. Dê: “Ku sêv dikevîne xwarê a va sêvekî tîne dike ku bixwe la dê he bise hinekî dide ew ê ku dimire.” (Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>7</sup>)

6. Dê: “Haaa a welle va soxa dijminê min e.” Dê radiwe serî papaxana digre û li hev va jêdike û çedike va dijminê min e diwê. (Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup>)

#### (Çîroka Duyem) Rezebûyer – II

7. Padîşahî seyîdvan bûye. (Hêmana Peywendiyê-Ş)

8. Dê: “Rokê dere seyde, kewê xwa hewûne.” (Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)
9. Diwê nê bi xwa ra diwe avê. Ku ava wî dirijê ku çî diwe. Nanê jî şor e ku dixwa qezewî dişewite.” (Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>)
10. Dê: “Bala xwa didê ku çiyakî ra av diqunitiye, tê ye çilk bi çilk. Va qedehekê dide ber ku tiji diwe dide kêw, kew nigê xwa lê dixê, serê xwa lê dixê dirijîne. Cardî wir dike, cardî wir dike. (Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: KF<sup>9</sup>)
11. A hema kewê xwa jî serjê dike dê va dijinê min e.” (Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup>)
12. Dê: “Dere jor. Bala xwa didê ku xenzîrek miriye. Qey royê daye ku wa donê wî ye. Haaa dê: “Welle mi bilheq va kewê xwa kuştiye. (Pênase: Derxistina Meydanê, Hêma: Ex)
13. Dê: “Ke herime malê dê ez ê herim wê sêvê bixwim bira ez bimirim. Wa sêva ku papaxana mi ra haniye hatiye.” (mtv.)
14. Dê: “Dere hema ku sêvê dixwe. (Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>7</sup>)
15. Dê ku ê pênçe şêşt saliyê, diwe penc şeş salî. (Pênase: Veguherîna Dirûvî, Hêma: T<sup>1</sup>)
16. Gênc diwe. Dê: “Haaa la welle mi bilheq papaxanê xwa jî kuştiye.” (Pênase: Derxistina Meydanê, Hêma: Ex)

**(Çîroka Yekem) Berdewamiya Rezebûyer IVan**

23. Go: “Padişah?” Go: “Tu jî eger tu vî darxî diwe ku tu poşman biwî. Îfada wî bigre, cardî bike.” (Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>7</sup>)
24. Ê dê: “Mada wirge em ê îfada wî bigrin.” (Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>5</sup>)
25. Dê: “Te çima ha kir?” (Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>1</sup>)
26. Dê: “Padişah.” Dê: “Wê çaxa ku ejdiha rawû ku te bigre, dê mi lêxist, mi ejdiha ku mer kuşt kete bin ew ê. Te jî niva dî te ew kir te firsend neda mi ke bên.” (Pênase: Agahî Berhevkirin, Hêma: ζ<sup>1</sup>)
27. Go: “Herin.” Derin bala xwa didinê ku bavoo di bin qarolîyê da heqet kuvaleka mêr e. Lêxistiye, kuştiye ê di bin dê. (Pênase: Derxistina Meydanê, Hêma: Ex)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Padişahê Diz’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

(Çîroka Yekem)

- I.  $\alpha, T^3, F^3, \xi, A^5, F^6, A^5$
- II.  $\xi, A^{13}, \uparrow, Q, L, \varepsilon^2, L, KF^1$
- III. (mtv.),  $\xi, H^4, J^1, A^{13}$ ,
- IV.  $D^7, E^5, \xi, D^7, E^5, \varepsilon^1, \zeta^1, Ex$

(Çîroka Duyem)

- I.  $\alpha, a^6, \xi, F^6, F^7, A^{13}$ ,
- II.  $\xi, \uparrow, a^5, KF^9, A^{13}, Ex, (mtv.), F^7, T^1, Ex$

Di vê çîrokê de çar rêzebûyer derdikevin pêş me. Di çîrokê de bûyer di rêzekê de nin. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê H-J heye” yê.

Di rêzebûyera yekem de padîşah bi dizan re dibe heval û xezîna xwe didize. Di rêzebûyera duyem de jî her sê hevalên ku bi wan re dizî dike ji mirinê xilas dike. Wan dike nobedarê xwe. Di rêzebûyera sêyem de yek ji wan padîşêh ji marekî difilitîne. Lê padîşah vê bûyerê xelet fem dike û dibêje ew dê min bikuşt. Fermana mirina wî dide. Di rêzebûyera çerem de birayê wî tê ji padîşêh daxwazê dike ku carekî guh bide wî ku zanibe ew çi kiriye. Padîşêh re çîrokekê vedibêje ji bo ku ew birayê wî guhdarî bike. Di vir de çîrokeke nû dikeve nav çîroka eslî. Piştî vê çîroka ku bira ji padîşêh re vedibêje padîşah guh dide ser nobedarê xwe û rastiye dibîne.

Di çîrokê de *leheng* padîşah e. Di rêzebûyera yekem de *êrîşkar*, jî padîşah e. Di *lehengê derewîn* jî padîşah e. Padîşah him ji dizan nasnameya xwe vedişêre him jî dema ku diz tèn dîyar kirin bi derewan hin kesên din wek diz nîşan dide. Ango em dikarin bibêjin ku padîşah xwedî sê rolan e. Rêzebûyera duyem de dîsa her sê dizên din jî ji ber ku xirabiyê dikin wek *êrîşkar* derdikevin pêş me. Di vê çîrokê de *alîkar* birayê dizê ku ji aliyê padîşêh ve fermana mirina wî tê dayîn e. Birayê wî bi saya çîrokê birayê xwe ji mirinê xilas dike.

Di çîroka ku bira vedibêje de jî dîsa *leheng* û *êrîşkar* padîşah e. Di wê çîrokê de *bexşger* tûtî û kew in. Çimkî tûtî objeya sêhrbaziyê ji padîşêh re tine. Kew jî wî ji mirinê xilas dike. Nahêle ku rûnê xênzîr vexwe. Di vê çîrokê de *prensês* û *şandyar* tune ye. Ev çîrok di nav pênc kesan de belav dibe.

Di fonksiyona “XVIan de *leheng* û *êrîşkar* di şerekî de derdikevin hemberî hev. (H) bin fonksiyonên  $H^1, H^2, H^3$  hene lê ev her sê jî li çîroka me nayên. Me li vê derê bin

fonksiyona  $H^4$  (Êrîşkar di rewşeke wisa de ye ku neşêt êrîşî leheng bike, leheng êrîşkar dikuje.) lê zêde kirîye. (Duran , 2019, r. 39)

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: T, I, A, F, ↑, Q, L, K, L, H, J, D, E, T, Ex.

## 2..1.11. Analîza Çîroka Bi Navê Mihemed û Keçika Padîşêh

### Rêzebûyer – I

1. Rokê padîşahek hewû ye. Keçik û lawikekî xwa hewû ye. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma:  $\alpha$ )**
2. Dê diya wan dimire. **Pênase: Dûrketin, Hêma:  $\beta^2$ )**
3. Padîşah dere dizewice dê dêmarî heqeretê li zariya dike.” **(Hêmana Peywendiyê-§)**
4. Dê dertên xwa ra derin şikeftê. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**
5. A Mihemed dere seyde, xwanga xwa jî li wir e dê tu nawê ku di dawiya şikeftê da mîna ewekî heye. Yekî tê daye ew niva îşbîrlîxî dikin. Ew û xwanga wê bi hev re diwûne. Dê ku Mihemed xewera xwa tune. Bi ro dere, bi şev tê radikeve. Bi ro dere wana xwa ra li hinda hev in. **(Pênase: Binpêkirina Qedexyê, Hêma:  $\delta^1$ )**
6. Dere seyde. Dê ku dere seyde, dê wê da tê, dê rêviyek tê ber e. Law dê: “Gune ye.” Kewekî çedikê. Dê ku dê va kewê xwa dixwe. Law siwe da bala xwa didê ku gurek hat. Cardin şêr hat, cardin hırç hat. Her heywanekî yek hat. Wî dayê niva heywanê xwa pir bû. **(Hêmana Peywendiyê-§)**
7. Dê rokê rêvi bala xwa didê ku Mihemed deriye vana tîn li ew ê dimînin ya dê em yek nowetê bigrin. Dê niva va mêrika li me mêze dikiye dê gerekî em jî wî ew bikin. Dê bala xwa didê ku haaa yekî zebelihekî ew û bi xwayinga wî ra bi hev ra ne. **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma:  $\epsilon^3$ )**
8. Dê radûwin tîn ew ê Mihemed çê dikin. “Te dî kewa didêye Mihemed.” Berê kewa xwa ra pê dilîstin ew dikiri. Dê kewî wî ne xwastin. Ha kirin vir da wê da. Dê gotiye: “La welle tişteke di vî heywanî mi da heye. Ecew çi heye?” **(Pênase: Nîşana Taybet, Hêma:  $\Gamma^3$ )**
9. Diwê: “Tê dê rêvi digre dere.” Dê bala xwa didê ku hoop zebelihekî li wir e. **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma:  $\zeta^3$ )**

10. Dê radiwe wî û xwanga xwa va dikuje. Dave ber wa heywana dixwin. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup>)**

### **Rezebûyer – II**

11. Mihemed cardi siwê radiwe dere, rêvi rûdine koşkekî çêdike. Dê: “Werin top bin.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>2</sup>)**

12. Bitune heywanan tên. **(mtv.)**

13. Heywan diwên: “Çima top bûn?” **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>2</sup>)**

14. Diwê: “Me xwayinga vî kuşt. Em lazim in vî ra jinekî wînin werin.” **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**

15. Rêvî dê: “Welle em ancax em pê re jinekê bînin. Em pê ra çarekî bûnin.” Dê: “Em ê herin nîzika gund.” Go: “Bira temsîlen du heyvan hêlet kevin. Temsîle îro xenzîr û bi fil a têkevîne gun cot bikin bira hirç jî toxim bireşîne. A em ê vanê di jî bireqîsin.” Go: “Teyr jî bira here li ser xaniyê mala padîşêh bisekine. A ku keçika xwa go ku ê bê heywan cot dikiye ku gîyê derêne derva werin, mêzekin. Ku keçik derket derva bira hema bira teyr rake wîne were **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>1</sup>)**

16. A vana bi wî hesawî dikin. A vana cot dikin. Hinek toxim direşînin. Heywan in îşte her yek bawetekî ê çûk jî xwa ra direqîsin. Teyr jî dereee li ser xaniyê ew ê dê teqereq dike. Dê: “Law werin heywan.” Dê: “Heywan cot dikine.” Dê berê cot hewû. Dê ku mîllet gî dertê. Dê keçika padîşêh dê: “Ez jî herim.” **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)**

17. Dê teyr hema hat, tery digre û yalla. Dê tîne tê. Dê vana bala xwa didinê ku teyr tîne tê. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, Hêma: G<sup>1</sup>)**

18. La vana derine hinda Mihemed ku Mihemed wan ra kewa tîne davê law kewê xwa va dilîzin. Law diwê teyrî wî yê mîna jeta heya diwê jor ber dide, xwa bera ser dide kewê xwa digre. Wir bi neşekê tê. “Law welle” dê: “Îro va heywanê mi da tiştêk heye. Keyfa wan î xwaş e.” **(Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>3</sup>)**

19. Dê bala xwa didê dê bavoo ku pê ra jinîkek hanîne. Ê welle rind e. Niva jinîk, tamam jinîk xwa ye. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>1</sup>)**

### **Rêzebûyer – III**

20. Law padîşah radiwe ku keçika xwa tunê. **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>4</sup>)**

21. Diwê pîreka cadû (dê berê cadû hewûn tey bi kup mûpa diçûn law mîna ku ê sehirbaz bûn) diwê dere bi çî filimê diwe, dê dere mala wan diwê bi wê filimê dê keçikê digre tîne. **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>2</sup>)**
22. Welle dê Mihemed ku siwê radiwe tune. Keçik tune. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**
23. Dê: “Welle cardî vî ew î xwa bikin.” Dê: “Bikin.” Teyr ra jî gotin: “Tu here ser xêni teperep ke. Eger ku dilê xwa hewû ku derket bigre wîne were, ku derneket jî yekî çarşiye bigre wîne em bi tev bin. **(Pênase: Nîşana Taybet, Hêma: I<sup>3</sup>)**
24. Tepetepê dike ê keçik jî niva qey li Mihemed hezkiriye. Ew jî dixwaze here. **(mtv.)**
25. Ku dertê hema digre û tîne. **(Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîfî an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîfî, Hêma: G<sup>1</sup>)**
26. A tîne tê welle padîşah niva fem dike ku wira ye. Padîşah eskerê xwa digre û dere diwê: “Ez ê bi çî hesawî we ez ê bi siwê lê bistînim.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>19</sup>)**
27. Law va rêvi bala xwa didê ku bavoo ku eskerek têye. Va ban dike, toplantiyê dike. Mihemed la feqîrî çî bike. Bi şexsekî tenê ye. Dê: “Gur here bana gura ke. Hirç bana hirça ke. Şer bana şêra ke. Fîl bana fila ke. Çeqel bana çeqela ke. Her kes bi qewmê xwa wînin werin.” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>14</sup>)**
28. Dê Mihemed siwê radiwe ku bavoo ku tu li heywanan. Dê teyra mîna jeta heye ya a pelê xwa berdane, ku çeqel in, rêvine, kêrgu ne ku çî hewûn wana jî gî vana gî ketine sirê. A go vana qarşiya hev sîkinîn. Diwê rêvi go, go: “Heyvanê çûk herin li ser mermiyê wan da bimîzin ku teqandin bira bi mermiyê xwa nê, niva neteqin.” Dê derin haşa ku ser wan da dimîzin. Vana hucûma hev dîkin. Dê teyr mîna ew ê dê bi serê wan da digrin bera jêr didin. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>1</sup>)**
29. Law padîşêh dî ku îş ê çîrûg e. Go dê: “Bavo bisekin.” Dê: “Çi ye?” Dê: “Em ê qewlekî xwa bikin.” Dê: “Bikin.” Dê: “Çi ye?” Dê: “Em ê herin keçikê re bên, eger keçikê Mihemed xwaaast a wî ye. Eger ku em xwastin hûn ê bi me din.” Diwe: “Nawe?” Dê: “Temam.” **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
30. Qey îlerî gelenê wan jî hene têne, derine hinda keçikê. Ku keçikê ra diwên: “Oxil?” Dê: “Tu me dixwazî, tu Mihemed dixwazî?” **(Pênase: Lêpirsîn, Hêma: ε<sup>3</sup>)**
31. Dê: “Welle bavo, ez Mihemed dixwazim.” A dê: “Temam.” Dê wa eskerê xwa dikşîne. **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>1</sup>)**
32. Mihemed dê: “Îjar ez ê van heywanan çito têr bikim?” **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>)**

33. Rêvi tê li wir top diwin dê: “Werin?” Dê: “Çiye?” Dê: “Her kes herin. Ku kîcax îcaw bike em ê cardin bana we kin. Go mêrik kane zikê we giya ter ke. Her kes herin.”

(Pênase: Qedexekirin, Hêma:  $\gamma^2$ )

34. A heywan derin. (Pênase: Binpêkirina Qedexeyê, Hêma:  $\delta^2$ )

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Mihemed û Keçika Padîşêh’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, \beta^2, \xi, \uparrow, \delta^1, \xi, \epsilon^3, \Gamma^3, \zeta^3, A^{14}$

II.  $D^2, (\text{mtv.}), E^2, a^1, B^1, \eta^3, G^1, \Gamma^3, K^1$

III.  $B^4, \eta^2, a^1, \Gamma^3, (\text{mot.}), G^1, A^{19}, B^1_4, H^1, \xi, \epsilon^3, J^1$

IV.  $a^1, \gamma^2, \delta^2$

Di vê çîrokê de çar rêzebûyer derdikevin pêş me. Di çîrokê de bûyer li pey hev tîn. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê H-J heye” yê.

Di rêzebûyera yekem de Mihemed û xwîşka xwe diçin şikeftê. Xwîşka wî bi mêrikekî re dikeve têkiliyê ew jî dema ku wê rewşa wan dibîne him xwîşka xwe him jî wî mêrikî dîkuje. Di rêzebûyera duyem de heywanên ku Mihemed xwe re kirine heval ji bo wî keçika padîşêh direvînin. Di rêzebûyera sêyem de padîşah keçika xwe bi sêhrbaziye tîne lê ew dîsa keçikê direvînin. Piştê padîşah diçe şer. Lê bi saya heywanan padîşah di şer de têk diçe. Dixwaze fikra keçika xwe bigre. Keçik jî êdî naxwaze ji cem Mihemed biçe. Padîşah jî êdî vedigere. Di rêzebûyera çerem de Mihemed nikare wan hemû heywanan têr bike û ew heywan jî vedigerin.

Di çîrokê de *leheng* Mihemed e. Lê di rêzebûyera yekem de wek *êrîşkar* jî rol dilîze. Di rêzebûyerên duyem û sêyem de jî *êrîşkar* padîşah e. Di vê çîrokê de *alîkar* heywanên Mihemed in. Bi taybet jî rovî ye. Çimkî kêmasiya keçikekê ji bo Mihemed ew ferq dike û dixwaze ji wî re keçikekê bînin. Gazî hemû heywanan dike ji bo ku şer bikin. *Şandyar* jî dîsa rovî ye. Ew heywanan dişîne ku prensesê bînin. *Prensês* jî keçika padîşêh e ku fonksiyona zewacê di derdora wê de tê xuyakirin. Mihemed bi wê re dizewice. Di vê çîrokê de *bexşger* û *lehengê derewîn* cîh nagrin. Çîrok bi taybetiyên pênc kesayetên ve hatiye honandin.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp dîyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in:  $\uparrow, I, A, D, E, a, B, G, K, H, J$

## 2.1.12. Analîza Çîroka Bi Navê Meryem û Natalî

### Rêzebûyer – I

1. Dê yek jî hewû ye. Navê xwa jî Meryem bûye. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α<sup>1</sup>)**
2. Diya xwa miriye. **(Pênase: Dûrketin, Hêma: β<sup>2</sup>)**
3. Dê bavê xwa jî çûye zewiciye. Keçikeke xwa jî hewû ye. Navê wê jî Natalî ye. Ê Meryem diya xwa nine, la dêmarî ye. Xwadê merhemet bike. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
4. Dê: “Amojinê, a hewikek burxur û rûn bide min. Gî derine qirşan e, ez jî bi erebê herime qirşan.” Dê: “Tu li ku herî qirşa wînî.” Dê ku mistek burxur û rûn didê. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>6</sup>)**
5. A welle ereba xwa siyar diwe û dere. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**
6. Dê ku dere dîk ban dike dê: “Qîqîrîqîqîîk, Meryem dikê wê da erebek zêr wîne were.” Dê: “Soxooo, nawê ku hestiyê wê ê wînin werin.”
7. Dê dere, qirşê xwa kom dike. Şikeftê li wir e dê xwa ra burxura xwa dide ser. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
8. Dê ku burxura xwa dixwe dê mişkek dertê. Dê: “Meryem, Meryem welle ez ê birçîme, welle tiştêkî bide min.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>7</sup>)**
9. Dê: “Kevçiyak e jî dê were rûne em tev bixwim.” Dê zîkê mişk têr dike. **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>7</sup>)**
10. Mişk pê ra diwê ku: “Meryemê ê niha hirçê were vira ê bê te ra şertekî mi heye.” Go: “Tî bê şertê te çi ye?” Go: “Ê bê were çavê min girê de. Eger ke te bigriim ez ê te bixwim, a ku te negrim, te newûnim jî a ez ê ereba te tiji zêr kim. Diwe nawe?” Go: “Tu pê ra bê erê.” Go: “Î zîlekî bi te de. Tu wî zîlî wînî werî bide min ez ê lêxim tu xwa ra here derva, rûne. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>9</sup>)**
11. Dê bala xwa didêkê ku welle hirç hat. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
12. Hirç go: “Welle şertekî mi heye Meryemê.” Go: “Were, çavê mi mezbût girê de. Ez ê zîlekî bi te dim. Tu zîl lêxe, a ke te bûnim ez ê te bixwim, ke te newûnim jî ez ê erebek zêr bi te dim. **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)**
13. Meryem diwê: “Welle diwe.” Dê: “Temam.” **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>)**

14. Va dere tiq riq lê dizî xwa lê dixê. Dê tep rep tep rep dere va qulikê ra berdide mişk xwa ra lê dixê. Ew viz diwe, viz diwe, xwa ra dere koşekî rûdine. Diweeee îndînî di hal da dikeve. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>2</sup>)**

15. Dê: “Meryemê were te qezenç kir.” **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>2</sup>)**

16. Dê Meryem dere çavê wî vedike û a ser ereba xwa tiji zêr dike. **(Pênase: Zewicîn, Hêma: w<sup>3</sup>)**

17. Meryem li erebê siyar diwe û dere mal. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

18. Dere nêzika gund diwe, dê dîk ban dike: “Qîqîrîqîqîmîk, Meryem erebek zêr tîne.” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasîyê, Hêma: B<sup>4</sup> -enf.-)**

19. Dê dêmarî wê lê hez nake, dê: “Kiş kiş, soxo.” Dê: “Nawê ku hestiyê Meryemê tê ye.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>9</sup>)**

Dê Meryem tê ber qêpi. Dê hatin ku ser tiji zêr e. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>2</sup>)**

## **Rezebûyer – II**

20. Diwê: “Siwe da qîza min ê here du erebe zêr wîne were.” **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>6</sup>)**

21. Ê, ê kul be jî, qandî leganek burxur, nîv kîlo, kîlok ji rûn didê. Dê: “Natalî yê here du erebe zêr bîne, were.” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasîyê, Hêma: B<sup>2</sup>)**

22. Dê ku dere ê çilek e. Şîva xwa dide ser. Ku dide ser dê mişk tê dê: “Natalî, Natalî!” Dê: “Kanî hewkeki bide.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>7</sup>)**

23. Dê ew ê li kêf dixê, dê: “Mi xwariye îja bidim te.” Dixwe, nade mişk. **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>7</sup> -enf.-)**

24. Hirç te diwê: “Were çavê mi girê de, e te biwûnim ez ê te bixwim. Ku te newûnim ez ê du erebe zêr bi te dim. **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)**

25. Go: “Diwe, diwe çima nawe.” **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>)**

26. A dê radiwe ku çavê wî girê dide. **(Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H<sup>2</sup>)**

27. Diwe tep rep tep rep û koşekî da hirp û digire. **(Pênase: Serkeftin, Hêma: J<sup>2</sup> -enf.-)**

28. Digire, dixwe. Hestiyê wê li ser erebê girê dide û diwe nizika gund û wedigere. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>14</sup><sub>17</sub>)**

29. Dê dîk ban dike: “Qîqîrîqîqîmîk” Dê: “Hestiyê Nataliyê tîne.” **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasîyê, Hêma: B<sup>4</sup>)**

30. La diwê: “Soxoo! Nawê ku du erebe zêr tîne.” Bala xwa didê ku ha gi tev e hev xwûn e. Hestî ne. A niva bi perinceka bi xwa dikeve. (**Pênase: Cezakirin, Hêma: U**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Meryem û Natalî’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, \beta^2, \xi, a^6, \uparrow, \xi, D^7, E^7, F^9, \xi, \eta^3, \zeta^1, H^2, J^2, w^3, \downarrow B^4 A^9, K^2$

II.  $a^6, B^2, D^7, E^7, \eta^3, \zeta^1, H^2, J^2, A^{14}_{17}, B^4, U$

Di vê çîrokê de du rêzebûyer derdikevin pêş me. Di çîrokê de bûyer li pey hev tên. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê H-J heye” yê.

Di rêzebûyera yekem de Meryem diçe qirşan û mişkek jê xwarinê dixwaze. Meyrem her çi qas xwarina xwe kêm be jî bi mişk re parve dike. Mişk jî alîkarîya Meryemê dike û Meyrem xwe ji hirç xilas dike. Bi zêran vedigere mal. Di rêzebûyera duyem de dêmariya Meryemê Natalîyê jî dişîne ku zêran bîne. Natalî xwarina xwe bi mişk re parve nake û di lîstoka hirç da bi ser nakeve. Hirç hestiyên wê dixwe erebê û dişîne gund.

Di vê çîrokê de di her rêzebûyerê de *lehengek* derdike pêş. Di rêzebûyera yekem de Meyrem di rêzebûyera duyem de jî Natalî *leheng* e. Di vê çîrokê de *êrîşkar* hirç e. *Bexşger* jî mişk e. Di rêzebûyera yekem de ji ber ku leheng tiştêkî dide bexşger ew leheng ji êrîşkar xilas dike. Lê di rêzebûyera duyem de leheng tiştê ku bexşger dixwaze naîne cîh û ew di lîstokê de têk diçe. Di çîrokê de *şandyar* dêmari ye. Ew Natalîyê dişîne ku biçe zêran bîne. Çîrok bi taybetiyên çar kesayetên ve hatiye honandin. Di vê çîrokê de *alîkar*, *prences* û *lehengê derewîn* cîh nagire.

Di çîrokê de fonksiyoneke wisa derdikeve pêş me ku di rêbaza Propp de cih nagire. Li gorî rêbaza Propp dawîya çîrokan bi zewaca lehengî yan bi xelatkirina lehengî xilas dibe. Lê di vê çîrokê de leheng dimire û ev jî dijî zewac an xelatkirina lehenge.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: a,  $\uparrow$ , D, E, F, H, J, w,  $\downarrow$ , B, A, K, U

### 2.1.13. Analîza Çîroka Bi Navê Gurî

#### Rêzebûyer – I

1. Zemanekê da guriyekî ap û amojina hewû. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α<sup>1</sup>)**
2. Guri a diya xwa û bavê xwa mirûn. **(Pênase: Dûrketin, Hêma: β<sup>2</sup>)**
3. Ber destê ap û amojina da mawû. Amojinê jî zalim bû. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
4. A mîna ku keçik diçûne îş mîş. Digo: “Guriyo tu yê jî va keçikana ra herî qirşa me ra bînî.” **(Pênase: Binpêkirina Qedexyê, Hêma: δ<sup>2</sup>)**
5. Amojinê radiwû nanê wan dikirê hinek danî û hinek av, a Gurî ra dikirê. Weris dida pista Gurî û dişande qirşa. Rawû Gurî bi wan re şand. **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>2</sup>)**
6. Digo keçika digo: “Guriyo, de rawe qirşê xwa kom ke.” Digo: “E kom nakim.” Digo: “We daniya mi xwariye, ava min vexwariye.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>5</sup>)**
7. Keçika digo: “Rawe qirşa kom ke. Tu çi qirşa top nakiye va gi baxçe ne o?” Na, rûdinişt, xwa dida erdê, xwa bi tişt dixapand, xwa bi qirşekê dixapand. Digo: “Welle me top kirine, em ê her yek hemêzekê pêra piştî wî kin û piştîyê wî li piyê wî din û bira wa pêş me de here em jî xwa ra li dû herin.” **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: KF<sup>1</sup>)**
8. Digo: “Xaltiyêke mi li vê derê heye.” Keçika ra nawê ku xaltiya min ê merxwûr e. Tu nawê ku pîr meriya dixuye. Keçika ra diwê: “Hadê em êvarê li mala xaltiya min bimînin. Derin mala pîrikê. **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>3</sup>)**
9. Gurî diwê: “Xaltiya min hûn çi dikin, hûn çi nakine?” Dê: “Mi hinek mêvan we ra hanîne.” Pîr dê: “Hiiii, oxxx welle.” Dê: “Wel wel wel wel welle ez ê vana serjê kim, bixwum.” **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>1</sup>)**
10. Keçik nizanine ku pîra merxwûr heye. Keçika ra diwê: “Hûn rakevin. Nan manê we hazir kiriye, bixwûn rakevin.” Dê: “E ranakevim aaa.” Dê: “E ranakevim.” Dê: “Guriyo çima?” Diwê: “Te di riya bavê xwa da riyo. Te çima negotiye pîra merxwûr e.” **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
11. Diwê: “Guriyê mi dayî, mayî kî payî?” Dê: “Welle daka pîrik ez payî.” “Ooo.” Dê: “Guriyê mi qey qisewatê te hene?” Dê: “Daka pîrik.” Dê: “Ma daka pîrik, şeva çûnê va çaxana diya me, me ra gûz dihanî, me ra kêsme dihanî, me ra her tişt dihanî.” Dê: “Gilêsê me dixwarin.” Pîrik dê: “Ez ê herim we ra bînim.” Dê: “Hûn gûza jî bixwun.” Radiwe, dere. Dikeve kufika gûza û kêsma digre û tîne. Cardini dê: “Dayî, mayî, kî payî?” Dê: “Welle daka pîrik ez payî.” Dê: “Şeva çûnê va çaxana diya me me ra qaz serjê kirin.” Dê: “Li sêlê dixist.” Dê: “Wîî! Gurîyê min hema bira mîna qaza be.” Pîr wir pê ra xizmet dikiye. Dere pêra qaza serjê dike. Dipûrtikîne. Sêlê datînin. Dere rûn mûnê xwa bi sêlê

dide. Wa qaz maza dišo hema tîne li sêlê dixîne û keçik dixwun. Cardi dê: “Dayî mayî kî payî?” Pîrê diwê. Gurî dê: “Dê welle daka pîrik ez payî.” Dê: “Şeva çûnê va çaxana, diya me bi embarê wir av di dêniz da me ra dianî.” Dê: “Oxil dê bira mina avê we.” Dere avê bîne. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>3</sup>)**

12. Dê: “Keçikno! Zû rawûn, kincê xwa li xwa kin. Tişteki xwa jî li şûna xwa mêlin.” Dê: “Piştîyê xwa bi pišta xwa xînin.” Dê: “Niva dinê ronik bûye.” Dê: “Hûn hema bi vê newalê kevin.” Dê: “Hûn niva filitîne.” **(Pênase: Alîkarî, Hêma: Rs<sup>1</sup>)**

13. Dê: “E nême.” Dê: “E kî hîn çî rengî bi serê wê bikim.” Keçik diwên: “Guriyo tu kê çî rengî bi serê wê bikî?” Dê: “Hîn pîr maye.” Dê: “Mi ku heyf li pîrê negirt birawe. Dê manga xwa heye, qazê xwa hene, lûqû xwa hene. Dê maleka malkirî dê kê mi ra bimîne.” **(mtv.)**

### Rezebûyer – II

14. Pîr tê ku keçik tunene, Gurî tuneye. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>1</sup>)**

15. Gurî radiwe xirarekî pêmi golikê pîrê dike xirêr. Diwê golik îçê xirêr da diwê: “Mooox.” “Hey te dî xwa mîna golika mi kiriye, xwa kiriye xirêr e.” Dê: “Te diye hele, soxoo.” **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>1</sup>)**

16. Dere hema wa li wê pêşiyê hucê kemberokê tîne. Dê: “Gurî xwa kiriye xirêr e.” A dere pîr tîne ser wî girarî da datîne. Êr vêdixe. Golik tê da dişewite. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup>)**

17. Pîrê radiwe ku here xêni ku av mavê bîne li ser golikê ke ku çito bike. A radiwe dere, ku pîr dere xêniye. Gurî lox li ser pîrê da berdide pîrê dikuje. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>13</sup>)**

18. A gurî dere gunde. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

19. Gurî dizewice û radiwe ap û amojinê xwa difilite. Dere maleke malkirî xwa ra tê da rûdine. **(Pênase: Zewicîn, Hêma: W<sup>0</sup><sub>3</sub>)**

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Gurî’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, \beta^2, \xi, \delta^2, B^2, A^5, KF^1, \eta^3, \eta^1, \xi, K^3, Rs^1, (mtv.)$

II.  $a^1, \eta^1, (A^{13})^2, \downarrow, W^0_3$

Di vê çîrokê de du rêzebûyer derdikevin pêş me. Bûyerên vê çîroke li pey hev tên. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê H-J û M-N tune” yê.

Di rêzebûyera yekem de Gurî bi keçikan re diçe qirşa komkirinê. Di vegeerê de Gurî keçikan dibe mala pîreke mirovxiwer. Pîr dixwaze wan bixwe lê Gurî wê dixapîne û keçikan dişîne gund. Di rêzebûyera duyem de Gurî dîsa pîrê dixapîne û wê dikuje. Mal û milkê wê hemû ji Gurî re dimîne û Gurî dizewice.

Di vê çîrokê de *leheng* Gurî ye. Gurî di heman demê de *alîkar* e jî. Ew keçikan ji Pîrê xilas dike û dişîne gund. Di çîrokê de *êrişkar* Pîr e. *Şandiyar* amojin e. Ew Gurî dişîne qirşan. Di vê çîrokê de *Prenses*, *lehengê derewîn*, û *bexşger* cîh nagrin. Ev çîrok di bi taybetiyên çar şexsiyetan ve hatiye honandin.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp dîyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: B, A, K, Rs, a, ↓, W

#### **2.1.14. Analîza Çîroka Bi Navê Pîrê û Rovî**

##### **Rêzebûyer – I**

1. Go pîrek û keçikeka xwa hewûn. (**Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α**)
2. Go pîrê keçika xwa kire bûk, da gundekî nîzîka xwa. (**mtv.**)
3. Go rokê go: “Anê ti ne ser mi da têt, ti ne derî. E keçika te me. Em ê neçar in. Rokê were mi ra tiştêkî wîne, xwarinekî wîne. (**Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>**)
4. Pîr radiwe kuzekî tiji penêr dike, yekî tiji helaw dike û dike dest xwa û dere. (**Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑**)
5. Ku rê dikeve roviyak tê pêşiyê. Dê: “Anapîr ku da?” (**Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>1</sup>**)
6. Dê: “Welle e kê herime hinda keçika xwa.” (**Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>**)
7. Dê: “Were, were.” Dê: “Tu westiyayî.” Dê: “Mi de ku yekî dêr te, e rakim” Rivi yekî radike. Dê: “Anapîr he ti di vê hêlê ra here, e vê hêlê ra herim. Dê hele em kî dikevîne pêş kê.” (**Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>1</sup>**)
8. Pîr mina wî dike. (**Pênase: Tevlî Tawanê Bûn, Hêma: θ<sup>1</sup>**)
9. A hama diwe koşakî têr dixwe ya di jî dêle haşa tê da dirî, dimîze û a pisî misîyî dike îçî û dê mezbût dike. (**Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>3</sup>**)

10. Dere diwê: “Anapîr, ê min î sivik e dê ti ê xwa bi mi de.” Dê: “Ez ê îja wî rakim. He ti li vê riyê da here, ez wê hêlê da herim. Ka em kî pêş da derin?” **(Pênase: Xapandin, Hêma: η<sup>1</sup>)**

11. Ê pîrê dixapîne. **(Pênase: Tevlî Tawanê Bûn, Hêma: θ<sup>1</sup>)**

12. Îja wî jî diwe xwa ra boş dike, vedişêre. A dîsa wî jî tiji haşa rêx mêxê, çol molê kom dike, dikê dêv doğri dike. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>3</sup>)**

## **Rezebûyer – II**

13. A keçik kinca dişo dê: “Anê te me ra tiştek nanî? Dê: “Wîîî, mi çito te ra nanî qîza min. Dê: “Mi te ra helaw hanî mi te ra rûnê malê hanî mi te ra çi hanî? Mi du kûz tiji kirine, hanîne. Here wîne ku em tev bixwin.” Diwe: “Erê.” Dere kûzekî keçik ser ew dike, ser pas dike. Diwê: “Anêê!” Dê: “Qe haşa rêx li mala me tunewû ku me bixwara. Va gî rêx e, gî serkulê kera nin. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>)**

14. Keçik diwê: “Va çi ye te me ra haniye?” Diwê: “Hîîî!” Diwê: “Ku çi kiriye wî rêviyê li mi kiriye.” Dê li mi hanî kiriye. Go: “Em çito bikin çito nekin?” Go: “Em vî rivî bûnin.” Go: “Ez ê îllam vî riviyî bikujim.” Pîrê got. Go: “Em ê bûnin.” Rovî êvarê têye qûna xwa didiye ser rojina wan e dê: “Elistok, melistok, kupê pîrê da rîmîstok.” **(Pênase: Derxistina Meydanê, Hêma: Ex)**

15. Dê pîr de: “Tu bisekine ku e tiştekî li vî riviyî bikim.” Dere hinek qîr û qetran tîne. Devê rojina xwa gî qetran dike. Dê: “Sewa ku rivi were ku e îllam dêla wî jêkim. Mada ku wî li mi ha kir bira ew jî kut biwe here nav hevala.” A dîsa tê qula xwa dide ser rojinê û dê: “Elistok, melistok, kupê pîrê da rîmîstok.” A çito dike qula xwa ranawe. Pîr çito şîşê li dêlê dixê, dêle ber da kut dike û dêlê tîne. Ê ku va riviya deriye nav hevala gî dên: “Quto, quto, dêl melquto, min bin dêlê hilquto.” **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>3</sup>)**

16. Rivi tê dê: “Lê Anapîrê, dê bira bûy Xwadê we.” Dê: “Lê dêla mi, mi de. E derime nav hevala dê mi ra dên quto quto dêl melquto.” **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>6</sup>)**

17. Diwê: Na. Here mi ra kûzek rûn û kûzel helaw wîne, ku e bi te dim.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>10</sup>)**

18. Diwê bizinê mi hene ez ê herim şîr bidoşim. Dere cem bizinê. **(Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)**

19. Dere bizinê re diwê: “Kanî şîr bide min e.” Bizin jî diwê: Here mi ra pelça bîne ku e şîr bidim te.” Dere dê: Darê tu pelça nadî min e?” Dê: “Tijî here min av de dê erqê berde e tî bûme ku e avê vexwim.” Dere kaniyê ku avê bîne, avê bi ser darê de. Diwê: “Here

ser bana qîza mîreka bira qîza mîra were xwa ser avên da çeke ku avê bi te dim. Dere hinda qîza mîra dê: “Qîza mîra, text û tîra.” Ber keçikê digere. Dê: “Mi ra cotek kondere, kirasekî û kemereke zîv bikire ku ez werim xwe ser kaniyê de çekim.” Dere hinda dukanekî. Dukkancî diwê: “Here mi ra gayekî cot bîne.” **(Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger, Hêma: D<sup>10</sup>)**

20. Dê dere ku mêrikek cot dikiye. Diwê: “Xaloooo!” Dê: “Gura kera te li dera han xwar.” A mêrik cotê xwa diterikîne û direve ku de “gura kera mi xwar.” A hema gê ber dide. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>3</sup>)**

21. Gê digre û diwe hinda dukancî. **(Pênase: Girtina Objeya Sêhrî, Hêma: F<sup>8</sup>)**

22. Cotek sol, kirasekî û kemerekî zîv dikire û dide keçika mîr. Keçika mîr dere xwa ser kaniyê da çe dike. Kanî avê dide darê. Dar pela diweşîne. Bizin pela dixwe û şîr dide rovî. **(Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K<sup>2</sup>)**

23. Rovî şîr digre û dere hinda pîrê. **(Pênase: Veger, Hêma: ↓)**

24. Diwe şîr dide pîrê. Dê: “Pîrê ka dêla min.” Pîrê diwê: “Haydêêê! Ti li mi keniyaî haaa.” Diwê dêla te yê va ye jî e nadim.” **(Pênase: Cezakirin, Hêma: U)**

25. A rovî dere xwa çedike gola avê û difetise. **(xwekuştin)**

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Pîrê û Rovî’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha$ , (mtv.),  $a^5$ ,  $\uparrow$ ,  $\varepsilon^1$ ,  $\zeta^1$ ,  $\eta^1$ ,  $\theta^1$ ,  $A^3$ ,  $\eta^1$ ,  $\theta^1$ ,  $A^3$

II.  $a^5$ , Ex,  $A^3$ ,  $a^6$ ,  $D^{10}$ ,  $\uparrow$ ,  $D^{10}$ ,  $K^3$ ,  $F^8$ ,  $K^2$ , U

Di vê çîrokê de du rêzebûyer derdikevin pêş me. Bûyerên vê çîroke li pey hev tîn. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê H-J û M-N tune” yê.

Di rêzebûyera yekem de pîrê dikeve rê ku keçika xwe re helaw û rûn bibe. Rovî rûn û helawa pîrê didize. Di rêzebûyera duyem de Pîr boçika rovî jê dike. Rovî ji bo ku boçika xwe ji Pîrê bigre diçe ku rûn bîne. Diçe tîne lê Pîr boçika wî nade. Rovî jî xwe diavêje avê û dimire.

Di vê çîrokê de *leheng* Pîrê ye. Di rêzebûyera yekem de *êrişkar* rovî ye lê di rêzebûyera duyem de jî *êrişkar* pîr e. Pîr xwedî du rola ye. Ew keçikan ji Pîrê xilas dike û dişîne gund. Dîsa *lehengê derewîn* jî rovî ye. Rovî ji bo ku gayê bi dest bixwe derewê jî cotkar re dike û dibêje “Guran kera te li dera han xwariye.” Ango rovî jî xwedî

taybetmendiyan du şexsiyetan e. Di çîrokê de *bexşger* bizin e. Çimkî bizin dê şîr bide ku rovî pê rûn çêke.

Di çîrokê de fonksiyoneke wisa derdikeve pêş me ku di rêbaza Propp de cih nagire. Li gorî rêbaza Propp dawîya çîrokan bi zewaca lehengî yan bi xelatkirina lehengî xilas dibe. Lê di vê çîrokê de rovî xwe dikuje û ev jî dijî zewac an xelatkirina leheng e.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine.

Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: a, ↑, A, Ex, D, K, F, U

### 2.1.15. Analîza Çîroka Bi Navê Hebîbê Neçar

#### Rêzebûyer – I

1. Go rokê padîşahêkî zalim hewû. **(Pênase: Rewşa Destpêkê, Hêma: α)**
2. Li wî memleketî jî neçarek hewû. Navê wî jî Hebîb bû. Hebîbe neçar pê ra digotin. **(Pênase: Kêmasî, Hêma: a<sup>5</sup>)**
3. Ê hebîbê neçar xwa ra qapî û pencere çê dikirin îşte. Feqîrekî, xerîbanek bû. **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**
4. Pêdişeh çav bera kulfeta wî da. **(Pênase: Xirabî, Hêma: A<sup>16</sup>)**
5. Go: “Ya Hebîbê neçar. Tu neçar î?” **(Pênase: Lêpirsîn, Hêma: ε<sup>1</sup>)**
6. Hebîbê neçar go: “Erê.” **(Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma: ζ<sup>1</sup>)**
7. Go: “Tu kê mi ra hezar qapîyî çêkî di roki da.” Jê re got: “Tu yê hezar kapiyî çêkî.” Ê Hebîbê neçar wê çaxê bi destan çêdike îmkan tunenin. Go: “Go e, vî îşî ancax mehêkê da nikam çêkim.” Go: “Ku tu heta siweda çêkî çêkî çenekî jî em ê cellat wînim serê te jêkim. **(Pênase: Karê Dijwar, Hêma: M)**
8. Ê va hate mal ê ûzuntilyê. Kulfeta hebîbê neçar go: “Ya Hebîbê Neçar xêr e te? **(Pênase: Lêpirsîn, Hêma: ε<sup>3</sup>)**
9. Go: “Nan ber mi da deriye.” Kulfetê xwa ra got: “Îşte durumeka hanî hanî heye.” Go: “Pêdişeh mi ra go ku tu kê hezar qapîyê çêkî. E çito hezar qapîyî çêkim. Ku çê nekim kê bana cellata ke min bi sêri bike. **(Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê, Hêma: B<sup>4</sup>)**
10. Go kulfeta xwa got: “Ya Hebîbe Neçar! Şev bû yek, qapî hezar, rakeve nolê hecar. **(Pênase: Reaksiyona Lehengî, Hêma: E<sup>2</sup>)**
11. Çû raket olum qorqusiyê li ser e. Dikê siweda cellat were wî sêri bigre. **(Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar, Hêma: N -enf.-)**

12. Pirbangî li qêpi xist dîng dîng dîng dîng... Firlemîş bû. Li cî xwe çekir, go: “Ahaa! Cellat hatin go dikê serê min jêkin.” **(Hêmana Peywendiyê-Ş)**

13. Go: “Xêr e.” **(Pênase: Lêpîrsîn, Hêma: ε<sup>2</sup>)**

14. Go: Ya Hebîbê Neçar rawe. Padîşah mir.” **(Pênase: Alîkarî, Hêma: Rs<sup>9</sup>)**  
**(Bicîhatina Qederê)**

15. Go: “Jê re tawûtekî çêkê.” **(Pênase: Qedexekirin, Hêma: γ<sup>2</sup>)**

16. Go: “Çû çêke.” Bana çiraxê xwa jî kir çû atolya xwa, dukana xwa vekir. “Ya Allah ya Bisimîla” go. Tawutê mîx lêxist mîx lêxist. Go wir dî go êga xwa hat pêşiyê êge ji lêxist. Go çiraxê xwa got: “Usta, Hebîbê Neçar, o mix dexil êgedir.

Go: Mixê êge eden de Allah, êgeyî mix êden de Allah.” “Ya Allah, Bisimîla” go û çekir. Padîşah gewermîş bû cenimî û çûne çeka kortekê kirin. **(Pênase: Binpêkirina Qedexeyê, Hêma: δ<sup>2</sup>)**

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîroka ‘Hebîbê Neçar’ dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I.  $\alpha, a^5, \xi, A^{16}, \varepsilon^1, \zeta^1, M, \varepsilon^3, B^4, E, N, \xi, \varepsilon^2, Rs^9, \gamma^2, \delta^2$

Di vê çîrokê de rêzebûyerek derdikevin pêş me. Ev çîrok li gor sefinandina Propp dikeve nav sinifa “çîrokên ku di nav de cotê M- N heye” yê.

Di vê çîrokê de padîşah dixwaze jina Hebîbê Neçar jê bistîne. Ji ber wê karekî dijwar jê re dibêje ku ew ê nikaribe vî karî bîne cîh. Hebîbê Neçar karê dijwar nîne cîh lê ji ber ku padîşah dimire ew jî ji zordariya padîşêh xilas dibe. Di vê çîrokê de *leheng* Hebîbê Neçar e. *Êrîşkar* Padîşah e. *Prensês* jî em wekî jina Hebîbê Neçar dikarin bibînin. Çimkî fonksiyona ‘M’(Karê Dijwar) yê ji bo jina wî tê dayîn. Çîrok bi taybetiyên sê kesayetan ve hatiye honandin. Di vê çîrokê de *Bexşger, alîkar, şandyar û lehengê derewîn* cîh nagire.

Di çîroka Hebîbê Neçar de jî em dibînin ku formeke cuda derdikeve pêş me. Mirina padîşêh wekî mizginiyekî ji Hebîbê Neçar re tê û êdî ew mecbûr nîne ku karê dijwar bi cîh bîne. Dîsa di vê çîrokê de jî em zewac an jî xelatkirina leheng nabînin. Ev jî ji eksê rêbaza Propp e.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp diyar kirine hemî nînin û rêza fonksiyonan li gorî pergala diyarkirî jî li dû hev nehatine. Fonksiyonên ku me di vê çîrokê de tespît kirin ev in: a, A, M, B, E, N, Rs.

Di vê beşê de me çîrokên derasayên Curnê Reş li gor rêbaza Propp analiz kir. Di serî de rêzebûyerên çîrokan hatin diyarkirin û fonksiyonên di nav çîrokê de hatin diyarkirin. Paşê Cureya çîrokê kîjan e ew hate ravekirin û ji bo her çîrokê kesayetên ku di nav çîrokan de cîh digirin û yên nagirin hatin ravekirin.

## **2.2. FONKSIYONÊN KU DI ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN CURNÊ REŞ DE DERBAS DIBIN**

Fonksiyon û binfonksiyonên ku di van çîrokên Herêma Curnê Reş de yên ku em rastê hatin ev in:

### **I.) Ji Malbatê yek dûrdikeve. Pênase: Dûrketin, Hêma: $\beta$**

✓ Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî rengê teqez yê veqetîna tê dîtîn. ( $\beta^1$ )

✓ Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî rengê teqez yê veqetîna tê dîtîn. ( $\beta^2$ )

✓ Ji neslên nû yek ji malê vediqete. ( $\beta^3$ )

### **II.) Leheng bi qedexeyê re rûbirû dimîne. Pênase: Qedexekirin Hêma: $\gamma$**

✓ An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşan kirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn. ( $\gamma^1$ )

✓ Bi ferman an jî pêşniyazek, rewşeke berevajî qedexeyê tê destnîşankirin. ( $\gamma^2$ )

### **III.) Qedexe tê binpêkirin. Pênase: Binpêkirina Qedexeyê Hêma: $\delta$**

✓ Rengê binpêkirina qedexeyê wekî rengê qedexeyê bixwe ye. ( $\delta$ )

**VI.) Êrîşkar ji bo ku qurbanên xwe an jî serweta qurbanên xwe bi dest bixe, hewl dide ku qurbanê xwe bixapîne. Pênase: Xapandin Hêma:  $\eta$**

✓ Êrîşkar dixwaze qurbani/ê qanih bike. ( $\eta^1$ )

✓ Êrîşkar rasterast tiştên sêhrî bi kar tîne. ( $\eta^2$ )

✓ Êrîşkar hin rêyên di yên xapînok an jî tirsêr bi kar tîne. ( $\eta^3$ )

**V.) Êrîşkar di heqê qurbanê xwe de agahiyan berhev dike. Pênase: Agahî Berhevkin, Hêma:  $\zeta$**

✓ Êrîşkar (Xayin), bersivê ji pirsê xwe re digire. ( $\zeta^1$ )

✓ Lêpîrsîna ku bi renekî dî an jî berevajî tê kirin, bersiveke lêhatî dixwaze. (ζ<sup>2</sup> û ζ<sup>3</sup>)

**VII.) Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alikariya dijminê xwe kiriye. Pênase: Tavlî Tawanê Bûn Hêma: 0**

✓ Leheng ji êrîşkar bawer dike. (θ<sup>1</sup>)

**VIII.) Êrîşkar zirarê dide yekî ji malbatê. Pênase: Xirabî Hêma: A**

✓ 1. Êrîşkar yekî/ê direvîne. (A<sup>1</sup>)

✓ 2. Êrîşkar objeyeke sêhrî didize an jî direvîne. (A<sup>2</sup>)

✓ 3. Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zirarê dide zevîyan. (A<sup>3</sup>)

✓ Êrîşkar kiryarên xwe yên dizîye an jî revandinê bi şikleki din dike. (A<sup>5</sup>)

✓ 6. Êrîşkar zirarê dide bedena kesan. (A<sup>6</sup>)

✓ 7. Êrîşkar, dibe sebeb ku yek ji nişkê ve berze bibe. (A<sup>7</sup>)

✓ 8. Êrîşkar quranê/a xwe mecbûr dike ku tiştêkî bike an jî bi zorê tiştêk jê digire.

(A<sup>8</sup>)

✓ Êrîşkar dirahêle yekî/ê. (A<sup>9</sup>)

✓ Êrîşkar ferman dide ku yekî/ê biavêjine behrê. (A<sup>10</sup>)

✓ Êrîşkar li yekî/ê an jî tiştêkî sêhrê dike. (wî/wê bi sêhrê vediguherîne tiştêkî dî)

(A<sup>11</sup>)

✓ Êrîşkar yekê/î diêxe şuna yekê/î dî. (A<sup>12</sup>)

✓ Êrîşkar ferman dide ku yek bihête kuştin. (A<sup>13</sup>)

✓ Êrîşkar yekê/î dikuje. (A<sup>14</sup>)

✓ Êrîşkar yekê/î di cihekî de qîlf dike an jî diavêje zindanê. (A<sup>15</sup>)

✓ Êrîşkar yekê/î mecbûr dike ku pê re bizewice. (A<sup>16</sup>)

✓ Êrîşkar, qurbanî bi mirovxuriyê ditirsîne. (A<sup>17</sup>)

✓ Êrîşkar her şev yekî/ê dişîne. (A<sup>18</sup>)

✓ Êrîşkar şer îlan dike. (A<sup>19</sup>)

**VIII-a.) Ji Malbatê Yek Tiştêkî Berze Dike An Jî Dixwaze Tiştêkî Bi Dest Bixe.**

**Pênase: Kêmasî Hêma: a**

✓ Kêmasiya keçikeke nîşanî, kêmasiya dostekî. (a<sup>1</sup>)

✓ Ji bo jiyînê, kêmasiya wasîteyên pêdivî, tiştên maqûl. (a<sup>5</sup>)

✓ Hin formên cuda. (a<sup>6</sup>)

**IX.) Agahiya xirabiyê an jî kêmasiyê belav dibe, bi daxwaz an jî fermanekê serî li leheng tê dayîn, leheng tê şandin an jî diçe. Pênase: Qasidî, Kêliya Derbasiyê Hêma: B**

- ✓ Hawara alikariyê tê kirin, dûre jî leheng tê şandin. (B<sup>1</sup>)
- ✓ Leheng pêre tê şandin. (B<sup>2</sup>)
- ✓ Leheng ji mala xwe derdikeve rê. (B<sup>3</sup>)
- ✓ Agahiya felaketê belav dibe. (B<sup>4</sup>)
- ✓ Lehengê ku hatiye qewirandin, ji mala wî bo derekî dûr dihête birin. (B<sup>5</sup>)
- ✓ Lehengê ku hatiye mehkûm kirinê mirinê, bi dizî serbest dihête berdan. (B<sup>6</sup>)

**X.) Lehengê ku lê tê gerîn qebûl dike ku bikeve nava çalakiyê an jî biryara çalakiyê dide. Pênase: Destpêkirina Çalakiya Dijber Hêma: C**

✓ Pirî caran di çîrokê de behsa vê kêliyê nayê kirin lê beriya derketinê teqeze ku biryarek hatiye girtin. Ev kêlî an jî element di çîrokên ku leheng ji bo gerekê derdikeve rê de dertê pêş me.

**XI.) Leheng ji mala xwe derdikeve. Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑**

**XII.) Leheng, di imtîhan, lêpîrsîn an jî êrîşek ku dê rê veke ku ew ê objeyeke sêhrî an jî alîkarek bi dest bixe de derbas dibe. Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger Hêma: D**

- ✓ Bexşgêr, lehengî imtîhan dike. (D<sup>1</sup>)
- ✓ Bexşgêr silav dide lehengî û pîrsan jê dike. (D<sup>2</sup>)
- ✓ Girtiyek/Dîlek, ji leheng dixwaze ku wî xilas bike. (D<sup>4</sup>)
- ✓ Daxwazên dî. (D<sup>7</sup>)
- ✓ Objeyeke sêhrî, nîşanî leheng tê dayin û pêşniyaza taqasê/bihevguherînê tê kirin. (D<sup>10</sup>)

**XIII.) Leheng, reaksiyonê dide çalakiyên mirovê ku dê di pêş de bexşê bibexşîne wî. Pênase: Reaksiyona Lehengî Hêma: E**

- ✓ Leheng, silava bexşgêr digire/nagire. (E<sup>2</sup>)
- ✓ Leheng, daxwaza kesekê ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne/pêk naîne. (E<sup>3</sup>)
- ✓ Leheng, girtî serbest berdide. (E<sup>4</sup>)
- ✓ Leheng, heywanê ku jê alîkarî dixwaze xilas dike. (E<sup>5</sup>)

- ✓ Leheng, hin xizmetên/alîkariyên dî dike. (E<sup>7</sup>)

**XIV.) Objeya sêhrî ji leheng re tê dayîn. Pênase: Girtina Objeya Sêhrî Hêma: F**

- ✓ Objê rasterast tê dayin. (F<sup>1</sup>)
- ✓ Objê, li wî cihê ye, yê ku ji leheng re tê gotin. (F<sup>2</sup>)
- ✓ Objê tê çêkirin. (F<sup>3</sup>)
- ✓ Objê bi rasthatinê dikeve destê leheng. (leheng wê dibîne) (F<sup>5</sup>)
- ✓ Objê xwe bi xwe yekcar peyda dibe. (F<sup>6</sup>)
- ✓ Objê tê vexwarin an jî xwarin. (F<sup>7</sup>)
- ✓ Objê tê dizîn. (F<sup>8</sup>)
- ✓ Curbecur kes bi dilê xwe dikevin xizmeta leheng. (F<sup>9</sup>)

**XV.) Leheng bi cihê ku obje li wê derê ye ve tê birin, ji bo wî rêberî tê kirin an jî tê birin. Pênase: Di navbera du qiraliyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti Hêma: G**

- ✓ Leheng li ezman difire. (G<sup>1</sup>)
- ✓ Leheng li ser erdê an jî li ser avê rêwîti dike. (G<sup>2</sup>)
- ✓ Ji leheng re rêbertî tê kirin. (G<sup>3</sup>)
- ✓ Ji leheng re rê tê nîşandan. (G<sup>4</sup>)
- ✓ Leheng navgînên sabît yê veguhastinê bi kar tîne. (G<sup>5</sup>)
- ✓ Rêçên îşaretkirî rê nîşan didin. (xwîn, şop, ta û hwd.) (G<sup>6</sup>)

**XVI.) Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev. Pênase: Pevçûn/Şer Hêma: H**

- ✓ Leheng û êrîşkar li meydanaşê şer dikin. (H<sup>1</sup>)
- ✓ Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê. (H<sup>2</sup>)
- ✓ Êrîşkar di rewşeke wisa de ye ku neşet êrîşî leheng bike, (H<sup>4</sup>)

**XVII.) Nîşaneke taybet li leheng peyda dibe. Pênase: Nîşana Taybet Hêma: I**

- ✓ Di bedena leheng de nîşanek peyda dibe. (I<sup>1</sup>)
- ✓ Leheng gustîlk an jî destmalek dibîne/bi dest dixê. (I<sup>2</sup>)
- ✓ Curbecur nîşanên dî. (I<sup>3</sup>)

**XVIII.) Êrîşkar têk diçe. Pênase: Serkeftin Hêma: J**

- ✓ Êrîşkar li meydana şer têk diçe. (J<sup>1</sup>)
- ✓ Êrîşkar di pêşbaziye de têk diçe. (J<sup>2</sup>)
- ✓ Êrîşkar bêy ku tu pevçûn biqewime tê kuştin. (J<sup>5</sup>)

**XIX.) Xerabiya di destpêkê de tê telafîkirin an jî kêmasî tê pêşwazîkirin. Pênase:**

**Pêşwazîkirin Hêma: K**

- ✓ Objeya ku lê tê gerîn, bi zore an jî bi hileyê/qurnaziyê tê revandin. (K<sup>1</sup>)
- ✓ Objeya ku lê tê gerîn, bi xiz ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan. (K<sup>2</sup>)
- ✓ Objeya ku lê tê gerîn, bi saya cazîbeyê tê bidestxistin. (K<sup>3</sup>)
- ✓ Bi destxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast encameke çalakiyên berê ye. (K<sup>4</sup>)
- ✓ Kesê ku sêhr lê hatiye kirin vedigere şexsîyeta/nasnameya xwe ya berê. (K<sup>8</sup>)
- ✓ Êsîr/Dîl tê xilaskirin. (K<sup>10</sup>)
- ✓ Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn, bi heman rengê bidestxistina objeya sêhrî ye. (K<sup>11</sup>) (me ev fonksiyona wek KF<sup>1</sup>, KF<sup>9</sup> û hwd. nîşan da.)

**XX.) Leheng vedigere. Pênase: Veger Hêma: ↓**

**XXI.) Leheng Tê Şopandin. Pênase: Şopandin Hêma: Pr**

- ✓ Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe. (Pr<sup>5</sup>)
- ✓ Leheng ji aliyê kesekî ve tê şopandin (Pr<sup>8</sup>)

**XXII.) Bi hawara leheng de tê çûyîn. Pênase: Alîkarî Hêma: Rs**

- ✓ Leheng, ber bi ezman ve tê birin. (Rs<sup>1</sup>)
- ✓ Leheng, astengan dertîne ser rêya şopînerê xwe û direve. (Rs<sup>2</sup>)
- ✓ Di kêliya ku dê leheng bê kuştin de bi hawara wî ve tê gihaştin. (Rs<sup>9</sup>)

**XXIII.) Leheng xwe vedişêre/kîbûna xwe vedişêre û vedigêre mala xwe an jî welatek dî. Pênase: Vegerîna bi rengê veşartina kîbûna xwe Hêma: O**

- ✓ Leheng diçe cem qiral wekî seyis an jî aşpêj dixebite. Carina jî bi tenê vegera li welat heye. (O<sup>2</sup>)

**XXIV.) Lehengekî sextekar bi îdîayên bê bingeh derdikeve. Pênase: Îdîayên Bêbingeh Hêma: L**

**XXIV.) Lehengekî sextekar bi îdfayên bê bingeh derdikeve. Pênase: Îdfayên Bêbingeh Hêma: L**

**XXV.) Karekî dijwar li leheng tê pêşniyazkirin. Pênase: Karê Dijwar Hêma: M**

**XXVI.) Karê dijwar tê bicihanîn. Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar Hêma: N**

**XXVII.) Leheng tê naskirin Pênase: Naskirin Hêma: Q**

**XXVIII.) Kîbûna êrîşkar, lehengê sexte an jî yê xerab dertê meydanê. Pênase: Derxistina Meydanê Hêma: Ex**

**XXIX.) Leheng dikeve rengê nû Pênase: Veguherîna Dirûvî Hêma: T**

✓ 1. Leheng bi tevgerê sêhrî ya alîkarê xwe reng/dirûv diguhêre. (T<sup>1</sup>)

✓ 3. Leheng kincên nû li xwe dike. (T<sup>3</sup>)

**XXX.) Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê cezakirin. Pênase: Cezakirin Hêma: U**

**XXXI.) Leheng dizewice û dertê ser text. Pênase: Zewicîn Hêma: W**

✓ Leheng, jinê û welat bi hev re bi dest dixê an jî pêşî nivê qiraletiyê bi dest dixê û piştî mirina dê û bav hemî qiraletiyê bi dest dixê. (W<sup>0</sup>)

✓ Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîne, di vê rewşê de nabe qral. (W<sup>0</sup>)

✓ Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî rengê dî tê xelatkirin. (W<sup>3</sup>)

✓ Zewac nivê de dimîne, zava mecbûr dimîne ku biçe cihekî din. (W<sup>4</sup>)

## ENCAM

Armanca vê xebatê ew bû ku çîrokên derasayên herêma Curnê Reş li rêbaza Propp bê tetbîqkirin. Di vê xebatê de me panzdeh çîrokên derasa yên Curnê Reş li gor rêbaza Propp analîz kirin. Propp ji bo analîza çîrokan 31 yek fonksiyon dîyar kirîne. Her fonksiyonekê jî gelek binfonksiyon hene. Me jî xwest em bibinin ev 31 fonksiyonên diyarkirî wekî ku di çîrokên gelên din de tîn dîtin di van çîrokan de jî hene yan tune ne.

Dema em rebaza Propp wek çîrokên gelên din tetbîqî çîrokên Kurdî (Herêma Curnê Reş) dikin dîsa heman zagonên neguherbar yên Propp diyarkirî nîşanî me dide. Em di vê xebatê de rastî hemû fonksiyonên ku Propp diyarkirine hatin. Carinan ji bo fonksiyonekê tenê mînakek derket pêş me carinan jî ji bo fonksiyonekê bi dehan mînak derketin pêş me. Jixwe van mînakan em di analîz û tetbîqkirinên çîrokan de dibînin. Em di çîrokên derasayên herêma Curnê Reş de rastî 31 fonksiyonan ku Propp diyar kirine hatin. Lê em çîrokên ku di vê xebatê hatine bikaranîn de rastî hemî binfonksiyonên ku Propp diyar kirine nehatin. Propp dibêje dibe ku di hemû çîrokan de hemû fonksiyon nebin lê lazim e fonksiyonên heyî li gorî rêza diyarkirî bîn. Gava em li çîrokên xwe dinêrîn fonksiyon carinan li gorî rêbaza Propp diyarkirî li dû hevdu nayên. Cîhê fonksiyonên ku Propp diyar kiriyê di çîrokên me de carinan pêş de carinan jî paş de diçe.

Li gor Propp çîrok dibin çar cure. (bnr. r:18) Di vê xebata me de çîrokên ku dikevin bin van cureyan wiha ne.

✓ Çîrokên ku di nav de cotê H-J heye: Dêwê Serzer, Hirç, Mihemedşah, Padîşahê Diz, Mihemed û Keçika Padîşêh, Meryem û Natalî.

✓ Çîrokên ku di nav de cotê M-N heye: Sêwiyê Ap û Amojina, Padîşah û Lele, Fuqere, Hebîbê Neçar.

✓ Çîrokên ku di nav de hem cotê H-J hem jî M-N heye: Masiyê Kesk û Hişin.

✓ Çîrokên ku di nav de cote elemantên H-J û M-N nîne: Dal Ahmet, Pîrewok, Gurî, Rovî û Pîrê.

Her çîrok herî kêr ji rêzebûyereke pêk tê. Di xebata me de herî zêde di nav çîrokeke de şeş rêzebûyer hatiye tespîtkirin. Ji aliyê hejmarên rêzebûyerên ve çîrokên ku em li ser xebitîne bi vî awayî ne:

✓ Çîrokên ku ji rêzebûyereke pêk hatine: Hebîbê Neçar, Padîşah û Lele (çîroka yekem)

✓ Çîrokên ku ji du rêzebûyeran pêk hatine: Meryem û Natalî , Pîrewok, Gurî, Rovî û Pîrê, Padîşah û Lele (çîroka duyem), Padîşahê Diz (çîroka duyem),

✓ Çîrokên ku ji sê rêzebûyeran pêk hatine:, Dal Ahmet, Hirç, Mihemedşah, Masiyê Kesk û Hişin

✓ Çîrokên ku ji çar rêzebûyeran pêk hatine: Fuqere, Dêwê Serzer, Mihemed û Keçika Padîşêh, Padîşahê Diz (çîroka yekem)

✓ Çîrokên ku ji pênc rêzebûyeran pêk hatine: Di nav van çîrokan de yên ku ji pênc rêzebûyeran pêk hatiye cîh nagrin.

✓ Çîrokên ku ji şeş rêzebûyeran pêk hatine: Sêwiyê Ap û Amojina

Dema ku mirov ji aliyê hejmarên rêzebûyeran ve dinêre di panzdeh çîrokan de herî zêde çîrokên ku ji du rêzebûyeran pêk hatine derdikeve pêş me. Çîrokên bi vî awayî şeş heb in. Piştî herî zêde çîrok dikevin nav çîrokên ku ji sê û çar rêzebûyeran pêk hatine. Çîrokên ku ji du rêzebûyeran pêk hatine çar heb in. Dîsa çîrokên ku ji çar rêzebûyeran pêk hatine jî çar heb in. Herî zêde rêzebûyer di çîroka Ap û Amojina de derket pêş me. Ev çîrok ji şeş rêzebûyeran pêk hatiye. Herî kêr rêzebûyer jî di çîrokên bi navê Hebîbê Neçar û Padîşah û Lele de derkevin pêş me. Ev çîrok tenê ji rêzebûyereke pêk tên.

Rêzebûyer di hemû çîrokan de li gorî rêzekê nayên. Ji bilî sê heban bûyerên çîrokên din li pey hev hatine. Çîrokên ku bûyerên wan li pey hev nayên ev in: Padîşah û Lele, Padîşahê Diz, Masiyê Kesk û Hişin.

Çîrokên ku me di vê xebatê de bikaranîn de du heb metin ji du çîrokan pêk hatine. Ango di nav çîrokê de çîrokek din heye. Ew çîrok ev in: Padîşah û Lele, Padîşahê Diz. Di diyarkirina hejmarên rêzebûyerên wan metnan de me çîrok di nav kevanekê de wek (çîroka yekem) û (çîroka duyem) bi nav kir.

Di fonksiyona XVIan de leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev. (H) bin fonksiyonên  $H^1$ ,  $H^2$ ,  $H^3$  hene lê ev her sê jî li çîroka bi navê ‘*Padîşahê Diz*’ nayên. Me li vê derê bin fonksiyona  $H^4$  ‘êrîşkar berî ku êrîşî leheng bike, leheng êrîşkar dikuje’ lê zêde kiriye.

Di fonksiyona XXIan de leheng tê şopandin. (Pr) bin fonksiyonên  $Pr^1$ ,  $Pr^2$ ,  $Pr^3$ ,  $Pr^4$ ,  $Pr^5$ ,  $Pr^6$ ,  $Pr^7$  hene lê ev hemû jî li çîroka bi navê ‘*Sêwiyê Ap û Amojina*’ nayên. Me li vê derê bin fonksiyona  $Pr^8$  ‘Leheng ji aliyê kesekî ve tê şopandin’ lê zêde kirîye.

Di fonksiyona XXXIyan de leheng dizewice û dertê ser text. Bin fonksiyonên (W) hene. Lê ev bin fonksiyonên ku Propp diyar kirine li çîroka bi navê ‘*Dal Ahmet*’ nayên. Me li vir W<sup>4</sup> ‘zewac nîvî de dimîne, zava mecbûr dimîne ku biçe cihekî din’ lê zêde kir.

Bi vî awayî em gîhîştin wê encamê ku rêbaza Propp em dikarin tetbîqî çîrokên ji herêma Curnê Reş bikin û di van çîrokan de, her çiqas ji hinek xalan ve rêbaza Propp kêmbimîne jî, bi piranî mînakên bo modela rêbaza Propp di van çîrokên derasayî de me tespît kirin û nîşan dan.



## ÇAVKANÎ

- Alakom, R. (2002). *Folklor û Jinên Kurd*. Weşanên Nefel. (Çapa Dijîtal).  
[http://www.nefel.com/epirtuk/epirtuk\\_overview.asp?RubricNr=4\(Ragihanî:15.09.2021\)](http://www.nefel.com/epirtuk/epirtuk_overview.asp?RubricNr=4(Ragihanî:15.09.2021))
- Alakom, R. (2013). *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyê Jinan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Azadovski, M. *Sibiryadan Bir Masal Anasî*, İlhan Başgöz (wer.). Enqere: Çapxaneya Feryal, 1992.
- Boratav, P. N. (1969). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. Stenbol: Weşanên Gerçek.
- Başdaş, S. (2018). "*Fonksiyonên Çîrokan di Perwerdehiyê de (Vekolîn-tekst-analîz)*", (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.
- Bozkoyun, M. (2015). *Çend Çîrokên Herêma Şêxan (Metin - Analîz)*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin) Zanîngeha Bingolê, EZZ.
- Cewerî, F. (2003). *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)* Cild I. İstanbul: Weşanên Nûdem.
- Çalıştiran, R. (2020, Nîsan). *Dahûrandina çîroka "Ehmedê Zeydan" li gor rêbaza morfolojîk a Vladimir Propp*. Kurdiname Akademik (Jimar: 2), r. 56-57.
- Çiftçi, M. (2019). *Nimûneyên Çîrokên Derasayî Yên Çaldiranê Li Gorî Rêbaza Morfolojiyê Ya Vladimir Propp*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Yüzüncü Yılê, EZZ.
- Çobanoğlu, Ö. (2019). *Halk Bilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Enqere: Akçağ.
- Öcal, O. û S.Gürçayır (ed.) (2005). "*Masal Anlatıcıları*", *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, Ankara: Geleneksel, Cild. 2.
- Dorson, R. M. (2017). *Folklor û Teoriyên Folklorê yên Îroyîn*. Necat Keskin (wer.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Demir, B. (2016). *Çîrokên Kurdî li Gorî Motîf İndeksa Stith Thompson (Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrza Mihemed)*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.

- Duran, Y. (2019). *Li Gorî Rêbaza Vladimir Propp, Analîza Çend Çîrokên Herêma Colemêrgê*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.
- Dündar, H. (2014). *Vladimir Propp ve Masalın Biçimbilimi*. Milli Folklor, Jimar 55.
- Geverî, A. (2008). *Antolojiya Çîrokên Nûbiharê*. Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- Gülmez, Ş. (Bermalî). 16.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Dal Ahmet*" *Mijara Hevdîtinê*, Navçeya Curnê Reş.
- Gülmez, Ş. (Bermalî). 16.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Guri*" *Mijara Hevdîtinê*, Navçeya Curnê Reş.
- Günay, U. (2011). *Elazığ Masalları ve Propp Metodu*. Enqere: Weşanên AKÇAĞ.
- Güney, C. (2019). *Zargotina Kurdan û Çîrokên Herêma Diyarbekirê*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Yüzüncü Yılê, EZZ.
- Güzel, A. Z. (Bermalî). 14.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Pîrewok*" *Mijara Hevdîtinê*, Curnê Reş, Gundê Çîmdeliyê.
- Güzel, İ. (Cotkar). 17.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Meryem û Natalî*", *Mijara Hevdîtinê*, Curnê Reş, Gundê Çîmdeliyê.
- Güzel, İ. (Cotkar). 17.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Mihemed û Keçika Padîşêh*" *Mijara Hevdîtinê*, Curnê Reş, Gundê Çîmdeliyê.
- Güzel, İ. (Cotkar). 18.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Masiyê Kesk û Hişin*" *Mijara Hevdîtinê*, Curnê Reş, Gundê Çîmdeliyê.
- Güzel, İ. (Cotkar). 18.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Mihemedşah*" *Mijara Hevdîtinê*, Curnê Reş, Gundê Çîmdeliyê.
- Güzel, İ. (Cotkar). 18.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Padîşahê Diz*" *Mijara Hevdîtinê*, Curnê Reş, Gundê Çîmdeliyê.
- Hîkmet, B. (2016). *Teoriyên Folklorê*. Amed: Weşanên Lîs.
- Kaplan, L. (2018). *Di Çîrokên Hîzanê de Motîfên Dé*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.
- Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. Stenbol: Weşanên Avesta.

- Khidhir, M. (2017). *Ji bo Zarokan Çîrokên Ajalan (Mînak Kovara Heng 2001-2011)*. Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Yüzüncü Yılê, EZZ.
- Kızıl, H. û Tanrikulu, V. (2015, Tîrmeh). *Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayên Grimm re*. International Journal of Kurdish Studie (IJOKS), Cild 1, Jimar 2.
- Ölmez, E. (2015). *Vladimir Propp'un Masal Çözümleme Metodu Çerçevesinde "Padişahın Evlatlığı" Masalı Üzerine Bir İnceleme*. Sosyal Bilimler Dergisi, Cild 1, Jimar 535.
- Pertav, A. (Bermalî). 02.03.2021, "*Çîroka Bi Navê Dêwê Serzer*" Mijara Hevdîtîne, Curnê Reş, Gundê Cemalan.
- Pertav, E. (Cotkar). 13.04.2021, "*Çîroka Bi Navê Dêwê Serzer*" Mijara Hevdîtîne, Curnê Reş, Gundê Cemalan.
- Pertev, R. (2015). *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Pertev, R. (2018). *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Propp, V. (1998). *Folklor, Teori ve Tarih*. T. Tanyel û N. Hasgül (wer.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Propp, V. (2020). *Masalın Biçimbilimi*. M. Rifat û S. Rifat, (wer.). Stenbol: Weşanên Akçağ.
- Rahman, M. (2016). *Rola Folklorê Di Perwerdekirina Zarokan De Mînak: Çîrok*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Yüzüncü Yılê, EZZ
- Sakaoğlu, S. (2015). *Masal Araştırmaları*. Stenbol: Weşanên Akçağ.
- Sakaoğlu, S. û Karadavut, Z. (2011). *Halk Masalları*. Eskişehir: Zanîngeha Anadolu.
- Sanar, Y. (Bermalî). 22.02.2021, "*Çîroka Bi Navê Pîrê û Rovî*", Navçeya Curnê Reş.
- Sansak, H. (Bermalî). 22.02.2021, "*Çîroka Bi Navê Hirç*" Mijara Hevdîtîne, Navçeya Curnê Reş.
- Sansak, H. (Bermalî). 22.02.2021, "*Çîroka Bi Navê Fuqere*" Mijara Hevdîtîne, Navçeya Curnê Reş.

- Sansak, H. (Bermalî). 22.02.2021, "*Çîroka Bi Navê Sêwîyê Ap û Amojina*" *Mijara Hevdîtîne*, Navçeya Curnê Reş.
- Sansak, H. (Bermalî). 22.02.2021, "*Çîroka Bi Navê Padişêh û Lele*" *Mijara Hevdîtîne*, Navçeya Curnê Reş.
- Tarduş, Î. (2015). *Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdeya Zarokan de*. Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.
- Taş, E. (2017). *Motîfên Sereke Ji Çîrokên Gundê Serispiya Colemêrgê*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin) Zanîngeha Bingolê, EZZ.
- Taş, M. (2018). *Lêkolînek li ser Çanda Devkî ya Çaldiranê*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Muş Alparslanê, EZZ.
- Temel, S. (2005). *Propp Metodu ve Bir Karagöz Metnine Uygulanması*. Sanat Dergisi. Jimar 8.
- Ücar, H. (2019). *Di Çîrok û Stranên Gelêrî yên Colemêrgê de Nasnameya Jin*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Yüzüncü Yılê, EZZ.
- Yıldırım, K., Pertev, R. û Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê.
- Yıldız, A. (2017). *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî* Cild 1. Stenbol: Weşanên Lorya.
- Yıldız, A. (2019), *Li Gor Rêbaza Vladimir Propp Analîza Çîrokeke Kurmanc*. Nûbihar Akademî, Cild 4, Jimar 11.
- Yıldız, R. (2017). *Di Edebiyata Zarokan de Çîrok*. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Yüzüncü Yılê, EZZ.

## PÊVEK 1

### METNÊN ÇÎROKAN

#### 1-Sêwîyê Ap û Amojina

Rokê çî hewû çî tunewû du sêwîyê ap û amojina hewûn. Bav û diya wan tunewû. Ber destê ap û amojinê xwe da wûn. Amojina wana pir tede lê fikir. Pir tede lê fikir. Navê keçikê Fatme bû. Fatmegul bû. Navê lêwik jî Elî bû. Eynî qaynî wan zarîyê apê jî hewûn. Apê pir li wan hez fikir. Diya xwe tew li wana hez nedikir. Digo: “Van çine serê me bûne bela ne, em ê van çito bikim.” A rawû naxira dewêr girtin. Go: “Ez ê vana bişînime ber naxirê.” Go: “Ku dilê min li van hûnik bibe.” A rawû Fatmegul û Elî va şande ber naxirê, çolê. Ro bi ro pîvazeke serê bi wan re dikêye, a hinek nan manê kurs murs dikêye, nanê ku haşa merî didê heywên meywên. Wana dişîniye wa û zarîyê xwe jî li mal dikine, dixune.

Elî û Fatmê ve rokê çûn ber dewêr giriyan. Mangeka diya wan heye teva naxirê ye. Mangeka diya wan tenê heye. Mangê dî ku digrîne. Rebbilalemîn kir. Ziman kete devê mangê hat. Go: “Elî, Fatme hûn bû çî digrîne.” Go: “Em ê birçîne.” Go: “Helê şîva me pîvaz e nan e kursê kepegê ne.” Go: “Ap û amojinê me ne.” Go: “Li me tedê dikin.” Go: “Apê me bi amojina me nikane filan.” Go: “Bisimilarihmanêrihîm bèn.” Go: “Vê qoçî min ê rastê.” Go: “Werin bisimilla bèn vê qoçê min ê rastê rakin.” Go: “Rebbilalemin ê we ra sifreka çito bê ê li ber we raxe.” Rawûn çûne hinda manga diya xwe, “Bisimilla” gotin û qoçê rastê rakirin. Sêwine qey Rebbilalemîn yardim kiriye. “Bismilla” gotin, bavooo, li pêş wan çî û çî bû. Her tişt hate pêş çavê wan. Her tişt wan re çêwû. Têr kirin, xwarin. Ê va amojina îja qisqanmîş bû. Elî jî pir ê rindik e Fatme jî pir ê rindik e, Fatmegul. Pir ê rindik in. Amojin qisqanmîş bû. Go: “Hele ez zarîyê xwe bişînim.” Go: “Eşê pê re herin.” Navê keçika wê jî Eş e navê lêwik jî Hem e. Go: “Hemo, Eşê hele pê re herin yek.” Go: “Hele vana çî dikine çî dixune.” Go: “E tiştêkî nadime.” Go: “Vana ro bi ro rind diwune, çeleng diwune.” Rawû lawik pê re şand. Lawik heta êvarê pê re çû. Vana dikine ku xwe lêwik bidizin tiştêkî bixun. Kê birçîna ra bixewirin wê pîvazê, wa kursa naxune. Bi hev re gotin. Go: “Hemo, tu zanî?” Go: “Hal mal e.” Go: “Mangeka diya me heye hanî hanî... Go: “Em dikin.” Go: “Xwedê me ra yardim dike.” Go: “Em qoçê manga diya xwe radikin.” Go: “Her tişt tê pêş me.” Hemo jî têr xwar. Êvar bû. Çûne mal. Diya xwe bervê çû. Go: “Hemo we li çolê çî xwar.” Go: “Me çî xwar?” Go: “Kursê

ku te kirinê ye me xwar.” Go: “Me çi xwar?” Go: “Va min ra nawê.” Go: “Ez ê siwe da Eşê bişnim.” Ro bi ro jî hinek herî jî didiye Fatmê ye diwê: “Tî vê heriyê birisî.” Ro bi ro keçik teşiyê dirisiye hêsrên çavan tên. Eş pê ra şand. Ê vana xwe xapand. Royê havînê dirêj in ê biharê. Kê birçîna ra bixerin. Go: “Eşê.” Go: “Em tiştêkî bên tu narî amojinê ra nawê.” Go: “Na.” Go: “Çiye?” Go: “Îşte hal mal e.” Qoçê manga diya xwe re “Bisimilla” got. Go her tiştê bindaye. Rabbilalamîn wan re dişîniye. Xwarin. Eşê jî xwar. Go êvarê diya xwa bervê çû. Go: “Anê hal mal e.” Go: “Qoçê diya Fatmê, manga diya Fatmê da...” Go: “Hanî hanî.” Go: “Vana safî goşt dixuna ku çi tişt dinê da heye...” Go: “Wa yê têdê.” Go: “Dixune.”

Pir çû hindik çû vê jinikê go: “E çito bikim çito nekim.” Ê neçar in jî. Xwa bi şîr û wê ew ê xwadî dikine. Rawû mêrik ra got: “Tu zanî?” Go: “Dilê min pir goşt dixaziye” Go: “Tu îllam vê mangê serjê kî.” Mêrik go: “Em xwa bi wê mangê xwadî dikine filan.” Dehe riya nan nexwar xwa kire cîya. Rabû tişt mişt, teneke kirine bin ewa xwe, bin doşega xwa. Êvarê xwe ser da avite erdê. Go: “Ay ay ay...” Go: “Parsuyê min gî şikiyan.” Go: “E dikê bimirim.” Dehe riya cîya ranewû. Mêrik go: “Niha tu dewa çi dikiye, tu bû çiyê nexweşî?” Go: “Va ew a te çiyê?” Go: “Ku tu manga diya Fatmê min ra serjê kî ez ê rihet bim.” Go: “Ku tu serjê nekî jî go ez kê wir hanî bim.” Mêrik rawû go: “Em ê mangê serjê kin.” Va keçika û lawik va bîst, giriyan. Go ew a me ye yardimciya me ye. Giriyan. Çûn ber naxirê siwê û êvarê giriyan. Mangê rokê go: “Elî Fatme go hûn bû çi digrîne?” Go: “Welle kê te serjê kin.” Go: “Em ê birçîna ra bimirin.” Go: “Ap û amojinê me ne go apê me yê rind e jî go amojina me tew ney rind e go şîşa sor dike di me dadine nizam çi.” Go: “Tu zanî bira min serjê kin.” Go: “Ez ê goştê xwe bi wan tehl bikim bi zihêr kim.” Go: “Ez ê we jî şîrin bikim.” Go: “Hûn ê wan hestiyê min di ber axurê min da erdê kin.” Go: “Ku hûn kîçax royê li we teng hat go hûn ê herin bigrin.” Go: “Bê we jî kesî ra na.” Go: “Ê gir bin ê çûk bin go kî li xwe ke kesî ra nawe go ê li we ra bibin. Gî zêr in. Gî kincê wan zêr in.” A go: “Bira min serjê kin.” Du sê ro çûn mange serjê kirin. Go: “Zû min ra nav û dila bi ser din.” Ya wê ne nav û dil e ku mangê here bimire. Wiqa ku wa sêwiya diqeheriye yeka hesûd bûye. Go: “Mi ra nav û dila serdin.” Dane ser ku zihêr e zihêr. Go: “Na, na...” Go: “E naxwim.” Go: “Bidine Fatmê û Elî.” Go: “Bira gî ê wan be.” Fatmê û Elî wa goştê xwa ra kirin, xwarin hestiyê wê jî kirine ber axurê wê erdê û heri bi ser kirin û a mange jî çû têr kirin, xwarin.

Va niva telesiya xwe nakiye, li wan tew hez nakiye. Ro bi ro diwê tu yê kîlok herî birisî Elî jî ê birise. Berê nedida Elî îja da Elî jî. Go vana çûne pêşiya dewêr talazekê li we hiriyê werda û ser hev da bir. Ê ku hiriyê jî nerise here mal ê lêxe, ê bikuje. Yek bi yekî ra diwê sêwîyê ap û amojina. Va keçika hiri çû talazê bir û keçik wir li şopê çû. Çû ku hiri ketiye devê şikeftê. Wişşş. Hiriyê derdixê ku dengê şikeftê da tê. Dere bavooo ku pîreke (caduyê) hêvir distirêye nêw û xwun di pêsirê da tê ye, yeka serqot e merî lê dibizdiye. Go: “Were were go Fatma min tu ku ra hatî go were serê mim tiji sipî bûye.” Go: “Were hewkî van sipîyana bikuje.” Fatmê çû serê wê da ser xwe. Made xwa li hev neket. Sipîyê wê kuştin kuştin kuştin. Go: “Anepîrê. Go: “Ez herim.” Go: “Dewarê me niha çûn.” Go: “Ez ê birê xwa wenda kim.” Go: “Here qîza min.” Go: “Tu jî Elî jî” (navê wan berê zaniye.) Go: “Here.” Go: “Avekê were pêşiya we. Go: “Dest û çavê xwa pak tê da bişon, kaniyê were pêşiya we. A rawû, çûn çûn ku kaniyê pêşiya wan e. Wî û birê xwa va dest û çavê xwa şuştin ku ha li birê xwa nêri ku tevehev diçurisiye Rebbilalemin mina ku ew gî lê kiriwin. Go: “Xwayingê go me dest û çavê xwa vê da şuştin. Go: “Serçavê me mina lokisa bûne.” Pir çeleng bûn, lewend bûn. Ber çavê meriya mina hîvekî bûn. Vana êvarê derin go hele vana çi kirine go vana hiri nerîştine ez ê wana bikujim. Ê hat ku him hiri ristine, dî ku tiştêkî mîna fanosê yek li vî alî dewêr e yekê li wê hêla dewêr e. Dî ku Elî û Fatmê ne. Ar ketê ar ketê. Go: “We çi kir çi nekir? Go: Me tiştêk nekir. Îllam go: “Eşê tu jî siweda herî.” Eş jî pir ê pîs e. Go: “Tu jî herî go hela ka vana çi kiriye?” Eş siwe da pê re çû. Go: “Fatme we çi kir ku hûn ha rindik bûn?” Go: Welle îşte hal mal e. Hiriyê min çû, e çûme filan şikeftê go pîrekê min ra go were sipîya bikuje.” Go: “Min serê wê sipî gî tê da kuştin.” Go: “Min karê wê jî kirin û go herin çavê xwe filan avê da bişon go avekê were pêş we.” A go: “Min çavê xwa tê da şuştin û ez ê birê xwa va hatin.” Go: “Ez ê jî siwe da herim.” Diya xwa go: “Îllam tu jî pê ra herî.” Çû, çû wa jî çû kete wê şikeftê. Dî ku eyn dîsa wa pîra yê li wê derê ye. Go: “Eşa min were were hewkî sipîya serê min da bikuje.” Go: “Serê min pir dixuriye. Go: “E li ber ranakevim.” Go: “Wêda.” Go: “Por pîsa heramê.” Go: “Made min digre ku sipîyê te bikujim.” Go: “Ez sipîya nakujim.” Hezar kise pê ra kir, porhişinê nizam çiyê. Go: “De here, here qîza min.” Go: “Avekê niha were pêşiya te.” Go: “Dest û çavê xwa pak tê da bişo here mal.” Ê çû sewir nakiye. Çû hema ecele çû ku dî ku av hate pêşiyê. Kaniyê pêşiyê vewû. Ser da sekinî. Av li çavê xwa kir. Ku çito av çavê xwa nekir Eş bû qîr û qetran. Reş bû goştêk jî eniyê de hişin hat. Ku çi pisiya Xwadê hewû go gî lê derket. Gî lê derket. Çûn mal. Va

sewir nakiye bervê çû dî ku dîsa dudu yê işiq têne ya din tune. Çû ku tew goştek jî rûyê Eşê de heye. Eş reş bûye mîna tenîyê bûye. Go: “Eşê çi li te qewimî?” Go: “Pîrê çi wan ra go min ra jî go.” Ê go: “Çima tu ha bûy ew ha bûn?” Ê go: “Anê min sipiyên pîrê nekuştin lema.” A go: “Wey li minêêê, wey li minêêêê.”

Ha pir çû hindik çû. Lawê padîşêh kê bizewice. Eş jî wirgê pîs e wirgê pîs e. Lawê padîşêh kê bizewice. Vana mîna ku Cemalkoyê gund mindan, bana derdorê gî kir. Banê kirin îşte go lawê padîşêh kê bizewice, delal bang kirin dan, bira her kes were dawetê. Va yê jî ap û amojina niva tişteki ku bike tinnê. Leganek danî wê derê go: “Heta çûme Elî, Fatme go hûn ê vê leganê tiji hêsir kin.” Go: “Hûn ê xêni da jî dernên.” Qapi jî ser ra kilît kirin û a go bi xwa jî kinc li xwe kirin û çûn. Vana giriyan ku hûn wana neçûne. Dikek hewû. Dîk go: “Elî, Fatme hûn bû çi digrîne.” Diwê: “Hûn bû çi digirîne.” Diwê: “Welle... Diwê: “Îşte hal mal ap û amojinê me ha kirin.” Dê: “Herin hinek avê xwe têkine ew ê destek xweyê xwe têkin. Surafkê bîna ava çava bûwe.” Go: “Zû herin kincê xwa li xwe kin.” Wana mîna ku di Cemalkoyê re kê vizbin werin vê derê. Hema hûn di vir re herin. Rê kire ber wana. Rê Xwadê jî dikiye bere. Vana çûn ber axurê mangê kolan. Bavooo, ku her qatek kinc dibiriqîne gî zêr in. Elî jî pir ê çeleng e Fatme jî. Wa kincana li xwe kirin. Tew kesî wir di wê çevrê da tinnê. Ku hûn wana negihiştinê vana berî wan çûn û ketine govendê. Elî û Fatmê ketine govendê, pîyê hev da baz dan. Millet ahaa lê rawû temaşê. Go: “Vana çine? Vana pêrî ne? Wana di ku da hatine? Vana ku çito digêne wê derê ar dikeve binê nigê wan.” Diwê: “Anê va Elî ye va jî Fatme ye. Va kincana li ku hanîne?” Diwê: “Anê va kincana kê ku bînîn va kincana zêr û zîv in ma va kincana li kesî hene?” Dê: “Anê helê eynî Elî eynî Fatme.” Derine dorê ra têne. Nehewiyan. Dikê bimirin. Rawû. Dî ku li hev kom bûn. Elî hat go: “Xuçê. Go: “Haydê. Go: “Wana çûne mal.” Heta ku wana di wirda doş bûn çûn wana jî rast hatine mal. Kincê xwe kirine şûne. Ku bi rêva hatin ecele hatin qondera Fatmê dikeve kaniyê. Li bê nigê wê jî kesî ra nabin. Hatin ser wê leganê da xwar bûn yanê em digirîne. Vana têne mal tîn diwên Elî û Fatmê ê li mal in. Ez zanime ê li mal im ma va kincana li ku hanîn?

Lawê padîşêh jî dereser kaniyê ku hespa xwe avde. Dinire ku hesp li şewqekê avê venaxiye. Lê dinêre ku qundereka zêrînî ye. Tev e hev dalxe didiye. Dilê xwe dikeve wê konderê hîn ne xadiyê qonderê. Diwê ez ê vê qonderê bigerînim ku va nigê kê ra bibe. Dawet maweta xwa îptal kir. Pir digirîne hindik digirîne nigê kesî ra nawe. Hinik diwên filan malek jî derêye. Maleka ap û amojina. Ser nigê Eşîkê dixiye dê: “Hi hi eynî di niga

ra diwîye.” Diwê: “Eynî di niga ra diwîye” Ê ma nawîye. Ku dikê derên cîraneke wan diwê, diwê: “Keçikeke wan a sêwi jî heye dê pirê xwaşik e dê bira nigê wê kin jî.” Ku çito mêrika, lawê padîşêh pê rê, pênc şeşek tev digerine. Lawê padîşêh aşiqê bûyê aqil li serê nemaye. Ku çito Fatme dertê a dê va ya wê şevê ye. Kincê pîs jî ê lê ne. Ku çito qunderê dike nigê xwe bîna qapaxê tam nigara diwe.

A jinik wê şevê nexweş diwe. Nexweş diwe. Lawê padîşêh hîn dawetêke nihû li hev dixê, şeş roya şeş şeva dawetê dike. Dikê were Fatmê biwe. Dikê were bûwe. Jin min şandine. Çûne wê derê. Kincê Fatmê li Eşê kirine. Wa gošta biriye. Şidikek daye ber e. A Fatme jî kiriye rojinê, perdek jî ser da berdaye, devê wê jî girê daye. Devê wê girê daye. Sorikê ser çava dê. Kê bûkê bînin werin. Destê Eşikê xanî kiriye. Gî dên: “Destê vê çika reş in.” Destê xwa avê da kirine ya. Mîna ku gorima xwa bê: “Va ne wa bûka ye, çîqa destê vê bûkê reş in.” Hîn qerepelix pê dikeve. Dîk dê:

“Qîqîrîk qîqînde

Fatma rindik tendûr de

Eşika pîsik xemil de”

A yek diwê hele hûş bin va dîka çî diwê.

Dîk dê:

“Qîqîrîk qîqînde

Fatma rindik tendûr de

Eşika pîsik xemil de”

Derin sorikê ser çava radikin ku ûûûû Eşik e. Şidikek daye ber sêrî ye, e wa gošta gî biriye. Serçavê reş in. Çûn perda rojinê jî rakirin. Ku Fatme di paş rojinê da bi girî biheciye. A îşte Eşikê îptal dîkin û lawê padîşêh tê Fatmê li hespê dike û dere. A dere, dere, pir dimîne hindik dimîne dê go: “E dikê carê ser Fatmê de herim.” Wir rihetiyê nadê. Dere dê îşê xwe berê çêdike ber sêhirciya. Dere şehêkî li zihêrê çêdike. Dê ku: “Ez îllam wê rihetiyê wê ra ber nadim.” Dê: “Fatme min hîn ku e hatime ez serê te bişom, piştta te mistim.” Radibê serê Fatmê dişo wê şehê mera di paş istiyê Fatmê re dike. Fatme li hêla di va diquliwe. Lawê padîşêh: “Amaan hawaaar, ley va çî bû, çî newû.” Wa çentê xwa radike û tê malê. A çîroka min çû nav rişka rihmet li bavê we gişka.

## 2-Çîroka Padîşêh û Lele

Çi hewû çî tunewû, go kalek hewû, go kalek hewû. Keçik li ber ferêt rûniştiye. Go xwa ra ha li ber ferêt rûdinişt. Go rûnişt ha pala xwa da çêêem. Duşunmîş diwû. Dî ku kalekî gêncek pî kir û bir wê hêla ferêt. Dû re li wê hêla ferêt jî li pî kir û hanî vê hêlê. Hat go: “Gênco.” Go: “Çiye?” Go: “Hele were hinda min.” Go: “Çi ye?” Go: “Çima tu li vî kalê siwar bû, çima kalê te pî kir bir wê hêla ferêt cardin jî hanî vê hêlê?” Go: “Welle me şert da girt.” Go: “Mi go rawe çend derewan min ra bike e te li kim, ku tu derewan nekî e bikim tu min pîke.” Go: “Welle me şert da girt.” Ê go bana kalê kir. Go: “Qe tişteke nate serê te tu çima werî vî gencî li pî kî werî salê şêşte heftê ye.” Go: “Welle mi ne tişteke dî, min ne li dinê fem kir.” A go: “Siwe bû, êvar bû e dem ka îro ye.” Keçikê got: “Were got e te re çîrokekê bêm.”

Go: “Bavê min padîşah bû.” Go: “Yek padîşeh bû yek jî lele bû.” Go: “Ez yeka tenê bûm.” Go: “Bavê min dida xwandinê.” Go: “Xwanying, birê min tew tunewûn. Ez qîza padîşêh bûm.” Go: “Lawikekî padîşêh hewû. Lele jî ber destê padîşêh bû. Padîşeh çî bê wî dike.” Go: “E diçûme mektewê.” Go: “Salê min deh û şeş deh û heft bûn.” Go: “Ez hatime malê.” Go: “Min bav û diya xwa ra got hûn zariyakî min ra li ku tînin wînin, hedûriya min nêye, e kê dîn biwîm.” Go: “Qonaxa me way hane.” Go: “Ez qîza padîşêh me. Go: “Lele jî li wir rûdine.” Go: “Bav û diyê min gotiye zariyekî Lele bûye ê çûkik e, em ê te re bînin. Lawik e, em ê te re bînin xwa ra pê bilîze em ê êvarê jî bûwin bi wan dîn. Wana hîn hez dikin. Jinik kar mara dikiye.” Go: “Rawû, bavê min wa lawika hanî. Min zeweş lêwik ra parçê kir, e pê dilîzime.” Go: “Tişteke nêye bîra min e. Kêra, kelem têraşî min orta zêweş da danî.” Go: “Ku lêwik çûye kêre listiye. Ez û lêwik derdê hevda ketine.” Go: “Kêr çûye qiriqa lêwik e lawik fetisî. Ez ê çito bikim, çito nekim ku e xwa vê olayê xilas kim.” Tim dê: “Kalo guhi bi ser de binêr e qîzek im min vana gî kirine. Tu çito îro va gêncî li te siwar diwûye, e temûl nakime.” Go: “Lawik nav lepê min da fetisî, bix bix bix fetisî, kêr çû jêr fetisî mir.” Go: “Mi go ez çî bikim çî nekim?” Go: “Min ew lawika kire çuvalekî.” Go: “Min bir kir dolawa xwa. Diya min jî nika here wê odê, bavê min jî nika.” Go: “Min bi şev destê wi jêkir çekire ser qonaxê.” Go: “Teyr û tûra xwar.” Mala xwa qe ê ber feratekî ye. Go: “Min royê tişteki lêwik jêkir çekîr.” Go: “Ku bixwe.” Lawik wenda bû. Go: “Dinê, alem derek nehiştin.” Go: “Lawik wenda bû.” Go: “Nigekî lêwik li hinda min ma.” Go: “Riya dawiyê... go: “Min çekire ser qonaxê.” Go: “Ku çî heywan çîye ku niva elîmî wira.” Go: “Di deve wî heywanî da kete xwarê.” Go: “Bekçiyê

me pêgirt. Va niga li ku hat?” Go: “Delal bang kir.” Go: “Qiyamet bû. Va niga li ku hat li ku nat em ê bân.” Go: “Min çû beqçiya ra got hûn niha çi dixwazine? E vê ew ê vedişêrime va olayîyek hatiye serê min e. Hûn çi bân ez ê mîna we bikim.” Diwê: “Em çi diwêne.” Diwê: “Em çel beqçî bavê te ne, em yek jî bavê neyê razî ne. Ti li me giya ra bûyî yek em gî werine hinda te em vê olayê veşêrin.” Diwê: “Kalo min go tamam.” Diwê: “Kalo min go tamam. Go: “Min hêrameka reş li xwa werda kalo. Kê siweda gî werin, çel beqçiyê bavê min e kê werin e kê gîra ya rakevim.” Go: “Min hêrameka reş li xwa werda. Go: “E daketime bajêr.” Go: “Min rawû satoreka xwa kirî ya ku pê goşt hûr dikan.” Go: “Min bire ser çerxa tûj kir û go min îçkîna pir kirî go min sîrka pir kirî.” Go: “E hatime mal. Kesek min nas nakiye.” Go: Çel meriye. Niva nikame, xewer jî dane hev.” Dê: “Kalo guhu bi ser de.” Go: “Ku kîjan kete xêni go em te re bi yek bin, araî vexwarin, tem di min nedan.” A go: “Min serê wan jêkir û çekire zîndanê. Min serê wan jêkir û çekir zîndanê.” Go: “Salê min deh û heşt bûn kalo.” Go: “Min çel meri teva lêwik çek û yek meri go mi gî çekirine zîndanê.” Go: “Min şeş miha jî ro bi ro jî qanadekî wan didime heywêne. Bê bav û diya min jî kesekî hayca vê alvêrê tinne. Kesek ne Lele va beqçiyana ku da çûn? Va heddê kesî da nine.” Go: “Pir çû hindik çû.” Go: Ez qert bûm.” Go: “Salê min bûne bîst û heft bîst heşt go padîşahêkî dûr hat ez lawê xwa ra xwastim.” Hîh go wan ra bûye yek a. Yekî ra raketiye. Go: “Kalo.” Go: “Va zemanê jî îşte ê hanî ye.” Go: “Ez yekî ra bûme yek.” Go: “Salê mi pir çû hindik çû.” Go: “Kî têye mi dixwazîye...” Go: Ez dêm e nakim. Kê pasikê min derê. Ez ne keçik im. E nakim. Ez kesî ra jî nawême. Diya min û bavê min zanine.” Go: “Bavê min go qîza min çima tu nakiye?” Go: “Bavo hal mal e ku min vana gî kirine min va jî kiriye. Bigere li çar mey dinê yeka eynî mîna salê min da bira neynokê wê dîsa mîna neynokê min bin. Bigere bîne hinda min ku tu min bûk kî.” Va malik tê ser diwê. Çarmey dinê digerin. Diwê dinê da du însanê bîna hev in. Derekê bernadin, radiwe yeka bîna wê diwûnin. Yeka bîna wê diwûnin. Navê wê Gul e navê wê jî Gulçîn e. Eynî ha bidin kêleka hev tu nizanî kîjan kîjan e kîjan kîjan e. Go: “Ez ê bûk bim.” Çû rihela xwa kir çû ew a xwa kir. Şerik merikê didiye ber xizmetçiyê kes serçavê xizmetçiyê nawûniye. Kesek kê bêy min serçavê wê newûne. Çûn daketine bajêr ku çi qumaşê rind heye hanî kire nivînan ku çi malê rind heye, qîza padîşahane bûka padîşahane go kê min ra were. Rawûn siyar kirin birin çûn. Êvar e pîrek mêrekê wezîr mezîra kom bûn, kê ciyê bûkê bikin. Kê bikin. Go: “Kalo?” Go: “Çiyê min dikine.” Go:

“Rûyê min ê we reş bin kalo. “Go ez jî ney keçik im.” Go: “E rawûm çûm hinda xizmetçiya xwa.” Go: “Mi go keçê were hinda min.” Go: “Min ber yaxa wê girt.”

Go min go: “Tu bû çi li vir î?” Go: “Ez bû te li wir im.”

-Tu ne xizmetçiya min î?

-Belê.

-E bêm çi tu dikê, nekî?

-Belê.

-E bêm çi karê min tu kê nekî?

-Belê.

Go: “Kalo! Go: “Min go were hinda min hîn ku zava natiye xêniye.” Go: “Min kincê xwa li wê kirin, kincê wê mi li xwa kirin.” Go: “E çûm şûna wê ser pûş dirêj bûm.” Go: “Zava jî êvarê, lawê padîşêh jî hate hinda wê.” Go: “Ez siwê rawûm.” Go: “E xizmetçî me, min wan ra taştê bir û çû.” Go: “Kalo guhu bi ser de min xwa wan re kiriye xizmetçî.” Go: “Min rawû û bir û çû go e kê qehra ra bibihecim. Law va xizmetçiya min e tu li ser doşega qedîfe raketiye. Kincê rind li xwa kiriye. Lawê padîşêh li kêlekê ye dehe lele yê li ber dêv in.” Go: “Bû êvar êvar were.” Go: “Ez çûn min xizmetçiyê ra go”. Go: “Mi go tu ne xizmetçiya min î?” Go: “Belê.” Go: “Min go tu ne cariya min î?” Go: “Belê.” Go: “Min go de kincê min bide ê xwa li xwa ke.” Go: “Wêdaaaa.” Go: “E mêrik ra raketim. Ez bûme jinika wî. E pê ra bûme yek. E ne şûna xwa didim, ne kincê xwa didim.” Go: “Kalo heftakî min çito kir, e vê çito bikim, e vê çito nekim?” Go: “Mi go ez ê vê bikujim. Bifetîsim. Ez ê vê bîdim cîyê xwa.” Go: “Bû êvar ku zava were.” Go: “Niva tu teqeta min nemaye.” Go: “Qehra ra nikame rawume ser xwe.” Go: “Kalo! Go: “Guhu bi ser de.” Go: “Nêzika ku zava were lawê padîşêh.” Go: “Ez çûm ku raketiye. Xwudan ser da zîpik zîpik bûye.” Go: “Kalo. Go: “Min belge da ser dêv û min çongê xwa dan qirikê go dest min da go bix bix bix bix...” Go: “Min fetisand.” Go: “Min vê qîzikiya xwa go min kaş kir bire şûne xwa.” Go: “Min kincê xwa li xwa kirin ê wê yê berê jî li wê kirin.” Go: “Hatim ser doşega xwa raketim.” Rok çûn, dudu çûn, sisê çûn. Ferq nakiye ha ê mîna hev in aa. Go: “Lawê padîşêh min ra got ley, ferq nakiye ha, ka va xizmetçiya te tinne ê li ku ye?” Min go: “Law qey ê şûna xwa xwa yê raketiye.”

Got: “Hele binêre va sê rone çavê min lêneket.” Go: “Min lawê padişêh pîya girt.”  
Go: “Min bir çû miriye, werimiye.”

“Kalo” go: “He binire e qîzek im aa, min çi û çi kir.” Go: “Te nikanû du derew bikira.” Go: “Çel û du meri bi vê qîzitiya xwa go min bi veşartî kuştin.” Go: “Ez niha xwadiyê çel û du qetla mê.” Go kal kuta ferêt kir û go: “Here mada ku tu tiştêkî re nawuye zeman li te çûye.” A çîroka min çû dîyara rihmet li bavê guhdaran.



### 3-Çîroka Fuqêre

Go rokê çî hewû, çî tunewû go pîrek û lawikekî xwa hewûn. Go pir ê feqîr bûn. Go neçarbûna ra dimirin. Tişteke tunewû, zemanê berê zati tişteke tunewû. Go li xwe re bar kirin çûne bajarêkî. Hoo ku mala padîşêh li vir e. Berê padîşah hewû axa hewûn. Dî ku mala padîşêh heye. Çimekî wî bajarî da xwa ra konekî xwa vegirtin. Xaniyakî xwa, xwa ra çêkirin. Sal bi sal ew bû lawik gir bû, xort bû. Go: “Anê em çî karê bikin?” Go: “Lawikê min here xwa ra here şivaniya, gavaniya gund bike.” Lawik jî tu çî li xwadê bixwazî wiqayê bi aqil e, wiqayê jî ê bi terbîya ye. Rindik e jî çeleng e. Rawû çû ber dewêr. Pîr ê jî xwa ra tevneka xwa li xêni kire dev. Pîr jî yeka pintî ye. Xwa ra tevnê diterikîniye deriye nav mala êvarê têye. Lawik çû xwara dewarê xwa doş kir viz kir. Viz bû, doş bû. Dî ku şiveka dirêêjj, ê mîna gewriya mêr e, hîn tîr jî li bêr ê xwar e. Şiva xwa radike. Dê va çito şiv e, şiv e hema çito şiv e. Tê dê: “Anê, dê mi va çoya xwe li erdê dî, va şiva xwa diwê ku va şiva mi rokê tişteke bûwe newê te negotiye. Tê vê kûr veşêrî.” Diwê: “Oxil, a hema paş istêrê, de diwê bira neşikê.” Diwê: “Temam.” Diwe çoya xwe bera paş dide.

Dî ku rokê tevna xwa dardê. Bi şev radiwe ku tevna xwa çûye li ber sekiniye. Tevn çêwûye. Riya din tê ku xaliya wê çekirine, xaniyê wê av kirine, damîştine. Pîrê diwê qey cîranê wê hatiye pê ra kiriye. Riya din dîsa dinire ku karê wê kirine. Cîrana xwa ra dê: “Eferim welle te duhu hatiye karê min kiribû. Xwadê li te razî we.” Dê: “Na xaltiyê, min nekiriye.” Cîrana xwa ya din ra diwê. Cîrana wê ya din jî dê welle min jî nekiriye. Dê: “Le va kê karê min kiriye?” Dê: “Hele bise ku e gudariyê lê bikim ku kê kiriye?” Pîr, bi şev diwe, xwa dike kuncikekî vedişêre. Dî ku nîvinê xwa tep û rep hilweşiyên. Xwadeyoo, keçiçek di wê şivêda derket, dengêkî quranê lê hat. Dest û çavê xwa şuştin, porê xwa şeh kir. Çû ser tevnê rûnişt. Devê pîrê çû bin guhi. Devê pîrê, lêvê pîrê gî teqîyan. Go va çito însan e. Yanê horî, melek a wê derê, horî ye. Xwadê daye wî lawikî. Rawû tevna pîrê bir ber sîkinand û ku çî li mal hewû xwara nanê xwa xwar û “Bisimîla” got û ku here şûna xwa kete pîrê metîn para guliyê wê girt. Go: “Tu kî yî tu min ra bê.” Go: “Anapîr.” Go: “Ez dergîsta lawikê te me.” Go: “Ez xwastekiya lawikê te me.” Go: “Mi berde.” Pîrê digê çocîka xwa çocîkê xwa dişkîne û lawik êvarê tê ku ê xêni ye lêwik jî hay jê tine ha wa dilê wê ketiye lêwik. Lawik kêyfa ra dîn bû. Bi çolê ket nizaye ku çî bike deriye wî seriyê deriye vî seriyê. “Lê anê xwadê va bi me kir.” Pîr jî dîn bû. Lawik jî dîn bû. Kesî ra negotin.

Rokê, duduya, sisîya... yeka mîna cîraneka wan ku go: “Mala pîrê bûkeka xwa dîye. Dertêye derva.” Go: “Derva gî ronik diwuye. Çiku pêri ye, pêri ye Xwadê pê ra şandiye.” Ya dini go, ya dini go... lawê padîşêh pê hesiya. Lawê padîşêh ber mala wan ra çû. Va keçika nav wî bajarî da bû şor. Lawê padîşêh kê bizewice, ê bi dergîstî ye. Du sal in ku ê bi dergîstî ye kê bizewice. Go, go: “E bimirim, ez ê vê jinika Fuqêre lê bistînim.” Navê lawik Fuqare ye. Go li meclîsê delal bangkirin da, şor kirin. Go: “E dikê jinika Fuqêre lê bistînim.” Go: “Dilê min ketêye. Ez dergîstiya xwa naxwazim.” Go: “Ez dikê wê lê bistînim, bixwazim.” Ê qey ma xelk e, alem e, cimat e. Go: “Ma wirganî diwe.” Go: “Ku tu îro jinika fuqarakî lê bistîni...” Go: “Vanê dora te yê gî yê herin. Ê bên siwe da jî sira me.” Go: “Na şertê min hene.” Go: “Sê şertê min hene.” Go: “Ku Fuqare wa şertê min neke go ez kê jinika Fuqare lê bistînim wînim.” Ê gî rûniştin. Go: “Şertê te çîne?” Bana Fuqêre kirin. Go: “Were şerten min te re hene.” Fuqare kê xwa bi girî bikuje. Pir li jinikê hez dikiye. Bîna ku xewneke dîye. Giriya xwa wê derê koma hev kir. Go: “Fuqareeee, go e niha li jinika hez dikime.” Go: “Dilê min ketêye, e aşiqê bûm.” Go: “Mi xewa şeva wenda kiriye.” Go: “Min rê ser bav û diya xwa wenda kiriye.” Go: “Tu kê jinika xwa bidî mi.” Fuqêre go: “Çito ez jinika xwa bidim te?” Giya kire hêla Fuqêre yanê. Go: “Sê şertê min hene.” Go: “Tu şertê min bikî jinika te ya te ye.” Go: “Tu şertê min nekî...” Go: “Ez ê jinikê li te bistînim. Dergîstiya xwa naxwazime e kê pê ra bizewicim.” Ê Fuqêre go: “Şertê te çîye?” Hat ber sikinî. Go: “Şertê min go tî herî cilekî wîni.” Go: “Ez ê li vê meclisa xwa raxim.” Go: “Li vê hêlê wê hêlê metrokê kom bimîne.” Giya go: “Tiştêkî hanî, cilê hanî tunene ma, kê meclîsê seriyak heye yek tunê.” Go: “Kê jinika min li min bistîne va ya newûnêye.” Fuqêre giriya, hate mal. Bi rê va kê dikê bikeve hema. Jinika xwa go: “Çima Fuqere tu digirîye?” Pîrê go: “Tu çima digirîye?” Go: “Îşte lawê padîşêh min re şert daxistiye. Diwê tu şertê min nîni şûnê ez kê jinika te bigrim.” Dê: “Kî kane min, li te bistîne. Megrî, xwa newestîne.” Diwê: “Le e çito bikim.” Diwê: “Gotiye çi?” “Gotiye here min re cilekî bine ez ê meclîsa xwa raxim, gotiye ê li vê hêlê wê hêlê kom be. A va şertek e.” Dê: “Wî eyb e elemek te ra.” Diwê: “Va çîye?” Diwê: “Here va şûna ku te lê hanîm, ku te erdê dîm. Bê selam aleykum xenzûr êlan.” Dê: “Wana jî ê bên aleykumesam ênişte. Diwê emrê te çîye. Bê keçika we tiştêk tune ku ciyê xwa li ser bike, ka wî cilkê we yî ber kun.” Ê dê: “Temam.” Kêf kir û çû. Çû. Tişt miştêk tinê ha. Erdî iiişk ezmanî iiişk. Go: “Selam eleykum xenzûrêlan.” Wana jî go: “Eleykumselam ênişte.” Qapî lê vewû. Go: “Emrê te çîye?” Go: “Welle keçika we gotiye here min re

cilekî bîne kê ser ciyê xwa bikim.” Go: “Here lêy here way ber kun bide ênişte.” Go: “Bira biwe here.” Têr kirin têr xwarin û bi rê xistin. Hat bi rê va go: “Ma va çiyê?” Go: “Va hewek e viqaska ye. Bîna belgiyakî çûk e.” Go: “Ma lawê Padîşêh ê ew bike, ê jinikê li min bistîne.” Bi rêva vekir, her ku vedikiye gir diwuye, her ku vedikiye gir diwuye. Yanê ew ê melayîkan in. Kêyf kir li hev werda, da ser pîyê xwe. Doğri derbasa odê bû. Gîya pê qerf kir. Lawê padîşêh pê kenîya. Go: “Hehheee!” Go: “Te hanî, têra meclîsê dike?” Go: “Erê.” Go: “Mi hanî.” Nîva piştta wî metîn bû ku wa dera dereka ew e, çiku erdî işq e qapî lê vediwuye. A bir û çû bana çar peya kir. Meclîs jî gî tirşikçiyê axa nin. Raxistin û ew kirin. Haaoooooww, ku her gulekê tê da ye, her ewekê tê da ye. Raxistin ku li vê hêlê jî metrok bû li wê hêlê jî metrok bû. Tew her ku radixine pir diwûye. Fuqêre kêf kir û revîya çû mal. Çû mal, riya din banê kirin. Go: “Were. Go: “Du şertê te mane.” Go: “Çiyê şertê min?” Go: “Çiyê şertê min?” Go: “Tu yê herî guşiyak tiri wînî. Ez ê li vê meclîsa xwa li vê ortê darxim ku çîqa gelan gîdanê min hewe ê bixwe, wa guşiyê ê neqede.” Fuqêre go: “Ku gî bû jî va nawe ma guşiyak tiri e pê têr nawim.” Dîsa giriya çû mal. Jinikê go: “Xêr e Fuqare tu digiriye dîsa. Megrî e heme, li paş te me, megrî.” Go: “Welle padîşêh mi ra ha gotiye. E ditirsim ku te li mi bistîne.” Go: “Kes nika min li te bistîne.” Go: “Here şûna ku te lê hanî me.” Go: “Bê selameleykum.” Go: “Ê bên Eleykumeselam. Bav û diya min in. Xwang û birê min in.” Go: “Ê bê tu hatiye çiyê?” Go: “Bê e hatime keçika we gotiye here mi ra guşiyak tiri wîne e dikê bixwum.” A go: “Ê bi te din tu yê wînî werî.” A lê go: “Guşiyak tiri çiyê?” Go: “Tu hereeee.” Go: “Serê xwa mêşîne, tu here.” Devê pîrê faf bûye, pîr kê dîn bûwe. A çû wira. Go: “Selamaleykum.” Go: “Eleykumeselam.” Qapî lê vewû. Go: “Emrê te ênişte.” Ber emrî wî ne. Go: “Emrê min keçika we gotiye welle cîgera min dişewitiye. Here min re guşiyek tiri bîne ku ez bixwim.” Go here filan derê filan rezî. Qapî vewiye. Guşiyak tiri jêkir, mîna kundaxa zariya ne. Guşiyak tiri jêkir. Rê da, xwu da qey dûr e çiyê? Go: “Laaww laaw, ku berî çend hewa bixwim, go gewriya min zuha bû.” Dî ku çend hew xwarin ketine şûnê, çend hew xwarin ketine şûnê. Kêyf kir, doxri derbasa meclîsê bû. Go: “Te hanî.” Dîsa heqeheq kete tirşikçi, mirşikçiya. “Wîne wîne wîne, em bixwin.” Ê xwa ra dên hef hef hef... Mexsûs ha ê fêsat pir in. Bi dar xistin. Guşiyê tey turi bîna qundaxê şûna xwa da neliviya. Fuqêrê go: “Temam bû? Go: “Ew ê te mi ra man? Go: “Erê şertekî mi man. Şertekî min ê çetin maye. Biwe biwe, newe tu kê jinika xwa siwe da mi ra wînî mal.” Çav birîne îşte. Go: “Çiyê?” Go: “Tu yê herî, tu yê çaxakî sê rokî wînî.” Go: “Ê meclîsa min

ê şora bike.” Go: “Meclîsa min jî ê guhu bi ser de.” Giriya çû mal. Her ku tiştêkî dertêye. “Dê: “Ê jinika min li mi bistîne.” Diwê: “Va tiştê ne.” A rawû, çû. Giriya jinekê go: “Tu dîsa bû çi digriye Fuqare?” Go: “Te emrê min xwar.” “Ley” go: “Îja jî tiştêkî din gotiye. Gotiye tu yê herî çaxakî sê rokî wîni ê li meclîsa min şora bike. Ma çaxayî sê rokî zanin şora bikin?” Go: “Mala te nekeve.” Go: “Here şuna ku tu duhu çûyî.” Go: “Bê selameleykum, qapiye li te vewe.” Go: “Bê keçika te gotiye heduriya min nêye bira wî çaxa yê me bişîne, lawikê birê min e. E kê xwa ra pê heduriya xwa bînim.” Ê vî lotik li xwa xistin û çû. Zaniwû ku kiramet niva tê da hene, niva îna kir. Çû, go: “Selamaleykum.” Go: “Eleykumeselam.” Gî lê kom bûn. Keçika xwa hezdikine. Bi xwa keçika xwa pê ra şandine ma. A go: “Keçika we gotiye wî çaxayî bişînin. Heduriya min nêye e kê xwa ra pê heduriya xwa bînim.” Go: “Biwe.” Rawûn kirine nav paçikekî. Rê da go: “Laooww laaooww va lawikê padîşêh li mi çi dixwaziye, law ku çima e neçar im, feqîrim, law go ez şivanek im, e gavanek im.” Go: “Erê welle.” Go: “Namussiz e, şerefsiz e.” Go: “E nizam dewa çi li te dikiye.” Nav pêçik da bang kir got a. Law go: “E qurbana serê te wûm.” Dî ku serê xwa bîna mandalyakê ye. Zariyakî sê rokî ye. Go: “Tu şora bike bi dora te wimoo.” Go: “A va şerta maye.” Go: “Qe cimati jî heye. Heq jî heye.” Go: “Temam tu haydê mi bûwe.” Bir û çû. Bîna xîyarekî ye. Gî hatin go: “Te hanî, te hanî, te hanî...” ber vê çûn. Ê go: “Erê mi hanî.” Rawûn ku bêjike ku çiyê danîne kuncêkî odê û wa çaxa danîne ser. Çavê çaxa çûn û hatin çûn û hatin. Lawê padîşêh go: “Çaxa şora bike.” Gî hatin ser ra sekinin. Go: “E çi şora bikim.” Cardin go: “Çaxa şora bike, bikêlime.” Go çavê xwa doş kiiiriinn, go: “Nuç nuç.” Gî lê ditirsine jî. Go: “E çi şora bikim.” Go: “Çaxa şora bike.” Go: “E çi şora bikim.” Go:

“Min bîstanekî xwa çand li Horhor

Go zeweş tê da gî bûne qiyayê qor

Go e dinime dê û jina lawê padîşêh ku

Kê jina Fuqêre lê bistîne bi zor”

Law go: “Vî berbatî rakin.” Law go: “Berbatoxli betbat tu yî. Go te çav bera jinika vî fuqereyî dane. Şerefsiz.” Go: “Tu lawê padîşêh î.” Go: “Rakin la...” Go: “Vî berbat î rakin û xelkê gî tûka ser çava kir û meclîs terikandin û çûn.” A çîroka min çû diyaran rihmet li bavê guhdaran.

#### 4- Çîroka Dal Ahmet

Go rokê da, wextekê da, çi hewû çi tunewû xwa ra sê, çar keçik hewûn. Xwa ra çûwûn ku bin dara bilîzin. Gotû: “Hahooo histiyê vî bîyê mina qirika Dal Ahmet çi wiqa yê dirêj e.” Keçika gotû: “Keçê ma dilê ketiye Dal Ahmet.” Gotû: “Erêêê, va pênc şeş sal in e li dû ketime ez nizame ku î li kîjan gundî ye.” Gotû: “Êy hêyyy tu çi wiqa meraq dikiye.” Çûwû li mal giriya wû. Bav û diyê xwa ra girîyawû. Keçikê rawû bav û diyê xwa ra gotû: “Mi ra sandiqekê çêkin. Zexêriya min ê heft sala dêkinê, min dengiz da berdîna dikê herim ber gundê wana bisekinim.” Gotû: “Dilê min ketêye.” Bav û diyê xwa jî gotû: “Keça min, hahoo, bihewe oxil, tu çi sewda Xwadê da ketiye. Pir ê mîna te çûn mêrik begen nekîr. Tu herî, tu li gundê wan bimîni, ê çito biwe çito newe?” Gotû: “Welle ez ê herim.” Gotû: “Hûn ê mi ra sandiqekê çêkin û a hûn ê zexêriya mi ê heft sala têkin û ez ê wir di dengiz da herim.” A rawûn pê ra sandîq ser necêr çêkirûn, a zexêriya wê ya heft salan kiriwûnê, di dêniz da berdîna wir xwa ra çû.

Çûwû, çûwû. Ber mala xwanga Dal Ahmet sikinîwû. Dal Ahmet lawê padîşêh e. Li bavê xwa qeheriye. Çûye hinda xwanga xwa sikiniye. Xwanga xwa jî ê li cem axê ye, ê li gundekî ne. Bav û diyê Dal Ahmet ê li gundekî ne, ew û xwanga xwa jî ê li gundekî ne. Li wê darê tikê tenê yek xwaying e yek jî bira ye. Dal Ahmet xwa ra dixewite. Xwa ra bajara dixewite. A va digrin derin, diwê azebê xwa hene. Dê: “Xatûn Xwadê umrekî we de.” Diwê: “Sandiqeq hatiye ber biyekê sikiniye.” Diwê: “Em herin bigrin bînin.” Diwê: “Herin, qantirê me pêlik lêkin, palika lêkin, du sê meri jî herin, belkî giran be.” Diwê: “Hûn nikanin bînin.” Diwê: “Herin bi ser din, kut kin bînin.” Derin didine dû hevdu û tînin. Tînin dê: “Xatun Xwadê umrekî te de.” Dê: “Welle me sandîq hanî.” Dê: “Bînin li hêla odê daynin.” Diwê: “Ku kî we ê derê diwê.” Dê ku: “Kî we hatiwe ê derê.” Dê ku: “Qismetê xwa ye.” Keçik zexêrî lê xilas diwe, keçik sê çar ro û şeva ê di binê sandiqê daye. Keçik fedi dikiye ku derê derva. A ku keçik qey birçî diwe. Cêriyê xwangê hene, xwangê li ser qarolî ye. Ezewê xwa hene, cêriyê xwa hene li ber desta dişuxiline. Mala axê ye. Keçika mala padîşêh e, hatiye bûye bûka mala axê ye. A radiwûn diwê keçik qey birçî diwe. Dikevine xew e. Radiwe, dere dikeve dolawê keçik şîvê digre dixwe, kevçiyekî li wî dixwe, yekî li wî dixwe. Keçik çira ber serê wê tîne ber nigê wê ya ber nigê wê jî diwe ber serê wê ya. Dê: “Halla halla vê çima li mi ha kir.” Cêriyê xa ra diwê ê ku ber desta dişuxiline. Dê: “Va hûn wir dikine.” Dê: “Welle xatûn dê ma em dîn in ku wir bikin.” Dê: “Em derin dikevin xewa xwa.” Xwanga Dal Ahmed diwê: “Ez ê bipê.”

Dê: “Heye va sandiqa ye.” Diwê. A bi şev xwanga Dal Ahmed ranakeve, radiwe, dere. Keçik dertê. Keçik dertê ku dertê dere di dolawê da şîvê dixwe ku were çira wê degişke. A xwanga Dal Ahmet hema piyê wê digre. Diwê: “Keça min.” Diwê: “Tu hatiye.” Diwê: “Xwa eşkere ke.” Diwê: “Welle ez hatime xaltiyê.” Diwê: “Ez hatime bûna birê te hatime.” Dê: “Heft sal in e dêngiz da tême dê bûna birangê te hatime.” Xwanga Dal Ahmet dê: “Lo looo dê wir mîna te çûn hatiiinn.” Diwê: “Wir însanên mîna te çûn hatin.” Diwê: “Welle keçika min, birê ney li mal e.” Dê: “Ku birê min were roya bazarê...” Diwê: “Em ê herine pîknîkê diwê baxçê me hene.” Diwê: “Meywê me hene.” Diwê: “Tu û şansê xwa.” Keçik jî kêf dike. Dê: “Welle ez hatime şallê e rezîl newîm.” A vana tev derine pîknîgê. Dal Ahmet dere ser darê, ku meywe jê ke. Keçik jêr da kufîkê dide dest e. Jor da keçikê mêze dike. Keçik dê: “Xwedêyo, Xwedêyo dê şallê li mi hez bike.” A Dal Ahmet peya jêr diwe. Dê: “Xwanga min welle min va keçika begenmiş kiriye.” Dê: “Înşelle qedera min ê li vê keçikê vewe.” Dê: “Xwedê û meziniya xwa.”

A keçikê hez dike, radiwûn rihela wê dikin, tişt miştê wê dikin. La heft ga ya serjê dikin. Berê heft def lê diketin, heft def û zurne lê diketin. Diwê li gundê xwanga mala Dal Ahmet xwanga Dal Ahmet birê xwa dizewicîniye. Niva roya ku dikê bûk were. Ku dikê bûk were, riyê Dal Ahmet kur dikin. Hêleka riyê Dal Ahmetê kur kiriye hêlek neyê kur kiriye. Siwariyek li wê da tê. Mîna ku li ku derê were ha? Mîna ku li Cemalkoyê were qezê. Tê diwê: “Axa, axa Xwadê umrekî te de.” Diwê: “Li gundê mala bavê te wana def lê diketiyê.” Diwê: “Hadê em herin.” Diwê: “La ma ez dizewicime.” Dê: “Tu li halê min û li halê vana binir aa.” Dê: “Ez dizewicime.” Dê: “Hêleka riyê min ê kur kiriye, hêlek nê kur kiriye.” Diwê: “Vana hatine diwên li mala bavê te dawet diwiye.” Dê: “Te dizewicînine.” Dê: “Niha min xwa ra yek diye.” Dê: “Ma çima bê mi, mi ra diwûnine?” A radiwe li bergîra xwa lê siwar diwe û dere. Va bergîra xwa şiv dike û dere û. Dê amaan, hawaar va çi def e, va çi sîtil in, va çi tişt e. Dê: “Welle oxil, em te dizewicînine.” Dê: “Em kê te ra sûprîzê bikin ku tu werî mal.” Dê: “Min niva jinik hanîye.” Diwê: “Jinik ê hanê di paş perdê da ye.” Diwê: “Tiştêkî hanî diwe.”

A radiwe, Dal Ahmet dere. Keçik dinire bû wexta nîvro nehet bû îkundu nehat. Keçik radiwe gelinligê xwa dike ziwûnê xwa û katek kincê qereçiyê li xwa dike û a keçik pirsra pirs pis a dere mala bavê Dal Ahmet. Dê bi pirs merî derî mala Xwadê. Dere ku Dal Ahmet misîn girtiye dikê here texrete êvarê bigre. Diwê: “Axa axa! Xwadê umrekî te de. Va çi dawet e li gundê we diwuye?” Dê: “Welle bav û diyê dikê min bizewicînin.” Dê: “

Tiştêkî bide min e.” Dê: “Diya min ê tişt li cem min çî digeriye.” Dê: “ Hele here lêê e berê di derdê xwa da ketime.” Dê: “Tu li min û vê kereçiyê binire?” Dal Ahmet nizaniye ku dergîstiya xwa ye. Ku li gundê xwanga wî ketiye rê û hatiye gundê bavê wî ye. Diwê: “Here hêla din dê tirşik pir e burxur pire.” Diwê: “Ê bi te din.” A dere, jinik li wa meriya pirs dike. Diwê: “Oda Dal Ahmet li ku derê ye?” Diwê: “Îro bûk hanîne.” Diwê: “Bûk ê li ku derê ye?” A dere oda Dal Ahmet ku bûkê li wê derê ye. Nare oda bûkê dere hêla dini. Dere kincê qereçiya li xwa datîne û gelinlixê xwa li xwa dike û a Dal Ahmet li wir va tê. A dê te dî dê bûne dudu. Dê bûne dudu. Dê: “Qe qedera mi da wir hewûye.” A çîroka min çû diyara rihmet li bavê guhdaran.



## 5-Çîroka Dêwê Serzer

Go çi hewû çi tunewû. Go heft lawik û keçikeka malikekê hewû. Go heft bira û xwangekê hewûn. Go xwaying hîn ê çûçik e. Keçik û dê û bavê xwa yê mal in tew birê xwa nedîne. Go va birê xwayingê çûne çolê, nehatine mal, niva çûne çolê yerleşmiş bûne, şikeft mikefta da xadî diwûne. Go pir çû hindik çû. Go: “Anê?” Go: Bavoo, va xwayingê min, birê min tine ne ma?” Go: “Birê giya hene xwangê giya hene.” Go: “Çima e tenê me?” Pê ra nego. Go: “Na.” Go: “Tu tenê yî.” Go berê şeri bi desta dikirin. Go îro sira mala Şiko ye. Go: “Em ê li mala Şiko şeriyê çêkin.” Go çûn, heft heşş keçik in. Go yekê nav da tir kir. Go jinikê got: “Kê, we kê tir kiriye nav vî hevîrî da?” Go: “E dikê cezê bidim wê.” Go: “Kê teyştek hevîrê din me ra bi şerî kin.” Go wî go: “Serê birê mi we ku mi nekiriye.” Ê wê go: “Serê birê mi we mi nekiriye.” Go vê keçikê jî go: “Serê golikê me yê beşik be ku mi jî nekiriye.” Gotiye: “Te kiriye. Çima birê te heft in tu bi serê golikê beş sond dixwuye. Ê eyne te kiriye.”

Keçik digirî tê mal. Dê: “Anê mi ra hanî diwûne ma birê mi hene, tunene?” Diwê: “Na birê te tunene filan bêvan.” Diwê: “Eyni hûn ê mi ra bèn heft birê mi hene hûn mi ra nawêne.” Diwê: “Heft birê mi hene hûn mi ra nawêne.” Diwê: “Em bèn va jî ê here. Va jî ê dest me here, em ê tene li mal bimînin.” Ê diwê: “Erê welle qîza min.” Diwê: “Birê te hene, kîjan gir bûn ê din banê kir çû hat bir û çûn. Çûne çiyakî bilind.” Diwê: “Asê bûne.” Diwê: “asê bûne. Vana gî çûn me jî nedîne.” A diwê: “Anê diwê hittilbatil ez ê herime wê derê. Dê bê.” “Tu yê çito herî çite nerî?” Diwê: “Sehirciyakî mi ra kerekî li xwalyê çêke, ez ê bi wê kerê herim.” Dê: “Qîza min tu yê li rê bimînî, gûr ê te bixwin, çiya ye zinar e kes kesî nawûne, filan bêvan.” Diwê: “Na.” Diwê: “Ez ê îllam herim.” Radûwe kerikeka xwa bi xwalyê çêdike û diwê: “Tim bê ço, ço ku tu bê hoş kerika te yê hilweşe.” Keçikê dixapîne. Keçikê dixapîne. Dere çolê bi rê va bîr dîke dê: “Çoş, hoş.” Ku çolê de here çi bike. Kerika xwa hildiweşe. Xwali ye lê siwar bûye. Kerik li celbê çêkirine. Hildiweşe. Keçik li wê derê dimîne, sêhra xwa qedîya, wa sêrbaza wê qediya. Li nivê rê maye. Çiya bilind e. Dinire ku jinikek rastê hat. Dê: “Tu li vê derê çi dikiye? Tu kî yî?” Keçikaka gênc e. Ne jinik e. Diwê: “Îşte ez kê herim hinda birê xwa.” Dê: “Birê te yê li ku ne?” Dê: “Birê min ê li filan derê ne.” Diwê: Şikeftakê da ne. Li wê derê seyd meydê dikine. Li wê de re yaşamış diwûne. Mi jî nedîne diya min diwêye. Diwê eşqîyê Şikefta Kulik.” Wa nas dikiye. Diwê: “Erê, haa ha Şikefta Kulik birê min, heft birê min ê li wirin.” Diwê: “Ez ê te biwûn.” Diwê: “Birê te yê jî were mi bixaze.” Diwê: “Em

jî heft keçik in.” Diwê: “Dêwê heftseri zamaninde diya me revandiye. Heft birê me hene dêw in. Em heft jî keçik bûne, em însan in.” Diwê: “Em jî dest wî bavê xwa da em zulmê da ne” Diwê: “Em ê di şikeftê da ne, mi a niha xwa filitandiya e hatime şîrmoka kom dikime.” Diwê: “Soz, soz.” Diwê: “E te bigînimê, soz soz” A va dere keçikê diwe. Keçik wa birê wê hev du diwûnin. Hev du diwûnin. Pê ra çava ger dike. Dê: “Welle mi ra jinikek jî derket.” Diwê: Hûn ê li ku ne filan bêvan” Şûna xwa pê ra diwêêê. Şûna xwa pê ra diwê. Keçik dere. Dêwê serzer bavê keçikê ye. Dê: “Bîna xerîwa li te tê ye.” Keçik dê: “Bîn mîn li mi nêye.” Dê: “Bîna xerîwa li te têye. Tu çûye ku mi ra bê.” Keçik şora xwa pê ra nake. E werime vira. E werime vira.

Çû kete şikeftê îşte, go: “Va şikefta birê te ne. Em heft bira ne, î mezîn ev e.” Go: “Va kî wû rasta te hat.” Go: “Qîza dêwê serzer e, heft serî ye ser zer e.” “Birê tey din ê jî ê werin.” Rawûn kew mev hanîn. Vê keçikê kew pirtûkand û şîva birê xwa kir û ê emaret e jî. Êvar bû tek û têk birê wê hatin û silehkê piya da bû ê ku kêrgu hanîne ê ku xezal hanîne ê ku çi hanîne... xwayinga xwa hez kirin didine serçavê xwa nizanine ku li xwayinga xwa çito bikin. A rawûn go: “Xwangiyê arê me li vira vemire...” Go: “Ar mar tune ha!” Go: “Em ê şîvê xwa xavi bixwun. Heste mestê me tune.” Arê di êrgûn daye. Geş û gemar kirine ser e. Go: “Va pisika...” Go: “Ku tu siwe bi siwe cîya rakî.” Go: “Rebbilalemin heqê pisikê mewûjeka reş dide, em siwê radiwûn li xaniyê xwa diwûnîn.” Go: “Ammaan û amman go vê pisikê meqheherîne. Ku goşt e ku çiyê bidê.” Go: “Va pisika me ya heft salan e.” Go: “Ê here êr mêr da bimîze.” Go: “Ar tune ha!” Vana çûn hatin, çûn hatin, pisikê tim xwa ha tê da, sê çar ro çûn.

Vana jî kêyf dikine diwê xwayinga me hatiye me ra nan û şîva dikiye. Pisikê xwa ha tê da, tê da wê jî pisik kut kir. Go: “Dûra mi here.” Go: “Dûra mi here.” Pisik qeherî. Keçik rawû ku şîva birê xwa bike çû ku pisikê bi êrda mîstîye. Go: “Êvar e birê mi werin ez ê çokim?” Keçik derkete ser şikeftê pê ra dên Şikefta Kulik. Dî ku arek li dûr mîna ku li Cemalkoyê li hinda Sêregê arek dûmanek radiwûye. Keçik xwa lê girt çû, xwa lê girt û çû, çû, çû. Dî ku Xwadêyooo! Heft biroş burxur dikeliye. Gî mer in gî ew in. Wa keçika û şeş xwayingê xwa jî li wê derê ne. Gî zariyê wî dêwê serzer in aa. Jinikek dizîye biriye çûye. Yanê xwa ra lawik bûne dêw e keçik jî bûne keçik e. A diwê: “Em newêrin. Diwê ha te ra hinek ar dikine a paçekî dê ahanî bi vê derê bigre û here.” Diwê: “Birê te jî îllam werin me bixwazin.” Diwê: “Temam. Em ê werin we bixwazin.” Hah keçik diwê: “Hah te ra, bavê me wexta ku li xew rawe. Bîna xerîwa tê, zane.” Diwê: “Ku hat vî şeyî çeke.”

Diwê: “Cardi kê bi te gê, vê sawûnê çeke.” Diwê: “Ku cardin kê bi te gê va terziya çeke.”  
Diwê: “A wê çaxê ku tu ketî şûna xwa niva nika tişteki bike. Wê şikeftê nas dike.” Ku birê xwa derine seyd meyd e jî tişteki pir mezin, kevireki tînine didine ser şikeftê ye. Keçik ku çito xêni da derket, dêw li xew rawû. Go: “Hiiiiii...” Go bîna xerîwa têye.” Nigê keçikê wê çaxê ber qêpi dikeve çilkek xûn lê dirijê. Dew wê xwînê dialêse. Dê: “Va xûna însanan e. Dê: “Mi ra bê kî hatiye vira.” Keçik dê: “Welle bîlle bavo.” Diwê: “Ya Şikefta Kulik e, hatiye.” Diwê: “Hatiye êr e.” Bi şopa keçikê dikeve. Keçik dinire ku toz û dûmanek rawûye bîna ku erebak di nav wê toz û dûmanê da were. Keçik sawûnê çedike, dê li pêş wî dêwî diwe celb, diwe çilbok, diwe batax. Heta dêw xwa li wira xilas dike, dikê hema bi keçikê gîne. Îja şê çedike. Diwe dehl û dirîşk tên pêşiya wî. Heta ku xwa dehl û diruşka xilas dike. Îja derziyê çedike. Derziyê çedike. Heta dêw xwa lê diqedîne xwa digîhîne şikefta xwa û dêw dere paş şikerfê rûdine. Dere paş şikeftê disekine. Diwê:

“Mîjmîjo,

Tiliyê derxe bimîjo

Ku her heft birê te nekujo.”

Dê: “Ez ê her heft birê te bikujim.” Dê: “Ïllam tê tiliya xwa derxî.” Keçik tiliya xwa derdixe. Va dê wa tilîya wê dimije. Keçik rep û hêla din dikeve. Xûn tê da namîne. Va birana derin teko teko wa xwa ra tînin. Îjar vana gî wê keçikê diqeherin. Diwên mêrê me çito li vê hezdikine qandî wê li me heznakine. Ê xwangake wan e. Birê xwa dê: “Xwayingê çi hatiye serê te” Dê: “Va jinana li te têdê dikine. Diwê te çi dikine?” Diwê: “Welle tişteki tine.” Diwê: “Mi ra doxri bê.” Dê: “Îşte wexta ku mi hat we ra got va keçikana hene.” Diwê e çûm wê derê êr. A we jî vana mehr kir.” Wana mehr kirine. Wana gîyê li malê ne. Diwê: “Dêw ro bi ro tê tiliya min derdixin, bavê wana tiliya min dimije xûna min dimije ku her heft birê te li nêçîrê nekujim.” A dê: “Xwîn di mi da nemaye.”

Go vana radiwûn qey bavê wan e. Birê lê dibê diwê: “Ku çito go tiliya xwa derxe go bê ez dernaxim.” Go: “Ku cardî go tiliya xwa derxe, ez tiliya te bimijim bê e dernaxim.” A va keçikana jî çûne qirş û qala kom dikine. Dîsa dêw tê. Vana xwa li dêw veşartiye. A dêw tê dê:

“Mîjmîjo,

Tiliyê derxe bimîjo

Ku her heft birê te nekujo.”

A keçik dê: “Ez dernaxim.” Ku hîn hiiraa keçikê dike ku here şikeftê da keçikê bixwe a vana lê dixin û serê dêw jê dikin û va dêw lox diwe û dere jêr. Keçik tên qewûl nakin. Dên: “Vana çito bavê me kuştiye. Dêw e ku çiyê jî bavê me ye.” Dên: “Em çi bikin gene em li vê keçikê xilas bin.” Diwê ku têlek wa pûrtek wî dêwî here zikê kê di zik da diwûye ejdî ye. Gir diwûye. Vana radiwûn keçik dera qirşa ku tê dere kom dike tê. Dere ku misîn bi ser xwa va ke avê vexwe vana pûrta bavê xwa kiriye misîn e. Kiriye misîn e. Ku keçik avê vedûxwe dê ûûyy dê mû çû qirika mi. Bi hev di re keçik dê vana tiştê kir. Keçik fem kiriye. Dê rooo bi ro keçika gir diwe qalind diwûye. Dê: “Niha çi li te qewumiye? Te çi kiriye? Kî te re bûye yek e? Va zikê te...” Dê: “Welle birawnoo, rûyê min ê li we yê reş be kes nîzika min newûye. Ez ê vê çolê me dê kesek nîzika min newûye.” Dê: “Na na na...” A wana lê îfterê dikin. Diwê: “Ê hamîle ye.” Diwê: “Dere qirşa, nê.” Diwê: “Ê hamîle ye.” Nawên ku me pê ra ha kiriye. A diwên: “Em çito bikin çito nekin?” Dê ku: “Em ê biwûn bikujin.” Birê çûk dê: “Nav me da hamîle bûye dê em hetf birê xwa ne. Ku kîye jî bira me ra bê.” Keçikê çito dikin keçik dê: “Welle kesek tine.” A zikê keçikê hatiye ber dêv e. Dê: “Em çito bikin çito nekin?” Dê: “Em ê biwûn li çolekê bikujin.” Du birê xwa dên: “Xwanyingê, hadê em kê herine qirşa, êzika.” Çol e, xwalî ye, dûr e. Dê: “Hadê em kê herin êzika.” Dê: “Hadê.” A xwanga xwa li kerê dikin û pir derin, hindik derin. Derine kerbelakê dûr û dûr, hew siwe ev jî êvar. A derin tenekakî bi darê va girê didin û diwên: “Xwayingê.” Ê wa jî canê xwa dêşiye, wa ewa jî zik da gir bûye. Tenekakî bi darê va girê didin. Wa jî bêlte dike destê xwa diwê: “E êzika dikime.” Her ku ba tê ye wa teneka li darê dikeviye va keçikê tim ku bi xeva deriye jî dê. “Birê min î va ye êzika hûr dikiye.” Dî ku şev reş bû nîvşev bû. Bû zûre zûre gûra û hirça. Serê xwa radike dê: “Birawoo birawoo şev bûye, te çima bana min nekiriye.” Dîye ku ne bira ye ne kes e. Dor tîji hirç û ew bûye çoleka xil ê xarî ye. Wa teneka bi darî va deriye li wê hêlê dikeviye û li wê hêlê dikeviye. Ku dengê wê tenekeyî tîye wa jî wirgê di xew de dê qey ka birê min î hinda min e. Diwê: “Birawooo dê ku e li vê kerbelê terikandim.” Dê:

“Tu herî diyarî mala

Nigê tekeve kelemekî dara

Heta destê min pê newe

Ne zer biwe ne der biwe.”

Bira çito dere diyarê mala û dirnaxa wê ejdiyayî di dig da dere û di nig da dişkê. Digê mal “Amaan nigê min hawaaarr nigê mi.” Bira wa here li wir biskine.

Keçik tî dimîne, birçî dimîne. Nan tune av tune. Dora wê hesti mesti hene. Tişt hene. Keçik bû siwê dere dora xwa digere. Lawê padîşêh xwa ra viz diwe. Dinire ku keçikeka çiqayî çeleng e. Li bin darekê dirêj bûye. Êjdiyak ha dêv ra dikişiyê. Pêşî heye dawi tune. Radiwe wê ejdiyayî tim jê dike, jê dike, jê dike. Û dike dismala xwa ku tamam dertê. Dinire ku keçik çavê xwa vedike. Dinire ku çavê xwa vedike. Dê: “Tu kî yî, tu çi yî?” Diwê: “Ez lawê padîşê me.” Diwê: “Ez ê li vê derêwûm. Çi li te qewimîye? Tu çima ha bûyî?” Çîroka xwa sêri da pê ra diwê. Dê hanî hanî bû. Dê: “Hadê mala. Rêyeka pir dûr bûye. Diwe mala xwa. Rihet diwe, keçikeka bîna vê tinê. Çava berê didê. Dê: “Ez ê li xwa mer kim.” Dê: “Ez ê mer kim.” Dê: “Kesekî xwa tinê li vê çol û polê mi xwa ra dîye.” Radiwe li xwa mer dike. Du keçikê xwa jî diwûn.

Vana jî tu derê ku wa mêrika negerandin tine. Nifira wê qewûl bû aa. Go:

“Tu herî diyarî mala

Nigê tekeve kelemekî dara

Heta destê min pê newe

Ne zer biwe ne der biwe.”

A rokê dîn ku erebek hate gund şeş heft sal çûne. Erebak hat gund û ber mehelle ber siqaqê xistine pê ew a kom dikine ku pê diwine der meran e. Dinire ku Xwadeyoo yekî nig lê meziin bûye. Kal bûye, çavê xwa lê dikeve digirî. Dê: “Qey yanê va birê min e.” Gî dên: “Ti çima ha bûye?” Dê: “Welle xwangeka me hewû. Min xayineta pê ra kir” Dê: “Mi bir çolê hîşt me gura jinê xwa kir.” Dê: “Ku nifir li mi kir ku çi bû e negîhîstîme malê e ha bûm.” Destê xwa pê dixê. Dê: “Keko nigê te yê rihet bûye.” A diwe mala xwa. Qey birê xwa ye. Mêrik dinire ku çito ku ava zer çû çû... Jinik dinire ku dirnaxa wê ejdiyayî ye. Ku çito tê da derdixê lawik rihet diwe. Dê: “Tu kî yî?” Dê: “Ez xwayinga te me.” Dê: “We li mi hanî hanî kir jinê we. Te dî binire e hatime ku hûn ê li ku ne.” A Çîroka min çû diyaran rihmet li bavê guhdaran.

## 6-Çîroka Hirç

Çi hewû, çi tunewê. Go sê keçik derine qirşa. Bîna ku du sê keçik di Cemalkoyê de ha ber wî ormanî kevin herine qirşa. Derine qirşa, qirşê xwa xwa kom dikin, kom dikiiin. Her yek bi newalekî dikeve, qirşê xwa kom dikin ê yekê jî birê xwa pê ra çûye. Qirşê xwa kom dikin ku piştî yê xwa lêkin. Her hinek koşakî lê dikine va hinda hevalî xwa piştî yê wê lê dikine, hil dide pîyê wê hil dide pîyê wê ku tê ê xwa jî ku çito dike ê xwa rake nika rake. Destiyakî ser datîne. Birê xwa ra dê hilde min. Ku çito dike dîsa nika rake. Xwedêyo radike ku birê xwe hemêzeka di li ser piştî radike yanê ku hindik bûwe ku xwayinga xwa pê kaniwe. Dinire ku hirçekî bîna meşka xwa kirê kiye û tê da dirêj bûye. Keçikê pî dike û direvîne hirç. Lawik: “Ammaan, hawaar, la filanino hirçê Fîdan bir, hirçê Fîdan bir...” Hirç e ma hirçê dizek e, kî bi hirçê kane. Keçikê diwe. Diwe. Vana gund, bi tifanga û bi silêha xewerê didine gîya. Dê çito bû çito newû? Dê hanî bû: “Piştî me yî lêkirî çêkirî em hatin ku xwayinga mi kê berkeve ku hilde pî nikawû. Min hinik rakir, hirçê nav da wû. A piyê xwaying a min girt û reviya, bir û çû. Kaş kir erdê ra bir û çû.” Vana deereekê bernadin. Teselliya xwa niva dikevin. Pir digerin. Diwên ku çi bû niva bû.

Va hirça jî vê keçikê diwe dike şikeftêkî. Qapaxake mezin dike dêv û di dinê da çi heye didiziye, tîniye, dixwiye. Keçik bi şev digirî bi ro digirî. Radiwe keçikê ra diwe. Keçikê ra mêriklixîyê dike. Heft zariyê keçikê diwin, heft sala da. Nîvî hirç e, nivî jî merî ye. Va keçika bi şev ban dike: “Ammaaan hawaaaarr, werin min dest vî hirçî biwûûûn. E miriiiiim. Ne kinc lê mane.” Heft sal ne dêmek. E çito bikim. Neynok dirêj bûne, por dirêj bûye, eyne mîna hirça bûye wa jî heft çêlik kirine. Nîvî hirç e, nîvî jî însan e hema wê ra kezew e. Pir dere, hindik dere digirî çito dike va hirça wê nêliye derva ye. Nêliye derva ye. Rokê hirçê rawû çû, qapax da ser ewê qulikek tê da ma hêlekê da ma. Jinik ha çavê xwa digerîne, dîye ku şivanekî pez î li pêş e li wa dera digerîne. Diwê: “Laaw şivanooo, şivanoo...” Şivan guhu dide ser, deng narêkê, dinire ku da tê ye şivan viz diwe, doş diwe, nawûne. Radiwe, dinire ku deng li vê şikeftê da tê ye. Dê: “Welle va dengê vê şikeftê ye. Dere, diwê: “Tu kî yî? Tu çi yî? Tu çi isn î? Tu çi cîsn î?” Dê: “Welle ez Fîdan im. Wê salê hirçê e revandim, e qîza mala filan kesî me.” Dinire ku hirç wê da hat ku hîn va pê ra şora dikiye. Hirç tekmaê mêrik dixê. Mêrik wê derê cansiz dikeve, loxa jêr dike hirç. Vana pir lê digerin, dên: “Va şivana çito bûye, va bû çi miriye? Va dîsa hirç e?” Pir dere hindik dere, salek, dudu dikevîne arê. Dîsa hirç qey qulikekê tê da dêle. Şêni hatiye îja çoyê desta ye hatin ewa ne. Ban dikiye, hirç tim terka şikeftê jî nakiye qey jinika xwa yê

tê da ye. A doş diwîn çûne kumîyana çiyê. Diwê ban dike ban dike. Diwê: “Law mîlleet, law hûn kî ne, hûn mala kê ne? Diwê hirçê e revandime heft heyşt salin e kirime vir e mi bernadiye ez filan kes im here pê ra bê.” A vana derin li mal diwên. Gund gî çoyê xwa dike dest xwa û tîn, dest xwe û tîn. A ku tê nêzika şikeftê hirç wan dide ber kevira û ber ewa. Bixe bix bi hirçê dikeve. Lêdixin keçikê tînin tîn. Keçikê lê distînin. Diwe vîze vîza wa çêlikê hirça di şikeftê da. Diya keçikê diwe keçikê, dike teyştê sêri dişo, neynoka dike. Eyn wa jî mîna hirça bûye. Şilf, tazi ye, mîna cinawira bûye. Hirç bi şev tê ser xaniyê wan tê tep rep, tep rep... Keçik dêre derva dê: “E herim anê, ecew e nerim? Çêlikê mi niha digirîne.” Diwê: “Fîdaaaan, keçik lawik aluuluuluu keçik lawik aluuluuluu...” Yanê ban dike dê werin. Diya xwa dê: “Were hirç e, pîs e.” Dê: “Lê anê ku hirç e, ku pirç e kezewê qirç e qirç e.” Şeva din dîsa tê. “Fîdaaa Fîdaan keçik lawik alulululu keçik lawik alulululu.” Yane digirîne. Keçik dîsa dere diya xwa dinire ku wir li ser xênî rûdine. Diya xwa dere, dê: “Qîza min hirç e, cêlikê hirça nin. Tu kê vana çokî.” Diwê: “Anê ku hirç e ku pirç e kezewê qirç e qirç e”. A dere hinda çêlikê xwe û a wana jî keçikê bîr dîkin. A çîroka mi çû dîyara rihmet li bavê guhdaran.

## 7-Çîroka Pîrewokê

Go çi hewû, çi tunewû. Go gundikek hewû. Go diçûne ber çemekî êş. Go diçûne êş. Go yek rokê çû êş hat. Gotiye: “Law.” Gotiye: “Va jinê me hene gî çi yê pintî yê pîs in.” Gotiye: “ Hinek jinê li ber çêm in, digerine ê şilfê tazi ne.” Tu nawê wana jî pîrewok in insanê ferêt in. Gotiye: “Law çiqayî çeleng in, law çiqayî lewend in. Va jinê mê yê pîs î pintî.” Rawûye, çûye korteka xwa vedaye ser jî ha noylon û qirş û qal kiriye. Mewûj mewûj kiriye. Dên pîrewok pir li mewûja hez dikin. Vana ber çêm digerin. Yeka qasî neh deh salî dikeve kortikê. Dikeve kortikê. A va hema xwa çe dike ser û şûşinekê kurkekê ra dike û pîrewok li hêsin pir ditirsin. A lê dikin û tîne, tê mal.

Kesî ra nawê. Dê bira gir bûweee. Dê mi ra nawe, ez ê bi lawikê xwa mer kim. Ê çîqa jî xwaşik in pîrewok. Pîrewok gir diwe, şûna wê tim bin kulînê ye. Nên mên dixwîye û hema deriye bin kulînê ye. Serçavê kesî nawûniye. Rokê îja birê wê mêrikê dere, dere êş, tê mala wan. Dê: “La, e îro ber çêm ra hatim.” Go yek diwê: “Fatikê mi, Fatikê min, Etikê mi keçikê mi.” Dê: “Wir ber ferêt ra dere tê.” Dê: “Sê çar carin ber ferêt ra dere tê wir yek di ber ferêt ra dere tê.” Dê: “Şilf û tazi ye. Fatikê mi, Fatikê min, Etikê mi Etikê min.” Hema wa jî bin kulînê da dertê dê: “Hem dadikê mi, dadikê mi.” A diwê: ‘Îllam min berdin.’ Çito dike bernadin.

Pir dere hindik dere. Gir diwe. Heft, heşt sal derin. Ra diwe, li lawikê xwa mer dike. A Xwadê zariyakî jî dide wê. Tim û tim tiştêkî lê dikine, hesinekî jî di bera dikine. Hêsin ditirsine newêre destê xwa bi şûjinê bike ne jî wêre here teva toplima xwa. A wa bebikê xwa gir diwe. Yekî herimî ye. Gir diwe. Niva mezin diwe. Qey hîn sonxi xwediyê xwa ne. Ku kê tê dê dora ferêt hîn li wê digerine. Xwa riya giya didine. Wa na jî, pîrewok jî xwa riya kesî nadin zû zû. A wa lawikê xwa ra dê. “Vî hesinî vê dera mi da kaş ke.” Lawik kaş dike. A dinire ku hema qîjînek hat û di qêpi ra derket. A vana şopê direvin ku xwa çita çe dike nav avê dinire ku xwûna soor bi ser avê ket. Cesedê wê bi ser ket. Hema dikujin. Niva hatiye hinda mîllet a. Çîroka mi çû dîyara rihmet li bavê gudarên.

## 8-Çîroka Mihemedşah

Go rokê çî hewê, çî tunewû. Go gundek hewû. Go ê li ber çemekî da wû. Go ê ip î issiz bû. Go kar û îşek tê de tunewû. Go pir ê neçar bû wa gunda. Go lawikekî malikekê hewû û go şeş keçikê xwa hewûn. Go lêwik li keçikekê hez dikir. Go çito kir, gotin: “Tu yê feqîr î em nadine we, tu gavan î em nadine te keçikê.” Lawik heft sala li hêviyê ma. Wir keçik nedanê. Lêwik rokê go: “Anê?” Go: “Çi ye?” Go: “Kinc mincê mi hazir ke.” Go: “E kê serê xwa rakim ser hewa herim.” Go: “Oxil tu kê herî ku?” Wê derê jî salê carê gemîyak tê. Pê ra diwên gemiya salê. Salê carê gemî hatiye, salekê çûye, salekê jî vegeyriyaye. Go: “E dikê gemiya salê siwar bim.” Go: “Çend ro mane ku were.” Go: “Ez ê xwa ra lê siwar bim û herim.” Ê wa gunda jî gîya xwa li hêviya bo gemiya salê hazir kiriye. Ê di çiyakî dê. Ne gelen ne gîden. Salê carê, gemiya salê tê. Lêwik xwa hazir kir û. Hezar meri zêde heye ê ku derine îş e ê ku derine derane, ê ku derine... Rawû lêwik têra şeş miha xwarin marin xwarina xwa ya gî hazir kir û gemiya salê mezin e, li gemiya salê siwar bûn û çû...

Gemiyaya salê jî wir heft heşt miha wir ser avê da deriye. Rokê vana di xew da bûn. Firtinak rawû, ser raketin, gemî hêl diwûye. Ê ku ketin avê, aman aman, aman... Bi dinê da deriye. Şeş miha şunda va ha. Niva hindik maye ku herin bi şûna xwa gên. A vana raketin rawûn ku sê çar textê gemiyê tenê mane û vana li ser çel meri maye li hezarî. Li hezarî ancax çel meri maye. Vana radiwûn, dinirin ku li ber reşayîyekê sekiniye wa textena. Xwarin marina wan gî bi ro da çû yê. Kê birçîna bixewirin. Xwadeyoo safî av e. Dereka ku pê da herin tune ne. A bana hev kirin go: “Hevalno!” Go: “Çi ye?” Go: “Kincê xwa daynin, li piyê xwe biştînin.” Go ku: “Xwa ra em ajnê kin, reşayî tê ye xanê ye.” Go ku: “Em herine wî reşayî.” Go: “Hele kanî? Go: “Em kê çito bikin.” Rawû gîya kincê xwa danîn. Korika xwa şidandin û ajnê kiriin kiriin, çel lê maye. Çûne wê hêlê her hinik bi çiyakî ketin, bana hev kirin û yekî go: “Bajarek têye xanê ye.” Go: “Çira tene xanê.” Bi ro ye. Go bajarekî şên e. Bana hev kirin, ditirsine jî. Gî çiya ne banî ne. Dereka xerîw e. Şeş mehe ne ku derine. Rawûn bi piyê hev girtin û çûûûn, çûûûn, çûn. Giştine wî bajarî. Nav bajêr viz diwîne ku go halla halla, go neee însanek lê heye, dukanê vekirîne, maxazê vekirîne, xaniyê vekirîne, mal gî heye. Her tişt heye û însanek lê tine. Qûlek lê tune. Go va tiştêk vî bajarî da bûye. Go: “Em ê çito bikin?” Her tişt pir e, bajarek e û kesek nemaye. A rawûn xwa ra ketine xaniyekî. Qapiyê xwa ser xwa ra girtin û go em ê îşev nowetê bi pên hele go ka çî li vî bajarî qewimîye? Go çend rîya li nav bajêr geriyan viz bûn, doş

bûn. Xwarin pir e, tişt pir û pir e. A rawûn şûrekî xwa dîn, kêr mêr ku şûr e kurrim e çiyê dîn. Yekî go ez ê îşev, ez ê bipê m yanê ez ê nowetê bipê m. A rawû li ber qêpi sikinî, ê di jî gî yê xêni da tirsra ra gî di xaniyakî da raketin. Xof digrine. Dên va çito bajarî şên e, her tişt pir e dê çima însanek lê tune ye. A vana radikevin û radiwin ku şûr ê li wê ortê yê hevalê wan tune ye. Vir da digerin wê da digerin, derekê nawûnin. Navê vay ku keçik xwastiye çûye jî Mihemedşah e. Digerin ban dikin, kessek tunê. Çû çû. Riya din yekî din. Gî tev rûniştin. Heta dudu, sisiyaan. Giya go xewa me têye îşev tişte k tune ye. Siwe da dîsa rawûn ku şûr î li wir e lawik tune ye. Riya din dîsa rawûn ku şûr ê li wir e û lawik tune.

Çar man. Çar man. Go: “Em ê çito bikin?” Go: “Wîne em ê îja dudu bipên.” Rawû duduya pa. Devê qêpi pa. Xwadêyooo! Dî ku di şefaqê ra mîna du lokiza hat hîve hîvek lê têye. Ku dêwê heft serî ye. Çavê xwa mîna lokisa vêketine. Ê mîna qaymonekê ye. A rawû hat. Ku bîna însên li ku tê ye wira nas dikiye. A hat ku çito hema ku wana daqultandin û vana bi şopê ketin û ma kê dêw çokin? Dudu man. Mihemedşah û hevlekî man. Vana çûne ser xêni. Go: “Wîne.” Go: “Em sê çar şûra ku hat em dûr va bavînê şalê li çav mava kete ku em dûra isti misti jêkin.” Î mezin e, pir î mezin e. Rawûn çûn ser xêni, tew neketine cîya. Xani ye ku î bilind e çi ye nizanime. Jêr mara gî dar û ber e. Go em ê herin ser xêni go wê da hat ku hînî li ku ye? Van şûr mûr avitnêkê, şûr çû bi çava ketin. Çava da çit bûn. Çit bûn. A vana çûn, bi şûra bi ser ketin û kuştin kuştin heta siwê hîve hîvek li wî dêwî haaat. Go xirç xirç quliwî ser wî dar û ber î. Gî dar in di bin da dişkêne wiqa ku î mezin e. Bajarek gî wî xwariye. A rawû çûn. Siwê zikê wî dêwî qeşartin, qelaştin ku hevalê wan gî tûmî yî tê da ne. Hema gî daqultandiye. Gî daqultandiye, hevalê xwa gî derxistin ber hev da dirêj kirin. Ê ku pêşiyê xwarine natine xanê, ê va çendekê vê dawiyê ber hev da dirêj kirin. Ser da giriyaan giriyaan giriyan, dikê xwa gî bi girî bikujin. Go: “Em ê çito bikin çito nekin?” Xwa re îja çûn serekî bajêrê dinî. Digerine ferat e, çem e ku tu çi bixwazî dukanê sola, maxazê zêra ku tu çi bixwazî ew heye. Nav bajêr geriyan. Ê go: “Bira qe tişt gî hewe.” Go: Em kê çokin?” Go: “Taliya xwa em bêkes in, vê derê ne. Em ditirsine, xofê zikê me dê.” Bi hev ra gotin. Navê yekî Ahmedşah e navê yekê jî Mihemedşah e. Go: “Xovê di zikê me dê.” Go: “Em kê çokin bira qe malê dinê gî e me we.” Rawûn xwa ra çûne ber çem. Ber çem giriyan, kuziriyân. Dîn ku pîrewok li dora çem hene. Yanê wan jî însan in, keçik in, jin in, hîn ê çûçik in, ê gir in. Xwa ra şembîloka kom dikine. Vana pêşek mewûjê xwa bir û çû. Vana zanine ku pîrewok li şûjinê ditirsin.

Her yekî ewaka xwa li maxazê rakir û şûjineka xwa rakirin, tê rakirin. Go şalê me her yekî yek li vana xwa ra bigirta, baniyana li xwe mer kirana. Rawûn çûn nîzika ferêt dî ku wana li wê derê hene. Riya dini îştâ çûn ewek girtin û şûjin tê ra kirin. Hinik mewûj birin. Li wa dera li mewûja pir hez dikin. Dê: “Mowûj mowûj mowûj.” A li wa dera mewûj reşandin û kortek hanî kolan a darik marikê zirav, gîha mîha dane ser çilo milo. Wext çû. Deng bi wan ket. Bi pîrewokan. Go: “Mowûj mowûj mowûj...” Ê çîplax in a eyîn jin in wana jî jinê ferêt in. Pîrewok, pê ra dên pîrewok. A rawûn ketine çelê û ketine çelê. Pîrewoka mewûj kom kirin û xurp û sê çarek ketine çelê. A ketine çelê vana her yekî yeka xwa metîn pê girt. A xwa ra wa ewa lê kirin û hanîne mal û. Go bi şev û bi ro giriyan go vê vê derê ra kaşkin. Yekî wa li xwa mer kir yekî ya din li xwa mer kir. Diwên: “Îllam vê şûjinê li vê dera me ra kaşkin.” Sewa ku herin a. Şûjinê pê va we nikane herin.

A pir çû hindik çû. Her du jî hamîle bûn. Yekê keçikeka xwa yekê lawikekî xwa bû. Tim digrîne diwên vê şûjinê vê dera me da kaşkin. Tim ditirsine. A rokê, dudu, sisê; salek dudu çûn. Cardî ya Mihemedşêh zari hewû. Zariyekî xwa hewû, bû du zariya. Ê dinê go: “E, kê jinika xwa rakim herim.” Wî go: “E nê.” Niva e wê hêlê nawûnim. Va qîherî hat. Wa tenê li wê derê ma. Du zariyê xwa hene ku heft sal çûn ku deh sal çûn. Yaşamîş diwûye, lê tim bi tirs yaşamîş diwûye. Jinika xwa jî pîrewokeka wirgê çito bê wirgê çeleng e. Porê xwa yê dirêj e. Jinikê illam elimî zimanê wê şorê wê. Go: “Tu yê illam vê dera min ra vê kaş kî.” Şûjino tê ra kaş kir. Çend riya gudaî kiiir. Dî ku nariye. Li zariyê xwa hez dikiye. Keçik û lawikeka xwa heye. Go: “Îllam haydê em herine ber çêm kinca û seriyê xwa bişon.” Go: “Em kinca tînine gemarî dikine çe dikine. Xwarin pir e, sawûn pir e em kê herine ber çêm çi?” Lawik tim ditirsiye. Diwê: “Na welle.” Diwê em ê illam herin em kê xwa ra herin ber çêm kêyfê.” Lawik çito dike çarê lê nawûne. Hinek tişt miştê xwa digrin û her du zariyê xwa yî çûçik digrin û cardin jî ê hamîle ye ro mîha ne. A derine ber ferêt. Derine ber ferêt, xwa ra li ber ferêt kiriiin, xwariin. Dî ku bi zimanekî şora dikiye, ê bin ferêt ra şora dikiye. Meri meriyê xwa re şora dikiye. Lawik çû metîn pê girt û li hindê rûnişt. Go: “Tu çi bi mi digiriye?” Go: “E li te ditirsime.” Go: “Metirse.” Go: “Yek, dudu, sisê.” Go: “Sê zariyê mi hene.” Go: “Tu çima ditirsîye?” A lawik, wa berda bi derdê tiştâ da ket bi zariyê xwa lîst. Lê nirî ban kir, go: “Mihemedşaaahh!” Go: “He li mi binêre.” Dî ku ê li orta ferêt e. Zariyakî xwa li piyê xwa kiriye, a ê hamîle ye, zariyak jî li hinda lêwik maye. Hinda bavê xwa ye. A go: “Li mi binêre.” Carê xwa li bin avê va kir rawû. Cinazê lêwik bi ser avê ket. Wê ku li kola xwa

kiriye. Cardin xwa bin va kir dî ku şîrîta por bi ser ket. Seri serjê bûye bi laşê xwa va. Seri bi ser ket. “Ley!” Go: “Mi kir tu meke, ley!” Go: “Tu çima li mi ha dikîye.” Ê bin ferêt wa kuştin. A wa kuştin û lêwik jî serê xwa girt û çû. A çîroka mi çû diyara rihmet li bavê guhdaran.



## 9- Çîroka Masîyê Kesk û Hişin

Dê zemanekî padîşahê hewûye. Dê padîşah nexweş bûye. Nexweş bûye. Dê tixtora gotiye: “Masiyê kesk û hişin heye di dêniz da.” Dê: “Ku tu wî bixwî, xwûna wî bixwî.” Dê: “Tî rihet bûwî.” Diwê radiwûn derin. Ê law tora davinê. Digrin. Diwê lawika xwa diwê wa bala xwa didê ku masiyekî xwaşik e. Dê: “Law, welle va gunê ye law.” Diwê digre, berdide cardî nav ewê. Welle masîci tê diwê: “Padîşah, Xwadê imrekî te de.” Diwê. Dê: “Me hat, me girt lawê te jî girt, avit nav ewê. Nehîşt ku em te ra bînin, werin. Gotiye welle, heyf e wa yî xwaşik e, masî bira ew newe.” Ku wir diwê şunda va dê: “Lawikê min, mi ra î xafîn e, ê heze ke bimirim ê şûna min padîşah be.” Dê lawê xwa ewladlixiyê da dixîne, dê hadê tu ku da deriye here. Diwê navê lêwîk jî Mihemed bûye. Ê de bira padîşah li wir be îja em werin ser Mihemedê.

Mihemed dere dere mîna ku here here dê balê çatereyekê ye. Dê balê xwa yekî hat. Go: “Silameleykum, aleykumeselam.” Merheba, xoş bêş. Go: “Navî te çiye?” Go: “Navî mi Ahmed e.” Lawê padîşêh jî navê xwa Mihemed e. Dê: “Tu kê ku da herî?” Dê: “Welle hal meda durumeka mi yê hanî ye.” Gotiye: “Hadê em bi xwe ra heval bin. Em birê hevûdin e.” Ê law Mihemed çi lê hez dike. Ahmed jî ew e wir î xwîngermik e. Dê derin. Ê vana derine owekê. Wê derê dirêj diwûn. Dê em yek rakevin, em yek jî nowedê bipên. Diwe nawe? Diwê diwe. Dê va Ahmed diwê: “Tu rakeve.” Mihemed ra diwê. A Mihemed radikeve, a va jî bala xwa didê di dûr da çirak xanê dikiye. Xanek e. Va xwa li wî aliyî da digre û dere. Dere bala xwa didêkê ku dêwekî du keçîk girtine. Go hema radiwe wî dêwî dikuje. Wa keçîka ra diwê çi? Diwê em: “Welle vî em revandine hanîne vê derê.” Dê bala xwa didê ku dawîya ew ê da tîji zêr e. Dê: “Hûn li vir bin.” Dê: “Ku em vegeerê hatin, em ê we jî bi xwa ra wînin werin.” Diwe: “Nawe?” Dên: “Diwe.” Dên vana derin. Diwê derin derin derin. Diwê derine bajarekî berê otêl motêl tunewûn xan hewûn. Hespera xwa diwin xanekî. Ew mewê xwa li wir datînin. Diwê Mihemed bala xwa didêkê keçîkek, keçîka padîşêh diwûn e. Dilê xwa dikevê. Keçîk jî qey ew jî wî diwûne, hev du diwûnin. Va radiwe hevalê xwa ra diwê. Ahmed dê: “Mada wirge dora ewê ra viz be viz be viz be.” Diwê: “Li wir bimîne ku te ra çi avit tu bigre were.” Dere viz diwe doş diwe dor qonaxa padîşêh ra. Diwê keçîk ha teqê ra mêze dike. Diwê pelege xasa berdide. Diwê va tîne diwê: “Mi devê bavê nî.” Diwê: “E çûm wê derê wiqa viz bûm va daye.” Ahmed gotiye: “Temam.” Dê: “Va yê gotiye ku êvarê were xas baxçesiyê. Em bi wê de re hevdu gê.” “Wirge?” “Erê.” Diwê: “Temam.” Diwê Mihemed derî ranekeve haa. Mihemed dere xas

baxçesiyê, bala xwa didê ku bavo, law avek deriye, baxçekî xwaş. Yataxekî li wê derê ye. Dere ser yataxê, qirt û ranakete. Radikeve, va keçik tê vir da viz dike, wê da viz dike bi xwa nahese. Dê eweka gula dike belgiyê serî wî datîne û bala xwa didê ku nahesiye dere. Ku dere vava bi xwa dihese bala xwa didê ku eweka gulê li wir e. Dê: “Va çito bûye? Va natiye?” Dê dere. Ahmed ra diwê: “Va gula daye ber serê min.” Dê: “Tu raketî ni?” Diwê: “Erê.” “Bimbarek.” Diwê: “Merî radikevî? Tu çi ye li wê derê raketiyê, keçik hatiye tu ranewûye, gotiye bira were baxçê gulan.” Diwe nawe? Va îjar dere baxçê gulan. Dere wira, dimîne dîsa dere radikeve. Keçik îjar çotek kaw dike berî. Gotiye here xwa ra kaw bilîze, tu ney liyaxa min î. A va ku tê dê bala xwa didê cotek kawî di beriyê dê. Dere Ahmed ra dê: “Va dane mi.” Ê diwê: “Tu çûye raketî keçikê gotiye tu mi ra niva nawû. Here xwa ra kaw bilîze. Tu çi şopa min ketiye?” Dê: “Here viz be.” Cardi dişîne. Dere viz diwe viz diwe, viz diwe viz diwe keçik bala xwa didê ku dîsa du pelê rihana ber dide. A va tê diwê: “Ez ê herim.” Dere Ahmed diwê: “Tiliya xwa birîn bike û xwêy bike ku tu ranekevî.” A va tiliya xwa birîn dike xwey dike û dere. Çû, dî, bala xwa dayê ku keçik hat. Hatine hinda hevu dini. Go: “Em çito bikin çito nekin?” Go: “”Îşte tu here ez ê şûr li vê dera texim.” A tu niva here malê. Şûr li keçikê dixê û keçik dere malê. Nigê xwa girê dide. A vana tên diwên: “Haho haho...” dên. Diza hatiye ew ê me li hinda xanê, barê meyê zêran, çi tiştê me gî birine û dikine qîreqîr. A va gî tên korime morimê padîşêh gî tên diwên welle me yek birîn kiriye, diwên: “Em dizê xwa nas dikin.” Ê dên: “Madam hûn dizê xwa nas dikine werin viz bin, werin viz bin.” Viz diwin doş diwin, mal bi maaal. Diwê mala padîşêh dimîne. Dên welle mala padîşêh nawe. Padîşêh diwê werin mala mi jî mêze kin. Derin mala padîşêh mêze dikin ku diwê: “Mi şûr li niga xistiye.” Bala xwa didinê ku keçik bîrînkirî ye, nigê wê bîrînkiriye, şûr lê xistiye. A gotiye: “Welle dizî mi vava ye. Dizî me ye.” Dê: “Mada wirge wîne em ê veşêrin. Diwê em ê darxin.” Gotiye: “Na, birakî mi heye hûn ê bidine birê mi.” Tîne tê a didine Mihemed. Dê: “Padîşah, ew ê ku qarşîya te dayê ye, lawê padîşahana ne yaa. Ne ku li vir da li wir da. Bavê wî jî padîşêh filan derê ye.” Diwê didêkê û a vana çendekî k li wir dimînin. Dê: “Welle padîşah.” Dê: “Ku tu emrê me bikî.” Dê: “Em ê herin, em ê herine memleketî xwa.” Ahmed û bi wî va tên. Tên a derin wa her du keçikê ku li dest dêw filitandûn jî tînin. Diwûne sisê. Li wê derê ku çiqasa zêr jî hene gî bar dikin û tîniin. A tên têtêên, a wî, cî ku Ahmed hatiye digên wê derê. A dê: “Birawoo, em li vê derê em dikê niva li hev veqetin.” Dê: “Le va keçika?” Ahmed dê: “Bira ê te wîn.” Diwê: “Ez wa masîya me.” Diwê: “Te heyata mi

xilas kir. Mi jî te ra va însanetiya kir.” diwê. Diwê: “Mada wirge.” Diwê hinek xwîna xwa didê diwê: “Biwe, bide bavê xwa.” Dê: “Bavê te yê î rihet bûwe î te jî ef bike.” A Ahmed dere. A va jî tê. Tê dere. Welle dên: “Padîşeh.” Dên: “Va lawikê te hat dê îşte du sê keçik hanîne.” Diwê nizan hanîne hanîne. Diwê: “Bira nîzika mi newe newe.” Neyse dên: “Bira were.” Dên derine hindê. Dê “Padîşah mi te ra îlaca te haniye. A dê: “Vê xwîne hewkî vexwe.” Diwê: “Tu yê rihet bûwî.” Çito dixwe rihet diwe. Ku rihet diwe dê: “Oxil mada ku te dermanê mi hanî mi rihet kir, mi jî tu ef kirî.” Radiwe wa her sê keçikana jî lê mer dike. A di wir da çîroka me xilas diwe.



## 10-Cîroka Padîşahê Diz

Diwê rokê padîşahê hewûye. Diwê bi şev gotiye ez jî herime diziyê. Kincê xwa li xwa dike û dere. Law jinikê gotiye tu padîşah î. Diwê derin fitikê lê dixin, wir lê dixin, wir lê dixin. Dê sê meri tên. Diwên teva wî diwine çar. Diwine çar. Diwê derine, dên: “Em çi bidizin.” Dê derin pezekê diwûnin. Diwê kar bûye. Diwê tînin, dên: “Bavo tu ê nihû yî.” Padîşêh ra. Nizanine ku padîşah e. Dê: Tu yê nihu yî.” “Erê.” Dê: “Bira va ê te we, tu biwe here xwa ra va yî bixwa.” Va tê malê dê jinik dê: “Law tu padîşah î, tu padîşah î.” Dê: “Tu lê geriwe.” Diwê: “Mi ra derxe.” Dê serjê dike. Cîgera wî dixwe.

Ê padîşah niva sewir nake ku êvar bûwe ku here diziyê. Neyse bi şev duwe cardin dere. Fitikê fîw fîw fîw lê dixin û digêne hev du û wana sê bira ne. Padîşêh va diwûne çar. Ê dê: “Wîne em hunerê hev û din bên.” Yek dê: “Welle.” Diwê: “Ku ez herime malekê ku ez Tiştêkî wan bidizim ke ser vê malê tiştêkî bixwim e nêlim ku wa tiştê here. E tiştêkî wan nawim.” Go î di jî diwê: “Ku ke carê meriyekî bûwunim, bi şev ke çavekî va biwunim ku ew xwa bipêçe jî ez wî nas dikim.” Dê ê di jî dê: “Welle ku ez zimanê heywên zanim.” Dê ku: heywan ku çi bê ez zanim.” Padîşah jî diwê: “Ez jî meriya li îdamê xilas dikim. Dê: “Welle mada wirge.” Dê: Ê te, ê li me çêtir e.” Dên ku: “Hadê kem herin xezîna padîşêh wekin.” Diwê: “Hadê kem herin.” Diwê derin. Tiştêkî lê dixin derin. Dê wa yî ku tiştêkî dike devê xwa dixwe. Dê: “Welle e nêlim.” Amaan wir da wê da. Law padîşah dê: “Çi me firsend lê hanîye, hatiye.” Nizane ku padîşah e. Dê: “Law.” Dê: “Welle em nawin.” Diwê derin. Diwê ku siwê xezîna padîşêh vewûye. Ê kî çûye? Diwê temsîlen sax wezîr dere, beriya xwa tiji dike dertê, sol wezîr dere beriya xwa tiji dike dertê. Vî hesawî general derin. Dê dizî belli ye. Çû girtin hanî hatin. Birin çûn ku darda kin. Dê we vekiriye. Aman vir da wê da. Diwê padîşah ewêki li xwa dike dere. Dê lê mêze dike. Dê te dî çavê xwa yî mîna ew a ne. Dê: “Te go e kanim we xilas kim.” Ew ê ku meriya nas dike. Dê wê çaxê ku çûn dê kuçikek dê ban dike, dê: “Padîşah çi yê bênamûs e, deriye diziyê malê xwa.” La va diwê: “Hilla hilla va padîşah diwe?” Ew î dini diwê. Dê radiwe ku dere. Diwê: “Bavo ez şehîd im vana ne dizê min in.” Dê: “Kê pêşiyê çûye diye?” Dê: “Sax wezîr.” Dê: “Sax wezîr were.” Dûra dê: “Sol wezîr.” Dûra tê, dê: “Beriya van tev din.” Bala xwa didin ku zêrê di beriya wan dê. A diwê: “Dizê min vana ne.” Dê raduwin, sax wezîr û sol wezîr dar da dikin. A dê padîşah bana wan dike dê va merinê wir ê ciddî ne tîne xwa ra dike qorimê xwa. Dê rokê birê wan î çûk te yî noweta wan dipêye ya. Diwê bala xwa didê ejdiyak rawû ku padîşêh bigre dê vî rawû lêxist ku

ejdiha ye. Go xist go kete bin qarolî wî. Kete bin qarolî. Padîşah bala xwa didê dê şûrek ser ra sikiniye. Aman aman, bana ew a dike. Dê: “Werin vî e kê bikuştama.” Dê: “Vî biwe herin.” Dê: “Vî dar da kin.” Yaw birê xwa yî mezin diwê: “Padîşah Xwadê umrekî mezin bide te.” Dê: “Îfada wî bigre.” Padîşah dê: “Ma îfada çi bigrim? Niva îfade îcaw nake.” Dê: “Mi dî kê bi şûr mi li mi xista. Niva îcawa îfadê nakê.” Ê çito ber digere, qewûl nake. Dê: “Padîşah?” Dê: “Çiye?” Dê: “E kê te ra meselekê biwêm a dûra dîsa bi dar da ke.” Dê: “Padîşahek hewûye.” Dê: “Papaxanekî xwa hewû ye.” Dê: “Rokê bala xwa didê papaxanê xwa wenda bûye. Wenda bû. Çend riya wenda bû. Go hat bala xwa didê ku mawûna pençê xwa da du dendik hanîne.” Dê: “Padîşah tîne tê wa dendika diçîne mezin diwe ku her yek sêveka pir mezin. Dê: “Ku sêv dikevîne xwarê a va sêvekî tîne dike ku bixwe la dê he bise hinekî dide ew ê ku dimire.” Dê: “Haaa a welle va soxa dijminê min e.” Dê: “Radiwe serî papaxana digre û li hev va jêdike û çedike va dijminê min e diwê.” Ê diwê: “Î seyîdvan bûye.” Dê: “Rokê dere seyd, kewê xwa hewûne.” Diwê nên bi xwa ra diwe avê. Ku ava wî dirijê ku çi diwe. Nanê jî şor e ku dixwa qezewî dişewite.” Dê: “Bala xwa didê ku çiyakî ra av diqunitiye, tê ye çilk bi çilk. Va qedehekê dide ber ku tiji diwe dide kêw kew nigê xwa lê dixê, serê xwa lê dixê dirijîne. Cardî wir dike, cardî wir dike. A hema kewê xwa jî serjê dike dê va dijminê min e.” Dê: “Dere jor. Bala xwa didê ku xenzîrek miriye. Qey royê daye ku wa donê wî ye. Haaa dê: “Welle mi bilheq va kewê xwa kuştiye. Dê: “Ke herime malê dê ez ê herim wê sêvê bixwim bira ez bimirim. Wa sêva ku papaxana mi ra haniye hatiye.” Dê: “Dere hema ku sêvê dixwe dê ku ê pênçe şêş saliye, diwe penc şêş salî. Gênc diwe. Haaa la welle mi bilheq papaxanê xwa jî kuştiye.” Go: “Padîşah?” Go: “Tu jî eger tu vî darxî diwe ku tu poşman biwî. Îfada wî bigre, cardî bike.” Ê dê: “Mada wirg e em ê îfada wî bigrin.” Dê: “Te çima ha kir?” Dê: “Padîşah.” Dê: “Wê çaxa ku ejdiha rawû ku te bigre, dê mi lêxist, mi ejdiha ku mer kuşt kete bin ew ê. Te jî niva dî te ew kir te firsend neda mi ke bên.” Go: “Herin.” Derin bala xwa didinê ku bavoo di bin qarolîyê da heqet kuvaleka mêr e. Lêxistiye, kuştiye ê di bin dê. A va di vir da xilas bû.

## 11-Mihemed û Keçika Padîşêh

Çi hewû çî tunewû. Rokê padîşahek hewû ye. Keçik û lawikekî xwa hewû ye. Dê diya wan dimire. Padîşah dere dizewice dê dêmarî heqeretê li zariya dike. Navê lêwik Mihemed bûye. Dê ew û xwanga xwa va destî xwa digrin, pir heqeretê lê dike dê dêmariye ma tu gunê xwa pê tê.

Dê dertên xwa ra derin şikeftê a Mihemed dere seyd, xwanga xwa jî li wir e dê tu nawê ku di dawîya şikeftê da mîna ewekî heye. Yekî tê daye ew niva îşbîrlîxî dikin. Ew û xwanga wê bi hev re diwûne. Dê ku Mihemed xewera xwa tune. Bi ro dere, bi şev tê radikeve. Bi ro dere wana xwa ra li hinda hev in. Dere seyd. Dê ku dere seyd, dê wê da tê, dê rêviyek tê ber e. Law dê: “Gune ye.” Kewekî çedikê. Dê ku dê va kewê xwa dixwe. Law siwe da bala xwa didê ku gurek hat. Cardin şêr hat, cardin hırç hat. Her heywanekî yek hat. Wî dayê niva heywanê xwa pir bû.

Dê rokê rêvi bala xwa didê ku Mihemed deriye vana tèn li ew ê dimînin ya dê em yek nowetê bigrin. Dê niva va mêrika li me mêze dikiye dê gerekî em jî wî ew bikin. Dê bala xwa didê ku haaa yekî zebelihekî ew û bi xwayinga wî ra bi hev ra ne. Dê radûwin tèn ew ê Mihemed çê dikin. “Te dî kewa didêye Mihemed.” Berê kewa xwa ra pê dilîstin ew dikiri. Dê kewî wî ne xwastin. Ha kirin vir da wê da. Dê gotiye: “La welle tişte di vî heywanî mi da heye. Ecew çî heye?” Diwê: “Tê dê rêvi digre dere.” Dê bala xwa didê ku hoop zebelihekî li wir e. Dê radiwe wî û xwanga xwa va dikuje. Dave ber wa heywana dixwin.

Îii dê ku Mihemed cardî siwê radiwe dere rêvi rûdine koşkekî çêdike. Dê: “Werin top bin.” Bitune heywanan tèn. Diwê çî top bûn? Diwê: “Me xwayinga vî kuşt. Em lazim in vî ra jinekî wînin werin.” Dê: “Em çito bikin?” Dê: “Em çito bikin?” Dê: “Welle em ancax em pê re jinekê bînin. Em pê ra çarekî bûnin.” Dê: “Em ê herin nîzika gund.” Go: “Bira temsîlen du heyvan hêlet kevin. Temsîle îro xenzîr û bi fil a têkevîne gun cot bikin bira hırç jî toxim bireşîne. A em ê vanê di jî bireqîsin.” Go: “Teyr jî bira here li ser xaniyê mala padîşêh bisekine. A ku keçika xwa go ku ê bê heywan cot dikiye ku gîyê derêne derva werin, mêzekin. Ku keçik derket derva bira hema bira teyr rake wîne were. Diwe nawe?” Diwê: “Diwe.” A vana bi wî hesawî dikin. A vana cot dikin. Hinek toxim direşînin. Heywan in îşte her yek bawetekî ê çûk jî xwa ra direqîsin. Teyr jî dereee li ser xaniyê ew ê dê teqereq dike. Dê: “Law werin heywan.” Dê: “Heywan cot dikine.” Dê

berê cot hewû. Dê ku mîllet gî dertê. Dê keçika padîşêh dê: “Ez jî herim.” Dê teyr hema hat, tery digre û yalla. Dê tîne tê. Dê vana bala xwa didinê ku tey tîne tê. Dê vana tiştê xwa gî diterikînin û xişt û revîyan. Revîyan. Vana hatin. Birin çûn. Li ew ê da danîn. Bi şêr ra gotin: “Tu beqçîyê vira we, tu nowetê bigre li ber keçikê.” La vana derine hinda Mihemed ku Mihemed wan ra kewa tîne davê law kewê xwa va dilîzin. Law diwê teyrî wî yê mîna jeta heya diwê jor ber dide, xwa bera ser dide kewê xwa digre. Wir bi neşekê tê. “Law welle” dê: “Îro va heywanê mi da tiştêk heye. Keyfa wan î xwaş e.” Dê bala xwa didê dê bavooo ku pê ra jinikek hanîne. Ê welle rind e. Niva jinik, tamam jinik xwa ye. İiii. A vana dên: “Em nowetê bigrin.”

Law padîşah radiwe ku keçika xwa tunê. Wir da tîne wê da tu ne. Diwê pîreka cadû (dê berê cadû hewûn tey bi kup mûpa diçûn law mîna ku ê sehirbaz bûn) diwê dere bi çi filimê diwe, dê dere mala wan diwê bi wê filimê dê keçikê digre tîne. Ku tîne. Welle dê ku siwê radiwe tune. Keçik tune. Dê: “Em çito bikin? Dê: “Welle cardî vî ew î xwa bikin.” Dê: “Bikin.” Teyr ra jî gotin: “Tu here ser xêni teperep ke. Eger ku dilê xwa hewû ku derket bigre wîne were, ku derneket jî yekî çarşiye bigre wîne em bi tev bin. Erê?” Dê: “Ere.” Tepetepê dike ê keçik jî niva qey li Mihemed hezkiriye. Ku dertê hema digre û tîne. A tîne tê welle padîşah niva fem dike ku wira ye. Padîşah eskerê xwa digre û dere diwê: “Ez ê bi çi hesawî we ez ê bi siwê lê bistînim.” Law va rêvi bala xwa didê ku bavooo ku eskerek têye. Va ban dike, toplantiyê dike, niva sermiyanê wan e oo. Mihemed la feqîrî çi bike. Bi şexsekî tenê ye. Dê: “Gur here bana gura ke. Hirç bana hirça ke. Şer bana şêra ke. Fîl bana fila ke. Çeqel bana çeqela ke. Her kes bi qewmê xwa wînin werin.” Dê Mihemed siwê radiwe ku bavooo ku tu li heywanan. Dê teyra mîna jeta heye ya a pelê xwa berdane, ku çeqel in, rêvine, kêrgu ne ku çi hewûn wana jî gî vana gî ketine sirê. A go vana qarşiya hev sîkinîn. Diwê rêvi go, go: “Heyvanê çûk herin li ser mermiyê wan da bimîzin ku teqandin bira bi mermiyê xwa nên, niva neteqîn.” Dê derin haşa ku ser wan da dimîzin. Vana hucûma hev dîkin. Dê teyr mîna ew ê dê bi serê wan da digrin bera jêr didin. Law padîşêh dî ku îş ê çirûg e. Go dê: “Bavo bisekin.” Dê: “Çi ye?” Dê: “Em ê qewlekî xwa bikin.” Dê: “Bikin.” Dê: “Çi ye?” Dê: “Em ê herin keçikê re bên, eger keçikê Mihemed xwaaast a wî ye. Eger ku em xwastin hûn ê bi me din.” Diwe: “Nawe?” Dê: “Temam.” Qey îlerî gelenê wan jî hene têne, derine hinda keçikê. Ku keçikê ra diwên: “Oxil?” Dê: “Tu me dixwazî, tu Mihemed dixwazî?” Dê: “Welle bavo, ez Mihemed dixwazim.” A dê: “Temam.” Dê wa eskerê xwa dikşîne. Law Mihemed dê îjar ez ê van

çito têt bikim. Rêvi têt li wir top diwin dê: “Werin?” Dê: “Çiye?” “Xwadê li we razî weee.”  
Dê: “Her kes herin. Ku kîcax îcaw bike em ê cardin bana we kin. Go mêrik kane zikê we  
gîya ter ke. Her kes herin.” A derin. Va jî hanî vî hesawî xilas diwe.



## 12-Meryem û Natalî

Dê yek jî hewû ye. Diya xwa miriye. Navê xwa jî Meryem bûye. Dê bavê xwa jî çûye zewiciye. Yek hanî ye, keçikeke xwa jî hewû ye. Navê wê jî Natalî ye. Ê go gî derine qirşa ne, gî derine ew ê. Ê Meryem diya xwa nine, la dêmarî ye. Xwadê merhemet bike. Dê: “Amojinê, a hewikek burxur û rûn bide min. Gî derine qirşan e, ez jî bi erebê herime qirşan.” Dê: “Tu li ku herî qirşa wîni.” Dê ku mistek burxur û rûn didêkê a welle ereba xwa siyar diwe û dere. Dê ku dere dîk ban dike, dê: “Qîqîrîqîqîîîk, Meryem dikê wê da erebek zêr wîne were.” Dê: “Soxooo, nawê ku hestiyê wê ê wînin werin.”

Dê dere, qirşê xwa kom dike. Şikeftê li wir e dê xwa ra burxura xwa dide ser. Dê ku burxura xwa dixwe dê mişkêk dertê. Dê: “Meryem, Meryem welle ez ê birçîme, welle tiştêkî bide min.” Dê: “Kevçiyak e jî dê were rûne em tev bixwim.” Dê zikê mişk têr dike. Dê mişk pê ra diwê ku: “Meryemê ê niha hirçê were vira ê bê te ra şertekî mi heye.” Go: “Tî bê şertê te çi ye?” Go: “Ê bê were çavê min girê de. Eger ke te bigriim ez ê te bixwim, a ku te negrim, te newûnim jî a ez ê ereba te tiji zêr kim. Diwe nawe?” Go: “Tu pê ra bê erê.” Go: “Î zîlekî bi te de. Tu wî zîlî wîni werî bide min ez ê lêxim tu xwa ra here derva, rûne. Diwe nawe?” Dê: “Temam.”

Dê bala xwa didêkê ku welle hirç hat. Go: “Meryemê tu bi xêr hatiye.” Neyse go: “Xêra Xwadê li te we.” Go: “Welle şertekî mi heye Meryemê.” Go: “Were, çavê mi mezbût girê de. Ez ê zîlekî bi te dim. Tu zîl lêxe, a ke te bûnim ez ê te bixwim, ke te newûnim jî ez ê erebek zêr bi te dim. Diwe nawe?” Diwê: “Welle diwe.” Dê: “Temam.” Va dere tiq riq lê dizî xwa lê dixê. Dê tep rep tep rep dere va qulikê ra berdide mişk xwa ra lê dixê. Ew viz diwe, viz diwe, xwa ra dere koşekî rûdine. Diweeee îndîni di hal da dikeve dê: “Meryemê were te qezenç kir.” Dê Meryem dere çavê wî vedike û a ser ereba xwa tiji zêr dike û lê siyar diwe û yalla. De ku dere nêzika gund diwe dê dîk ban dike: “Qîqîrîqîqîîîk, Meryem erebek zêr tîne.” Dê dêmarî wê lê hez nake, dê: “Kiş kiş, soxo.” Dê: “Nawê ku hestiyê Meryemê tê ye.” Dê Meryem tê ber qêpi. Dê hatin ku ser tiji zêr e. Diwê: “Siwe da qîza min ê here du erebe zêr wîne were.” Ê, ê kul be jî, qandî leganek burxur, nîv kîlo, kîlok ji rûn didê. Dê: “Natalî yê here du erebe zêr bîne, were.” Dê ku dere ê çilek e. Şîva xwa dide ser. Ku dide ser dê mişk tê dê: “Natalî, Natalî!” Dê: “Kanî hewkeki bide.” Dê ew ê li kêf dixê, dê: “Mi xwariye îja bidim te.” Dê: “Kerê ku niha hirç hate, na te birawe.” Dixwe, nade mişk. Welle ew tê, hirç te. Dê: “Natalîyê tu bi xêr hatî.”

Go: “Xêra Xwadê li te we.” Î çilek e, î ew e ooo. Diwê: “Were çavê mi girê de ke e te biwûnim ez ê te bixwim. Ku te newûnim ez ê du erebe zêr bi te dim. Diwe, nawe?” Go: “Diwe, diwe çima nawe.” A dê radiwe ku çavê wî girê dide û diwe tep rep tep rep û koşekî da hirp û digire. Digire, dixwe. Hestiyê wê li ser erebê girê dide û diwe nizika gund û wedigere. Dê dîk ban dike: “Qîqîrîqîqîmîk” Dê: “Hestiyê Nataliyê têne.” La diwê: “Soxoo! Nawê ku du erebe zêr tîne.” Bala xwa didê ku ha gi tev e hev xwûn e. Hestî ne. A niva bi perinceka bi xwa dikeve. Niva çû. A va jî xilas bû.



### 13- Çîroka Gurî

Çi hewû, çi tunewû wextekê da, zemanekê da guriyekî ap û amojina hewû. Guri a diya xwa û bavê xwa mirûn, ber destê ap û amojina da mawû. Amojinê jî zalim bû. Apê pê pîsi nedikirin. Amojinê pir pîsi pê dikirin. Digo oxil pê nan dikir û pê cot dikir û ka ma tiji dikir. Ê digo: “Lê amojinê ez gune me. Ez peya me.” “Hooo!” Digo: “Ma guriyo nanê belaşê li ku derê ye.” Digo: “Lê welle amojinê welle e gune me digo bav û diyê mi mirine e ketime ber destê te.” Digo: “Ma bavê mi, apê mi îtxiya bi mi nakiye. Tu îtxiya bi mi dikiye.” Haa digo, bi gurî nan dikir, bi gurî nan werdigerand, hevîr distira, ku çi kar bû dikir. A mîna ku keçik diçûne îş mîş. Digo: “Guriyo tu yê jî va keçikana ra herî qirşa me ra bînî.” Wî digo: “Amojinê eyb e, lê ma keçik in, e hevalê wana me ku wan re herim.” “Na.” Digo: “Tu yê jî herî.” Digo: “Cîran mîran ê me ne tu yê pê ra herî.” A radiwû nanê wan dikirê hinek danî û hinek av, a Gurî ra dikirê. Weris dida pista Gurî û dişande qirşa. Rawû Gurî bi wan re şand.

Digo keçika digo: “Guriyo, de rawe qirşê xwa kom ke.” “Na.” Digo: “E kom nakim.” Digo: “We daniya mi xwariye, ava min vexwariye.” Keçika digo: “Rawe qirşa kom ke. Tu çi qirşa top nakiye va gi baxçe ne o?” Na, rûdinişt, xwa dida erdê, xwa bi tiştê dixapand, xwa bi qirşekê dixapand. Keçika digo: “Va bûye bela serê me.” Digo: “Welle me top kirine, em ê her yek hemêzekê pêra piştî wî kin û piştîyê wî li piyê wî din û bira wa pêş me de here em jî xwa ra li dû herin.” Digo: “Xaltiyeke mi li vê derê heye.” Keçika ra nawê ku xaltiya min ê merxwûr e. Tu nawê ku pîr meriya dixuye. Keçika ra diwê: “Hadê em êvarê li mala xaltiya min bimînin. Dê mera qaza tîne, me ra gûza tîne, me ra kêsma tîne.” Ku derin mala pîrikê, Gurî diwê: “Xaltiya min hûn çi dikin, hûn çi nakine?” Dê: “Mi hinek mêvan we ra hanîne.” Pîr dê: “Hiiii, oxxx welle.” Dê: “Wel wel wel wel welle ez ê vana serjê kim bixwum.” Keçik nizanine ku pîra merxwûr heye. Keçika ra diwê: “Hûn rakevin. Nan manê we hazir kiriye, bixwûn rakevin.” Dê: “E ranakevim aaa.” Dê: “E ranakevim.” Dê: “Guriyo çima?” Diwê: “Te di riya bavê xwa da riyo. Te çima negotiye pîra merxwûr e.” Diwê: “Guriyê mi dayî, mayî kî payî?” Dê: “Welle daka pîrik ez payî.” “Ooo.” Dê: “Guriyê mi qey qisewatê te hene?” Dê: “Wîîî xaltiyê!” Diwê: “Amojineka mi heye.” Diwê: “Gawir e.” Dê: “Pîsiya bi mi dike.” Dê: “Qe xewa mi nê.” Dê: “Qiseweta mi hene.” Dê: “Guriyê mi, çima tu payî?” Dê: “Qe tew xewa te îşev nêye?” Dê: “Ma daka pîrik, şeva çûnê va çaxana diya me, me ra gûz dihanî, me ra kêsme dihanî, me ra her tişt dihanî.” Dê: “Gilêsê me dixwarin.” Pîrik dê: “Ez ê herim we ra bînim.” Dê:

“Hûn gûza jî bixwun.” Radiwe, dere. Dikeve kufika gûza û kêsma digre û tîne. Gurî dê: “Keçikno rawun.” Dê: “Rawûn, êmiş we ra hat.” Dê: “Law Guriyo, êmişê çi hat?” Dê: “Welle.” Dê: “Êmiş hat?” Dê: “Welle êmiş hat.” Keçik êmiş dixwin. Dên: “Welle Guriyo tu felaket î.” Dê: “Me nizanû ku tu wir î felaket î.” Dê: “Welle îşev te zikê me têr kir.” Dê: “Keçikno! Ramekevin haa!” Dê: “Pîrê we bike cumekî ha.” Dê: “Ê we bixwe.” Dê: “Guriyo te di riya bavê xwa da riyo.” Dê: “Çima te nego pîra merxwûr e?” Dê: “Welle ramekevin.” Diwê: “Em ranakevine.” Dê: “Me xwar xwar, nexwar nexwar jî em ê herine mal e.” Cardini dê: “Dayî, mayî, kî payî?” Dê: “Welle daka pîrik ez payî.” Dê: “Şeva çûnê va çaxana diya me me ra qaz serjê kirin.” Dê: “Li sêlê dixist.” Dê: “Oooxxx me xwar.” Dê: “Wîî! Gurîyê min hema bira mîna qaza be.” Pîr wir pê ra xizmet dikiye. Dere pêra qaza serjê dike. Dipûrtikîne. Sêlê datînin. Dere rûn mûnê xwa bi sêlê dide. Wa qaz maza dişo hema tîne li sêlê dixîne û keçik dixwun. Cardini hewkî şev dişkê. Cardi dê: “Dayî mayî kî payî?” Pîrê diwê. Gurî dê: “Dê welle daka pîrik ez payî.” Dê: “Şeva çûnê va çaxana, diya me bi embarê wir av di dêniz da me ra dianî.” Dê: “Oxil dê bira mina avê we.” Dê: “Keçikno! Zû rawûn, kincê xwa li xwa kin. Tiştêkî xwa jî li şûna xwa mêlin.” Dê: “Piştîyê xwa bi piştî xwa xînin.” Dê: “Niva dinê ronik bûye.” Dê: “Dinê mi, we ra ronik kir.” Dê: “Hûn hema bi vê newalê kevin.” Dê: “Hûn niva filitîne.” Dê: “E nême.” Dê: “E kî hîn çi rengî bi serê wê bikim.” Keçik diwên: “Guriyo tu kê çi rengî bi serê wê bikî?” Dê: “Hîn pîr maye.” Dê: “Mi ku heyf li pîrê negirt birawe. Dê manga xwa heye, qazê xwa hene, lûqû xwa hene. Dê maleka malkirî dê kê mi ra bimîne.” Keçik dê: “Guriyo te di riya bavê xwa da riyo. Dê yan tu kê pîrê bikujî.” Dê: “Welle tiştêkî wirganî heye.” A radiwe, pîr tê ku keçik tunene, Gurî tuneye. Gurî radiwe xirarekî pêmi golikê pîrê dike xirêr. Diwê golik îçê xirêr da diwê: “Moooooooxxx.” “Hey te dî xwa mîna golika mi kiriye xwa kiriye xirêr e.” Dê: “Te diye hele dê soxoo.” Dere hema wa li wê pêşiyê hucê kemberokê tîne. Dê: “Gurî xwa kiriye xirêr e.” A dere pîr tîne ser wî girarî da datîne. Êr vêdixe. Golik tê da dişewite. “Hey ku Guriyo tu di riya bavê xwa da birî. A dê te golika mi jî şewitand.” A diwê: “Te qîlek hanî li ber qîlê mi xist te nehişt ku e bikujim.” A dê: “Te dî mi îşev viqa pê ra xizmet kiiiir.” Diwê: “Rawû va keçikana girt û şandin.” Gurî radiwe dere ser xêniye dikê lox li ser pîrê da berde hoo. A pîrê radiwe ku here xêni ku av mavê bîne li ser golikê ke ku çito bike. A radiwe dere, ku pîr dere xêniye. Gurî lox li ser pîrê da berdide pîrê dikuje. A gurî dere gunde dê: “Law keçikno!” Dê: “Werin.” Amojina xwa dê: “Çi bû?” Dê: “Hadê mala malkirinî bi mi ma. Diwê latê xwa hene, dê nogina xwa

heye, dê nogina xwa heye, dê manga xwa heye.” A dê: “Welle Guriyo, em ê te bizewicînin û em ê mala te li wê derê bêlin.” A Gurî dizewice û radiwe ap û amojinê xwa difilite. Dere maleke malkirî xwa ra tê da rûdine. A çîroka min çû diyara rihmet li bavê guhdaran.



#### 14- Çîroka Pîrê û Rovî

Çi hewû, çi tunewû. Go pîrek û keçikeka xwa hewûn. Go pîrê keçika xwa kire bûk, da gundekî nîzîka xwa. Go da gundekî nêzîka xwa. Pir ney dûr e, ney nîzik e. Keçikê jî ê neçar e. Go rokê go: “Anê ti ne ser mi da têt, ti ne derî. E keçika te me. Em ê neçar in. Rokê were mi ra tiştêkî wîne, xwarinekî wîne. Ez keçika te me. Ti çima ser mi da nariye nêye?” Pîr radiwe kuzekî tiji penêr dike, yekî tiji helaw dike û dike dest xwa û dere. Ku rê dikeve roviyak tê pêşiyê. Dê: “Anapîr ku da?” A çîrok e îşte. Dê: “Anapîr ku da?” Dê: “Welle e kê herime hinda keçika xwa.” Dê: “Were, were.” Dê: “Tu westiyayî.” Dê: “Mi de ku yekî dêr te e rakim” Rivi yekî radike. Dê: “Anapîr he ti di vê hêlê ra here, e vê hêlê ra herim. Dê hele em kî dikevîne pêş kê.” A hama diwe koşakî têt dixê ya di jî dêle haşa tê da dirî, dimîze û a pisî misîyî dike îçi û dê mezbût dike. Dere diwê: “Anapîr, ê min î sivik e dê ti ê xwa bi mi de.” Dê: “Ez ê îja wî rakim. He ti li vê riyê da here, ez wê hêlê da herim. Ka em kî pêş da derin?” Ê pîrê dixapîne. Îja wî jî diwe xwa ra boş dike, vedişêre. A dîsa wî jî tiji haşa rêx mêtê, çol molê kom dike, dikê dêv doğri dike û dere mal. Dera mal ku keçika xwa kinca dişoye. Dê: “Çaxa te bixêr qîza min.” Îşte dê: “Anê ti hatî filan bêvan.” Diwê: “Erê” A keçik kinca dişo dê: “Anê te me ra tiştêk nanî? Dê: “Wîîî, mi çito te ra nanî qîza min. Dê: “Mi te ra helaw hanî mi te ra rûnê malê hanî mi te ra çi hanî? Mi du kûz tiji kirine, hanîne. Here wîne ku em tev bixwin.” Diwe: “Erê.” Dere kûzekî keçik ser ew dike, ser pas dike. Diwê: “Anêê!” Dê: “Qe haşa rêx li mala me tunewû ku me bixwara. Va gî rêx e, gî serkulê kera nin. Va çi ye te me ra haniye?” Diwê: “Hîîî!” Diwê: “Ku çi kiriye wî rêviyê li mi kiriye.” Dê li mi hanî kiriye. Go: “Hele ê din veke ê din tew hîn tişt pîsî ye.” Go: “Em çito bikin çito nekin?” Go: “Em vî rivî bûnin.” Go: “Ez ê îllam vî riviyî bikujin.” Pîrê got. Go: “Em ê bûnin.” Rovî êvarê têtê qûna xwa didiye ser rojina wan e dê:

“Elistok

Melistok

Kupê pîrê da rîmîstok.”

Dê pîr de: “Tu bisekine ku e tiştêkî li vî riviyî bikin.” Dere hinek qîr û qetran tîne. Devê rojina xwa gi qetran dike. Dê: “Sewa ku rivi were ku e îllam dêla wî jêkim. Mada ku wî li mi ha kir bira ew jî kut biwe here nav hevala.” A dîsa tê qula xwa dide ser rojinê û dê: “Elistok

Melistok

Kupê pîrê da rîmîstok.”

A çito dike qula xwa ranawe. Pîr çito şîşê li dêlê dixê, dêle ber da kut dike û dêlê tîne. Ê ku va riviya deriye nav hevala gî dên:

“Quto, quto

Dêl melquto,

Min bin dêlê hilquto.”

A va pîr jî boçika wî nezer boncuğiya pê va dike, morika pê va dike. Tişta pêva dike û ber qapiyê xwa va dar dixê. Rivi tê dê: “Lê Anapîrê, dê bira bûy Xwadê we.” Dê: “Lê dêla mi, mi de. E derime nav hevala dê mi ra dên quto quto dêl melquto.” Diwê: Na. Here mi ra kûzek rûn û kûzel helaw wîne, ku e bi te dim.” Diwê bizinê mi hene ez ê herim şîr bidoşim. Dere bizinê re diwê: “Kanî şîr bide min e.” Bizin jî diwê: Here Mi ra pelça bîne ku e şîr bidim te.” Dere dê: Darê tu pelça nadî min e?” Dê: “Tijî here min av de dê erqê berde e tî bûme ku e avê vexwim.” Dere kaniyê ku avê bîne, avê bi ser darê de. Diwê: “Here ser bana qîza mîreka bira qîza mîra were xwa ser avên da çeke ku avê bi te dim. Dere hinda qîza mîra dê: “Qîza mîra, text û tîra. Ber keçikê digere. Dê mi ra cotek kondere, kirasekî û kemereke zîv bikire ku ez werim xwe ser kaniyê de çekim. Dere hinda dukancî. Dukkancî diwê: “Here mi ra gayekî cot bîne.” Dê dere ku mêrikek cot dikiye. Diwê: “Xaloooo!” Dê: “Gura kera te li dera han xwar.” A mêrik cotê xwa diterikîne û direve ku de “gura kera mi xwar”. A hema gê ber dide. Diwe hinda dukancî. Cotek sol, kirasekî û kemerekî zîv dikire û dide keçika mîr. Keçika mîr dere xwa ser kaniyê da çe dike. Kanî avê dide darê. Dar pela diweşîne. Bizin pela dixwe û şîr dide rovî. Diwe dide pîrê. Dê: “Pîrê ka dêla min.” Pîrê diwê: “Haydêêê! Ti li mi keniyaî haaa.” Diwê dêla te yê va ye jî e nadim.” A dere xwa çedike gola avê û difetise.

## 15- Çîroka Hebîbê Neçar

Go rokê padişahêkî zalim hewû. Li wî memleketî jî neçarek hewû. Navê wî jî Hebîb bû. Hebîbe neçar pê ra digotin. Ê hebîbê neçar xwa ra qapi û pencere çê dikirin îşte. Feqîrekî, xerîbanek bû. Însanekî temîz bû yalniz. Padişahê go zalimê namussiz bû. Pêdişeh çav bera kulfeta wî da. Çav bera kulfeta wî da. Go: “Ya Hebîbê neçar. Tu neçar î?” Go: “Erê.” Go: “Tu kê mi ra hezar qapiyî çêkî di roki da.” Jê re got: “Tu yê hezar kapiyî çêkî.” Ê Hebîbê neçar wê çaxê bi destan çêdike îmkan tunenin. Go: “Go E vî îşî ancax mehêkê da nikam çêkim.” Go: “Ku tu heta siweda çêkî çêkî çenekî jî em ê cellat wînim serê te jêkim. Ê va hate mal ê ûzuntilîyê. Kulfeta hebîbê neçar go: “Ya Hebîbê Neçar xêr e te? Mi sifre daniye were nê bixwe.” Go: “Nan ber mi da deriye.” Kulfetê xwa ra got: “Îşte durumeka hanî hanî heye.” Go: “Pêdişêh mi ra go ku tu kê hezar qapiyê çêkî. E çito hezar qapiyî çêkim. Ku çê nekim kê bana cellata ke min bi sêri bike. Go kulfeta xwa got:

“Ya Hebîbe Neçar!

Şev bû yek,

Qapi hezar,

Rakeve nolê hecar,”

Çû raket olum qorqusiyê li ser e. Dikê siweda cellat were wî sêri bigre. Pirbangî li qêpi xist dîng dîng dîng dîng... Firlemîş bû. Li cî xwe çekir go: “Ahaa! Cellat hatin go dikê serê min jêkin. Go: “Xêr e.” Go: Ya Hebîbê Neçar rawe. Padişah mir.” Go: “Jê re tawûtekî çêkê.” Îşê Xwedê teala xerîb in. Go: “Çû çêke.” Bana çiraxê xwa jî kir çû atolya xwa, dukana xwa vekir. “Ya Allah ya Bisimîla” go. Tawutê mîx lêxist mîx lêxist. Go wir dî go êga xwa hat pêşiyê êge ji lêxist. Go çiraxê xwa got: “Usta, Hebîbê Neçar, o mix dexil êgedir. Go: Mixê êge eden de Allah, êgeyî mix êden de Allah.” “Ya Allah, Bisimîla” go û çekir û padişah gewermîş bû cenimî û çûne çeka kortekê kirin. A çîroka min hanî wû. Heta vê derê wû.

## PÊVEK 2

### FERHENGOK

#### A

Ar	: Agir
Arê	: Navber, navberê
Ayri	: Cuda
Avitnêkê	: Avitin
Azeb	: Kesê nezewicî

#### B

Ban	: Bang
Batax	: Avzê, çirav
Begen kir	: Eciband
Bîna	: Mîna, wekî
Baniyana	: Bianîna
Banê kirin	: Bang kirin, gazî kirin
Baxçesî	: Baxçê wî
Belaş	: Bêpere
Bellî	: Dîyar
Bervê	: Ber bi wî
Birang	: Bira
Biroş	: Beroş, amana kûr ya ku xwarin tê de tê kelandin.
Bimbarek	: Mibarek, bêrdar
Bitûne	: Hemû, gişk
Biwûnim, bûnim	: Bibînim

Bixun : Bixwin

## C

Cansiz : Bêcan

Celb : Herî, axa ku pir av di nav de ye

Cemalkoy : Gundeke girêdayî navçeya Curnê Reş e. Bi tirkî navê xwe Ömerli ye.

Ciddî : Giran, cidî

Cil : Xalî, tiştê ku li erdê tê raxistin

Cî : Nivîn

Cîger : Kezew

## Ç

Çarşî : Sûk

Çaxa : Sava, zarokên nûzayî

Çe dike : Diavêje, avêtin

Çêlik : Çêle, bi gelemperî biçûkên jîndaran

Çêkirûn : Çê kiribûn

Çêwû : Çêbûn

Çilbox : Herî, celb

Çilk : Dilop

Çim : Kuncik

Çito : Çawa

Çokim : Çawa bikim

Çûk : Biçûk

## D

Dehl	: Rêl, bîşe, daristanok
Dêle	: Dihêle
Deniz	: Behr
Degîşke	: Biguherîne
Dêngiz	: Behr
Dêmek	: Ango, nexwe
Dere	: Diçe
Derin	: Diçin
Dertê	: Derdikeve, derketin
Dewa	: Doz, dawê
Digên	: Digihîjin, heta cîhekî çûn yan jî hatin
Doğrî	: Rast, dirust
Diçurusiye	: Biriqîn, şewq dan
Dirumek	: Rewşek
Diwe	: Dibe
Diwê	: Dibêje, dibê
Diwûne	: Dibîne
Dixaze	: Dixwaze

## E

E	: Ez
Ecele	: Lez, bi lez
Ecew	: Gelo, eceb

Ewladlixî : Ji zarokatî, ji ewladî

## Ê

Ênişte : Zava

Êmiş : Fêkiyên hişk an yên hişkirî

Êzik : Êzing

## G

Ger kirin : Gerandin. Doş kirin

Gênc : Ciwan

Gemar : Qilêr, qirêj

Gir : Mezin

Gî : Hemû, giş, tev, hemî

Golikê beşik : Golikê ku di eniya wî de rengê spî heye.

Goşî : Gûşî, koma libên tirî yên ku bi rex hev ve şên bûne

Gune : Guneh

## H

Hamîle : Avis, ducanî

Hazir kir : Ameda kir

He'rî : Ax, xwelî

Hedurî : Aciziya can, acizî

Hêlet : Bêhalî, bêtaqetî

Hemaret : Çapxûn, mikewnî

Hemêz	: Hembêz
Heqaret	: Zilet, ibtizaz, biçûkxistin
Herî	: Hirî
Hesaw	: Bers, amar, hesab
Hewe	: Hebûn, ger heba
Hewek	: Hebek, hinek, pîçek
Hewkî	: Piçek, hinek
Hinda	: Li cem, pê re bûn, li gel bûn
Hişin	: Şîn, hêşîn
Hûnik	: Hênik, fênik
Hittilbatil	: Îllam, çi dibe bila bibe

## I

Istî	: Sitû
Işk	: Hişk
Istêr	: Paş nivînan

## Î

Îcaw	: Divêtî, hewcehî
Îçi	: Hundir
Îftera	: Newehî, buxtan
Îja	: Îcar, vê carê
Îkundi	: Esr, berêvar
Îna kir	: Bawer kir
Îtixî	: Tade, zorî, zalimî

## K

Kane	: Dikare
Kaş kir	: Kışand
Kaw	: Kaw hestiyên ji çokên pêz in. Berê li gundan xortan bi kawan dilîstin.
Kem	: Ku em
Kemberok	: Gîyayekî bi strî ye. Bi zimanê latînî navê wî “Citrullus Colocynthus” e.
Kerbelak	: Di maneya pir dûr de hatiye bikaranin.
Kê	: Dê (dema borî), dikê
Kinc	: Cil, tiştên ku mirov li xwe dikin.
Koşakî	: Kunccek, qunccek
Korika xwe	: Li piştta xwe
Kufik	: Zembîl, selik
Kurs	: Nanê ku êdî mirov nikare bixwe
Kurrim	: Şûr, kêr. Tiştêkî tûj.
Kulîn	: Hêlîn
Kun	: Kon, çadir
Kut kirin	: Tehn lê dan, dehfdan
Kuziriyar	: Kelegirî bûn (ji ber qehrê)

## L

Lema	: Lema, loma, ji ber wê yekê
Lê gerî we	: Pê eleqedar nebe. Têkilî pê nînê.
Lîyax	: Lîyaq, şayeste, babet

Lokiz :Lokiz, çireya xazê

Lûq : Şamik, elok, çûlik

## M

Mada : Ji ber ku, hemin

Mange : Çêlek

Megrî : Negrî, girîn

Memleket : Welat

Merî : Mirov, Meriv

Mexsûs : Bi zanebûn, bi qestûka

Merxur : Kesê/a ku mirovan dixwe, mirovaxwer

Mezbût : Zeftkirî

Mêrixlixî : Mêrîfî

Mirûn : Miribûn.

## N

Namusiz : Bênamûs

Narêkê : Hilnayê, bi cîh nayê

Narî : Naçî

Nawê : Nabêje

Nawûne : Nabîne

Neşe : Coş, şadî, kêf

Nêlim : Nahêlim

Nêm : Nayêm

Nig : Ling, pî

Nika : Nikare  
Niva : Êdî, ji hingê pêve

## O

Olay : Bûyer  
Orman : Daristan  
Orte : Nav, nîvek  
Owa : Deşt

## P

Papaxan : Tûtî  
Pemî : Pembû  
Piyê xwe : Da pişta xwe, pal dan  
Pîknîg : Seyran, geşt

## Q

Qandî : Qasî  
Qapax : Devik, devgirtek  
Qapî : Derî  
Qantir : Hêstir  
Qarşî : Li hember  
Qaynî : Qasî  
Gene : Qet nebe, bi kêmî  
Qewûl : Qebûl, pejr, pesind  
Qise : Dijûn, gotinên pir xirab

Qisqanmîş	: Hesûdî kirin
Qorime	: Parêzkar, parêzvan
Qûl	: Evd
Qulik	: Kun, qul, kurî

## **R**

Rivî	: Rovî
Revîn	: Bazdan, bezîn
Rawû	: Rabû
Rîya	: Rojan, ew roj
Rok	: Rojek
Ronik	: Roni, ronahî,

## **S**

Sandîq	: Sindoq, sabat
Sax	: Rast, aliyê rastê
Serqot	:Kesa ku porê wê bi tiştêkî ve nehatiye veşartin
Sewa	: Ji bo, ji ber, bi sedemê
Sêreg	: Girê Sor (Navçeyeke girêdayî Rihayê ye)
Sêhrcî	: Kesê/î ku sêhran çêdike
Sira, sire	: Rêz, dor
Siyar	: Siwar
Siwe	: Sibe

Sorik : Di dawetan de paçê ku li ser serê bûkan tê danîn. Bi gelemperî rengê wan sor e.

Sûravk : Şoravk, ava bi xwê.

## Ş

Şalê : Înşallah

Şembîlok : Gîyayek e.

Şerefsiz : Bêşeref

Şerî : Rişte, cehek

Şert : Merc, şirûd

Şe'hîd : Şahîd, govan

Şilf : Tazî, bêcil

Şiv : Ço, darikê zirav (bi taybetî yê ter ku mirov pê heywanan diajo)

Şîrmok : Giyayeke ku tê xwarin, pincar

Şor kirin : Axaftin, peyîvîn

Şûn : Cîh. An jî di maneya şînê de tê bikaranîn.

## T

Tede : Zalimî, zorî

Tekatek : Yek bi yek

Tekmak : Pihîn, pînek,

Teq : Pace

Têlek : Tayek

Tirşikçî : Kesên ku ji axayan re an jî dewlemendan re melaqîyê dikin.

Tixtor : Bijîşk

Tî	: Tu yê
Toplantî	: Civîn
Toplim	: Civak
Tûmî	: Hemû, gişk

## Y

Yanê	: Ango
Yardim	: Alîkarî
Yatax	: Nivîn, cih

## V

Vewû	: Vebûn, hatin vekirin
Viqaska	: Ev qas, bi qasî vê
Viz kirin	: Zivirîn, li dor tiştêkî an cihekî livîn

## W

Weris	: Bizîng, benê stûr yê ji çend benê li hev hûnandî hatiye çêkirin.
Wiqa	: Ew qas, ew çend
Wîne	: Bîne, anîn
Wirg	: Wisa, wilo

## X

Xadî	: Xwedî
Xawî	: Xav, xag

Xîrar : Telîsê mezin yê ku ji pembo hatiye çêkirin û piranî pembo tê xistinê.

Xîlê xariyê : Tişteke tune.

Xov : Tirs

Xu da : Xwîdan da

Xûn : Xwîn

## Z

Zanim : Dizanim

Zarî : Zarok

Zatî : Jixwe

Zebelih : Mezin, mirovê gelek dirêj û qelew

Zemaninde : Di wextê de

Zexêrî : Xwarin, xwarina ku di rêyên dirêj de bi xwe re dibin.

Zihêr : Jehr